DİJİTAL KÜTÜPHANE KANALI

# Keyifli Okumalar Dileriz

Binlerce kategoride milyonlarca PDF e-kitap, ders kitapları, dergiler ve romanlara platformumuz üzerinden ücretsiz ulaşabilirsiniz.

RESMİ WEB SİTEMİZ

https://rantey.org

Yedek ve Duyuru Kanallarımız
Sitemize erişim engeli gelmesi veya adres değişikliği durumunda aşağıdaki kanallardan güncel giriş adresine erişebilirsiniz:


• Telegram: https://t.me/birkitapbir

• WhatsApp Kanalımız : https://whatsapp.com/channel/0029VbDHv8uE50Us4IvMoc0Y

# LI WELATÊ SÎNORAN

## Sherko Fatah

WERGERANDIN JI ALMANÎ: HUSÊN DUZEN



AYRINTI

RÊZA PIRTÛKÊN ZER

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Wergerên Kurdî û Tirkî,
Yên Pirtûkên Nivîskarên Kurd
Yên ku ji zimanê xwe hatine nefîkirin
Û dewlemendiya Kurdî veguhastîne zimanên dî
Û ne li axa lê hatine dinyayê
Lê di welatên dî û zimanên dî de navdar bûne:

**Pirtûkên Zer**

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## SHERKO FATAH

Sherko Fatah (Şêrko Fetah) di sala 1964an de li Berlîna Rojhilat hatiye dinyayê. Bavê wî Kurdekî ji Kurdistana Başûr û dayîka wî Alman e. Salên zarokiya xwe yên destpêkê li Almanyaya Rojhilat (DDR) derbas kirine, lê hingê demên dirêj li Kurdistanê jî maye. Di sala 1975an de mala xwe bar kirine Viyanayê û piştre li Berlîna Rojava bi cîh bûne. Li wir Fatah, felsefe û dîroka hunerî xwendiye. Di vê demê de jî ew gelek caran çûye Kurdistanê û Iraqê. Fatah, bi babetên derbarê tevgara Îslamî ya tundrev û teknîkên bi hêmanên realîst û fîktionên macereyan bi romana yekemîn Li Welatê Sînoran bala alema wêjeyê kişande ser xwe. Di nava çend salan de gelek xelatên wêjeyê yî berbiçav wergirtin. Fatah endamê Navenda PENa Almanyayê ye û li Berlinê dijî.

Berhem: Im Grenzland (Li Welatê Sînoran, roman 2001); Donnie (Kurteçîrok, 2002); Onkelchen (Apê Biçûk, roman, 2004); Das dunkle Schiff (Keştiya Tarî, roman, 2008); Ein weißes Land (Welatekî Spî, roman 2011); Der letzte Ort (Cîhê Dawî, roman, 2014).

Xelat: - 2001: Xelata Aspekte ya wêjeyê bi romana Im Grenzland; 2002: Xelata şerefê ya Rexnegirên Alman; 2007: Xelata Hilde Domin ji bo wêjeya li Surgûnê; 2008: Shortlist ji bo Xelata Pirtûkan ya weşangerên Almanyayê bi romana Das dunkle Schiff; 2012: Shortlist ji bo xelata Pêşangeha Pirtukan a Leipzigê bi romana Ein weißes Land; 2015: Xelata hunerê ya mezin Berlînê; 2015: Xelata Adelbert-von-Chamisso-Preis ji taybet ji bo romana Der letzte Ort.

## HUSÊN DUZEN

Husên Duzen, li gundekî beriya Mêrdînê ji dayîk bûye. Dibistana seratayî li gund, a navendî li nava Mêrdînê, lîse li Savaştepeya Balikesirê xwendiye. Berî ku di sala 1979an de derkeve derveyî welêt, li Qosera Mêrdînê maye û tev li çalakiyên ciwanan ên hingê bûye. Li Hamburgê beşa aboriyê qedandiye. Li zanîngehên Frankfurt û Hamburgê, bijîşkî, heta pola dawî xwendiye.

Wergerên wî yên ji Kurdî bo Almanî: Zehn Kurdische Erzähler (Deh Vebêjerên Kurd, Antolojî (1996), wek berhevkerê pirtûkê û yek ji wergêrên wê); Im Schatten der verlorenen Liebe (Siya Evînê, Mehmed Uzun, roman 1998).

Wergerên wî yên ji Almanî bo Kurdî: Sê Cowboy li Kurdistanê, Nezîf Telek, çîrok, 2000; Hiob, Joseph Roth, roman, 2015; Bingehên Dramatûrjiyê, Werner von Appeldorn (li ber çapê ye).

Werger ji Tirkî bo Kurdî: Nameya Ku Hate Gund (Köye Gelen Mektup, Esma Ocak, 1991).

Dersdariya Kurmancî (Hamburg, 1996-2001).

Amadekarî û pêşkêşvaniya programa Vegotinê-Kurd1 Tv (2009-2010).

Gotarên wî yên li ser babetên çandî di malper û kovarên cuda de belavbûne.

Niha li gel wergerên wêjeyî, wek wergêrê sûndxwarî yê ji bo Kurdî û Turkî, li Hamburgê dijî.

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# Li Welatê Sînoran

Sherko Fatah

AYRINTI

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Ayrıntı: 885
Rêza Pirtûkên Zer: 3

Li Welatê Sînoran
*Sherko Fatah*

Navê Pirtûkê yê Eslî
*Im Grenzland*

Edîtorê Rêzê
*Yavuz Ekinci*

Werger
*Husên Duzen*

Edîtorê Pirtûkê
*Ayhan Geverî*

Xwendina Dawî
*Ronî Hartmann*

© 2001 Jung und Jung Verlag, Salzburg

Mafên weşandina wergera vê berhemê
aidê Ayrıntı Yayınları'yê ne.

Wêneyê Bergê
*Shaul Schwarz/Getty Images Turkey*

Bergsazî
*Gökçe Alper*

Tîprêzî
*Hediye Gümen*

Çap û Cild
Kayhan Matbaacılık San. ve Tic. Ltd. Şti
Merkez Efendi Mah. Fazılpaşa Cad. No: 8/2 Topkapı/İst.
Tel.: (0212) 612 31 85 - 576 00 66
Jimara Sertîfîkayê: 12156

Çapa Ewil Stenbol Gulan 2015
1000 Hep

ISBN 978-975-539-993-5
Jimara Sertîfîkayê: 10704

AYRINTI YAYINLARI
Basım Dağıtım San. ve Tic. A.Ş.
Hobyar Mah. Cemal Nadir Sok. No: 3 Cağaloğlu – İstanbul
Tel.: (0212) 512 15 00 Fax: (0212) 512 15 11
www.ayrintiyayinlari.com.tr & info@ayrintiyayinlari.com.tr
Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://archive.org

# Li Welatê Sînoran

Sherko Fatah

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# 1

Gava mêvanê ji rêya dûr hatî bihîst şîn heye, Qaçaxçî ji berî bi gelek rojan ve bi rê de bû. Bêyî ku hayê wî ji mirina kurê wî hebe ku niha bi fermî hatibû pesendkirin, wî dabû rê. Lêbelê berî wê yekê wî terka maliyên xwe yên mayî, jin û herdu zarokên xwe yên biçûk kiribû. Mîna ku his kiribe bê çi li pêşiya wî ye, Qaçaxçî dest bi dawîlêanîna pêwendiyên xwe yên heyî, hilweşandina pirên li pişt xwe kiribû.

Rojên dawîn berî ew bide rê, li mala xwişka xwe ya mezin şeveder mabû. Xwişka wî yeke bêdeng î bejnkurt bû, lêbelê di hemû kiryarên xwe de jineke bêrawest bû. Wê gelek caran hewl dabû ku têbigihêje, bê çi hatibû serê birayê wê. Lêbelê Qaçaxçî, bêdeng bû û bi gumaneke mezin wê dilê xwe pê xweş dikir ku rewşa wî tenê ji ber krîzeke kurtedemî xirab e. Bi nûçeya mirina kurê wî yê ciwan ku ji mêj ve bûbû, her tişt bi şêweyekî ku qet nedihat texmînkirin, xerabtir bûbû.

Mêvanî, dît ku meta wî ya ku hetanî hingê tenê ji salixdanan ew nas dikir û dema kurt ya mêvaniya xwe li mala wê dima, mîna cinekê bi lez û bêdeng di nav malê re derbas bibû. Mîna wê, wî jî ji xwe dipirsî ka dê Qaçaxçî çi bikira, ger ew vegeriyaya û ew tişt bibihîsta ku bi salan bi tirsa wî dijiya.

Ew çû mala Qaçaxçî, ji bo ku ji jina wî re sersaxiyê bixwaze. Maleke gava ku ew hatiyê, vekirî bû; derî li piştê bû. Her kesê ku bixwesta dikarîbû derbasê hundir bibûya, ne tenê ji bo ku



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

sersaxiyê bixwaze, lêbelê ji bo ku ew demekê bi wan re şînê jî girêbide. Wî derî bi dahfdan vekir û di nav pêlavan re ku wek ên li hêwana mizgeftekê bûn, ji xwe re rêyek vekir. Ji bo bikaribe sola xwe bi hêsanî dîsa bibîne, piştî çû di nav zilamên mêvanên şînê de rawestiya, ew ji piyê xwe derxist ku qatê jêr ji wan re hatibû veqetandin. Mêvanan pala xwe dabû dîwaran, li ser erdê rûniştî bûn û dengê axaftina wan ê hêdî, ode dadigirt. Ew heta bi derenceyê meşiya, beyî ku awirekê jî biavêje nava odeya ku gelek kes lê bûn. Jixwe wî ji wan mêvanên li wir kesek jî nas nedikir.

Ew hilkişiya ber bi jor ve û her carê radiwestiya, heta ku zilamên li ser pêlikên derenceyê ji bo ku rê vekin, yek bi yek rabin ser xwe. Jor, ji deverên malê yên mayî hîn tarîtir bû. Perdeyên li odeyên biçûk hatibûn girtin. Li wir jin li hev civiyabûn. Wî li odeyan yek bi yek nerî û zor da çavên xwe. Tenê awir pêrgî wî dihatin, tu kes pê re nediaxivî.

Dengê xweser ê xwendina Qur'anê, ew ber bi odeya rast ve bir. Wê destê xwe dabû ber rûyê xwe, serê wê ber bi aliyekî ve xwe dabû ser destê wê, li ser erdê rûniştî bû. Pişta xwe sipartibû dîwarê tazî. Jinên din hema wisa li wir, li dora wê xwe piçikandî rûniştî bûn û dem pê re derbas dikirin. Demeke ku nedixwest derbas bibe. Wisa berdewamiyek hebû ku teşeyê melodiya xwe di heman peyvên monoton ên ji teybê de werdigirt. Wî gavên xwe bi hemd di nav jinan re avêtin û çû li ber wê rûnişt. Wê ew yekser himbêz kir, ber bi xwe ve kişand, mîna ku ew jî di wê kêliyê de wenda dibû. Wî berê pirsîbû bê divê çi bike û wisa li gor agahdariyên bidestxistî niha maçî hinarka rûyê wê kir, bêyî ku tu tiştî bibêje. Wê ew dîsa berda, serê xwe hêdîka bi erênî hejand û kêliyeke kurt bi xemgînî li wî mêze kir. Xemgîniyê ew di wê kêliyê de zeft kir, ji ber ku wê bi şêweyekî qet ne şexsî li wî mêze kiribû. Ew tenê ji nêzîkahiya wan perdeyên tarî yên şînekî çîrokî pêk dihat ku hemû rengên di hundir de heta bi yê çerm jî dadiqurtand. Wî xwe ji nav destê wê derxist û rabû ser


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

xwe. Wê di ser xwe re lê mêze kir, lêbelê mêvan bi xwe jî tenê beşek ji tariya mezin bû, ew jî dikarîbû biçûya û bihata û tiştek pê nedihat guhertin. Tenê tiştê wî karîbû bikira ew bû ku beşek ji dema bêdawî di malê de derbas bike.

Mêvan, ji odeyê derket, dengê xwendina Qur'anê bi tecwidî heta ber derenca jêr jî da dû wî. Li wir ew kêliyekê rawestiya û wisa eşkere hest bi vê demê kir, ji ber ku demeke vala bû, ne bi axaftinan ne jî bi tu tevgeran hatibû dagirtin. Wê mîna barekî xwe bera ser wî da, hingê mêvanên ji bo şînê yên nûhatî bi dû hev de bê pêjin derbasî hundir dibûn. Ew dihatin, bêyî awirên bêhnteng û bêyî ji bo silavdanê amade bin. Li vir raya giştî jî tune bû; di van odeyên tarî de mirov ne mêvan bû, lêbelê bi wateyeke bê hêvî û kambax qaşo mirov li mala xwe bû.

Piştî demeke nediyar wî biryara xwe da ku biçe. Piçekî li rex, di tariya quncikekê de, ew pêrgî Beno bû. Wî gelek caran Beno bi Qaçaxçî re dîtibû û niha ew jî li ber çûnê bû. Kêliya ku herduyan pêlav dikirin lingên xwe, daxwaza ji bo axaftinê ya vî zilamê nearam, ne veşartî bû, tiliyên wî yên rastê li çena wî diketin mîna ku li defê bikevin û awirên wî yên bi daxwaz ên li derdorê li mêvan rast hatin. Ew ji malê derketin û çûn meydana ku her cara Qaçaxçî diket rê yan jî vedigeriya, neçar dima ku tê re derbas bibe. Kevokan dikirin pirepir, difiriyan û di ser wan re di nav şewqê de wenda dibûn.

Kêliya ku jin, zarok, zilamên ciwan û kal di ber wan re bi lez derbas dibûn, Beno, ji bo ku bi mêvan re biaxive, xwe da pêş. Wî ev fam nekir, an jî di xwe dernexist. Wî destên xwe ber bi guhê xwe yê çepê ve bir û îşareteke ku nabe da. Pê re li nav rûyê Beno mêze kir. Wî çavkên şiyar û lêvên ku bê rawestan diliviyan dîtin. Dema ku yê din ew rawestand, destê zilamî hîn jî li ser çena wî bûn.

Wî meydan terk kir û dageriya kuçeya bi sî. Cerboh ji wir belav bûn, xwedirêjkirî û bi erdê ve eciqandî bûn. Kêliya ew li pişt xwe zivirî, wî Beno li pişt xwe nas kir ku yekser di cîh de


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

rawestiya, lêbelê bêyî ku ji bo xwe veşêre bikeve nav tu hewldan û tevgeran. Tewra wî serê xwe bilind kir û wisa xuya dikir ku mirov digot qey ew bi daxwaza êrîşê dinere. Bi gumaneke mezin ew bi dû daxwazeke hundirê xwe ya nediyar de ye, mêvan ji xwe re got, kêliya ku wî ew wisa şipyayî dît. Bi gumaneke mezin tu tişt nedihatin bîra wî, ev mereqeke ji pîşeya wî dihat ku carekê Qaçaxçî behsa wê kiribû. Wî çûna xwe dom kir, bêyî ku careke din li dû xwe mêze bike, ew di nav baxçeyên mezintir ên halxweşan re û di nav wan xanîkên teng re derbas bû ku dîwar, pace û baniyên wan hatibûn serastkirin. Hewşên wan tije mirov bûn.

Li pêşberê malê, wî kûçikekî zeîf yê bi guhên zelût ên berjêr daliqiyayî, dît. Wisa xuya dikir ku te yê bigota kûçik li hêviya wî bû. Lêbelê dema ku mêvan bêtir nêzîk bû, heywan gav bi gav bi paş de vekişiya. Wî jê re kire pistepist, dixwest, wek ku wê kêliyê wî dil hebû, kûçik ber bi xwe ve bîne. Lêbelê wî kir nekir, kûçik nêzîkî wî nebû. Ji derbasbûna di ber wî re û di ketina deriyê hewşê re, bi şêweyekî wek ku ew tune be pê ve, tiştekî ku mêvan bikira tune bû.


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

## 2

Bi rojan berî wê mêvan, bi Qaçaxçî re rûniştibû, li gel ku ya rast ew bû jî binavkirina wî wek ap, nehatibû bîra mêvanî.

“Berî mirov bikeve rê, divê mirov baş xurîniya xwe bike.” Qaçaxçî, şefqa qesele ji serê xwe derxist û ew êdî nema dişibiya bi mirovekî macereperest, lêbelê dişibiya kesê ku ew bi xwe bû: niştevanekî taybet ê herêma ser sînor. “Tu wateya wê nîne ku mirov zû bide rê, ji ber ku ji bo mayînan ferq nake, bê kengî tu têyî. Ew napên. Tu demê ew ne li hêviya kesekî diyar in. Çêtir e, ku tu di ronahiya şewqê de bighêjî ba wan.”

Biraziyê wî, dilşad bû ku Qaçaxçî dîsa bi ser babetê vebibû. Wer xuya bû ku çivên vegotina wî xwedî wateyekê bûn. Piştî kêliyên dirêj î mîna hev zilam, dîsa dihat ser xala axaftina xwe ya destpêkê.

“Ev êdî henekpêkirinek e: Tiştê wan ji wî gundiyê ku berî bi çendekî çûbû nav zeviyan bi paş de anîbûn, şeqekî sipîsax bû. Wisa xuya dikir. Şeqekî mezin î kizirî. Min ji xwe re got: Tam ew perçeyê bedena wî yê ku li mayîna panzerê ketibû, sax maye. Tiştekî wisa heta hingê min nedîtibû. Mayînên xefikên hilpekêr jî na. Lêbelê ku qirdê min tune be, bila yeke wisa be. Yên biçûk xerabtir in. Ez ê li wê jorê çi bikim, ger li min rast bê û ez hew karibim bimeşim?”

Zilamê ciwan, mîna ku bala wî ne li wir be, serê xwe bi erênî dihejand, lê ne wisa bû. Dema ku ronahiya sibehê di paceya



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

çêştxaneyê de dilîst, wî dît ku şivanek pezê xwe di ser kolanê re dibe. Heywan bi lez di ber derabeyên deriyê hewşê re derbas dibûn, mîna mexlûqekî ku xwediyê gelek ling, serî û çavan be.

Qaçaxçî, çayeke din ji wan re dadigirt û bi şêweyên seyr destê xwe diavêt samawerê. Yekser jina pîr a di malê de kar dikir û dijiya, hat ba wî û wê dom kir. Ji bo Qaçaxçî, hîn serê sibehê zû, yekser piştî ew gihiştibû wir, di malê de cihekî ji lihêfên li ser hev qatkîrî hatibû amadekirin. Hemû bi kelecan bûn, te yê bigota bi hefteyan e li hêviya wî mabûn û baş zanîbûn ku ew ê bê, lêbelê nizanîbûn kengî.

Birazê, bi hatina vî zilamî re, li wê malê pêşwaziyeke bi rastî jiyabû. Ev yek berî bi deh rojan bû. Di vê navberê de ew bi wî re çûbû nav bajêr: Qaçaxçî, bi hesteke ku wî zanîbû bê ew çiqas girîng e, li ser kolanan dimeşiya. Li ber çavên ên lê mêze dikirin rewrewk çêdibûn, mîna kesekî ku ji nav metirsiyan derketibû, ji cihekî dûr ku tenê wî karîbû ew rêwîtî bikira hatibû. Şêniyên ku bi rê de pêrgî wî dibûn, bi tirs silava wî vedigerandin û xwe ji ser rêya wî bi dizî didan alî. Qederê ku xuya bû, bê dilî xwe bi wî re diketin nav axaftinê. Birazê, dît bê çawa malfiroşan ji neçarî hûr mûrên xwe yên firotinê tev didan. Qaçaxçî, bi aramî li wan temaşe dikir. Ew qasidekî derdora bajêr a ku hema hema kesekî hew karîbû gav biavêtaya nav bû, ew devera ku tenê gundiyên ku tu derfeta wan î din tune bû lê dijiyan. Lêbelê wan li rexê erdê mayînkirî jiyana xwe bi zor dom dikir, Qaçaxçî di nav wî erdî re diçû û dihat.

Birazê, gelek caran li meşa yê din ecêbmayî dima. Ew bi kêfa xwe dimeşiya, lê bibiryar bû. Binê pêlavên xwe bi xwebawerî û şidyayî datanîn ser erdê. Birazê ji xwe re got, dibe ku ev encameke ji ezmûnên bi mayînan re be. Herhal wisa xuya bû ku di bajêr de kesek tune bû ku taybetmendiyên vî zilamî bala wî nekişandibû. Çiqasî mirov bala xwe dida wî, ewqasî jî diyar dibû ku tirsa xelkê ya ne diyar, ne bi qasid re têkildar bû, lêbelê bi tiştê ku wan wek peyama wî dizanîbûn. Ji


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

cergî ew nêzîkî wî bû, dilê Birazê li Qaçaxçî xera dibû ku ew çêjê ji vê tirsa derdorê werdigre. Lê piştî demekê ew hat ser hizreke din: Ev zilam bi karê xwe re bûbû yek ku nirxê wî di tiştên wî bi xwe re dianî de dihat dîtin. Ew pevgirêdana vî bajarî ya bi gund û herêma derdorê ya li derve re bû. Wî rê nas dikir û tu kesî texmîn jî nedikir bê wî çiqasî baş ew rêya ku di dirêjahiya wê de kevirek tenê jî tune bû ku wî lê mêze nekiribû, qevdek giha tune bû ku ew li ser hûr nebûbû.

Qaçaxçî, têra xwe xurînî xwaribû û wisa bê serêşanî pêrgîhevbûna wan a yekemîn pêk hatibû. Xortê ciwan, xewlêçûyî derbasî hundir bû û kêliya wî hest kir ku ew bi baldarî tê çavdêrkirin, cefilî bû. Ligel ku wî kelecana serê sibeha zû hest kiribû jî, dîsa jî rabûbû ser xwe, deriyê odeya xwe vekiribû û pê re li meta xwe nerîbû bê ew çawa lihêfan dibe qatê zemînê. Lêbelê piştî wî bişirîna wê ya arambar dîtibû, çûbû dîsa razabû, wisa xuya bû ku bûyer ji hişê wî hatibûn jêbirin. Niha, di kêliya ku wî zilamê bi tenê yê di nîvtarîyê de rûniştî bû û destên wî mîna du alavên baş tam li nik hev li ser rûyê maseya qelişî danîbûn rex hev, dît, wî ji xwe pirsî, bê çi karîbû di dema razanê de kelecaneke wisa pêk bianiya ku silava wî bi xwe jî, piştî bi rêwîtiyeke ji dûrahiya çend hezar kilometreyan bi balafirê û bi minîbûsa rêwiyan a rêyên gundan di nav çiyan re, berovajî wê mîna xêrhatineke belavbûyî bandor kir.

Qaçaxçî, ji piraniya kesên li vir cudatir bû, kêliya wî mêvan dît, ne gengaz bû ku mirov karîba yekser pê re biketa têkiliyê. Îfadeya rûyê wî ne biaqil ne jî mejîkerikî xuya dikir. Tê de ne neyartî, ne mereq ne jî pirsyar xuya bûn. Tenê xalekê ji vî rûyî yekser hîn di destpêkê de bala xortê ciwan kişandibû, vê yên mayî bêbandor dikirin: bêdengiyeke kûr î bi xwe re lihevhatî, lêbelê bê tu nîşanên serdestiyê. Ew aramiya ku Qaçaxçî pê mirovên li kolanan jî ditirsandin, mîna ku ew hest bikin ku tê de dûrahiyeke ku hemû kiryarên wan dorpêç dikir hebû, bê


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

çawa herêma ku kesek nikarîbû derbasî nav wê bibûya, bajar dordipêç dikir. Qaçaxçî, bi erênî ji mêvanî re serê xwe hejand, ber bi alîyê semawerî ve zivirî, rahişt çaydên û çay bera piyala ku ji bo wî hatibû amadekirin da. Ev vexwendineke têra xwe bû, sariya heyî rabû û Birazê bi bişirîn li nik wî rûnişt. Jina pîr jî ew ferq kiribû û bê deng derbasî ba wan bûbû. Wê bi dilsozî serê xwe hejand, tepek li ser milên wî xist û çû nan anî.

Ew bi ser zimanekî vebûn ku wan hêdî hêdî dikarîbû bi axaftinê re meşq bikin. Pirsyarên mêvanî, bûn bingeha tevahiya axafinên wan. Qaçaxçî, dikarîbû henûn ba, lê tenê ji bo kêliyekê, tu carî ne ji kêfxêşiyeke ji dil. Ger destûr hebû ku Birazê pê re biçe nav bajêr, ev ji ber bixwebaweriya Qaçaxçî bû ku li warê xwe tev bigeriya.

Dema ew roja pêşîn ji mal derketin, ro baş bilind bûbû. Di qiçîna germê de bajar di nav girên tazî yî derdorê de mîna hêlîneke ku jiyan jê difûriya xuya dikir. Ew di ber paceyên malan î bi dirabeyên hunerî re, di daristana darên textan re, di ber şeqlên kincan ên bê binî ku kincên bi rengên spîçolkîbûyî li ser wan raxistî bûn re derbas dibûn. Birazê, bihîst ku Qaçaxçî sefereke din plan dike û pêşî ji xwe û piştre ji wî pirsî, bê gelo ev çend rojên li bajêr têra wî û bêhnvedanê kirin.

“Niha dem guncav e. Divê ez sûdê ji havînê werbigrim, hîn ku rê vekirî ne. – Na, ne ewqas ji ber germê. Kitekit girîng in; divê ez gihayê bibînim.”

Ew gihîştîn ber xaniyekî mezin î nû, li rex bajarê kevnar. Gulên li bejna zilaman di ser dîwarên neseyandî yên bexçeyan re dihejiyan. Qaçaxçî di ser dergehê hewşê re bang kir û piştî bi çend saniyan, zilamekî temenê wî nêzî bist salî hat derve û silaveke dostane da wan. Li odeya mêvanan a tijî cam û xalîçeyên buha li ber maseya çayê ya nizim rûniştin. Zilamê xwediyê malê yê giloverî ku jîndariyeke baldar a tacirekî jê difûriya, keserek kişand û li himber wan li ser kursiya avzêrkirî ku lingên wê jî bi şêweyê rokoko, dikir qirçînî, rûnişt. Sohbeteke


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

li ser Birazê û sedemê mana wî ya li bajêr dest pê kir; herdu zilamên navsere bi vî awayî bi hêsanî derbasî nav axaftina girîngtir a li ser danûstandina karê bi hev re bûn. Ji ber ku Qaçaxçî hatibû mala tacirî, ji bo perê ku ew pê li dewleta cîran heqê mal bide, bibe. Bêguman mebest pê para wî jî bû. Tacir, axaftin dirêj kir, hişt ku kurê wî ji wan re çayê, coca cola û kuloran bîne. Wateyeke vê biderengxistinê ew bû ku wî dixwest hemû derfetên bazarkirinê bikarbîne. Ligel ku Qaçaxçî, heta bi dawîyê li ser ya xwe ma jî, wateya ticaretê ew bû ku dema heyî mirov ji bo xwe bikarbîne, ji bo dawiyê hesta ku ew hat xapandin pê re çênebe. Li vir, Birazê hizirî, bi rastî jî bi vî şêweyî dem pere û pere jî dem bû.

Berî ew herin, tacir ji qutîka hesînî ya ber xwe pere derxistibû û dabû. Di dema xatirxwestinê de, mîna ku vatiniyeke xwe pêk anîbe, rehet xuya dikir. Niha kêfa wî ji dema çayê bêtir lê bû û kurê xwe şand ku du miftedankan bîne, pelikên zirav ên zîvînî ku bi îşaretên nivîsekê hatibûn neqişandin.

Li ser kolanê ew gelek caran li saetçêkerên "nû" rast dihatin. Wê dema ku saetçêkerên birastî ji ber ambargoya navnetewî ji zû de dikanên xwe girtibûn, niha ciwan li ser peyarêyan rûdiniştin, ne dixwestin saetan bifroşin, lêbelê xwe kiribûn hosteyê tamîrkirina saetan. Ji ber ku hema hema hew mal dihat welêt, gelek kes dihatin ba wan ciwanan, hinekan ji wan karê xwe dorfireh kiribû û tiştên xemlê jî difrotin. Li pişt benkên textînî rûdiniştin û ne pêwîst bû ku ew bang li kesên di wir re derbas dibûn, bikin.

Qaçaxçî, li ber yek ji wan benkên ji bo rûniştinê rawestiya û ji bêrîka xwe saeteke Quarz derxist ku hew tu tişt rê dida. Wî ew di ber awireke bi aliyê Birazê ve li ber çavê ciwan girt. Wî bi kurtahî lê nerî, serê xwe bi erênî hejand û ew ji dest wî girt. Saet danî ser benkê, destê xwe avêt kêleka xwe, du qetremîzên biçûk ên konserveyê danîn ber xwe ku di wan de bermahiyên


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

saetên kevn ên tarî mîna kêzikên mirî xuya dikirin. Pêşî wî saeta Quarz perçe bi perçe ji hev xist. Ewqas parçeyên hûr hatin ser hev ku ne gengaz xuya dikir ew dîsa karibin li hev bên siwarkirin û bibin yek. Carekê xortî, serê xwe rakir û bi pirsyarî li wan mêze kir, mîna ku ecêbmayî mabe, bê seba çi mişteriyên wî naçin li bin siyekê napên, lêbelê ew di ser wî re rawestiyabûn û li destên wî mêze dikirin, bê ew çawa kar dike. Qaçaxçî, tenê bi erênî serê xwe kurt hejand û xortî karê xwe dom kir. Piştî wî saet bi tevahî ji hev derxistibû, perçeyekî ku diyar bû ji aliyê helbirînerê wê ve ji bo ku bi tevahî bê guhertin hatibû çêkirin, bi tiliya xwe ya nîşandanê dahfand navenda dezgehê ku li ser kar dikir. Wî ew tişt vekir û darikê di destê xwe de xist navberên heyî û hevgirêdanên ku qet nexuyabûn. Ev karê herî dijwar bû. Xort lêvên xwe bi ser hev ve eciqandin û gelek caran ku ew gelekî ne aram dibû, destê xwe bi paş ve dikişand. Wî serê xwe xwar kir, te ê bigota qey ew dixwaze bihêle bêtir şewqa royê bikeve vê qutîka biçûk, bêhûde. Di destpêkê de wî tornevîde vir de wê de di saetê re radikir, piştre bi zanebûn ew dadixist cihê ku wî dixwest. Carekê xort bêhna xwe ji nişkê ve çikand. Bi berdana bêhna xwe re dîsa li Qaçaxcî mêze kir û niha şanazîyek di rûyê xort de xuya bû. Wî dest pê kir ku saetê dîsa li hev siwar bike. Ecêb bû, bê wî çawa ew pêk dianî. Wisa xuya nedikir ku ew dizane bê çi dike. Her carê ji nû ve diceriband bê perçe li hev tên an na û dîsa encama bi dest xistibû têk dibir. Lêbelê diviyabû ew serê tayekî ku nexuya bû bibîne, ji bo ku ew di rex wî re karê xwe biqedîne. Perçe bi perçe di wî tiştê ku dîsa birastî jî bû saeteke Quarz de wenda dibûn. Kêliyeke kurt berî ku dawî bê-niha wî baş zanîbû bê perçeyên mayî divê bikevin ku- burxiyeke biçûk jê kêm ma. Bi guman ew ji ser benkeyê ketibû. Xort bi dû hev de qetremîz rakirin jor, ew dizivirandin û li tiştên di wan de mêze dikir. Dawiyê devê yekê ji wan vekir, lê ew vala nekir, bi herdu tiliyên xwe çerxeke bi diran î kevn derxist. Ji wê burxuyek derxist ku bi rastî jî lê dihat. Bi kêf û bi


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

baldariyeke mezin wî saeta Quarz girt û hişt ku saniyekê li pêş wî bimîne, berî ku ew wê bide qaçaxcî, bêyî ku wê biceribîne. Birazê, di destê yê din de, ziq li saetê nerî. Reqemên sor li ser bûn û hemû fonksiyonên wê yên ku Qaçaxçî diceribandin, bê qusûr kar dikirin. Ew bişirî û cara pêşî xort jî bi kurtî bişirî, rahişt qetremîzeke biçûk û vala ya din kir mîna barkeeperekî.

Birazî niha xwe birastî jî biyanî his dikir, ew têgihîşt, bê jiyan li vir çiqasî daketibû, bê çiqasî girîng bûn ew koma parçeyên yedek î kevn ji bo hemû atolyeyên tamîrê, ji yên saetan bigire heta bi yên tirimpêlan. Mirovên li vir neçar bûn ku bi tiştên heyî îdare bikin. Bajar, yê taciran bû ku pêdiviya wan jî bi qaçaxçiyan hebû.

Wan serdana xwe ya duyemîn ji bo wê rojê ber êvarkî pêk anî. Mal li rex bajêr bû û qaçaxçî bi birazyê xwe da famkirin ku ev yê duyemîn ji sê zilamên girîng bû ku diviya ew biçûya nik wan. Ên mayî hemû dihatine ba wî. Ji aliyê paş xanî ve dîmena bi gir xuya bû. Dîmeneke rût bû mîna bi heriya qehweyî bi hev hatibe vekirin. Teyrên dirinde li esmanê gewr, lê teyisandî, xelek pêk dianîn. Qaçaxçî awirên biraziyê xwe yên ku digeriyan ferq kirin. Li cihê xwe rawestiya û îstîqameteke diyar nîşan kir. Li wir zincîrên çiyan î bilind xuya dikirin.

“Sînor di ber çiyan re derbas dibe. Derbasbûna di erda rast re ne pirsgirêk e, tenê dûr e ew.”

“Herêm vala xuya dike.”

“Tenê wisa xuya dike. Li paş giran çem heye û ji wir mêrg dest pê dikin. Di destpêkê de hîn çend zevî hene ku bê dijwarî mirov dikare di nav wan re derbas bibe.”

“Lêbelê çi bi wî gundiyê ku pêl mayîna panzeran kiribû hat?”

Qaçaxçî mizicî. “Bêguman divê mirov li xwe miqate be. Deverên bi mayîn tam bi zeviyan re dest pê dikin. Lê di vê navberê de gelek mayîn ji aliyê gundiyan an jî zarokên wan ve bi şêweyekî hatine dîtin, lema êdî metirsî ne ewqas mezin e. – Ez dikarim biçim.”


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

“Ev tê çi wateyê?”

“Divê ez pişt re bi çarpiyan biçim.”

Ji bo Birazê ne hêsan bû ku bîne ber çavê xwe, bê çawa qaçaxçî li ser dest û çonkan di nav mêrgê re xwe dilivîne. Bi taybet jî piştî wî dîtibû bê li mala mişteriyê duyemîn çawa ew ji xwe razî bû û kêm axivîbû. Ew li ser kursiya xwe rehet rûniştibû, pala xwe dabû pişta kursiyê, lingên xwe avêtibûn ser hev. Rewşa vî tacirî jî li gor ku dixuya li gor hoyên vir zehf baş bû. Di mala wî ya mezin de bi dûzîneyan alavên elektronîk hebûn û wî fêkiyê teze îkram kiribû. Bazarkirina vê carê ewqas dirêj nekir, lema tacir di dawiyê de derfet dît ku behsa gereke xwe ya paytextê ku li başûr bû bike. Li wir havîna dawî ecêb germ derbasbûbû. Herkes ecêbmayî dima ku meteorologan di televizyonê de, her roj behsa 40° Celsius dikirin, ligel ku termometreyan ji 50° bêtir rê didan jî. Vê rewşê çend hefteyan wisa dom kiribûye, heta ku ev nakokî eşkere xuya bûbû û peyamnêrekî, ev ji meteorologekî pirsîbû. Wî li pêşberê kamerayan pesend kiribû ku ji meqamê bilind ji wan hatiye xwestin ku ew germahîyê herî zêde 40 C° bidin, ya na dê gel nearam bibe. Hersê bi vê çîrokê keniyan. Atmosfer rehetir bû, wisa ku tacirê bejinqut li ser mîndera xwe dikeniya û yekser bi ser vekir û behsa helbijartina serjimara dawî kir ku li ser 16, 2 Milyonî li hev hatibû kirin. Lêbelê vê ji ber sedemeke ne diyar têrê nekiribû, lema ji jor ve hat danîn: ji îro pê ve 18 Milyon.

“Ev nayê bawerkirin”, got Qaçaxçî û bi kêfxweşî di kursiyê de xwe doş kir. “Ger ev li derveyî welêt bê gotin, divê mirov ji ber şerm bike.” Wî çav da xortê ciwan, mîna ku li hêvîya pejirandinekê be.

Wî niha derfet dît ku bipirse, bê ew kare biçe ser banê xênî, ji bo ku awireke din li derdorê bide. Tacir bi dilşadî pejirand. Piştî wî hemû odeyên mala xwe ku xuya bû ew tenê lê dima nîşanî wan dan û pê ve, dawiya dawîn ew derketin derve ser banî û sedemê razîbûna zilamî dîtin. Bi kursiyên ji bo mirov li


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

ser wan ramede û gulên di guldank, qutî û sindoqan de, ew der cihê rûniştinê yî bingehîn ê vê malê bû, qe nebe niha di havînê de. Papaxanekî sor î qerase li ser darê xwe danîbû.

“Ew dikare biaxive”, tacir bi kelecan got.

Bi gumaneke mezin, di hundirê xwe de hizirî Birazê, gelek kes nayên ser vî banî. Li gel rengê xwe yî geş jî papaxan bêmirûz xuya dikir. Wî awirek avêt ser dîwana ku kêm mabû di nav pel û gulan de wenda biba.

“Ez bawer nakim”, got Qaçaxçî, bi rehetiya ku serîlêdan pêkanîbû.

“Belê, belê, ez bi wî re sohbetê dikim!” Tacir li ber teyr rawestiya û bi şêweyekî cidî li Qaçaxçî mêze kir. “Ez her roj bi wî re sohbetê dikim”, dubare kir û di ber re bi wateya ku pesend bike serê xwe daxist.

Qaçaxçî, berê xwe da aliyekî din. “Ew wisa xuya nake. Xuya ye ew ditirse.”

Papaxanî, serê xwe xwar kiribû. Ew bi hêvî li dor wî bûbûn xelek, tacîrî çend peyv dubare dikirin û ketibû bin giraniyekê ku te yê bigota ew dixwaze wî heywanî bifroşe. Papaxanî xwe bi vir de wê de dihejand, xwe xûs dikir, dîsa xwe rast dikir. Carnan herdu perçeyên nikilê xwe ber bi hev ve dilivandin. Yên li dor wî guhên xwe miç dikirin. Lê teyr bê deng dima.

“Ew ji ku ye?” got Qaçaxçî, ji bo ku rewşê nerm bike. “Her hal te tu kes neşand aliyê din î sînor, ji bo wî bîne.” Anî ber çavê xwe, bê çiqas dijwar dibû ger wî teyrekî wisa mezin di ser sînor re derbas bikra.

“Na”, got yê tacir bê sebir. “Ji berî şerê yekemîn de ew li ba min e. Temenê wî zehf dirêj e.”

“Erê, û bi gumaneke mezin êdî zef yextiyar e ji bo ku karibe biaxive” Wer xuya bû Qaçaxcî kêf ji hêrskirina zilêm werdigirt ku niha eşkere xuya bû bêhna wî teng bûye.

“Divê sebra te hebe”, ji nişkê ve got.

Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

Papaxanî serê xwe daxist jêr heta bi bin darikî. Wer xuya bû ku tacir jê re hin tişt digotin lê deng nediçûyê. Birazî jî ceriband, bê serkeftin.

Qaçaxçî jî hêdî hêdî hewesa xwe ya ji bo teyr wenda kir. Birazê, dît ku ew li ber çîtê rawestiya ye û xwe pê girtîye. Di ser herêmê re teyrên baz dikirin qîjînî. Tiştekî ji vî wêneyê- ji pişta zilamî yî xusbûyî li pêş esmanê germ î şîn- jê re digot ew bû ku dem hatiye û êdî divê bajêr, hêlînê terk bike.

Wan xwe zivirand, kêliya ku dengê papaxanî bi xulxul dest pê kir. Tiştê wî digot nedihat famkirin, lêbelê dengê jê derdiket wisa ne xwezayî bû ku tenê dikarîbû dubarekirina peyvan bûya. Wisa xuya dikir ku di pêkanîna wan de, teyr bi xwe ne beşdar bû. Tacir mîna zarokekî bi kêf bû, ji kêfan destên xwe bi lerz li rahnên xwe dixistin.

Qaçaxçî tenê bi erênî serê xwe hejand. Di çavên Birazê de Qaçaxçî, kêfa xwe ji yê din re tenê ji bo kêliya kurt î bêrêzgirtin anîbû, ji ber ku ew bi lez ji ser banî daketibû, li gel ku papaxanî di wê kêliyê de jî hîn dengin ne zelal ji xwe derdixistin, bêyî ku tu piştî bibêje.


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

# 3

Li gel ku dunya zehf germ bû jî, Qaçaxçî berî bide rê, bi ser kincên xwe de qapûtekî leşkerî yê kevin li xwe kir. Pêdiviya wî bi gelek bêrîkên hundir hebû, ji bo ku ew pere û alavên xwe bixe wan. Qapût, ji rengê gewrekî tarî yê mîna asfaltê bû û zehf ne dirêj bû. Qaçaxçî, li çêştxanê rawestiya û hewl da xwe ji bo tiştên li pêş xwe amade bike. Wî careke din hemû tiştên di bêrîkên xwe de saxtî kirin, qimçokên devê bêrîkan ên ku hîn hebûn, girtin. Piştre dîsa li ber maseyê rûnişt û xurîniya xwe ya bi nanê şikeva û penêrê mîhan qedand. Du şekirên din jî avêtin qedeha çayê ya nîv tije, bi kêfa xwe ew tev da û çaya ku têra xwe şêrîn bûbû bi carekê re bi ser xwe de dakir.

Wî tûrê piştê yê mezin î vala avêt ser pişta xwe û şidand. Piştre destê xwe avêt bêrîka qapûtê xwe ya ku kîsikekî xwê, qetek têl û bêrikeke biçûk tê de bû. Di cama dolabeke çêştxanê re awireke dawî avêt qapûtê xwe yê ku kêlên durûnê yên tarî bedena wî mefsel dikirin. Kêliyeke kurt jina wî hat bîra wî ku dema şer bi dawî bû, wê ev qapût peyda kiribû. Û wî zanîbû ku divê dom nekira û maliyên xwe neanîna bîra xwe, ji ber ku vê yekê erda di bin wî de vedikir; hesteke ku bi vê hêzê ji bo wî nû bû û wî yekser hewl da ku ji bîr bike.

Kolan êdî zehf germ bûbûn, barkêş û xortên ku çay belav dikirin, diketin ber zilamê ku bêyî ji kesekî xatir bixwaze, bi hemdê xwe ji mal derketibû û jê derbas dibûn. Ew bi leza ku wî



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

dixwest piştî derketina ji nav bajêr jî dom bike, di kolanê re diçû. Dema ew gihîşt dîwarên germ ên ku ji aliyê meydana camiyê vedibûn, wî bi kurtî li saeta Quarz a ku wî bê qordon, bêtir ji bo kêfê, di bêrîka qapûtê xwe de, bi xwe re digerand, mêze kir. Wî rê hesiband û bi bextewarî dît ku ew ê li dor êvarkî bighêje ber çemî.

Bajarê li dor wî, xwe ji aramiya nîvro re amade dikir. Jinên nixumandî, rêya xwe ji ser zilamê porşîn dadigrandin. Wî li ezmên mêze kir, mîna ku tişekî jê bixwîne, lêbelê ji derveyî şînê tarî tu tişt tê de nedixuya. Ev esman hema hema mîna yê hemû rojên din bû û bi yê li bin wî dijiyan, wisa dihat ku ew bêyî demê û şewqa wê ya ku dihat guhertin, wek xwe bû.

Qaçaxçî di nav kuçan re ket ser rêya xwe, çû wê devera ku bajar ji nişkê ve bi çoleke avahiyan diqediya. Xaniyên neqediyayî û bê sewax xuya dikirin, hîna ne seyandî, çend sed metreyan ji wir dûr jî servekirî bûn û li dawiyê dezgehên avahiyan berjor dibûn. Li devera ku herêma gundan dest pê dikir, rê derbasî nav erdê bi gihayê hişkbûyî dibû. Di destpêkê de hîn bi alavên avahiyan cîh cîh qut dibû, heta ku kevirên yekemîn xuya dibûn, bi teşeyên bê pergal, belawela bûn ku cihê ew lê bûn, mîna ji serî de yê wan be, xuya dikir. Wî erda rast li pêş xwe dît, asoya nerm di germahiyê de û bê hemdê xwe li çem hizirî, bi kurtahî destê xwe li meterê avê di bin qapûtê xwe de peland.

Kêmzêde li nîvê rê, li ser erdeke rast, ew li leşkeran rast hat ku ew li wir ne li hêviya wan bû. Xwêdanê di tevahiya çavikên cildê wî re davêt û wî ji ber fedî kir. Di kêliyên ku jê re diviya de, ji bo ku bişirînekê pêk bîne, wî hemû derfet diceribandin. Pere têra leşkerên ser sînor û hemû tiştên ku bi kirîna alavan re têkildar bûn, dikir.

Hîn di sefera beriya vê de guhertinan bala wî kişandibû. Yek jê ew bû ku şopên tekeran ji berê bêtir bûn û bi ser de jî wî li ser rêya vegera ji çiyan, di xala herî bilind a rêwîtiya xwe de


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

dîtibû ku dûman ji geliyekî teng ê bêşênî radibû. Şopên tekeran bi gumaneke mezin ên leşkerên ku li vir hatibûn bicîhkirin bûn, lêbelê dûman, dikarîbû nîşana hin kesên bi tevahî cuda ku hatibûn serdana vir baya. Pirsyar ew bû ka bê ew bi destûr an bêyî destûra artêşê li vir bûn. Îhtîmala duyemîn ji wî re ya xerabtir bû. Kêliya wî xwe nêzîkî qemyonê kiribû, ew kêfxweş bû, ji ber ku bi vî awayî ji gelek lihevrastinên ku ew ne li benda wan bû rizgar dibû.

Sê leşker bûn ku piştî ew li pêşber wan rawestiya bû, wan ew ferq kiribû. Gomlekên wan ên ji xwêdanê şilbûyî ji rengê qûme bûn û bi bedena wan ve zeliqîbûn. Wer xuya bû li qapûtê Qaçaxçî ecêbmayî mabûn, bi gumaneke mezin wan ew ji dûr ve wek kesekî ji artêşê hesibandibû. Qemyon ji ber arîzeyeke motorê rawestiyabû û leşker li wir dipan.

Qaçaxçî bi yekî ji wan re axivî ku mîna lawirekî di bin erebeyê de paldayî bû. Wî leşkerî xwe gindirand ser zikî û çena xwe siparte ser destê xwe. Piştî bersîvên di ser re yên pirsyarên jirêzê -ji ku, bi ku de- Qaçaxçî bi zanebûn hişt ku navbereke kurt bikeve navê. Îfadeya rûyê zilamê di navbera eksenan de hema hema nehat guhertin, lêbelê têr kiribû, ji bo ku hest bike, bê Qaçaxçî li vê herêmê çi dikir. Ji malika şifêr leşkerê duyemîn xwe avêt jêr ser qûmê û ji yê sêyemîn ê li paş qemyonê bû re got ku divê erebe bê kaşkirin. Qaçaxçî têgihîşt ku rewş ji bo wî baş e, ji ber ku leşker zehf bi erebeyê ve mijûl bûn, ji dêvla ku li ser wî hûr bibin. Wî di serê xwe de yekser xêzek li ser herduyên li pêşiyê kişand, wer xuya bû pileya wan nizm bû. Pirsgirêk ew zilamê bin erebeyê bû, lema ew ji ber çavên xwe wenda nedikir: Ger wî pere bidana kesekî, divê bidaya wî.

Li ser tutikan rûnişt, bi pişta destên xwe xwêdan ji ser eniya xwe paqij kir û behsa dûmana jor li gelî kir. Leşkerî hêdî hêdî bi erênî serê xwe dihejand. Got bi rastî jî li herêma ser sînor hin kesên nû hene, lêbelê ew li cîhekî ji leşkerên nobedar dûr, li jor, li devera nemayînkirî dimînin. Got me hîn ew nedîtine,


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

lêbelê me bêhna wan kiriye. Leşker bi kurtahî keniya û Qaçaxçî bi bişirîn û erênî serê xwe hejand. Ji nişkê ve motor şixulî, û qemyon ji cîh leqiya. Qûm pijiqî, leşkerî xwe ber bi aliyê tevgerê ve gindirand. Qemyon tenê çend santîmetreyan tevgeriyabû û êdî dîsa rawestiyabû, kêliya ku mêrik xwe ji bin qemyonê kaş kir, bi siqêfan ber bi herdu leşkerên din ve çû. Qaçaxçî rabû ser xwe, li paş qemyonê zivirî û bihîst çawa yek ji leşkeran ji bo xwe mafdar derbixe dibêje motor dîsa dişixule, lêbelê tu kêr li yê hêrsbûyî nedikir. Qaçaxçî çûna xwe dom kir, ne zehf hêdî ne jî bi lez. Ew amade bû ku her kêliyê bi bangekê re tevbigere û bi paş ve vegere, lêbelê wî di xwe dernexist û wisa hişt, bê kesek dê bang li wî bike an na.

Piştî nîvro wî deşt li dû xwe hiştibû. Di deverên bi kaş de li dû xwe zivirî û hîn jî qemyon ji wî ve xuya bû. Wan mirovên nû yên ku yê leşker behsa wan kiribû, bi wî re xem çêdikirin. Lêbelê dîsa ji bo kêliyekê be jî bêhna wî fireh bûbû, li hersê leşkeran rasthatina wî bi kêrî tiştekî hatibû. Di dema seferên wî de ku di nav heman heramê re derbas dibûn, pûçbaweriyeke taybet pê re çêbûbû. Ji ber ku wî rêya xwe gav bi gav nas dikir, diviyabû her tiştê li vir ku mirov ne li bendê bû, ji bo wî xwedî wateyeke baş bûya, ger ev piştre diyar bibaya jî. Carekê wisa ew li rex zeviyan li kurikekî biçûk rast hatibû. Pişta zarokî li wî bû û mîna li wir hatibe danîn, li benga zeviyê rûniştî bû. Qaçaxçî yekser rawestiyabû, ji bo ku wêne bi aramî li pêşberî wî be; germahî, erda bi rengê qehweyî, giha û qîvarên nîvhişkbûyî yên ber bi jor ve rabûkî, esmanê bê tevger û di nav van hemûyan de reşê biçûk ku pêşî totemê ku tim li rex rê dihat çikandin anîbû bîra wî. Lêbelê zarok zindî bû, milên wî diliviyan. Wî dilîst, tiştek bi vir de wê de daf dida. Wî xwe nêzîkî wî kir. Kurik cefilî û xwe da alî. Bi vê tevgerê re zilamek û jina xwe bi şêweyekî seyr di wir re derketibûn. Lêbelê Qaçaxçî bala xwe zehf nedabûyê, ji ber bala wî li ser wî tiştê ku kurik pê dilîst bû. Ew tişt telaşek ji mayînekê yê bi qiraxên tûj bû. Li ser nivîsek bi


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

zimanekî biyanî hebû. Ew li ser tutikan rûnişt û ew parçeyê kevn xist destê xwe. Çi li ser nivîsandî bû jî, tiştekî ji wateya wê ya şênber bêtir, bi gumaneke mezin agahînin li ser tîpa wê bû, jê pê ve, ev nikarîbû rasthatinî ba ku vê rojê û li wê deverê di ser wî kurikî re ev ber bi çavên wî ketibû. Tîpên nivîsê mîna xêzikên ku di nav şopên reş î dûya barûdê re wenda bûbin, xuya dikirin. Wî ew tişt da ber şewqê û hewl da ku peyameke ku ji wî re hatibe nivîsandin, deşîfre bike. Mirovên li paş wî divê ew wek pisporekî yan jî dînekî didîtin, yekcar bê deng tevdigeryan. Ji bo bibe xwedî hizrekê, wî careke din di ser xwe re mêze kir. Ev mirov, ew piştre fêr bû ku koçerên çiyê ne, tim li rex zeviyên ku heta niha ne mayînkirî bûn diman. Kurik bi pîjikên hesinî yên ku di nav zeviyê de dîtibûn dilîst. Qaçaxçî bi çavan li xaçirêka xwe ya hertim a ku ne bi dûrahiya panzdeh gavan di nav zeviyê re diçû mêze kir, û dîsa li tîpên nivîsê û nemreyan nerî. Ew rabû ser xwe û ber bi kurikî ve çû. Wî xwe li pişt zilamê bejinzirav ku reviyabû nêzîka wî, veşart. Pê re zendikek ji ya qutikê wî yî ji çermê berxan ê ku li ser canê xweyî tazî li xwe kiribû ji milê wî ber bi ser destê wî ve şemitî. Qaçaxçî berê xwe da ber bi kurik ve û pirsî bê wî ew pîjikên hesinî li ku dîtibûn. Zilamê bejinzirav bi paş ve nîv zivirî û pirsyar bi zaravayekî ku li geliyên bakurê wir tê axaftin dubare kir. Ji nişkê ve kurik derket pêş, bi lez bazda ber bi rex zeviyê ve û ew dever nîşan da. Li wir bi rastî jî kortekê xuya dikir, ku diviyabû pîjîk tê de bûna. Qaçaxçî fam kiribû ku erd hatibû cotkirin. Bi gumaneke mezin ji alî wî gundiyê ku berî bi çendekî bermahiyên bedena wî anîbûn bajêr. Lema diviyabû ew xaçirêka ku wî wek a xwe zanîbû, ne rast baya. Wî ji zilamî pirsî, lêbelê wî bi neyênî serê xwe hejand. Ji bo Qaçaxçî zelal bû ku divê ew xaçirêka xwe bibîne, ji ber ku erdê mayînkirî yê bi rastî li aliyê din dest pê dikir, û zehf girîng bû bê ew dighîştibû ku. Ew li ber zevî çû û hat û hewl da ku îşaretekê bibîne. Wî ew bi ser hev ve anî û rêya xwe ji gir bi aliyê din yê zeviyê re xiste


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

pêwendiyê. Xaçirêka wî ya ku cot ew ranekiribû li ber çavên wî dîsa eşkere xuya kir, qederê metreyekê dûrî ya nû. Kî di vê rêyên re çûbû, yan ji wî çêtir zanîbû, yan jî yekî ehmeq bû.

Bi vî awayî rasthatina li kurikê koçer bi kêrî wî hatibû, ji ber ku kesî nizanîbû bê wî dê kengî pê derxista ku dabû ser xaçerêka şaş. Leşker jî mîna wî kurikî jê re bûbû alîkar ku jê re behsa mirovên nû yên bi zanebûn li rexekî diman û divê sedemeke wê hebûya, kiribû. Hizra ku li vê devera xirî-xalî li mirovên biyanî rast bê, pê xweş nehatibû. Bi gelek pereyê di qapûtê xwe de, diviyabû wî rêya xwe ji ser wan dageranda, lêbelê ev ne gengaz bû, ji ber ku ji derfetin zehf hindik pê ve tenê di xaçirêkekê re dikarîbû biçûya. Tenê payîn, ger wî ew keşif bikiraya, bi kêrî wî dihat. A girîng ew bû ku bala xwe hîn baştir bide guhertinên derdorê; ger ne dûman be jî dê qûma ku bi ecacokê re radibe wan bide dest. Wî meşa xwe hêdî kir, dawiyê her ji sed û pêncî pêngavî rawestiya û li derdorê mêze kir.

Li bilindahiya gir xaçerêka wî rêyeke ku eşkere dihat dîtin bû. Ne ji ber ku wî ew bi lingên xwe bi erdê ve temisandibû, lêbelê wek ku ew bi xwe mîna teşeyeke xwezayî ya rêyekê pêk hatibe, û wî ew kiribû ya xwe. Di vê teşebûnê de wî li dîmenê derdora xwe temaşe kir; derdor pê re li hev bû û ew bi derdorê re, vê rewşê ewlekariya gavên wî dayê. Giran pêşber awirên wî digirtin, him ên deşta li pişt wî him jî yên li pêş wî. Lema wî çûna xwe dîsa hêdî kir. Ew bi çongan çû ser axa seran û gulpek av ji metereyê xwe vexwar. Di wê kêliyê de awirên wî yî tûj li ser lûtkê girê nêzîk bûn, lêbelê tu guhertin ferq nedikirin. Her çû wî bêtir bawerî bi hesta xwe ya emniyetê anî, ya ku şikên wî belav dikir.

Piştî pênsed metreyên din serê reş-sor ê şeybûkê xuya kir. Ew bû ya ku niha xaçerêk kiribû rê. Ew batirsokek bû ku di dema şer û ya piştre bûbû nîşana vê derdorê. Bê kê serê wê-carnan kundirekî qulkirî, carnan jî zebeşek- her carê nû dikir,


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

ne diyar bû, bi gumaneke mezin her kesê gundî û koçer, belkî jî leşkerên ku rêya wan bi vir diket. Bi rastî jî wek metirsiyekê niha bi Qaçaxçî dihat, ji ber ku di vê demê de serê wê tune bû û navbera milên wê çakêtê ji hevketî tenê bi darekî serîtûjkirî berjor ve bilind dibû. Wî hîngê ev mîna îşareteke îqazkirinê fam kiribû, ji ber ku diyar bû ku ji mêj de kesek nehatibû van deran, ji bo ku li wê miqate bibin, ev jî ne bê sedem bû. Kêliya wî zebeşê ku ne zehf kevn bû lê ji zû de qelişî bû ferq kir, piçekî bêhna wî fireh bû. Nava zebeşî ya sor, bi ser wî fîgurê piçek yê xwarbûyî ve mîna rîhekê bi ser çeneya wî ve berjêr herikî xuya dikir. Xaçirêkeke mîna a lawirên kovî ku tê re diçin ser avê hebû li vê herêmê. Ev xaçerêka rêwîtiya wî bû, belkî jî tenê ya tirsên wî bû ku wî têkiliya wan û vê rêwîtiyê bi hev re datanî. Ger vê carê serî tuneba, ji xwe re got, ew ê teqez bi paş de vegeriyaba.

Şeybûkê bi mezinbûna xwe zehf ecêb xuya dikir, kêliya ku ew li pêşberî wê rawestiya. Ev hest ji ber betaniyên ku çakêtê wê pê hatibû dagirtin dihat û mîna perdeyeke gemarî li binya wê heta bi erdê ve dadiket. Taybetmendiya vî reşî di wir de bû ku avahiya wî bi darekî ve ne çik re çaprazek pêk dianî. Wisa mil mîna li ser bedeneke birastî bin, tewandî û kurt bûn. Ew di lûleyên piyên çakêt ên vala de bi dawî dibûn. Qaçaxçî çend saniyekî li seriyê ku kilmozeke mêşan dor wî girtibûn temaşe kir. Ji bo nûkirina vî seriyî bi rastî jî hewldanek jê re pêwîst bû. Kê ev dikir, diviyabû xaç ji erdê bikşanda û daniya ser erdê. Ji bo vê yekê jî, ew hizirî, du kes pêwîst in. Vê hizrê pê re taswaseke din çêkir. Qaçaxçî bi lez di ber şeybûkê re derbasbû û di newalekê re derbasî ser diyarekî din bû. Dîsa tu tişt nexuya bû ji rengê axa seran û esmanê vala yê bi teyrên dirinde pê ve.

Dawiya dîmenê bi gir, beşekî zehf taybet ê rêwîtiyê bû. Li gor hizra Qaçaxçî wir destpêka Bakur bû. Li vir çemî dîmen diguherand, pê re jî qewsikên pişta erdê mîna ku westiya bin, dadiketin. Mirov digot qey ew bi zixurên ku li her derê hebûn,


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

keskahiyê jî bi xwe re tîne, rengê keskê li vir mîna yê leşkeriyê yê matbûyî, li gel vê jî rengekî tije yê gihayê derdorê bû. Ew hizirî ku li nêzîkî avê dar û giha xwedî enerjiyeke zêde ne ku xwe bera vê keskahiyê didin. Wer xuya bû, rengê qehweyî yê axê jî tev lê dibû, lêbelê ber bi jêr de, ber bi rehan ve dihat eciqandin, kêmtir dibû.

Çemê ku li rex wî dar rêzkirî bûn teqrîben pêncî metreyî fireh bû, lêbelê, ji havînî pê ve ew ji qasê mirov dipa kûrtir bû. Ferşên gewr ên li rex avê, av wisa rê didan ku mirov digot qey bi dirêjahiya gelek metreyan mirov dikare di nav re bimeşe. Li devereke diyar û pê ve li çogan dima. Berê li vir kelekeke biçûk bi tevahî biharî û peyizî hebû. Ew ji kelekekê bi textan çêkirî pê ve ne tiştekî din bû ku bi şerîtekê ji rexekî avê ber bi yê hember ve dihat kişandin. Lê dîsa jî wê bar zûwa derbasî aliyê din dikirin. Her carê di vî beşê rêwitiyê de bi Qaçaxçî mîna bîranîneke demên aşitiyê xuya dikir; di pergala wan deman de cihê wê hebû û her kesî sedemê hebûna wê zanîbû, teyê bigota ew tim li wir e û tu carî zehmetî jê re ne pêwîst e, ne ji bo ew bê helbirîn û ne jî ji bo tamîrkirina wê. Ne dûrî şerîdê kelek carekê nîv binavbûyî demeke dirêj di nav avê de mabû, ji ber ku tekerên nepixandî yên ku ew hildigirtin, hatibûn qulkirin. Piştre ew tev li şerîdê wenda bû, xeta di serê wî de îşaretkirî ji bo ku bi ser xaçirêka xwe vebe. Êdî ji wî re herdu singên ku hinekan ji bo şerîdê bi wan ve girê bidin di erdê de çikandibûn, tenê man. Piştî demekê ji herdu singan tenê yê li rexê din î çem ma. Di vê navberê de pêdivî pê nemaye. Ji mêj ve xaçerêkê teşeyekî xwe wergirtiye ku îşaretên ewlekariyê hew pêwîst in û wer xuya bû têra xwe sabit bû ji bo ku her şêwe ji herifandinê jî karibe werbigire hundirê xwe, bêyî ku ew pê bê guhertin.

Dema dezgehên hevkariyê yên bê pere ku ev ferîbot jî yek ji wan bû ji zû de derbas bûbû. Serpêhatiya ku ji paytext dihat behskirin û bi sedên caran bi devkî hatibû belavkirin hat bîra wî. Li gor wê çîrokê, zilamek di yek ji sê asansorên avahiyeke


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

bilind ya buroyan de asê mabû û bi bêhna bedena wî ya ruxuyayî hatibû dîtin, ji ber ku kesek hew li tu tiştî miqate dibû yan jî kontrol dikir, bi taybetî jî nedikirin, ji ber du ji sê asansoran hîn jî kar dikirin.

Qaçaxçî di çem re derbas bû, wek her carê kêfa wî ji cizmeya wî ya kevn î ku av derbas nedikir re hat, metereyê xwe ti jî av kir û çû li rexê din yê avê rûnişt. Dema ku di saleke ji yên derbasbûyî de di ber vir re hatibû, devera dawî ya li ser sînor dest bi valakirina ji şêniyan kiribû. Ev gundikê biçûk du kîlometreyan li aliyê rojava li nêzîkî çemî bû, dema wî dest bi seferên xwe kiribû, hîngê şênî lê diman. Wî ji mêj de hew serî li wir dabû. Hat bîra wî, bê çiqas rehet bûn ew meşên destpêkê, ger mirov ew bidana ber yên niha. Hîngê wî dikarîbû li wir bixwara û vexwara, di nav mirovan de ba û ligel ku beşê dijwar yê rêwîtiyê hîn li pêş wî bû jî, ji wir bi wî wisa dihat ku tenê gereke seyranê ya bi hin astengî ye. Xerabtirbûna rewşê hîn eşkeretir xuya dikir, dema wî ferq kir ku kuçik nemane û her carê bêtir zarok û zilamên ciwan yên kêmendam di ber wî re derbas dibûn an jî di nav gemarê de li rex kolaneke mezin xwe qurnisandibûn.

Niha, li rex çem, berê wî ber bi aliyê rojava ve, hizirî ku ew nearamiya berî bi çendekê ya li vê herêmê bi gundê ku hatibû valakirin re têkildar bû. Dibe ku hîngê dîsa jiyan lê vegeriyabû. Ligel ku ev ne gengaz bû jî, lêbelê Qaçaxçî ji rewşa nû piştrast bû. Vê dihişt ku ew hêdî tevbigere û demê derbas bike, lema ew ne ket xaçirêka xwe û dageriya ser rêya di rex re ku wî demên berê bikardianî.

Gund hîn jî mîna berê mirî bû, çend xanîkên ku hîn hebûn jî, herifî bûn. Qaçaxçî, di nav xirbe û tiştên li wir mayî de çû û hat, bêhnteng û bêbiryar bû. Ew poşman bûbû ku hatibû wir, ji ber her tiştê didît, bi wî mîna wêneyekî rewşa wî bi xwe, xuya dikir. Ji dêvla ku li ser xeta xwe ya xeyalî bimîne û bêrawest serast biçe, hişt ku daxwaza wî xurt bibe ji bo ku gerekê pêk


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

bîne. Kêliya wî çavên lawiran di xanîkekî de, pêşî ji qorziya çavên xwe, piştre bi baldarî û ecêbmayî dîtin, ji nişkê ve hizreke din a tevgera wî hat bîra wî. Tiştekî vê seferê ji hemûyên berê cûdatir hebû. Wî bi carekê gelek tişt ji xwe dipirsîn: Gelo ev ji temenê wî dihat, reaksiyoneke ji bo dîtina dahatuyê û rûtînê yan jî hestkirina bi rastî jî nû bû ku ji serî de bi wî re nearamiyek pêk anîbû? Cara pêşî bala wî kişand, bê çiqasî dijwar e, ger mirov cûdatiya navbera tiştekî hundirîn û derveyî eşkere ji hev derbixe. Di rastiyê de bêkêriya wî ya ji bo vê sedemek ji yên bêaramiya wî bû. Gelo ew ê çawa, wisa ji xwe pirsî, bikaribe vê rewşa nû teswîr bike, ger ew neçar bimîne? Wî xwe ji ser lingekî da ser yê din, bi wî heywanê ku hîn jî ziq lê mêze dikir mijûl nebû, li ezmên û li çiyayên ji dûr ve şînoyî xuya dikirin nerî û li bilindahiya wan ku bi rengê xwe ji nişkê ve bi dawî dibû, lêbelê sînorê ku ew û hêşînahiya pêş wan digihîştin hev, ji hev nedihat derxistin. Di xênîk de pêjnek hebû, lêbelê Qaçaxçî dixwest heta dawiyê li tiştê di serê xwe de bihizire, berî ku xwe tev bide; wî berê xwe da rex û li rêya li dû xwe ya di ber çemî re, devera ew tê re hatibû, mêze kir. Wî ji xwe re got, tenêtî ye tiştê min li vir nearam dike. Ne tenê ew rastiya ku ew tenê bû- ew her carê, di eslê xwe de li her derê tenê bû. Na, tiştek bi vê tenêtiyê hatibû; wê xwe guhertibû, mîna deverên mirov demekê ew baş nas dikirin û piştî demeke dirêj mirov wan dîsa dibîne jî xwe diguherin. Her tişt nas e, ji qederê mirov texmîn dikir bêtir, lêbelê her tişt ji ber vî sedemî jî cuda ye, mîna ku bi gelek şopên qeramuşkên biçûk hatibe nixumandin. Biyanî ye, hizirî ew, û lema ku her cûre guhertin tê de gengaz e. Belkî ji ber vê yekê ew vê carê nikarîbû li ser xaçirêka xwe bimaya.

Piştî ew ber bi xanîkî ve çû, têgihîşt, bê çiqasî bi hêz heywanê di hundir de pîkolî dikir. Ew çû ber derî, kêliyekê xwe sipartê û dîsa xwe da alî, ji bo ku darê xwe hilîne û ji bo her tiştê ku dikarîbû pêk bê, wî bi herdu destên xwe zeft bike. Ev bi wî seyr hat, her weha bi wî bi biryar jî hat. Di devê derî de rawestiyayî,


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

di nîvtariyê de wî pêşî du serî dîtin, yekî mezin û yekî biçûk ku berê herduyan bi aliyê berovajiyî hev de bûn. Wî serê xwe dirêjî hundirê xênîk kir, û awira wî bi çavên beq ên çêlekekê ketin. Bi paş wê ve golikekî şil î birqokî mîna ku bi xavikekê nixumandî be, ber jêr bûbû. Golikê nû çêbûyî êdî di ber xwe dida, lêbelê serê wî pê ve daliqandî, li ba dibû mîna ku mirî be. Qaçaxçî xwe da paş, ji ber ku wî tirs di çavên wê heywanê de dît. Li pêşber xanîk rawestiya, bêyî ku zanibe li hêviya çi ye. Wî ji xwe pirsî bê kê ew çêlek anîbû xistibû wir, ji ber ku wî tu carî ji rasthatiniyan bawer nedikir.

Ew li hemû deverên wî gundê demekê, li şopa lingan geriya, lêbelê li yekê bi tenê jî rast nehat. Piştî ku çavên xwe li esmanê sipîçolkî gerandin, disa li xwe û pirsyara xwe vegeriya, bê ew li wir çi dike. Tiştek ji wî ve pişterast xuya bû: Ger ew bi vî şêweyî dom bike, bêhêle bala wî belav bibe, dikarîbû yekser bi paş de vegeriya, lêborîn bixwesta û pere bi paş de bidana xwediyên wan. Wî bêhn veda û dîsa da rê. Li ber xênîk êdî pêjna du heywanan kir, û hesteke cemidî xwe bera ser canê wî da, dema ku ew li ser vê zayîna li welatekî bêkes hizirî. Wî hewl dida ku hew bala xwe bide ser ecêba ku çêlekek di xaniyekî mirovan de diza.

Piştî hemû tiştî hema hema ew hew karibû ecêbmayî bimîne ku rêya kurt î kaş î ber bi jor ve ji çem heta wir ji her tiştî dijwartir bi wî hatibû. Bêhnçikiyayî dibû, doş dibû, bi çîpên şidyayî bi paş de bi ser kevir û tahtan de diket, li erdê dirêjbûyî dima, dîsa dida xwe û dîsa ber jêr ve dişemitî. Wî li çemê diteyisî mêze kir, qultek av vexwar û xwe da ser dest û çongan û bi ser tahtê ve hilikişiya. Gihişt jor, nemiqatebûna wî jê eşkere xuya bû, hêdîka rabû ser xwe û li ser panavê çend metreyan meşiya. Ew ji nişkê ve di cî de rawestiya, ji ber ku wî bawer kir ku dengin dibihîstin, tenê ji bo kêliyeke kurt, ewqas kurt ku ji bo ew rast be ji qasî divê kurtir bû. Lêbelê dengê qelabalixê eşkeretir bû, ji qasî wî ji bo xwe bixwesta, mîna ku xwe di nav

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

ba de livandibe, ji hev vekişiya be û dîsa bi ser hev de hatibe temisandin. Qaçaxçî, li cihê xwe ma û ponijî: Li gel ku ew li navenda sêniçika dewletan bû jî, ne gengaz bû ku ew yekîneyên Tirkiyê yan yên Îranê bin. Tenê yên ku rêya xwe ber bi vir de şaş kiribin, dikarîbûn kesên ku mayîn radikirin ên Netewên Yekbûyî û rêxistinên din ên bi dedektorên metal û pisporên bi helmên ber rû bana ku bi mesrefîn mezin û lema zehf hêdî di nav herêmê re tevdigeriyan. Lêbelê wî dê ji çalakiyeke wisa li dar an jî yeke ku dê pêk bihata li bajêr agahdar bûba, jê pê ve ne gengaz bû ku wî pêjna yekineyeke wisa heta niha nekiriba. Lema tenê gumana ku ew kesên bê cîh û war bin dima. Gelek caran mirov tiştin ji yên Rojhilatêbakur dibihîstin ku di nakokiyên eşîran ên ku gelek caran pêk dihatin de, cîh û warê xwe wenda dikirin û debara xwe bi xwe dikirin. Mirov nikarîbû bi rastî jî navê eşqiyatiyê li wan bikira, ew tenê derketî bûn. Lêbelê gundî, ji wan jî mîna ji her kesê ku ji derve dihat, ditirsiyan. Ger ev mirovin wisa bin, eşkere ye ku ew bi çek in û Qaçaxçî nikarîbû xwe bixista wê metirsiya ku ew wî bigirin.

Ji dengê lawaz dihat famkirin ku ew zehf dûr, li binya panavê bûn. Lêbelê dîsa jî gumana ku ew ji aliyê hember di ser rêya wî re ber bi aliyê din ve bên, ji bo ku di ser tahtê re derbasî ber çem bibin jî hebû. Qaçaxçî, ji qiraxa panavê vekişiya û piştî tahtekê bi şêweyekî bi cîh bû ku kesê hilkişya jor nikarîbû ew bidîta. Di dema ku bi biryara bi paş de vegere re mijûl bû, dengekî din ew cefiland: Bi kêmanî du kûçik bi wan kesên li jêr re hebûn.

Tiştê ku heta êvarî gelek caran ew mijûl dikir, pirsyara bê ew çawa di nav erdê bi mayîn re tevdigeriyan. Tenê ew û belkî du kesên din jî xwedî xaçerêkekê bûn, ev bû rastmalê wan. Kî dikarîbû wisa dîn baya û li vir bi serbestî tevbigerya? Û berî her tiştî: Seba çi? Dê qet ne dijwar ba, ger ew di korîdora sînor a zirav î bi metirsiyê re ber bi aliyê bakurêrojava ve, ber bi Turkiyê ve, ji vê devera bi metirsî derketibana.


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

Dema tarî ket erdê, tê derxist ku êdî wî sar bû. Ew niha dîsa dilşad bû ku qapûtê leşkeriyê lê bû. Ev ne cara pêşî bû ku ew neçar dima bi rê de şevder bimîne. Berî bi du salan di kêliya ku ew di ser vê tahtê re derbas bûbû, lingê wî ketibû ber wî û bi ser de jî heta bi jêr kuliyabû, ji bo ku ew li wir lingê xwe nelivîne, heta ku ew a dinî rojê karîbû rêya xwe dom bikira. Niha jî şev bi tevahî bê deng bû- wer xuya bû ku ji wan herdu çêlekên di xanîk de pê ve tu heywan li vir tune bûn. Qaçaxçî hewl dida ku wê tirsa ku ji nêzîkaya mirovan pê re çêdibû, biçewisîne.

Seyr bû ku xewna wî ya îşev ne bi mirovan ve têkildar bû, lêbelê ji bîranînan pêk dihat. Ew bi xwe seyr dihat, di bin şewqa melûl î zerspî ya bajarê paytext de. Tiştê ew ber bi wî ve diçû, goncaleke mezin î di erdê de bû. Ew bi wê şewqê dagirtî bû û bi qasî wî çavê xwe bigirta û vekira ew nêzîkî wî bû. Wî gotibû qey ew stasyoneke gelek tirênan di navenda çoleke bi şevê de ye. Wî ji her derê, ji kozikên textînî û sindoqan, dengên boreborê û qîrînê dibihîstin. Bi mereq, lê di hindurê xwe yê bi xewnê re ne têkildar bû de bêdil, ji xwe re rêyek di nav glêjê re vekir û di ber cismên ecêb mezin re derbas bû, wer xuya bû divê wî ew nas nekirna, ji ber ku ew bi taybet ji derveyî awira wî ya xewnê mabûn. Lêbelê ew bi wan bû -yan jî ew bi wî- bê guhertin û bêyî ku ji cihê xwe bileqin. Ji nişkê ve bi tevahî tarî bû, ew hew ber bi şewqekê ve meşiya, û pirsyara bê ew seba çi dimeşe, ji xwe nepirsî. Piştî kêliyeke din dîsa li ber erebeyeke baran î ecêb dirêj rawestiya, yeke di navbeyna lîmozînekê û qemyoneke leşkeriyê de bû. Deriyên wê qeraseya erebeyan vekirî bûn, zehf mezin xuya dikirin û siya wan mîna baskên zehf dirêj davêt ser erdê.

Li dor malika şifêr geriya, lêbelê ji dêvla ku di deriyên vekirî re mêze bike, li pêşber cama pêşiyê rawestiya û tê re li hundir nerî. Li ser palkursiyê mîhekê xwe dirêj kiribû, serê xwe rakir, û Qaçaxcî ji rûyê wê yî dirêj î mîna yê qirdikekî ku pêşber wî bû cefilî. Ji aliyê cihê bar dengin bihîstin, piştre çû li paş


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

qemyonê rawestiya û li du gulaşgirên girs temaşe kir. Ew di hundir de tena serê xwe şipyayî bûn, bi trîbûna ku êretî bilind bû li ser cihê bar. Herdu jî bi maske bûn, di kêliya ku wan bi milên hev ên qalind hevdu kaş dikirin de, hereşeya ku serê wan li hev bikeve, di her kêliyê de hebû. Hîn di xewnê de hat bîra wî ku ew van gulaşgirê wisa ji televizyonê nas dike, vê dema dawî vê têkoşînê bi saetan dom dikir. Ji nişkê ve yek ji herdu lîstikvanan derket jor û bi lingên ji hev vekirî ket jêr. Wî wisa yê din zeft kir ku ew kêliyekê li ser milên wî rûnişt, berî ku ew wî kaşî erdê bike û pişt hustê wî li ser erda cihê bar bieciqîne. Xuya ye ku niha ew bi ser ket, hizirî Qaçaxçî. Wî hewl da ku di maskeya yê rûniştî de çavan bibîne, lêbelê qelşa ji bo nerînê reş bû. Gulaşgir bi şeqên vekirî rûnişt, wisa mîna ku ew derketibû jor û daketibû û di navbera rehnê wî de serê yê din hebe, bi teşeyê hêkekê bi kêlên serî yên li dirêjahiyê. Di qelişteka çav re çavên wî bi şilayiyekê ket û berê xwe jê zivirand. Derdora wî hîna jî stasyon bû, sibe ronî dibû. Kêliya ku li pereyê xwe hizirî panîkê ew girt. Bi tiliyan qapûtê xwe peland, devera qalind bûyî his kir û destên xwe bi aramî bera ber xwe dan. Di wê kêliyê de mîh li rex wî rawesyabû, li wî temaşe dikir û wî xwest ku li pêş wê xwe bide ser çonkan, di wê kêliyê de şiyar bû.

Mirov digot qey xewn naxawaze bi dawî bibe, ji ber ku li dor wî heman atmosfera serê sibehê hebû. Rehet bûbû, dema têgihişt bê li ku ye, lêbelê yekser piştî wê ew hatibû ser hişê xwe. Li derdora xwe mêze dikir û çavên xwe dikutkudandin û di heman kêliyê de bi aramî bêhn dida û distand, te dê bigota qey ew dixwaze bi bêtevgeriyê xwe veşêre. Bêdengiyê aramî pêk dianî, tenê ba xuşexuş ji strîmişkên bi pênc gavan jê dûr dianî. Qaçaxçî, li ser xwe rûnişt û li xewna ku dîtibû ponijî. Ger hemû tiştên ku li vir hatin serê wî, xwedî wateyekê bin, hîngê divê wateyeke vê xewnê jî hebe. Wî gulaşgir li aliyekî hiştin, zehf bi liv li navendê bala mirov neçarî ser xwe dikirin. Mihê


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

bêtir ew mijûl dikir û berî her tiştî ew tiştê bi pereyan ve têkildar. Mîna di xewnê de wî betanê qapûtê xwe seh kir, bê ka her tişt li cihê xwe ye yan na. Destên xwe birin ser rûyê xwe mîna ku ser çavê xwe bişo. Dema ku bû roj û esman ji nişkê ve ronî bû, wî hîngê biryara xwe dabû: Wî dê rêya xwe dom bikira, lê tenê wek ceribandinekê, berî wê wî dixwest pereyê xwe li wir di bin erdê de veşêre. Ji bo wî diyar bûbû ku di rewşeke wilo de, ya baş ew bû ku bi paş de vegerya, lêbelê şanaziya wî ne dihişt ku bi rastî li ser vê yekê bihizire. Heta niha qet tiştek pêk nehatibû, ji xwe re got, û wî zanîbû ku dê nikarîba sedemekî tenê yê şênber bidaya ku ew neçarî vegerê kiribû. Ji xwe re got belkî ku rê dirêjtir baya. Lê di vê meşa rojê de, têkçûn ne gengaz bû. Çi pêk hatibû ku nikarîbû di hemû seferên bên de jî pêk bihata? Wî xist serê xwe ku ji niha pê ve ji her cudatiyên biçûk ên ji rewşa asayî netirse, lêbelê ew xwe li wê gorê amade bike. Wî hebekî jî ev herêma li ser sînor wek ya xwe didît, û wisa diviyabû çavê wî li ser yên ku derbasî vir bibin baya.

Bi kêra bêrîkan wî betanê qapûtê xwe vekir. Di wê kêliyê de mîna dizekî her li dora xwe mêze dikir. Girêka ku di tûrikekî plastîk de pêçayîbû derxist. Wî erda sist di nav sitirîmişkan de dît, bi tiliyên xwe kortikek zirav veda û girêk xistê û ser wê bi ferşekî ku wî piştî biryara xwe, ji bo wê peyda kiribû, piştî biryarê ewqas zû, lema ew hizirî bû ku wî birayareke wisa da, ji ber ku li nêzîka wî ew kevirên pahn hebûn. Bi dilşadî wî dît ku her tişt xwezayî xuya dikir û di nav giha û stiriyan de kevir, hema hema nexuya bû. Dema ku wî qapûtê xwe dîsa serast kir, mîna ku rizgar bûbe, wisa xwe cansivik his kir, te yê bigota wî bi pereyan re hemû tirs jî binerd kiribûn. Ger ew niha pêrgî kesekî bihata, dê bê şik biçûya ser wî, bêyî dijwarî dest bi axaftinekê bikira û mîna kesekî mulayim tevbigerya. Ji bo wî zelal bû ku sedemê hemû hereşeyan ew pere bû. Ji ber vê yekê di her sefera xwe de hewl dida ku heta gengaz be bi rê de pêrgî hindik kesan bê. Her tim vê ew mijûl dikir, lêbelê ji ber ku rê


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

kurt û tenê bû, tu carî vê bala wî nedikşand. Niha ew dîsa serdestê rewşê bû û dîmen, buhureke di navbeyna sînoran de bû, li herdu seriyan ji aliyê leşkeran ve ewlekarî dihat pêkanîn û ji ber erdê mayînkirî tenê hindik kes derbasî nav wê dibûn. Vê rewşê ew piştерast kir, ji ser tahtê daket û wî di wê kêliyê de minminîkên zer dîtin ku bayê ew di ser xaçerêka wî re difirandin.


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

# 4

Naskirina Beno, qet nedihat wateya ku mirov dibû xwediyê hevalekî nû û heta nedihat wateya ku nasekî mirov î baş çêdibû jî. Naskiran Beno, dihat wateya ku mirov mereqa wî ya şermokî, lê tu carî kêmnebûyî, awirên wî yên şûm ên ku ji kêlekê ve mîna pîjan di canê mirov de diçikiyan û axaftina wî ya ku bêtir ser tiştan dinixumand, ji dêvla ku zelaliyê pêk bîne, deyax bikira. Mirov çawa pêrgî Beno dibû? Bê guman bi rasthatinî, hizirî Qaçaxçî û mizicî, hat bîra wî ku her cara ew rasterast diçû serdana wî, Beno, bêdil û bêhnteng bû; pêrgîbûna bi rasthatinî karê wî bû. Mixabin pê nema. Naskirina Beno dihat wê wateyê jî ku ji serî de hestek bi mirov re hebe ku dê bûyer nebaş bi dawî bibe.

Hîngê ew li ser rê bû ku biçe başûr nav paytext. Gelek demetên pereyan ên ku dixwest wan bibe ji mirovên ku bi qaçaxî hûr dikirin re, her tim ew nearam dikir. Tenê tiştê ku ewlekarî didayê yên ku di çavika erebeyê de li ber destên wî amade, demetên jimartî ji bo nobedarên yekayek, ew pereyên rê bûn. Wî tirimpêlek -Toyotayeke zehf ewle- ji merivên jina xwe deyn kiribû, bi hin dijwariyan ew tije benzîn kiribû û anîbû ber malê. Ew di wê kêliyê de bi veşartina tiştên xwe mijûl bû. Dema ku wî serê xwe ji baxacê rakir, Beno li kêleka wî rawestiyayî bû. Qaçaxçî gavek bi şûnde avêt, ji bo ku karibe rûyê zilamî bibîne. Wî silav dayê û dest pê kir ku di ber bişirîna xwe re biaxive.



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

"Tu diçî rêwîtiyekê? Îro zehf germ e, seba çi tu ber êvarkî nakevî rê?"

"Ez naxwazim ku ez bi şev bi rê de bim." Qaçaxçî hewl da ku ji zilêm fam bike bê yekî çawa ye. Kincên lê, mîna yên sivîlekî halxweş bûn, lêbelê mereqa wî yî neveşartî guman dibir ser ku ew yek ji leşkeran be.

"Ji ber ku min niha tu dîtî, min xwest ez bipirsim bê tu dikarî min jî bi xwe re bibî? Rêwîtiya du kesan hindiktir bi acizbûnê derbas dibe, ne wisa?"

Ji bo ku demê bi dest bixe, Qaçaxçî dîsa bi ser bagajê de daqûl hat. Du zarokên ji mala cîranan bi bazdan hatin cem wan û bi kefa destê xwe li deriyê tirimpêlê xistin. Beno ew yekser bi tevgerên destên xwe yê bi hêz ji wir qewirandin. Ew dîsa tenê man. Wî dixwest çi bike? Ne zehf guncav bû, ger mirov qenciyeke ku li gor dema me ne seyr bû, bi vî zilamî nekira. Ew ji pirsyarên zilamî ditirsiya; qe nebe dê bi dirêjahiya saetan bi hev re bi rê de bana.

"Bêguman min ê pereyê rê jî bidaya." Rûyê Beno jî di bin deriyê bagajê re derket. Wî serê xwe bi erênî dihejand, mîna ku bixwaze Qaçaxçî jî pê bixîne.

"Baş e", got Qaçaxçî bê dilî xwe, "lêbelê ez niha yekser dikevim rê."

Wî deriyê tirimpêlê ji yê din re vekir, û careke din çû malê, ji bo ku xatir bixwaze.

Jina wî li ber pacê rawestiyayî bû ku ji der ve nedihat xuyakirin û li wan temaşe kiribû.

"Ew zilam kî ye?", wê ji wî pirsî, berî ku wî karîba ew himêz bikira.

Qaçaxçî rawestiya. "Ez nizanim."

"Tu wî nas nakî?" Wê berê xwe da ber bi pacê ve. Bi şik û tirs, wek ku ew wisa bû, wê dest bi kurtepistê kir. Hemû rexneyên wê yî li dijî karê wî yê ticarî niha bêtir xwe didan xuyakirin. "Wî ji te re çi got?"


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

“Ew dixwaze bi min re bê?”

“Heta bi paytextî?”

“Ez pê nizanim.”

“Tu pê nizanî?”

Mîna ku di kêliya dikuxuya de wêneyê wê hatibe girtin xuya dikir. Çavên wê bêçare li dor wî digeriyan û mîna her carê di kêliyên wisa bêaramiya bê rawest de, zehf pîrtir û lawaztir ji rewşa xwe xuya dikir. Wî hewl da ku ji wê re behs bike ku ev xal tu rolê nalîze, ku ne girîng e, ka bê heta ku ew bi wî re biçe û tenê tiştê girîng ew ku erê yan na bê gotin. Wî jê re negot ku ew leşkerekî di dilqê wî zilamî de texmîn dike.

“Ger tu nizanî bê ew kî ye, seba çi tu dixwazî wî bi xwe re bibî,?”

“Hema jixwe. Ma çi dikare bibe?”

Wê ji bo kêliyekê çavên xwe girtin, mîna ku bixwaze wê bersivê hezim bike. Wî axir ew himêz kir û çû.

Piştî ku wan bajar li dû xwe hiştibûn, ji wî zilamî re got ku ew diçe paytextî. Zilamî tenê bi erênî serê xwe hejand û bêdengiya xwe dom kir. Bi Qaçaxçî wisa hat ku bi pejirandina wî zilam hîngê gihişt armanca xwe ya wê kêliyê.

Piştî demekê Beno, dawiya dawîn dest bi axaftinê kir. Pêşî behsa tiştên ne girîng mîna wek rewşa rê û bê cihê kontrola li pêş wan tam li ku ye. Qaçaxçî bi baldarî li zilamî guhdarî dikir û hest kir ku ev zilam, bi axaftina xwe tiştekî amade dike. Dîmena derdora wan ji zû de hew bi kevir û taht bû, lêbelê bi pêlên seyr yên rût rûyê erdê nixumandî bû, ku dikarîbû pişta lawirên bê serî yên bi hêz ba jî.

Ger baş dihat bîra wî, piştî demekê Beno li ser palkursiya tirimpêlê kûrtir şemitî û şeqên xwe kişandin ber xwe. Cîhê xwe xweş kir. Naskirina Beno dihat wateya ku diviyabû mirov li gor atmosfêrên ku wî ji nişkê ve pêk dianîn tev bigeriya. Niha Qaçaxçî, hew bawer dikir ku zilamê pê re, xwedî planekî bi dizî bû.


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

Wî dest pê kir ku behsa şerê mezin bi USA û di rastiyê de bi Ewropa re bike ku pir dem di ser re derbas nebûbû. Ev şer mezintir bû ger mirov ew bida ber şerê Xelîcê yê yekemîn ê bi Îranê re, di rastiyê de tenê ji ber hejmara dijberan bêtir bû, hêzeke şer a bi rastî jî navnetewî bû, bi çek û derfetan pêçayî ji hemû şerên dawîyê bêtir. Beno hêdî hêdî vedigot. Wer xuya bû ku dîmena bi tûlm a wê derdorê dihişt ku ew aram bibe. Dengê wî hatibû guhertin. Ev baş dihat bîra Qaçaxçî; ew tenê hêdîtir an kûrtir jî bûbû. Ne her tişt baş dihat famkirin, dengê tekeran li ser rêya asfaltkirî ku di bin zincîrên panzeran de qet qetî bûbû, zehf bilind û ne wek hev derdiket. Hingê di tirimpêlê de hestek pê re çêbû ku piştre gelek caran ew his dikir: ew ji alî Beno ve naçar dihat hiştin ku ew li wî guhdarî bike.

Di dema şerî de Beno, wek leşker li çeperekî dima ku li aliyê din î sînorê başûr di nav qûma çolê de hetibûn belavkirin. Ji wan re emir hatibû ku divê di her halî de li çeperên xwe bimînin û her tiştê ku ber bi çavên wan bikeve ji yên di ser xwe re bibêjin. Ne gengaz bû ku zanyariyên yek bi yek werbigrin, bê li ku çi dibe û çi nabe. Tenê diyar bû ku êrîşa mezin ji çend rojan vir de li dar bûn. Lêbelê leşkerên di çeperan de ku ew bi wan re di nav danûstandinê de bûn, wek mîna hemûyan hetanî asoyê tenê qûm, qûma ji ber çavikên çeperên wan dest pê dikir, didîtin. Nexwe wan nikarîbû tu tiştê bêtir ji payînê bikirana. Tiştê herî kambax ew bû ku ew di nav qûmê de neparastî bûn. Ger bi rastî jî cihekî vekirî hebaya, got Beno, ew jî mîrata çolê bû. Çi di çepereke ji betonê de an jî li derve mîna hev bû. Her tiştê ku çol pêk dianî, germa rojê û serma şevê, qûm û liva wê ya bêdawî, dûpişk û mar, her tişt her li wir bûn. Dawiya dawîn çol bi van ne dîmenek bûye, belkû rewşeke ku her ji xweguherînê pêk tê. Wî qet nikarîbûye xwe di çepera beton de ramedanda, bêyî ku ew çolê bi xwe re bibe xewê. Zehf dijwar e ku mirov bawer bike, got Beno, lêbelê wî cerekê tenê jî giha û kulîlk di


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

xewna xwe de nedidîtin; ew her tim di nav qûmê re dimeşiya û ji pêjna her pêngavê ditirsiya.

Pirsgirêka li cihê nobetê ew bû ku ew ewlebûn dê tiştek bi ser wan de bihata, kesekî nizanîbû bê bi çi şêweyî. Bêguman ew li ser rewşê ponijîbûn. Berî her tiştî ji xwe dipirsîn, bê bi rastî jî sedema payîna wan ji bo li dijî derketina êrîşekê bû, wek ku dihat gotin, her kesê di çeperê de bi vê pirsyarê mijûl dibû. Li gor çekên bi wan re ew bi kêrî tiştekî wisa qet nedihatin. Gelo ew tenê nobedarên çavdêriyê bûne ku diviyabû ew bibana qurbanî? Kesekî ev guman bilêv nedikir, lêbelê kêfa wan ne li wan bûye.

Ji eniya şer wan tenê dibihîst ku hêzên dijber bi lez seranserî xetê ber bi wan ve tevdigerin. Ev nûçe di nakokiyeke dijberî dîmena derve ya bitevger-rawestyayî de bû. Beno got wî wek halusînasyonekê panzer û heta hesp jî didîtin, kêliya ku wî li xeta di nav erdê û esmanî de mêze dikir ku mîna tevgereke bêrawest xuya dikir. Lêbelê tu tiştî rûnedida. Vê rewşa şidiyayî jî şûna xwe ji pûçbûnekê re hişt ku tu kesî ji wan nikarîbû xwe jê biparasta. Nerîna li derve, derfeta bi tenê bû, ji bo ku mirov xwe ji tengasiya sengerê bi dûr bixista. Piştre dengê işareta têkbirinê hat û hemû tekiliyên bi rêya bêtêlê têk birin. Ew mîna sîgnala alarmê ya bêrawest e ku mirov nikare li dijî wê qet tev bigere, li gel ku mirov dizane ew hatina tiştinan radigihîne. Bi dirêjahiya yazdeh rojan ev deng ji dêvla dengên ku ji wan re pêwîst bûn hatibû. Yazdeh rojan ew li çola xalî rûniştî man û wan nizanîbûn, bê ew ê dawiya vî dengî bibînin an na. Di vê demê de yekîneyên ku cihê nobeta wan bi pêwîstiyan tedarik dikirin jî nexuya bûn.

Di destpêkê de hîna hêvî hebû. Lêbelê tecrîdê hêdî hêdî rewşek pêk anî ku şer hew mîna rasteqînê xuya bû. Dijwar bû ku zilam bikaribin li ser erkên xwe hûr bibin. Wan dest pê kir ku bi tiştên biçûk mîna bi pêlavên xwe re, an jî bi hin tiştên din di çeperê de mijûl bibin. Sîgnala têkbirinê hişmendiya rewşa


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

ku ew tê de bûn hereşe dikir. Beno got ku tenê hizrekê ew mijûl dikir: Kengî ku yekîniyên bi paş ve vedikşiyan, xuya bikirna, divê ew ji bo tev li yên ku bi paş de dihatin biba, amade baya. Tirsa wî ya herî mezin ew bûye ku ew di heman çeperê de di navbeyna yekîneyên leşkerî yên xwe û yên neyaran de bimîne.

Lêbelê ew hew piştrast bûn ku şer bi qasî ku heta hingê wisa dirêj dom kiribû, hîn jî dom bike. Ji ber ku aliyê din zehf bi hêztir bû, bi gumaneke mezin dê leşkerên wan zûtir xwe radest bikirina. Her ku diçû ev hizir li ba leşkeran xurtir dibû; ew bû hêviya wan. Ji neyaran bêtir ew li hêviyê bûn ku qasidekî bi tena serê xwe yê ku nûçeya dawîbûna şerî bida wan. Tiştek tenê hebû ji bo hemû rojan li dijî vê bû: Sîgnala têkbirinê ya ku her dom dikir. Vê dihişt ku herkes bizanibe ku bi kêmanî peywendiyeke bi tenê, ger yeke yekalî be jî, hîn heye û ev jî ne nîşana xêrê bû.

Qaçaxçî, peyva wî birî û got, ez dizanim bê niha dê çi bê, min bûyera ku bi ser leşkeran de reşandibûn bihîstiye.

Beno destên xwe li ba kirin û li paca rex mêze kir, mîna ku tiştekî bîne bîra xwe. Piştre got, ku qederê ew dizane kesek ji wanên ku panzerên bi bêr li wan rast hatibû sax nefilitî bû. Wan xwe bi lez nêzîk kiribûn û bi çekên bêkêr li dijî wan şer qet nikarîbû bihata kirin. Ji bo yên ku di sengerê ne baş şidyayî de bûn her tişt zû derbas bûbû. Lêbelê gelekên ku di çeperên tebût de mabûn, hebûn. Ew di wan de dorpêçayî hatibûn hiştin.

Deqa kontrola rê ya yekemîn xuya bû. Nobedar li rex rê vir de wê de diçûn û dihatin, heta hinek ji wan di nav qûmê de ramedandî bûn. Kêliya ku ew nêzî çeperên MG ên ji birceke nerm a koma çewalên qûmê pêkhatî bûn, du zilamên ku çekên wan ên otomatîk di bin milê wan î çepê de daliqandî bûn derketin ser rê. Qaçaxçî rawestiya û cama şibaka tirimpêlê daxist. Kaxezên xwe dan wan û li hêviya talîmata wan ma ku jê re bibêjin dakevin û deriyê baxacê vekin. Di vê kêliyê de, awirek avêt ser Benoyê ku di wê kêliyê de wî jî nasnameya xwe


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

dida wan. Li ser pirsyara yê leşker ka bê diçin ku Beno, bi lez tev geriya û ji wan re got, ka li kaxezên di destê xwe de mêze bikin. Kêliya ku dîsa serê leşker di paca tirimpêlê re xuya bû, bi lez bû ku kontrolê bi dawî bike. Vê bûyerê ne tenê pereyê Qaçaxçî di kîsê wî de hişt. Ew niha zehf dilşad bû ku wî ew zilam bi xwe re anîbû, ew bi rastî jî ne yekî ji rêzê bû. Ajoya wî ew nexapandibû; niha tenê dikarîbû li bende bimaya ka bê Beno jê çi dixwest. Lêbelê ew vî tiştî ne di rêwîtiyê de ne jî demeke din fêrbû.

Wan kontrola rê li pişt xwe hiştin û gihiştin destpêka çolê. Herêm heta bi asoyê erderast bû û çewlikên yeko yeko yên heyî baş xuya nedikirin. Qaçaxçî, bê deng bû û li hêviyê ma ku yê din dest bi axaftinê bike.

“Ez dizanim, tu lê şaşwaz mayî”, got Beno, “lê li hêviya agahdariyekê ji min neke. Çawa be, wisa bipejirîne.” Qaçaxçî bi erênî serê xwe kil kir. “Ji bonê ez jî ji te napirsim bê seba çi tu diçî paytextî.”

Ev hevoka dawiyê bi guhê Qaçaxçî, mîna gefeke bi dengê nizm hat, tiştekî ku Beno ji her tiştî bêtir jê fam dikir. Bi gumaneke mezin wî hingê jî baş hay ji hemû tiştî hebû û dihişt ku Qaçaxçî li hember wî li ser hemû karûbarên xwe bêdeng bimîne.

Ji dêvla vê ve Qaçaxçî jê pirsî: “Di çeperê de çi rû da?”

Helîkopter ji asoyê xuya bûn, got Beno, te ê bigota qûmê ew berdabûne ezmên. Ew refekî mezin î tarî ji mekîneyên giran ên ku pozê wan piçekî ber bi jê ve daxistî bû û rasterast ber bi çeperê ve dihatin. Hemû zilam li ber çekên xwe amade bûn û piyan, û mêze dikirin bê çawa her diçû wisa xuya dikir ku bêtir ev tiştên ecêb ji devera asoyê ber bi jor ve bilind dibûn. Di destpêkê de, Beno got, hîn wan hewl dabû ku wan bijmêrin, lê piştî demeke kurt dev jê berdabûn. Bi şêweyekî êrîşkar mekîneyan xwe nêzîkî wan dikir. Leşker di her kêliyê de li hêviya emrekî bûn. Diyar bû ku hema hema ne xwedî derfeta

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

ku helîkopterekê bi tenê jî bixînin bûn, her waha diyar bû jî ku piştî bi kêliyekê dê dojeh bi ser wan de bihata. Kesekî di çeperan de nedipeyivî, her yek ji wan tenê li ser pozên makîneyan hûr dibûn û li dengê giregira ku her diçû nêzîktir dibû. Dema ku yên yekemîn di ser wan re firiya bûn, wan bawer kiribû ku çekeke nûh îcad bûye û niha cara pêşîn dihat bikaranîn. Lêbêlê piştre ew têgihîştibûn ku ew ne armanca êrîşê bûne. Ref li pişt wan wenda bû, û hemûyan li dengê şer guhdarî dikirin. Tu tişt tune bû, got Beno, her tişt mîna berê bû, li gel cudayetiyekê tenê ku diviyabû ji niha pê ve biryar li ser tiştên mayî bidana, ji ber ku ji niha pê ve, ji beşê welêt î li dû xwe hatibûn qutkirin. Wan biryar da ku qasidekî bişînin. Ji ber ku kesekî bi riza xwe ev nexwestibû, Beno, biryar dabû bê kî biçe. Biryar ji bo yekî Şîe yê ku hîn bîst saliya xwe danegirtibû, hat dan ku qe nebe ji yên din bêtir tecrûbeyên wî û çolê hebûn. "Teqez dê wî gotiba: Bêguman min çol ji we bêtir ji tirimpêlê dîtiye.", got Beno û li hêviyê ma ku Qaçaxçî bibişire.

Ew ne bi dil çû, lê çû. Dema ku ew piştî bi saetan vegeriya, wan bihîst ku helîkopter bi kîlometreyan li paş cihê ku ew lê bûn danîbûn û leşkerên reşayê li wir bi cîh kiribûn. Wan li çeperên ku li wir belav kirîbûn dest bi karê xwe kiribûn. Ji dengên çend teqînên hindik ên ne ewqasî bi hêz pê ve qasidê wan tenê dîtibû bê çawa piraniya kesên di bûnkeran de xwe radest kiribûn.

Beno cihê xwe li ser palkursiyê xweş kir û li dîmena cîh cîh bi deverên tarî mêze kir. Ev çaviyên ji rengê qehweyiyê tarî, di erderasteke bi rengê vekirî yî zuha de, mîna ku şiliyeke bin erdê ku nêzîkî ser rûyê erdê bin, xuya dikirin. Lêbelê dîsa jî wer xuya bû ku qijik ber bi xwe ve dikişandin.

Ji nişkê ve Beno dîsa bişirî. Wî li Qaçaxçî nerî û bi neyênî serê xwe hêdîka hejand.

"Tenê ji ber ku radyoya te tune ye, ez neçar im tevahiya demê vebêjim."


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

Qaçaxçî milên xwe hildan û dostanî di rûyê wî de xuya bû. Wî nizanîbû bê li ser wê yekê çi bibêje.

“Seba çi radyoya te tune ye? Te nikarîbû yek bi xwe re bianiya?”

Qaçaxçî ziq li pêşberî xwe dinerî, lêbelê wî dikarîbû di qorziya çavê xwe re bibîne ku yê din dimizice. Dîsa Qaçaxçî, mîna ku di ser kiryarekê de hatibe girtin û jê şer tê xwestin xwe his kir.

“Ev ne tirimpêla min e”, bi kurtahî bersîv dayê.

“Ez dizanim”, got Beno. “Gelo tu karî ji bo kêliyeke kurt rawestî?”

Wî ajot rex rêya ji mirovan xalî û rawestiya, Beno ji tirimpêlê peya bû. Wî xwe rast kir, destên xwe avêtin pişhustuyê xwe û ew ber bi hev ve eciqandin. Piştre li qiraxa rêya xwarbûyî rawestiya û bi nav qumê de mîz kir. Destava Qaçaxçî jî hat, lê wî nedixwest ji bo wê li kêleka Beno raweste.

“Rewş çawa ye,” yê li derve bang kir, “ji cergî şer tu carî tu çûyî paytext?”

Qaçaxçî li bende ma heta ku Beno dîsa li tirimpêlê siwar bûbû, dengê oxîneke rehetiyê bihîst û piştre got, “na.”

Beno dîsa bişirî. “Xeman nexwe, zerarên ku hebûn niha hema hema hew xuya ne -tenê çend pir hew hene. Avahî û rêyên ruxuyayî yekser hatin serastkirin.”

Bi rê de jî tu şopên şer nexuya bûn. Her ku ber bi başûr ve çûn, li derdorê bêtir terîşên kincan, tirimpêlên jihevketî û xirbe hebûn jî, lêbelê ew ji serhildanên têkçûyî yên rasterast piştî şer mabûn.

Kontrola rê ya din jî ji ya yekemîn tundtir bû, li gel nobedarên bi kincên nû yî ji rengê vekirî yî leşkerî û kumên sor, dikarîbûn bê pereyê gumrika rê derbas bibin. Beno ew ji bo wê yekê amade dikir ku ya bê divê tiştin bên dan. Qaçaxçî ponijî, gelo her ku ew ji çiyayên bakur bi dûr diketin re, bandora Beno jî kêmtir dibû.


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

“Niha”, got Beno, bi kêf li dora xwe mêze kir, di kêliya wan rêya xwe dom dikirin de, “dema em ji çeperê derketin, me dixwest em bên vir. Me ev ji her tiştî bêtir dixwest.” Wî bêhnek da axaftina xwe, û Qaçaxçî dîsa lê pirsî. Ne dijwar bûye ku mirov bizanîbaya bê dê hîn çi bihata. Carekê bi serê xwe, êrîşa birastî li pêş wan bû. Ger hîngê hayê wan ji dozerên bi panzer hebûya- serbazan ev carekê be jî li ser wê bi wan re neaxivîbûn. Lêbelê ev sedemê herî girîng bû ku ew ji çeperên xwe derkevin, ew rastiya ku wan qet nizanîbû bê çi dibû. Ew li bende man heta ku bêdengiyeke seyr pêkhat, piştre wan hemû tiripêlên ku li pişt pêlên çewalên qûmê yên nexuya û di çeperên mezin de ji bo ewlekariyê bi cîhkirî bûn, vala kirin û ber bi bakur ve ketin rê. Wan zanîbû ku parçeyekî mezin yê çolê hîn li pêş wan e, lêbelê dîsa jî û cêb hebûn. Ew ketin ser şopa hîn xuya ya yekîneyên alîkariya lojîstîk.

Di destpêkê de pirsgirêka mezin ew bû ku wan xwe ji deverên ku şer li wan dibû, dûr bigirtana. Ger wan li pêş xwe dengên çekan an teqînê dibihîstin, rêya xwe ji ser wir dadigerandin. Wan biryar dabû ku heger ew li amerîkayan rast bihatana, wan ê yekser xwe radest bikira. Seyr bû ku ew rêya ku konvoya wan î biçûk dabû ser, vala bû. Adinî rojê nîvro qemyona yekemîn ji yên wan, bi rê de ma. Qiç-qiça germê bû, ew rawestiyan û zilam veguhestin qemyoneke din. Piştre wan ew erebe li wir hişt, lê ne bêyî ku ava radyatorê bi xwe re bibin. Pisûleyeke royê serweta wan a herî buha bûye, li devereke dûr a dirêj ku gelek caran di nava saetekê de bi tevahî diguhert.

Piştî demeke kurt qemyona duyemîn jî bi rê de ma. Vê care diviyabû wan sê zilam li dû xwe bihiştina. Beno, bi cêbê li pêşiyê diçû û di mirêka paşiyê re li erebeyan mêze dikir. Kêliya wî dît ku kerwanê tirimpêlan rawestiya, hişt ku cêb raweste û her yekê li nêzîka wî çeka xwe li dijî hevalên xwe bilind bike. Bi lezbûna tevgera wî, bi ponijîn got, bêyî peyveke din eşkere bû ku tenê nêzikbûna wan û wî heta demekê dihat wateya ku


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

destûr heye ew hîn bajon. Wan di ber dilê yên mayî de da û hêvî ji wan re çêkirin ku ew dikarin ji aliyê Amerikayiyan ve bên dîl girtin. Lêbelê ji ber qûma li dor wan ya bilind, sûda wan ji bo vê zehf hindik bû. Wî bawer dikir, got Beno, ku ji bo yên li paş man, a herî baş dê ew bûya ku ew vegeriyana qada şer, ji bo li wir bal bikêşandana ser xwe. Ev şêweyê xwe rizgarkirinê ne bê metirsî bû. Wî dê di rewşeke wisa de, ger cêba wî bi rê de mabaya, ev kiriba. Lêbelê mirov digot seyra bûyeran jî leşkerî hatibû organîzekirin, cêba serbaz ma tirimpêla ku herî dawî hîn jî saxlem bû. Konvoy, ji paş de ber bi pêş de ji hev belav bûbû. Dawîyê ew pênc kes mabûn, wan yên din li paş xwe hiştibûn. Zilaman dixwest ji bo demeke kurt serî hildin. Niha wan fam kiribû ku sûda wan a li gor yên ku wan li pişt xwe hiştibûn, metirsa ku bibaya bela serê wan hebû. Ji ber ku niha gelek kîlometre bi nav çolê de çûbûn, şensê wan ê rizgarbûnê kêmtir bû ji yên din. Lema, got Beno, wan pisûla xwestibûne, ku bi rastî jî yeke tenê hebû. Çi nemabû ku şerekî bi teqîn pêk bihata. Pênc ciwan bûne, got Beno, divê mirov vê fam bike. Çi jî bû wan xwarin û av bi wan re par vedikir ku dikarîbû xeteyek baya û soz didan wan ku alîkariyê bişînin, kengî ku ew pêrgî yekîneyên welêt bibûna.

“Tu zanî”, got Beno, “tiştê herî bêtir ez şaşwaz kirim, ew bû ku kar dikir: Min av û xwarin heta dawiyê belav dikir, tenê ji bo yekê, ji ber ku min ew kiryar mafê xwe didît. Wan hemûyan serî tewand û tu tişt êdî li pişt min nemabû. Li pişt min tenê qûma ku dimeşiya hebû. Tu tê digihîjî, yekî dikarîbû rahişta çeka xwe û yê din bikuşta. Ji ber ku em pênc kes bûn, ev dikarîbû bihata wateya cezayê mirina me.” Qaçaxçî ji nişkê ve pişterast bû ku tiştekî wisa ji Beno dihat. Û eşkere bû ku wî dixwest vê hizrê ji bo wî îma bike.

Beno xortê Şîe li nêzîka xwe hişt, ji ber ku ew tenê bi wî re diaxivî. Wî hişt ku ew bibin mîna yekîneyekê, ango serê konvoya yên mayî pêkbînin. Li paş mêzên hebû û ya rastî


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

hizreke bê wate bû ku ew heta bi gundên li dawiya çolê biçûna, ew zilam karîba bêtir ji hersiyên din bi kêrî wî bihata. Ew her sê jî mîna wî ji Bakur bûn.

Ew bê vir de wê de bi rê ketin, bêyî ku bala xwe bidin cûreyê qûmê. Jê pê ve zanîn, dem û hêza wan tune bû. Dîsa jî cêb bi rê de nema. Ew çû heta ku benzîna wan qediya. Piştre rêwîtiyê peya dom kir. Wan her tişt li dû xwe hişt, ji hin paşxwanên xwarinê, çekên xwe û pisûlayê pê ve. Gava ku şeva din dest pê kir, wan xwe li derve bi ser hev de piçikandin. Pêxistina agirekî ne gengaz bû, ji ber ku helîkopterên Amerîkayiyan ku diviya wan hîn jî di her kêliyê de hesabê wan bikira, bi aletên ji bo germê hessas bûn dagirtî bûn. Hereşe bû bê bi çi lezê dikarîbûn bihatan ser wan. Beno ev gelek caran jiyabû.

“Bi dengê nizm û bi lez mîna buokan”, got Beno. Ji wê jî xerabtir ew bû ku kesên di van helîkopteran de bûn, wek ku wî digot, xurû ji kujeran pêk dihatin, bi taybetî jî ku ew bi şev bi rê de bûn. “Tu dizanî bê ez çi bawer dikim”, got Beno, “ev ji cûreyê ekranê tê ku di makîneyên wan de bûn -lema ger tiştekî xwe bilivanda, ji bo wan dijwar bû ku gulebaran nekin. Piştre min carekê wêneyên Amerîkayiyan ji sefereke wisa ya şevê dîtin. Em ji wan ve mîna heywanên spî ku zehf hêdî tevdigeriyan xuya dibûn. Wan nikarîbû wisa bi hêsanî bera rexekî bida. Çi baş bû ku min ev wê şevê nizanîbû.”

Wan çend terîş û betaniyên ku hebûn li xwe gerandin û li hêviya sibehê man. Ji bo rewşeke ku helîkopter derkevin, li hev kiribûn ku ew yekser xwe bixin nav qûma sar. Piştî demeke kurt, hewldana wan a ku di xewê re biçin bi ser neketibû. Neparastî, ew li ser erda reng tarî ramedandî bûn.

“Hesteke wisa bi me re hebû ku qûm me ber bi berjor ve bilind bike. Mirov nikare di xew re here, ger mirov bawer bike ku ji tarîtiyê ve mirov xuya dike. Jê pê ve guhên me li ser dengên herî hûr bûn. Tu dizanî, nayê deyaxkirin, ger tu di sermayê de nifiran li germahiya bedena xwe bikî.”


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

Ji wê kêliya ku wan xwe ramdandibû ve tirsa wan a ji helîkopteran êdî bi rastî jî xwe da hestkirin. Bi zorê radibûn ser xwe û tavilê dîsa diketin cihê xwe, ji bo ku qet nebe tiştekî li dijî êrîşa ku dikarîbû bihata ser wan bikin. Piştî xwe bi cîh kirin êdî wan tenê mil û serê hev didîtin, ger qet tiştek nas dikirin. Qûm ewqas sar bû ku mirov digot qey ew tevahiya germa bedena wan dimêt. Mîna kurmê li ber mirinê, xwe dixistin nav qûmê, di ser wan re stêrên ku dilerizîn vêketî bûn, mîna alavên çirayên li dûr ên hinekên ku li tiştekî digeriyan. Wan hew bedena xwe hest dikir û ligel vê jî ew têra ku guhertinên di tarîtiyên de pêk bihatana ferq bikirna, şiyar bûn. Niha bi rastî qûmê hema hema ew daqurtandibûn, lê dîsa jî tiştekî ji wê bi metirsîtir hebû. Belkî jî tenê wisa bi hereşe bû, ji ber ku ev demeke dirêj bû ew li hêviyê bûn.

Dema ku êdî dunya ronî bûbû, bi wan dijwar dihat ku ji qulên xwe derkevin. Ew ne şiyar bûn ne jî westiyayî bûn, bedenên wan li gel jandanê jî ku pê xwe ji nav qûmê rizgar dikirin, hew diliviyan mîna ku cemed girtibin. Kesekî peyvek jî nedigot, lêbelê hemû jî ji şeva bê ditirsiyan. Beno got, wê sibehê wî biryar da ku hew navberê bide heta ku ew bê hiş bikeve û piştre jî bi çarpiyan biçe, tenê ji bo ku ew careke din wisa bê tevger nemîne.

Di destpêkê de ev germa ku her diçû bilind dibû xweş bû û mirov jîndar dikir, lêbelê piştî saetekê wan ewqas xwêdan da ku gêj bûn. Piştî ku dawiya ava giravî jî hat, kêliya ku her tişt ber bi wê ve diçû hat: Ji hev belavbûn, û ev bêyî ku bê ferqkirin pêk hat. Bêyî ku ew bibêje hemûyan zanîbû ku niha divê herkes ji bo xwe bi tenê tekoşînê bide, gav bi gav. Kî li paş bima, ew nema hebû. Hêviya wan a dawîyê, got Beno, di nezaniya wan de bû, bê ew bi cêbê çiqasî rê hatibûn.

Pergala bilind hişt ku dawiyê bi rastî jî Beno û yê Şîe tenê li ba hev bûn. Wer xuya bû ku tiştekî ew bi hev ve girêdidan, wek ku diviyabû bermaya herî dawî ya yekitiya destpêkê qet ji hev


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

neketa. Ew dimeşiyan, hêdî hêdî û her carê li ser heman astê bi çarpiyan diçûn, lêbelê bi navbaraka ji deh metreyan. Tenê van deh metreya ji bo bişkivînê derfet didan. Bi vî awayî her yekî ji wan tekoşîna xwe dida, di heman demê de, li ber çavên hev bûn. Ji herduyan ve diyar bû ku niha diviyabû ew bimeşin, heta ku ew karibin. Lêbelê sînorê vê meşê ne xaleke diyar bû ku ew di ber re biçûna û li ser ser erdê ramedandî bimana, belkû rewşeke ku mirov diketê ji bo ku mirov bimeşe, bêyî ku mirov bimeşe.

Hesta yekemîn a ku ev rewş guhert, qûma bû ku di bin potînên wan de, xwe diguhert. Ew hişktir dibû, perçeyên keviran pêkdianîn û tije zuxurên spî yên bi meznahiya nênûkên tiliyan bûn. Bi şêweyekî ecêb ev qûm bi wan nas dihat, niha êdî wan ferq dikir, bê ya din çiqasî bi wan xerîb bû. Ev erdê bi rengên vekirî bû, motîvasyona wan a dawîn. Tenê bi çavekî vekirî ew li rasteqînê vegeriyabûn, wisa digot Beno, û li ber vî çavî bi rastî jî gundek xuya bûbû. Ew gihabûn xanîkên destpêkê û ji aliyên şêniyên wî û înzîbatekî ve hatibûn pêşwazîkirin.

Zilamî berê çeka xwe dabû wan û li rûyên wan mêze dikir û divê hizra pêşî ya ku hat wî ev bû: Firariya leşkeriyê! Zilamekî bejindirêj î bi rîh, heskeke av da wan, mîna ku şorba germ be. Li gel rehetiyeke ku hema hema mîna pûçbûnekê bû Beno, metirsiya ew tê de bûn nas kir. Tavilê zor da xwe ku li wê gorê tevbigere. Di rastiya xwe de, yê înzîbat mafdar bû, lema hîn di kêliya wî av vedixwar de, Beno ji bo rêyeke çareseriyê diponijî. Kêliya ku ew qediya, hemû hêzên xwe dan ser hev, xwe rast kir, li pêş yê din rawestiya û bi qasî ku hîn jê dihat bi ser wî de kir birebir. Peyvên despêkê helkehelk bûn, piştre dengê wî bêtir bû. Bi wê baweriyê ku wê zimanê wî li hemû tiştên ew bibêje bigere, dest bi çîrokeke çêkirî kir, behsa êrîşeke bi gelek miriyan kir û got ku biryara xwepaşdevekişandinê hatiye dan, bi şêweyekî kambax, ji wan pê ve hemû hevalên wan hatine kuştin. Wî xwe bi çîroka xwe re bera da, bi hêsiran re xwe vir


Ücretsiz PDF Kitap Arşivi - https://rantey.org

de wê de da ku bi şêweyekî bedena wî diliviya û çavên xwe li ser geşbûna tirsa li ser rûyê yê din ku wekî din mîna yê zarokekî bû, neda alî. Di dawiyê de ew du kesên dawî bûn ku ji şerekî ku qet pêknehatibû mabûn.

Leşkerê înzîbat êdî çeka xwe danîbû û çi neba ku lêborînê bixwaze. Hesabê Beno li hev derketibû; wî zilamî jî qet hay ji tiştên li eniya şer dibûn tune bû. Ev gelek rojbûn ku nûçeya yekemîn wan herduyan jê re anîbû. Ji bawerkirina ji Beno pê ve tiştek di destê wî de tune bû.

Piştî hemû tiştan şêniyên gund ew mîna kurên xwe yên wendabûyî pêşwazî kirin. Xwarin û av dan wan û wan çend saetekî bêhna xwe vedan. Lêbelê pirsgirêka wan pê nehatibû çareserkirin. Di kêliyeke ku bala kesekî ne li ser wan bû, li ber xanîkê ku ew lê diman Beno, yê Şîe xewle kir û jê re rewş got: Ew herdu tenê dizanin ku tevahiya eniya şer ji hev belav dibe. Amerîkî dikarîbûn di her kêliyê de bighîştina wir. Ev dihat wê wateyê ku diviyabû ew herdu rêya xwe dom bikin û heta ku gengaz be ber bi aliyê bakur ve biçin, ji ber ku dibû ku meşa ber bi pêş de li devereke li pişt sînor bê rawestandin. Ger ew naxwaze, bê kuştin an jî dîl bikeve, ev rê tenê heye, wisa jê re got Beno.

Xortê ciwan şaşwaz mabû. Berî bi kêliyekê hîn kêfa rizgarbûna wan lê bû, niha xwe li ser doşeka pûş li pêşber xanîk dirêj kir û destên xwe danîn ber rûyê xwe. Wî nedixwest dom bike û Beno zanîbû ku wî her tiştên gengaz ji bo wî kiribûn.

Wisa wî dest bi amadekariya reva xwe kir. Pêşî bi leşkerê înzîbat re axivî û jê re got, bê seba çi divê niha yekser biçe bo Bakurî. Ew anî wê rewşê ku biçe li tirimpêlekê bigere. Lêbelê piştî çend xulekan eşkere bû ku alaveke tenê ya ku niha tavilê karîbû ew bibirna hebû, ew jî qantirek bû. Ew bi lez ji xwediyê wê hat standin û Beno yekser bi rê ket.

Ecêb bû ku heywan di bin wî de hêdî hêdî bi rê de diçû. Wî çavên xwe li leşkeran digerand, lê wer xuya bû ku derdor ji mirovan vikî vala bû.

“Hizrên herî girîng dawiyê hatin bîra min. Bê çawa xuya dike, ger leşkerekî bi ûnîformên gemarî li ser qantirekê be. Kê ez bidîtima dê ez mîna firarê leşkeriyê bi nav bikirama. Û ku Amerîkanî bighîştina min, ez ji bo wan yekî neyar bûm.”

Ango ew êdî hew tenê li tirimpêlekê geriyabûye, lêbelê wî rêbaza xwe guherand: ger ew bi kincên sîvîl bi rê de bûya, wî dikarîbû dem bi dest bixista. Ew li dor du saetan bi qantirê çû. Ewqas jî diviyabû dom bikira, heta ku ew gihîşt gundê herî nêzîk, devera ku diviyabû wî qantir radest bikira. Ji dêvla wê ve ew hîn li ser rêyeke gundan bûye ku hema hema hew xuya dikir, di navenda xirbeyên ku ji hev nedihatin derxistin ên ku mîna telaşên hestiyan ên qerase xuya dikirin. Ji dûr de giregira balafiran dihat. Di nava dûya di ser berîya bê binî re ku ne qelaç ne jî çol bû, şivanekî ciwan mîna qasidê dewraneke din ku ji zû de hatibû jibîrkirin virde wêde diçû û dihat. Beno ji bo kêliyekê bê deng ma.

“Min nikarîbû bawer bikira”, wî piştre got. “Gundiyên li gundê li ser sînor hîn jî ditirsiyan û hema hema peyvek jî nedigotin. Lêbelê piştî çend kîlometreyan ber bi nav erdan de her tişt mîna ku tu tişt pêk nehatibe xuya dikir. Tu dizanî, piçekî din ber bi başûr ve min dikarîbû bidîta, bê çawa yek ji van bobeyên nû yên ku dipijiqin qemyoneke di nava ne ji saniyekê bêtir wisa qulqulî kir ku ew bi ser hev ve kumişî, te ê bigota ew li ber çavê min heliya. Û li vir ew ciwan virde wêde diçû û dihat û kevirên biçûk davêtin nav qûmê. Bi rastî jî ez lê hêrs bûbûm.”

Ew rawestiya, xwe ji ser qantirê avêt û çû nêçîra wî xortî. Ger bi ya wî biba wî dê ew xort ji paşt ve zeft bikira û bêbandor bikira, lêbelê ji bo vê erda deverê nedibû alîkar. Wî xwe quloz kir û heta jê hat xwe nêzîkî wî kir. Lingên wî di tulmekî nerm de çikiyan: Mîhan tevgera ji nişkê ve ferq kirin, lema mîna nîvxelekê pêk anîn. Beno tavilê destê xwe rakir û hewl da ku bibişire. Xortî ecêbmayî li wî mêze kir. Ne bi peyvan ne jî bi

îşaretên din dihiştin ku ew tev bilive. Wer xuya bû ku tivingê jî ew neditirsand; li wir rawestiyabû û dipa. Piştî ku Beno du caran jê re got bê wî çi dixwest, xort ji nişkê ve berê xwe jê guhert û bazda. Beno tiving avêt ser erdê û di çiv û çivanokan re li ser erda rast da dû wî. Ji hêz ketî, wek ku ew wisa bû, demeke dirêj jê re pêwîst bû heta wî xwe gihand ê xort. Wî ew xort avêt nav qûmê û destên xwe xistin qirika wî. Ji ber ku bi rastî nedixwest wî bifetisîne, nikarîbû ew zeft bikira, dema ku yê xort ji qasê ku dihat pê bêtir di ber xwe dida. Mîna kerekî, Beno avêt aliyekî, çend metreyan di nav qûmê re bi çarpêyan çû û rabû ser xwe. Beno, dîsa xwe gihandê û bi milên xwe, xwe li pişta wî xist. Niha xort bi ser zikê xwe ve ketibû û vê mîna keyseke guncav xuya dikir. Beno, çongên xwe dan ser pişta wî û pê re axivî. Jê re got ku ji kincên wî pê ve tu tiştê din jê naxwaze, jê pê ve dê tu tiştê din pêk neyê, ger ew tevnegere. Wî pêşî milê çepê piştre yê rastê yê xortê bin xwe tazî kir, çakêt jê kir û avêt rexekî. Ji bo şal diviyabû ew wî bizivirîne. Kêliya wî ev dikir, gewdê xortî destpê kir ku bi hêz bilerize, mîna ku tiştekî di bin wan de tevbigere.

"Mîna erdhejekê bû. Her tiştê wî kil dibû, deverek ku ez karibim zeft pê bigirim tune bû. Ez dibêjim ew mîna tayekê bû, ji kelecanê. Çavên wî bi tevahî şaşomaşo bûbûn."

Ew li ser şal hûr bûbû, dawîyê wî tenê şeqên şalî zeft girt û ew kişandin ber bi xwe de, di kêliya ku xortî xwe li hev digerand mîna yekî li ber mirinê be.

"Kêliya min dît ku ew di bin şal de tazî bû, dilê min hingê bêtir pê şewitî. Lê pêdiviya min bi kincan hebû. Min ê ji bo wan potikên wî, ew bikuşta. Tu karî tiştekî wisa bihizirî, ji bo kincên ku wisa teng bûn, min digot wextî ji her dirûna wan ez biteqim. Ez neçar bûm ku ez di wî şalî de wisa bi şeqên ji hev vekirî, bimeşim mîna teyrekî qerase. Û gava ez vegeriyam, qantir ji wir çûbû. Di wê kêliyê de min nifir li çarenûsa xwe kirin. Li wê devera xirîxalî bi tena serê xwe, li dor pêncî gavî

ciwanê şêt dûr bû. Dema min xwest ez rûnêm, şal ji paş ve çiriya. Min ji bazdana bi du qantir û pê ve nikarîbû tiştekî din bikira. Di wê kêliyê de hestek bi min re hebû ku wî xortî daye dû min mîna kêliya berî wê helîkopteran."

Dawiya dawî wî karîbû xwe bigehanda qantirî. Qantir rasterast çûbû, lêbelê rêya di ser rê re çûbû ku piştî saetekê eşkere bû tirimpêl tê re çûbûn. Beno heywan li rex rêyê hişt û bi malbateke ku bi tirimpêla xwe direvî re, ber bi bakur ve çû. Şeş hefteyan dom kir heta wî xwe gihand bajarê xwe û bi rastî jî ew bi serketî di hemû kotrolên leşkerî re derbas bû, ji ber ku wî xwe mîna feqîrekî derbider dida naskirin. Dema ew gihişt cihê xwe, şer ji mêj de bi dawî bibû.

Darên xurman yên pêşî yên li derdora paytextî xuya bûn. Demek ketibû navberê ku Beno, êdî hew diaxivî. Wer xuya bû bala wî li ser rêyê bû, ligel ku tiştek li ser wê nedihat dîtin jî. Qaçaxçî, wek tedbîr jê re behs nekir ku ew piştî şer gelek caran hatibû vir. Bêguman ji mêj ve tu wateya vê nemabû, ji ber ku bi gumaneke mezin Beno ji xwe ew niha zanîbû. rêya gundan di nava daran de bûbû pîsteke bi tulm ku diçû bin xirbeyên pireke otobanê. Li wan deran tu kes nexuya bûn, tenê du mirîşk di ber tirimpêlê re derbas bûn. Dîsa jî Qaçaxçî, li pêş pirê mîna her carê rawestiya -bi derengî dê vê ew bida dest. Wî hişt ku motor bişixule, ji bo dengê wî biçe hinekan, newêrîbû li qornayê bixista. Li bin pirê, gilêş kom bûbû ku li dor stûnên gewr mîna giran hatibû ser hev. Pê qula derziyê pêk hatibû; rê niha hîn vala bû, lêbelê ji bo çavan zehf teng xuya dikir û kesê ji derve dihat, diviyabû wateya vê deverê bizanîbaya.

Piştî çend xulekan, zilamekî xwe nêzîk kir ku tenê ji tivinga wî xuyabû ew leşker e, diyar bû ji bo kincine leşkerî derfetên têrê nekiribûn. Rewşa wî ne guncav bû, ji ber ku bi vî awayî pileya wî nedihat dîtin û li gor wê dihat destnîşankirin bê mafê wî û çiqas pereyî hebû. Belkî jî ev bû nêta ku nexuya bû.

Qaçaxçî ji ber hebûna Beno aram bû, biryara xwe da ku girêkeke ji bo yên bi pileya nizm bidêyê. Li gor rewşa zilêmî ew nikarîbû tiştekî din bihizirya. Zilam qelew û bêhnteng bû, wek ku ew wisa bû, bi kefa destê xwe li cama pêş ya erebeyê xist, mîna bixwaze bi vî şêweyî erebeyê bide rawestandin. Xwe bi ser pacê de xwar nekir. Tiştê yekemîn ku ji xwe derxist, daxwaza ku divê motor bê tefandin bû. Piştre hişt ku Qaçaxçî peya bibe. Ji dêvla wî jo tiştekî kontrol bike, paşê xwe dayê û kir firefir. Qaçaxçî li cihê xwe rawestiyayî ma.

Di kêliya ku li dor xwe mêze dikir de, di nav komeke gilêş de, livînek ferq kir. Piştî bi çend saniyan, zilamekî kal î zirav î mîna bûkeke lîskê ji nav gilêş xwe kaş kir derket ku li ser erdê xwe bi ser hev de piçikand û ma û çonga xwe ya rengtarî ya mîna zîlana deriyekî ji tiştekî mezeloqî paqij dikir. Ji bo vê yekê tif destê xwe nedikir, lêbelê hewl dida ku tifa xwe li wê çonga xwe rast bîne, lê ew pê bi ser nediket. Qijik li dor wî kom dibûn û her ku wî tif dikir wan baskên xwe li hev dixistin. Dengekî bala Qaçaxçî ji ser zilamê kal bir. Li jor, nêzîkî qiraxa pirê ya şikestî ku bitirs berjêr ve daliqiyabû, zilamekî din rawestiyabû, tivinga wî xwar li ser milê wî bû. Li ber şewqa dijber ew tarî mîna siyekê xuya bû. Xuya nedikir bê ew li wê jorê çi dike. Gelo li devereke dûr mêze dikir an li berjêr- Qaçaxçî nedixwest ku sedemekî ku ew xwe neçar bibîne tiştekî bike, lema Qaçaxçî tavilê awîrên xwe dîsa berjêr kirin. Zilamê kal çûbû, tu şop li dû wî nemabûn, qijik jî li ser erda gewr î sipî li her derê mîna hev belav bûbûn.

Zilamê qelew bi paş de vegeriya, serê wî di ber wî de bû, mîna kesekî ku derketibe gerê û di ber re biponijî. Li ber Qaçaxçî rawestiya û pala xwe da baskê ser tekerê tirimpêlê.

“Tu dixwazî biçî ku?” hêdîka ber bi jêr ve pirsî û dîsa rûyê xwe yê ne kurkirî berjor ve rakir.

“Ez diçim serdana merivên xwe. Ew ne dûrî vir dimînin.”

“Meriv.” zilamî bi zor nefes da û stand.

“Erê, merivên jina min.” Qaçaxçî hewl da ku tiştekî ne ewqas girîng e û li dora xwe mêze kir û bersîvên xwe mîna ku ne girîng bin dan xuyakirin.

“Meriv li bajêr.” got zilamî bêyî giraniyeke taybet bide peyvên xwe.

“Erê...” Qaçaxçî li peyvan geriya, di wê kêliyê de mirîşk li qorziya pêş tirimpêlê zivirîn û kêliya mirov dîtin bi lez rêya xwe dadigerandin. “Ji mêj ve me hev nedîtiye.”

“Ji mêj ve me hev nedîtiye, meriv.” Wer xuya bû ku zilêm, nikarîbû awira xwe ji erdê bibiriya. Kêliyeke kurt serê xwe rakir mêze kir û serî dîsa berjêr bû.

“Erê. Meriv, ên ku ez niha dîsa dibînim.”

“Merivên li bajêr.”

“Erê.”

“Tu tiştekî ji wan re bi xwe re tînî?” Ji nişkê ve zilam bi şêweyekî jîndar li stûnên pirê ziq nerî.

Li wir tu tişt pêk nehatibû. Qaçaxçî wêrîbû careke din li nobedarê li jor binêre. Ew hîn jî mîna deqeke biçûk î reş di şînê tarî yê ezmên de rawestiyayî bû.

“Meriv, ne wisa?” Wer xuyabû, zilêm serê benê xwe wenda kiribû. Ev ferq kir û dîsa pirsî: “Tu tiştekî ji wan re bi xwe re tînî?”

“Na”, got Qaçaxçî bi bawerî.

“Lêbelê tiştek li bajêr tune ye.” Zilam piçekî mizicî.

Qaçaxçî milên xwe hildan. “Li ba me jî tu tişt tune ye.”

“Li bajêr hîn kêmtir hene.”

“Ev min nizanîbû.”, bi kurtepist got Qaçaxçî, ji bo ku şikê li ser nehêle, bê zilamî çi digot.

“Belê”, wî serê xwe bi erênî eşkere hejand, “li bajêr hindiktir tişt hene.”

“Erê”, got Qaçaxçî û wî jî serê xwe bi erênî hejand.

“Hindiktir ji wê devera tu jê tê.”

“Belê, wisa xuya ye.”

“Eynî wisa ye.” Zilamî heja serê xwe bi erênî dom kir. “Tu li bajêr li çi digerî?”

“Tenê serdana merivên xwe.”

“Ma te ji zû de ew nedîtine.”

“Erê.”

“Ji kengî ve?”

Qaçaxçî kêliyeke kurt poniji. Li jor li ser pirê zilam wisa rep rawestiyabû, mirov bawer dikir ku xapandineke optîk e.

“Ji cergî şerî ve.”

“Ev ne ji zû de ye”, got zilam û bi rûyekî li ken mêze kir.

“Na, lê divê ez mêze bikim, ka bê çi ji wan derketiye.” Qaçaxçî zanîbû, ku girîng e, li ba her tiştê ku wî gotibû bimîne, lema hişt zelal bê dîtin. Yê din hewl nedida ku tiştekî seh bike. Îşareteke guncav bû. Li gor tiştê xuyabû gengaz bû ku tenê ew aciz bûye.

“Bi esehî tiştek bi merivên te nehatiye.”

Qaçaxçî bişirî. “Ez hêvî dikim.”

“Berê mirov karîbû telefon bikira.”

“Belê, berê.”

“Îro na.”

“Na.”

Zilam xwe ji tirimpêlê qetand û çû pêşber radyatorê. Ev mîna îşaretekê pejirand qaçaxçî. Ya girîng ew bû ku berê bûyerê ber bi aliyekî ve bihata dan, bêyî bal bihata kişandin. Diviyabû her tişt herikbar bimaya, ji ber ku tenê wisa mîna ku ji derveyî herduyan be xuya dikir, mîna tiştekî pêkhatî, tiştekî pêwîst.

Da dû zilêm û ji wî derbas bû. Di kêliya ku wî di cama pêşiyê re li zilamê tenişta şifêr mêze dikir, Qaçaxçî hişt ku Beno pacê veke. Piştre wî desteyeke ji pereyên di çavika tirimpêlê de derxist û dîsa çû pêşiyê ba zilamî ku pere bêyî eleqeyeke mezin ji destê wî girt.

“Gelo henûn in, merivên te?”

“Erê çawa”, got Qaçaxçî û tev li deriyê ku bi destê xwe girtibû şipyayî ma.

“Kesin henûn.”

“Erê.”

“Wê tu tişt bi wan nehatibe.”

“Ez hêvî dikim.”

“Êdî bajo, here ba merivên xwe.” Zilam bê sedem bêhntengî bû, lêbelê ew mîna yekî serxweş dikeniya.

Qaçaxçî ecele dikir, ji bo ku siwar bibê û motor bişuxulîne. Bi wî nexweş bû ku neçar mabû her tiştî li ber çavên Beno bike. Çaviya berdestê wî hîn jî vekirî bû. Wî xwe ber bi wê de xwar kir û ew girt, piştre ew li gor desthejandina zilamên li derve tevgeriya. Hîngê di hişê wî re derbas bû bê ew çiqas ne şareza bû ku nikarîbû kiryarên xwe ji Beno veşêre. Beno, tenê li cihê xwe bêdeng rûniştibû û li bende mabû, hemû sir li ber çavên wî eşkere dibûn. Bi leza miroveki peya tirimpêl gihişt zilêm. Li rex nigên pirê û komên gilêşê wî dîsa xwe da ber paceyê.

“Birayên te hene?”

Qaçaxçî tavilê pêl li firên kir û tirimpêl rawestand. “Na, tenê xwişkên min hene.”

“Ew jî li bajêr dimînin?”

“Na, ew li bajarên din dijîn, li Bakur dimînin.”

“Ew xweşik in?”

Ev pirsyar bi Qaçaxçî ewqas nexweş hat ku wî nikarîbû ew bibersivanda. Wî tenê badoka tirimpêlê didît û bi zor nefes dida û distand. Beno bê deng bû. Zilamê di pacê de ji kêfan dikir hîqehîq, dîsa bi kefa destê xwe li tirimpêlê xist, çend gavan bi paş de meşiya û tivinga xwe avêt piyê xwe. Qaçaxçî bi hemd ajot û hêdîka di ser kevanê pira neqediyayî re derbas bû.

Bajar hat bîra wî bê hîngê çawa bû, tarî û mîna ku ji dûmana di ser xwe re bi ser hev de hatibe pelixandin. Li her derê agirê

vêketî xuya dikir, li rex rêyan, di hewşan de û li bin darên xurmeyan. Ji her demê bêtir mirov derdiketin ser kolanên bê ronahî. Reşên wan mîna reşikên şevê di nav alavên êgir de xuya dibûn û taritî li ser qadên bajêr î ku dîsa jî mîna sêwîmayî xuya dikirin bû. Ajotina tirimpêlê ne hêsan bû, ji ber ku bi tefandina şewqê re sînorê di nav rêyên tirimpêlan û rêyên peyan jî ji holê rabûbûn. Piraniya mirovan li pêşber dikanên nava bajêr li hev kom bûbûn. Di wan dikanan de niha lempeyên gazê vêketî bûn, bahreke ji şewqên mîna deqekê yên li dor her yekê ji wan malikeke ji rengê pirtiqalî hebû. Li her derê li nav lingên peyan kuçik belav bûbûn. Wer xuya bû ku hemû deriyên bajêr hatibûn vekirin.

Bombe û guleyên topan ên ku rasterast li derekê ketibûn mirov hema hema hew karîbû ew bidîta. Ji ber ecêba ku gelek gule bi taybetî yên bombeyên ku bi xwe dipeqiyan li armanca xwe neketibûn, li gelek cîhan şopên teqînê hebûn ku kûr bi erdê de çûbûn û li her deverê ser wan, asfalt, xanî yan jî dar rakiribûn an jî ji erdê qetiyabûn.

Wê êvarê, kêliya ew bi Beno re gihişt bazarê, bayekî gûr rabû. Serê darên xurmeyan li hev diketin, çadiran dikirin reqereq û perçeyên kincan li kuçan li ba dibûn. Piştî pergala avê têk çûbû, li van kuçan bîdonên kevn ên gemarî ji bo avê rêzkirî bûn. Qaçaxçî, li dor bazarê geriya û li hêviya îşareteke Beno ma, ku dê dawî li rêwitiya wan a hevbeş bianiya. Lêbelê Beno xwe ber bi pêş de xûz kiribû û li esmên dinerî.

“Tu teyrên pir dibînî? Ez dixwazim bizanibim bê seba çi niha li vir kom dibin.”

Di ser dîwarên xaniyan ên tarî û darên mîna di esmanê tarî de çikandî xuya dikirin re qijikên ku hîn jî bi zorê dihatin dîtin mîna birrên masiyan bi rêz derbas dibûn. Qaçaxçî dîsa berê tirimpêlê da kolaneke teng. Alayeke mezin li ser dergehê daîreyekê xwe wisa li stûnê gerandibû ku tenê hîn qorziyeke tûj diperpitî.

“Teyr”, Beno peyva xwe dom kir, “baş dizanin, bê ew kengî dîsa dikarin bifirin. Ew dipên, derfetekê dibînin û piştre wê ji xwe re bikartînin. Ma tu dibêjî ne wisa ye?”

Qaçaxçî, serê xwe bi erênî hejand û ji dil hêvî dikir ku Beno dawî li çavdêriyên xwe bîne. Ya herî xerab dê ew ba ku Beno dixwest bibîne ka ew diçe ku û zor didayê ku ew sebir bike, ji ber wî ferq kiribû ku Qaçaxçî, ji biderengxistina gihîştina paytext pê ve tiştekî din nedikir. Ew bê çare bû, ji ber ku diviya bû êdî armancekê bibîne yan jî bi Beno bide hestkirin ku ew dixwaze xwe jê xelas bike.

Ji nişka ve Beno, destê xwe bilind kir û îşaretek dayê ku ew raweste. Wî destê xwe danî ser eniya xwe û wer xuya bû ku diponijî, bi destê din êdî wî derî vekiribû, lêbelê ew zeft girtibû.

“Bila di nav me de bimîne”, bi dengê hêdî got, “û ku bi te re ne têkildar be jî: Min ji hinekan bihîst ku karekî zehf bi metirsî -mirov dikare wisa bibêje?- dikin. Bi metirsî ye bê ew çawa pereyan bidest dixin. Hîn jî bi xerabtir e, bê ew çi bi wan pereyan dikin.” Wî bi kurtahî li nava çavên Qaçaxçî nerî û berê xwe dîsa jê guherî. “Yasa zû tên guhertin li vî welatî, û wisa jî tiştên bi pereyan ve têkildar in, vê dawiyê guhertinek pêk hat. Tu dizanî, kesên ku ez behsa wan dikim, ne ji bo pereyê bêkir ê ku li vir heye xwe dixin nav metirsiyê. Ew diçin bazara reş û bi dolaran diguherin. Ji bo van çend dolaran -tu dikarî belkî wan bijmêrî- niha dest, destên tima tê jêkirin. Ji bo meblaxên mezin mirin heye. Ez vêya ji te re dibêjim, ji bo tu zanibî, bê kî di kîjan metirsiyê de ye ku ew bê vir.” Wî derî bi dahf vekir, çend peyvên xatirxwestinê gotin û daket.

Qaçaxçî destê xwe hîn rakir, lêbelê zilamê qamqut bi lez zivirîbû û ketibû kolanê di nav ciwanan û zilamên kal de diçû heta ji ber çavan wenda bû.

Qaçaxçî tirmpêla xwe ajot û li ser tiştên ku hatibûn gotin ponijî. Wî hîn tiştek li ser cezayên nû nizanîbû. Tam di wir de bû îqazkirina birastî, hîngê hizirî Qaçaxcî, lê wî ev jî ji xwe pirsî: Ji çi, bi esehî?

# 5

Tahta pala çiyê bi devereke mîna dikekê diqediya. Piştî wir bi dawî dibû, dîsa erdeke bi girên bi giha detspê dikir ku ji darên hêvristê pêk dihat. Dar li hev geriyabûn û şaxên wan bi şêweyekî seyr tewyayî di valahiyê de xwe davêtin nav hev. Li paş daran rê di kaşekî tije kevir re berjor ve diçû. Wî kaşî destpêka çiyan a bi rastî destnîşan dikir ku taht mîna lîstikeke destpêkê bû. Xaçerêk diçû ser şivîleyekê ne ewqas bilind ku heta ber qereqola ser sînor diçû.

Qaçaxçî, li derdora xwe nerî, lêbelê pêjna tu mirovan nekir. Vê hişt hema hema ew li wan dengên êvareke berî vê bikeve gumanê. Ew piştrast bû ku xwediyên wî dengî, ger wî birastî jî ew bihîstibû, diviya li devereke nêzîkî daran bûna. Li aliyê rojava erdê bi mayîn dadiket heta ber çem, li gel ku li aliyê rojhilat erdekî mayînkirî nehatibû destnîşankirin jî kesek nediçû li wir nedigeriya, ji ber ku wir ne ewle bû. Tiştê jê nedihat bawerkirin ew bû ku li wir mayîn qet nehatibûn danîn. Mirov dikare bibêje, deverên bi fermî wek erdê mayînkirî hatibûn destnîşankirin ên herî kêm bi metirsî bûn. Lêbelê bi taybetî herêmeke mîna ya li rojhilat wek devereke ku divê mirov qet nekeve nav dihat dîtin, mirov nikarîbû xwe nêzîkî wir jî bikira, ji ber ku kesî nizanîbû, bê wê bi rastî ji ku dest pê dikir. Li gor vê tenê ew navbera ku Qaçaxçî li ser tev digeriya dima, ne ji ber ku ew ji mayînan hatibû pak kirin, lêbelê ji ber

ku hema ji xwe ew li wir bû; valahiyeke nenaskirî ya di nav deverên qedexekirî yên plankirî-bêplan de ku dikarîbû beşekî ji bo jiyanê ba, nîşaneke ku nikarîbû bihata xwendin ji bo bûyarên hingê yên di dema şer de. Belkî demekê wateyeke vê navberê hebû, lêbelê niha ji şopa ku ew di ser re diçû pê ve ne tu tişt bû.

Ravekirina vî tiştî, hîn ji zilamê Ewropî yê ku sibehekê li bajêr bang wî kiribû, pê dijwar hatibû. Ew zilamekî ciwan î di hedê xwe de bû. Wer xuya bû hurmeta wî ji Qaçaxçiyê bi temenê xwe jê meztir re hebû. Di çadireke mezin de ku rêxistina wî ya hûmanîter, berî bi çend hefteyan li wir vekiribû de, wî kursiyek û çixare pêşkêşî Qaçaxçî kirin. Bi serê xwe yê rûtkurkirî, rengvekirî mîna ku ard bi ser de hatibe reşandin, di kêliya ku hîn ew li hêviya wergêr bûn, li pêşber Qaçaxçî rawestiyabû û dibişirî. Li dîwaran wêneyên birînên bi mayînan daliqandî bûn; wan şeqên perçebûyî û binzikên mîna seradê qulkirî rêdidan. Ew alavên perwerdekirinê yên ji bo dersên bijîşkî yên ji kesên di wî warî de bûn. Zilamê Ewropî hişt ku Qaçaxçî, li ser nexşeyê devera erdê mayînkirî nîşan bike. Lêbelê piştî wî li xetên pênûsa risas mêze kir ku bi wan Qaçaxçî ji xaçirêka xwe pê ve heta jê hatibû destnişan kiribû, zilamê Ewropî bi şikbarî serê xwe hejand.

“Ew deverên tu xêz dikî, tu wateyê nadin”, hişt ku wergêr bibêje. “Li gor te kengî xaçerêka te pêk hatiye? Tevahiya wî erdî divê mîna hev mayînkirî be.”

Lêbelê ew navber hebû û Qaçaxçî hişt ji zilamê Ewropî re bê gotin ku li gor hizra wî gelek ji van xaçerêkan hene û divê mirov li wan bigere. Wî ew peyv gotin ji bo tanekê li mêrik bixîne. Lêbelê hizra yê Ewropî tiştekî din bû. Wî dixwest ku heger komendoya mayînpaqijkirinê bihata amadekirin Qaçaxçî, xwe bixe xizmeta wan. Qaçaxçî ev red kir. Wî her tiştê ku zanîbû li ser nexşeyê destnîşan kiribû, lêbelê tenê, ji ber ku ew piştrast bû ku ev Ewropî dê tu carî ji sedî sed xwe nespêrin

zanyariyên wî. Zilam endamê komekê bû, mîna ku niha gelek caran tê şandin. Komên Awusturyayî jî hebûn. Wan karê xwe li gor planên birêkûpêk pêk dianîn, ji yên ji deverê zef cûdatir bûn. Di nav yên Awusturyayî de hinên wisa hebûn ku mayîn ne diteqandin, lêbelê ew ji bin erdê derdixistin û ji hev vedikirin, ji bo ku barûta wan dîsa bikarbînin. Yekî ji wan ku berî bi salan Qaçaxçî çûbû ba wî, ji bo ku rakirina mayînan jê re bibêje, ji wî re vegotibû, ka çawa koma Ewropayiyan hatibû gundê wî ji bo ku gundiyan di derbarê cûreyên mayînan de agahdar bike. Yên ku hatibûn gund, zehf şaşwaz mabûn, kêliya ku dîtibûn gundiyên wî gundî tevahiya cûreyên mayînan ên heyî baş nasdikirin û xwedî kolleksiyoneke qutîkên mayînan î vala bûn.

“Çima tu naxwazî alîkariya me bikî?” pirsî yê wergêr wisa di ber re, lema Qaçaxçî neçar ma ku bikene. Lêbelê piştî ku zilamê Ewropî gotina xwe qedand, wergêrî dom kir: “Tu nikarî tenê li xwe bihizirî. Hemû kesên li vir in dikevin ber. Te dikarîbû tiştek bikira ji bo ku herêm ewletir biba.” Wergêrî çi digot jî, bandoreke mîna senkronîzasyoneke çewt, dikir.

Qaçaxçî, ji xwe re got, bi gumaneke mezin zilamê Ewropî tiştekî nebaş li ser min dihizire, ew min mîna kesekî ku tenê li kara xwe ya ji rewşê dihizire dibîne ku hinek jê jî rast bû. Lêbelê ji bo wî pirsgirêk bi şêweyekî din xuya dibû û vê hizrê ew bi rêve dibir: Van mirovan dixwest demê bidest bixin û ev dihat wateya ku wan dixwest wî li pêş koma ku mayîn rakirana, bişandina, ji bo ku ew ji devera ku rewş cidî bû pê ve dest pê bikin. Lêbelê pûçbaweriya wî lê qedexe dikir ku di bin hoyin ji yên hertim cûdatir de, derbasî nava wê axê bibe, ango ne bi tenê û bi alavên teknîkî.

“Divê ez tenê biçim.”, wî hişt ku wergêr bibêje, “yan na ez ê nikaribim piştrast bim, ku ez li her tiştê girîng miqate bim. Jê pê ve ez her di rêyekê tenê re diçim, tu carî ne di yeke din re.”

Zilamî, bê rawest serê xwe bi neyênî dihejand û destên xwe di ser nexşeyê re dibir û dianî, mîna ku xetên pênûsa risas ji nişkê ve ew aciz dikirin. Di rastiyê de biyanî mafdar bûn, Qaçaxçî jî ev zanîbû. Di dema şer de gelek mayînên pêlkirinê ji alî hemwelatiyên wî ve li ser girên herî bilind ên welêt li derdora çeperên wan hatibûn danîn. Xaçerêkeke zirav ji bo pêdiviyan vala hatibû hiştin. Piştî şer, baranê ev mayînên sivik, hêdî hêdî li ber xwe biribûn geliyan, deverên ku niha li derdorê ne û ser wan bi axa seran hatiye girtin. Sedemê piraniya qurbaniyên sivîl ev bû. Mayîn ku zehf hêdî be jî ketin tevgerê. Ewlekariyeke misoger nikarîbû li tu derê hebaya, her tim metirsiyek ma ku mirov derbasî nav herêmê dibû, bi nexşekê jî. Qaçaxçiyê ku bawer dikir ku rêyên baş nas dike û li ser hemû guhertinên biçûk hûr dibû, li gor wan xwedî hin avantajan bû.

Lêbelê dîsa jî hizra wî hindik bawerî dida, ji ber ku herkesî zanîbû ew bi alîkariya mayînan pereyên xwe qezenc dike. Di rastiyê de ne xema wî bû. Lêbelê ew gelek caran dihat bîra wî, bê yê Ewropî bi sariyeke çawa xeyalşikestî xatir jê xwestibû. Dijwar bû ku ew îfadeya rûyê wî bê jibîrkirin. Nefreteke bêdeng ku xuya bû ne şexsî, lêbelê prensîpî bû, ji çavên wî tev li bişirîna wî ya bêhêvî dibû.

Qaçaxçî, hilkişiya ser cîhekî bilind û bala xwe da her gava xwe. Dîsa jî mîna her carê perçeyên kevirên bi hev ve di bin lingên wî de sist dibûn, ji cihê xwe dihatin dahfandin û li devereke din diman, bêyî ku guhertinek bihata dîtin. Wî ji van tiştên ku ji erdê diqetiyan, ser rûyê erdê yê livbar ku amade bû her rûxandinê dîsa serast bike, hez nedikir. Li jor, li deverekê, wisa ji xwe re got, kaniyeke bêdawî ya keviran heye ku ber jêr ve mîna di ser re here, bi ser kaş ve berjêr dirije, li gel ku ne şile ye jî. Niha wî di şeva gewr de xwe gewr didît. Bi ser tiştekî mîna ferşekî mezin yê bê binî yê xwarbûyî ve elpişî jor. Ew ferş di bin wî de dişikiya û hîmên keviran pêk dihatin. Wî hewl dida ku di ser qiraxa wan a tûj re li jor bimîne, lêbelê di erda bin wî de her

carê qelşin meztir vedibûn. Bi wî wisa dihat ku ew zehf dirêj e, têra xwe dirêj, ji bo ku dîmenê şikestî yê dor xwe bibîne û di qelşekê de wenda nebe. Wî hewl dida tiştê ku wî didît ji xwe re teswîr bikira û ew bi nav kir: Erda birçî.

Kêliya wî kaş derbas kir, wî çayira mayînkirî dît, mîna ku ser pêlikeke mezin î di çiyê de bi gihayê hatibe girtin. Tu mirov li wir nexuya bûn, ne pêwîst bû ew bi rastî jî li dor xwe mêze bike, wisa nas û ne guhertî bû vir, heta hewa wê jorê jî. Wî ji xwe pirsî, bê çawa ew hatibû ser hizreke wisa ku ew li wir ne tenê ye. Li paş xwe nerî. Darên hêvristê li ber bê hêdî hêdî dihejiyan, û li ser xaçerêka wî hîn jî minminîk xuya bûn. Dîmen dê bandoreke bêhnfirehiyê bidaya, ger li her derê, gelek deverên rût û taht derneketana pêş, mîna deverên gurî li ser çermekî. Qaçaxçî kêliyekê li ser van lekeyan hûr bû, ji xwe pirsî, bê hemû li ser hev ji erdê bi şênahî ne bêtir in. Awira wî ber bi dûr, li kaşên bi taht bi dawî dibû û ji ber ku niha pesendkirina wî pêdivî pê hebû, bi dest xistibû, ket nava aramiyeke mezin û bi kêfa xwe hêdî hêdî ji xwe re planek çêkir. Ew dê bi paş de biçûya hetanî bi ber çem û pêşî meterê xwe tije av bikira, piştre biçûya pereyê xwe ji bin erdê derxista. Wî bilindahiya royê texmîn kir, lêbelê dîsa jî tiliyên di bêrîka qapût de li saeta Quarz gerand, ne ji ber ku wî dixwest demê baş bizanibe, lêbelê ji ber ku ew saeta wî hebû.

Rewş ji guncavbûnê çêtir bû; ger ew bi kêfa xwe tevbigerya jî wî dikarî erdê bi mayîn bêyî lez derbas bikira. Lê dîsa jî gava ewran roj tarî kir, ew ji serma lerizî. Wî di ser kaş re li jêr mêze kir û ferq kir ku berê di dema ku di ser kaş re bi çarpêyan hildikşiya, tu carî xeyala ku erd biqelişe pê re çênebûbû. Wî xaçirêka xwe dît. Bawer kir ku ew kare şopa lingên xwe yek bi yek û wê devera ku taht diket devê rê, bibîne. Di hişê xwe de wî meşa xwe bi paş ve dom kir, heta ku gihîşt bajêr di ser rêyê re heta bi malê. Ew ji wê hizrê cefilî ku di eslê xwe de ev xaçerêk bi paş de tune bû, ji xeynî ku wî bida ser. Lêbelê wî dîsa jî ew

wisa zelal hest kir. Bi wî wisa dihat ku wî tenê nimûneya wê rêyê di serê xwe de hiştibû, li gel ku tiştekî mîna wê ya di rasteqînê de, wenda dibû. Li pêşberî wî welatekî ne birastî hebû. Wî xwe mîna çûkekî serî rakirî yê reş li ser kaş rûniştî dît. Ji nişka ve bi wî zehf dijwar hat ku ew careke din neçar bimîne di ser wî kaşî re hilkişe. Wî da xwe ku yekser rabe ser xwe û hêdî hêdî berjêr bibe.

Xweşbextane zû pêk hat û wî hêdî hêdî xwe aram kir. Hindik mabû bighêje dara hêvristê yekemîn, likumî. Kevirekî şayik ku di ser tevahiya kaş re heta jêr şemitîbû, li hêviya wî mabû ku lingê xwe deyne ser, ji bo ku bişemite. Li gel ku kevir giran xuya dikir jî, mîna tiştekî şimatokî şemitî. Qaçaxçî mêzêna xwe wenda kir û li ser piştê ket ser erdê. Di leza ku ew radibû ser xwe de, bi gupegupa dilê xwe re û bi awirên xwe yî li derdorê wî, tirsa xwe hest kir. Wî ji xwe re got, divê ez berî demê navberê nedimê. Wî dît bê çawa destên wî li herdu aliyên wî bi tiliyan di nav axê de çûne. Dîsa li jor mêze kir û tê gihîşt ku ew mîna her demê di bin çavdêriyê de be, tev digere. Ew ketina wî ya ji nişkê ve diviyabû bandora xwe wenda bikira, destên wî hêdî hêdî erd berdan. Piştî wê awirên wî yên li derdorê kêmtir bûn û ew daqûlbûyî rabû ser xwe, mîna ku bixwaze tiştekî veşêre. Lixwemiqatebûna wî ya ku pê çûna xwe dom kir jî tu sûd ji bo ku ew careke din nekeve, nedayê. Bi şêweyekî ji rewşê nerazî ji xwe re got, ez ji qasî divê, bêtir hêdî û bêpêjin diçim, lêbelê nikarîbû dev ji vê kiryara xwe berda jî.

Çiqas ew li rêya xwe ya dirêj a heta wir dihizirî, ewqas tirsa wî pê bê wate dihat. Ew bi pêş de çû û vegeriya, ev tiştê ku herî bêtir bal dikşand û rastiya ku ev tedbîrek ji bo ewlekariyê bû, di çavê wî de îşareta bê armanciyê, nikarîbû bihata jêbirin. Wisa bêhntengbûyî vegeriya heta ber çem, meterê heta nêvî tijî, vala kir û ew dîsa dagirt. Ev hemû bi wî zor hatin. Lîstikeke zarokan dianîn bîra wî, planê dunyayeke bê metirsî di deverek teng de. Pê jê re zelal bû ku dema ew ji vir derkeve hatiye. Ser

çavê xwe şuşt û rabû ser xwe, kefên destê xwe yî şil di ser qapûtê xwe re birin û rehetiya van kiryarên xwe hest kir. Dema ew zarok bû tu cihên ji vir biçûktir ên giha lê şîn dibû nedihiştin ku nediçûnê, ji bo lîstika şer bilîzin. Ew tu carî ewqasî dûr nedihatin mîna ku niha wî dikir, lêbelê li kêleka rêya ber bi başûr de, piştî bajêr cîhin hebûn ku dişibiyan dîmenên vir. Wî got divê ev sedem be ku ji nişka ve zaroktî hat bîra wî, ku zehf kêm caran, li zaroktiyê dihizirî.

Dîsa bi tahtê ve helpişî, bi gavên mezin di ser panavê re meşiya çû nav qirş û deviyan, ax da aliyekî. Rastiya ku wî pê dizanîbû, bê her gava wî dê çawa bê pêkanîn ew bêhnteng dikir. Didît bê çiqas hewldan pêwîst e, li devereke ku mirov wê baş nas dike, li her tiştî miqate be. Wî qûma bi girêka plastîk ve paqij kir û hema wisa ew xist bêrîka xwe, ji ber ew niha piştrast bû ku dê pêrgî kesekî nebe.

Dîsa li ber kaşê bi kevir rawestiya û xwe bi xwe dît ku mîna teyrekî baz li jor daniye. Xwe ber bi pêş de daqûl kir tevgerin ku ew birin jor bi şêweyekî otomatîk pêk anîn, heman gavên mîna hev fireh û meşeke bi tirs û tevgerên destan ên çi diket ber wan zeft dikirin û erd dixepirandin mîna berê. Ji bo ku van hemuyan durist pek bîne, li jor rûnişt, mîna bê çawa wî ji jêr ve xwe dîtibû. Tava rojê ew di şefqa qesele re dişewitand. Niha wî perçeyê qumaş di nav tivirên ku sor diteyisandin de dît. Di awira pêşîn de, bi lez berê xwe jê guhert, di ser wir re li cîhekî din nerî. Bi wî wisa hat ku çavên wî, ji bo kêliyekê baş nedidîtin û dîsa vebibûn, mîna ew bixwaze wê devera ku ew tişt lê bû, di ser re bi xumamî mêze bike, şayik bike. Lêbelê ew hatibû destnîşankirin. Mîna cismekî li hev geriyayî, fanêreyê hirî xwe li ser erdê, li qurmê darekê gerandibû. Ew ji rengekî keskokî bû û wer xuya bû kevn bû, lê ne têra xwe kevn, Qaçaxçî ev tavilê fam kiribû. Li gel ku dar pêncî metreyî ji xaçirêka wî dûr bû jî, ger wî bi rastî jî bi baldarî li derdorê mêze kiriba, diviyabû wî berê fanêre li wir dîtiba.

Ew li wir rûnişt û xwe tev neda, ji ber ku wî zanîbû, ji bo her tiştê ku ew niha bike, biryareke bingehîn divê. Wî karîbû hema wisa rêya xwe dom bikira, lêbelê hîngê metirsiya vegerê dima. Lêbelê li wir pir tiştên ku divê bihata kirin tune bûn. Xwe ji hizra ku divê ew berjêr dakeve, ji bo fanêre saxtî bike, bi dûr xist, ji ber ku ev dihat wê wateyê ku ew dê pêşî ji xaçirêka xwe derketa û biçûya wê devera ku ew tu carî neçûbûyê. Ew ji mayînan neditirsiya, ji ber ku fanêre îşareta wê yekê bû ku ew perçeyê rêyê paqij bû, li gel ku her tim jî hinek metirsî dima. Ew hizir, bêtir ya ku wî diviya hîngê cara sisiyan bi kaş ve hilkişe bû. Ev cara sisiyan, ew diqilqiland, ew li derveyî hemî rêzan bû, hemû nimûneyan ew bi dirêjahiya demê re fêr bûbû ku divê ew xwe bispêre wan. Wî didît ku fanêreyê kesk li ser milên wî ye û di nav kevirên mezin de asê maye û dixwest ku mîna teyrekî baz ew bikaribe wî tiştî di nav lapûşkên xwe de bîne jor. Lêbelê piştre? Wî dê ew li wê jorê raxista mîna çermê lawirekî, serê xwe xwar bikira û lê temaşe bikira. Wî dikarîbû hêviya çi bikira ku tê de bibîne? Wî ji xwe re got ku ev perçeyê qumaş tu pirsyaran nabersivîne, ji ber ku wî hemû tiştên pêwîst zanîbû; bi nerîna ji jor ve ew fêr bûbû, lê dîsa jî hizra ku wî fanêre nepeland û ji hemû aliyan ve lê mêze nekir, ew nexweş dixist. Piştre wî di kêliyekê de xwe ji wî qumaşê li hev geriyayî rizgar kir, wî bawer kir ku wî tiştên li dorê mîna hewşekê didît ku pê ew ji erdê dihat veqetandin. Ew ne ji demeke ne dirêj de li wir bû, ne ji demeke ewqas dirêj ve ku ew ji erdê gemarî bûba.

# 6

Gotegota li ser artêşa zarokan û mirovên bipotik ên ku piştî “tevlêbûna” wî hatibûn girtin, hatin bîra Qaçaxçî, wek ku bi tenê bi paşbingehê şerî ve têkildar bû. Wî pê re tiştekî seyr keşif kiribû: Dîmenên gewr ên wan fîgûrên hîngê di nav bûyerên mîna tavên ewran, di nav xumamekê de wenda dibûn û tiştekekî wisa dihat serê wî bi xwe jî. Kesayetiya wî ya gewr an jî ya bê reng hat bîra wî- ji çend kêliyên hindik ên bextewariyê pê ve ku wî ew di hundirê xwe de şiyar nekirin.

Qaçaxçî, li tahtên mîna zimanekî dirêjbûyî û devera avahiyên ruxyayî ziq nerî. Wir heman herêm bû, tenê hin çîtên dor çayiran hîngê spîsaxlem bûn, niha ji wan tenê hin singên xwar û qetên têlan mabûn, te yê bigota qey destekî mezin çît bi erdê ve kişandibû. Her carê Qaçaxçî di tariya êvarê de dida rê û bi şev di nav wê deverê re derbas dibû. Hêdî û bêdeng xwe dilivand. Niha bi tirsa ku kesek karibe li vê jorê be, wê rewşa hîngê dîsa xwe dixist nav ramanên wî. Wî nikarîbû tu tişt li dijî vê yekê bikira.

Dema ku gotegota eşqiyan belav bû, ew hîn tacirekî asayî bû û kirîn û firotina ne yasayî dikir. Her roj li bajêr, li meydanên girîng radiwestiya û dema xwe bi kirîn û firotina tiştên biçûk re derbas dikir. Sal bi sal xwe ji ber endamên artêşê vedişart, heta ew kêlî hat ku ketina nav artêşê pêşî bi dizî, piştre bi tevahî eşkere bû. Hingê dawiya şer bû. Di bin mase û qapûtên taciran

re hatina xwe xuya dikir. Dema ku çek ji bo firotinê hatin pêşkêşkirin, her tişt qediyabû. Jina wî qapût peyda kir û wî bi pereyên mayî ji xwe re kêr kirî. Qapût jê re bû, têra wî bêrîk tê de hebûn û bi qasî yekî nû baş bû. Rewşa kêrê cuda bû. Di rastiyê de, pêdiviya wî pê tune bû, lêbelê gava ku leşkerê ciwan î hişkolekî, ew ji qilifê derxist, xwest ew bibe ya wî. Ew ne kêreke tebût bû, wek ku wî niha ew bi kar dianî, nîv alava kar, nîv cilêt, ne mîna alava masîvanekî yan jî nêçîrvanekî bû; ew xençerek bû, zirav û sar, çeka kujeran bû.

Wê sibeha zivistanê, li ber çavê wî lezgîniyekê bi wî leşkerê ciwan ê bi taya cemidî girtibû. Leşker dixwest, hemû tiştên bi xwe re, bike pere. Piştî çeka xwe, saeta xwe û heta şehê xwe jî ji bo firotinê pêşkêş kir. Bi destên lerzokî li bêrîkên şalê xwe digeriya û digot ku ji çûna malê, ya ber bi başûr, devera ew jê bû pê ve, ew tu tiştê din naxwaze. Qaçaxçiyê ku hîngê hîn tacirek bû, ji nav hûrmûrên di destê direjkirî yên zilamê pêşber xwe de, kaxizeke li hev pêçayî kişand û bi baldarî lê mêze kir. Ew nexşeke bi destan çêkirî ya bi nîşanina bû. Qaçaxçî wê kêliyê bi tiştê hat bîra wî re mizicî, wî hingê xwe mîna qorsanekî fîlmên kevn dîtibû ku di wê kêliyê de agahdariyeke derbarê denê zêr î veşartî bi dest xistibe. Wî ji yê leşker agahdariyên bi kîtekit wergirtin û hişt ew çend agahdariyên din wek nîşe binivîse. Tiştê wî zilamê ku bi kêmanî bi şêweyekî nerasterast di mayînkirina sînor de beşdar bûbû, bi xwe re anîbû, planê mayînan bû. Bi çend nîşeyên lê zêdekirî, derdor û rewşa wê ji bajêr ve baş dihat dîtin û niha êdî pereyê zilamî hat dan. Wer xuya bû, plan ji bo yê leşker, xwedî nirxekî hindik bû. Wî hemû tişt li dû xwe hiştin, mîna yên ku ew ji wan niha baş têr bûbû û bi ser hev de piçyayî milên xwe hildan û di nav mija serê sibê de wenda bû.

Tiştê yekemîn ku şêniyan behs dikirin, êrîşên li ser tacirên gerok ên li rex herêma ser sînor bûn. Ger ne ji bêînsafiya êrîşên bê wate bûya, her kesî dê bigota ew, leşkerên ku di wir re derbas

dibin in. Qaçaxçiyê siberojê, di destpêkê de ev zehf girîng nedîtibû. Lêbelê ev bûyer her diçû bêtir dibûn. Dawiya dawîn kesekî hew dixwest biçe welatê bê xwedî, ji xwe piştî şer artêş jî ji wir dûr mabû. Ji ber ku mîna berê rêya herî kurt a di ser sînor re bû, niha derfeta ku bi planê di bêrîkê de qezenckirina pereyên pir derketibû holê. Hizir ew bû ku ji ber rê zehf kurt bû, dê zehf dijwar ba, ger mirov wek kesekî bi tenê yê ku derdor nasdikir û li xwe miqatebû, li wê koma mirovên gerok ras tbihata ku her kesî behsa wan dikir. Nexwe diviyabû mirov tenê biçûya. Wisa ew bû Qaçaxçî, ji hingê ve, wî tu hewl nedida ku tiştekî din bike, ji bêyî kesek pê bihise, pereyan û mal bibe û bide kesekî din.

Kesekî bi rastî jî baş nizanîbû, bê kê li welatê bêxwedî fêlbaziyên xwe dikirin. Wî li derdorê dipirsî û wek bersiv çîrokên bi tirs dibihîstin. Kesên, herî pirtir behs dikirin, wan tiştên herî kêm zanîbûn. Axir ew çû nav wî gundê rexê çem ku niha ruxyayî bû. Qe nebe li wir mirov zanîbû, ew kesên behsa wan dibe, dizên heywanan bûn. Wan her tim ev kar dikir, lê bi pîvan. Lêbelê gundî di xanîkên xwe de diman, ji ber ku her kesî zanîbû, eşqiya bi çekên giran bûn. Divê ew leşker bana, ji ber ku li gor gotinan, çekên otomatîk bi wan re bûn ku dengê wan carnan ji gelîyan jî dihat bihîstin. Qaçaxçî, bi pirsyarên xwe dom kir, lê piştî demekê dîsa ew derbasî nav împaratoriya fantaziyan bû.

Ew vegeriya nav bajêr. Hingê cara pêşî çû navenda Ewlekariya Hundirîn a bi navê xwe yî xerab wek Avahiya Sor naskirî, bêyî ku bizanibe bê dê ev avahî ji bo wî hîn çi wateyê werbigre. Avahî beşek ji kompleksek e leşkerî bû. Baryêreke gewr î gemarî, valahiya di dîwarekî de digirt ku li rex tevahiya rê bû û nedihişt mirov ji qatên jor ên avahiyê pê ve tu tiştî li pişt wî bibîne. Tenê sê qatî bilind bû avahî û ji kiremêtên nû yî sor hatibû lêkirin. Bi paceyên xwe yên mezin ên tarî li rexê rêyên bi çûnûhatin, li dawiya cihêkî meşqê yî dîsa bi çîtan

sînorkirî bû. Li rex baryêrê yekî sivîl di qulûbeyeke cam de rûniştî bû. Qaçaxçî, da ser xaçirêka ji bo peyan û di ber baryerê re derbas bû, awirek avêt hundirê qulûbeyê, lêbelê tu livandina zilamê di hundir de hest nekir. Wî çûna xwe dom kir. Li pêşber deriyê avahiyê nobedarekî bi ûnîform nobet digirt. Qaçaçiyê bi kincên ku bal nedikşandin, bi fitlonek di derîyê çîtê yê ne kilîtkirî re derbas bû û çû ber bi deriyê avahiyê ve. Bê wate dimizicî, lêbelê çêtir bû ku ew mîna dînekî xuya bikira, ji dêvla ku bi şêweyekî şikbar xuya bikira. Yê nobedar xwe nedilivand. Piştî ku Qaçaxçî gihîşt nêzîkî wî, ew ket devê derî. Qaçaxçî jê re got ku tenê hinek zanyarî ji wî re pêwîst in. Lê hemû hewldanên wî sud nedan, nobedar ew bera hundir neda.

Wisa gotegot, wek xwe man; ew kesên li welatê bê xwedî, eşqiyayên baş çekkirî bûn. Nexwe rewş bi metirsî bû. Lêbelê jin û zarokên wî hebûn, divê debara wan bihata kirin. Qaçaxçî dît ku ew di germa nîvrojê de, di ser cihê meşqê re ber bi malê ve diçe. Destûra wî ya ji bo derbasbûna nav erdê dîyarkirî û avahiyên bi qorzî tune bû. Li cihekî ji vir herêm dihat rêvebirin, leşkerî, qe nebe ew wisa dihizirî, dezgeheke tenê bû ku dikarîbû li herêma li ser sînor desthilatdar ba. Wî maseyeke mezin anî ber çavê xwe ku li ser wê nexşeke ne bi destan çêkirî ya têkûz a welêt raxistî bû, bi agahdariyên reşnivîsî yî bi pergal û tijî teşeyên ku agahdariyên girîng destnişan dikirin. Ji bo van hemûyan, ji bo van nîşanên ewlekarîyê jî destûra derbasbûnê tune bû û ji bo hesta xweş ku ew li bin siya desthilatdariyê tev bigere jî, destûr tune bû. Wîsa wî dest pê kir ku pergala xwe bi xwe çêbike, pergaleke ji şarezebûnê, tedbîrên miqatebûnê ku bi hizrên pûçbaweriyê ve têkildar bûn û agahdariyeke li ser rewşa li wê deverê ku bi tevahî ji bo kiryarên wî fesilandî bû.

Wî xwe dît ku bi xencerê dilîze. Divê ew çeka tenê bûya ya ku wî bi xwe re digerand, çekeke bê deng ku li gor xwe, pêdiviya wê bi nêzîkayiya bedenê hebû û pê re jî tiştekî şênberz tev li tirsê dikir. Wî xwe fêrî kişandina xençerê dikir, ji kemera pişta

xwe û ji saqa cizmeya xwe. Ji ber ku wî ji niha pê ve hew dixwest kiryarên xwe li gor pergaleke objektif pêk bîne, wî guh nedida şîretên leşkerên perwerdekirî jî. Wisa wî, ji bo xençerê cihekî ku li gor wî guncav bû dît. Wî qilif li ser zenda xwe ya çepê yî tazî girêda. Hiçkên gomlekê xwe di binya mil re jêkirin. Niha diviyabû ew tenê destê xwe bavêje piyên qapûtê fireh ji bo ku kêrê bikşîne. Wî xwe fêrî vê jî dikir, û kêfa wî jê re dihat. Gelo wî dê ew xençer tu carî bikar bianiya yan na, ne ewqas girîng bû, tiştê girîng ew bû ku ji bo rewşeke taybet tiştek di destê wî de hebe.

Di derbarê rêya ku diviya ew tê re biçûya de, hizra wî baş zelal bû û mafdar bû ku wî baweriya xwe bi rastiya planê anî, wek ku di derbasbûna wî ya yekemîn di ser sînor re diyar bû.

Tiştê girîngtir, ew bû ku wî ji bo kesên ku tişt spariş dikirin, komek çêbikira. Bêguman gelek kes hebûn ku dixwestin tiştinan jê spariş bikin, lê pêdiviya wî pê hebû ku tiştên gelek kar bianyana bihatana wesandin. Diviyabû ew tiştin wisa bûna ku hilgirtina wan hêsan ba û gelek pere bianyana. Buhayê herî mezin, bê şik dê bi dermanan ku her diçû kêmtir dibûn bihata bidestxistin û ku wî dê karîba qederekî pir ji wan hilgirta. Wek ku wî zû tesbît kir, pirsgirêk ew bû ku li rojhilatê Tirkiyê û li Îranê jî derman bi teqsîtan dihatin dan û tu pêwendiyên wî yên ku karibin nehêlin ev kontrol pêk bê, tune bûn. Tenê malên luks diman. Wî ji tiştên biçûk de dest pê kir. Pêşî wî hema hema tenê alkohol û çixare derbas dikirin. Ji bo van tiştan diviyabû ew gelek caran here û bê ku her diçû metirsiya ku ew li koma eşqiyan rast bê bêtir dibû. Her ku dema aramiya seyr ya piştî şer dirêjtir dibû, alavên ku jê dihatin xwestin xwesertir dibûn. Dema ku computerên biçûk bûn mode, hingê destpêkir ku lê hêja be. Wî ya yekemîn tev li barê xwe yê vodkayê derbasî vî aliyî kir. Piştre her ku çû bêtir kesan dixwest ku cîhazeke wisa bi dest bixin. Ji bo vê yekê rêxistinî pêwîst bû. Berê sipariş werdigirtin. Wî cîhazên elektronîk yên wek videoyê û

televizyonên biçûk jî derbas dikirin. Ji ber ku zavayê wî Zarik li cihekî nêzîkî sînor li aliyê Tirkiyê dima, derket ku rewşeke zaf baş bû. Zarik, peywendî bi nava welêt re datanîn û li gel ku hingê mesref bêtir dibû jî, kar bêtir dihat kirin. Her tişt ji bo wî dixebitî; ambargoyaya navnetewî dom dikir û mirov nikarîbû ji pêş ve bigota bê kengî dê rewş qe nebe sistir bibûya.

Bi demê re, bêguman hin rêyên din jî di ser sînior re çêbûn. Rêyên ku tirimpêl di ser wan re diçûn hebûn. Lêbelê ev rê di destê hin komên qaçaxçiyan de bûn ku têkiliyên wan î baş bi leşkeriya aliyê din re hebûn. Wan kesên mîna wî, tenê bi pereyekî hindik wek barkêş bikar dianînin. Li wir xaçerêkek fireh î ewle ya bê metirsî ji bo wan dihat dan, mirov diçû cihekî destnişankirî li ser sînor û malê amadekirî tenê teslîm werdigirt ji bo ku wî bi şev bîne devereke vî aliyê sînor. Ev tişt ne ji bo wî bû, karê wisa xortên gundî dikirin, kesên ku bi lomiya xwe kar dikirin. Wî xwe ji qaçaxçitiya organîzekirî dûr dixist, li ser hesabê xwe kar dikir û pê re metirsiya ku ew bi tena serê xwe li welatê bê xwedi bimîne hebû. Vê yekê, ew ber bi xwe ve dikşand.

Di vê navberê de Qaçaxçî, êdî bawer dikir ku bextreşiya wî, bi ji nû ve xuyakirina Beno ya di rojeke germ de, kêliyeke kurt piştî serdana wî yî têkçûyî ya Avahiya Sor, dest pê kir. Ew bi Nêrîk re, li ser kolana ne dûrî mala xwe dimeşe. Di wê kêliyê de ew ji komek xortên ku bi fûtbolê dilîstin re derbas bûbûn, kurê wî li ser wan tiştekî ew biçûk didîtin gotibû. Ew leyîstikvan hebekî ji wî ciwantir bûn.

“Seba çi tu wan naecibînî?” Qaçaxçî jê pirsî. “ Heta berî demeke nêz te bi xwe jî bi wan re dilîst, tu wan mîna mejîkerikan dibînî?”

Xort şipyayî rawestiyabû û li paş xwe zivirîbû. Gog bi şirqîn li nav şaxên dara hejîrê yên ku bi ser dîwêr de daliqiyabûn de ket. Xortan bi vir de wir de bazdidan, her carê yekî gog digirt û bi piranî kêliya ku yekî din ew ji gogê bi dûr dixist, ew diket erdê.

"Her yek ji wan gogê digire heta ku ew kare, rêbaza lîskê ev tenê ye. Lema hemû bi hev re mîna mîhan di xelekekê de bazdidin." Wî serê xwe bi neyênî hejand û meşa xwe dom kir.

Qaçaxçî, hewl dida ku bi gavên xwe pê re bigihê. Tiştên ku xort ji xwe berdida, van rojan gelek caran ew şaşwaz kiribûn. Vê carê mîna ji bergirtina tiştekî fêrbûyî bû. Wî di wê kêliyê de xwestibû ku jê bipirse bê mamosteyên wî yê nû ev fêrî wî kiribûn. Di wê kêliyê de fîgurê zirav ê kurt li pêşberî wan li ser navenda kuçê rawestiyayî bû. Dîsa kincên sivîl li Beno bûn, lema piştî wî bang kir Qaçaxçî, li xwe hay bû. Bi şêweyekî li gor dengê hundirîn xwe bi ser guhê lawikî ve xwar kir, û ew bi rêya wî de şand, ew bi tenê ber bi zilamê ku dibişirî ve çû. Li ber wî rawestiya û silav lê kir. Her tiştê di rûyê wî de dixwest dostane xuya bike, mijangên wî bi xwe jî deviyin komîk pêk dianîn di ser cavên zirav re.

Beno pirsî, "Kurê te ye?" û li dû kurik nerî.

Ji ber sedemekî ne diyar Qaçaxçî, dixwest zû bala zilamê din bikşîne ser xwe.

"Xêr e?"

"Tu wê rojê hatibûyî Avahiya Sor?" Çavên wî her li xort bûn.

Qaçaxçî got "erê", di wê kêliyê de li guhê Beno mêze dikir û hêvî dikir, êdî berê xwe bide wî.

"Te çi li wir dixwest? Ka were em çend gavan bimeşin."

Wisa wan da dû Nêrîk, li rex hev di ber dîwêr re çûn. Dîsa jî Qaçaxçî ji ber xwe ve hewl dida leza meşê hêdîtir bike; bi zanebûn gavên xwe ji yên yê din biçûktir davêtin. Ew rehet bû piştî ku lawik ket ser kolana ku çik pêşberî wan bû û ji ber çavan wenda bû. Wî nizanîbû bê çawa ew ji yê din re pirsgirêka xwe bibêje.

Beno ji nişkê ve bişirî: "Ez texmîn dikim, te dixwest tu li ser rewşa derve tiştinan bibihîzî, ji ber ku tu dixwazî karê xwe firehtir bikî."

Qaçaxçî tenê bi erênî serê xwe hejand. Bê ji ku zilam ev zanîbû jî, wî ev jê re got, û pirsgirêk jî ev bû. Tirsa Qaçaxçî ew bû ku neçar bimîne hin mesrefa din bixe ser.

Te ê bigota Beno hizrên di serê wî de xwendin, destên xwe rakirin û serê xwe bi neyênî hejand. "Divê tu vê tenê bizanibî ku hayê min ji xaçerêka te heye. Ger tiştek bibe, ger tiştek bala te bikşîne, hîngê were cem min. Erê, erê, were Avahiya Sor. Tu vêya bi xwe re bîne û nîşan bide." Wî kaxizeke biçûk xist destê wî û li hêviyê nema heta ku yê din wê ji hev vebike û bixwîne. Wî xatir xwest û ew bi lez di rêya xwe ya di kuçê re bi paş de vegeriya.

Di destpêkê de kêfa Qaçaxçî lê bû ku parastina desthilatdariyê ya ku dixwest, wergirtibû. Piştre têgihîşt, ev kaxeza bi nav, pile û beşa Beno ji bo wî tê wateya berpirsyariyekê. Ew dê bi dil an bê dil biçûya vê devera ku ne ewqas xweş bû ger tiştekî taybet bala wî nekşandaya jî. Wan dixwest ku agahdar bin, ev mercekî karê wî yê plankirî bû ku heta hîngê wî nizanîbû.

Pêşî metirsî bi pêrgîhevbûneke ji nişkê ve bisînorkirî bû. Li herêma ser sînor gelek mayîn bela wela kirî bûn jî, lêbelê rêya wî ya hetanî bi sînor hîn fireh û vala bû. Berî gotegot belav bibin, hinekên ku wî ew nas dikirin, çûbûn êzingan bidin hev. Tenê yek hîngê mercek bû: Wî nikarîbû rê kurt bikira, ji rê derketa û di rêyên wî baş nasnedikirin re biçûya. Rêya wî tev li çend tiştên awerte jê re hat destnişankirin.

Sefera xwe ya yekemîn di şeveke sayî ya bi stêr de da destpêkirin. Ew zahf hêdî diçû, wî çavên xwe fêrî tariyê dikirin û destpê kir ku kitekitên li rex rê di bîra xwe de bihêle. Li vir û wir radiwestiya û li derdora xwe guhdarî dikir. Lê wî xwe li kesên ku derdiketin gerê datanî, li deverên tijî metirsî bêtir ji ku di rasteqînê de ev wisa bû. Kelecana wî bêtir ji nûbûna rewşê bû. Her tişt bi şêweyekî herî baş dimeşiya, ew pêrgî tu kesî nebû li wê devera xirîxalî, li lawirekî jî rast nehat.

Nobedarên li ser sînor, hingê hîn jî ew bi şêweyekî ecêbmayî pêşwazî kirin, lêbelê ew yekser tê gihîştin, bê çi dibe û tiştê hêvî dikirin wergirtin. Qaçaxçî xeyalşikestî bû, ji ber ku nikarîbû ji wan jî tu zanyariyan di derbarê wan kesên qaşo eşqiya werbigirta. Leşker bi tu tiştî mijûl nedibûn. Lêbelê dîsa jî piştî ew pêrgî wan bû wî xwe hinekî di ewlekariyê de his dikir; qe nebe ew li wir bûn, li gel ku dê di rewşeke ciddî de, wan dê tu tişt ji bo wî nekirina jî. Wan rewşeke rojane, rewşeke normal pêşkêşî wî dikir. Di şevên welatê wî yê bêxwedî de kêfa wî ya ji şewqa lawaz ya barakayê re destpêkir ku wî ji jor ve her carê piştî kaşê tarî yê dawî ku beşê mezîn yê rêwîtiya wî li dû wî dima, ew didît.

Gotegotên li bajêr bi dawî nedihatin. Piştî ku ava çemekî ku hîn bêtir li bakurê wir diherikî termek anîbû ber lingê yekî gundî, gelek çîrok dihatin gotin. Serî û milekî zilamê mirî kêm bûn û ev bû sedema ku gelek texmîn û şik bên kirin. Qaçaxçî, guh neda van hemû tiştan, ji ber ku wî hest dikir bê tirsê çawa rê li ber wî digirt. Wî nikarîbû ew hîn hêdîtir biçûya, hîn bêtir bi hemd ba, ji bo ku bikaribe vê tirsê ji ser xwe bavêje. Divyabû ew bê xem ba, heta piçekî aqilsivik ba, ji bo ku bikaribaya xwe ji cihê xwe yekcar bilivanda. Tirs ji bo wî hereşeyek bû, ew zehf giran dikir.

Wî rêwîtiyên xwe dom dikirin. Rewşa siparişan, her çû çêtir bû. Ew karîbû sê qatan bêtir jî biçûya û bihata, lêbelê ew wek xwe ma ku hemû tiştên bi veguheztina mal ve têkildar bûn, ew bi tena serê xwe bike. Tu kesî pê re reqabet nedikir, ji ber ku kesekî baş nizanîbû bê kengî û di ku re diçe. Wî ji bandorên di ber re ku karê wî bi xwe re dianîn jî sûd werdigirt, di nav civakê de cihê wî bilindtir dibû. Tenê tacirên bazaran ên dewlemend dikarîbûn alavên elektronîk ên ji bo derbaskirina dema xweş, sipariş bikirina. Kê ji wan ev tişt carekê sipariş kiribû, hingê birçîbûna wî ya ji bo cîhazin din, ji bo parçeyên wan, ji bo temamkirina wan hew dihat têrkirin. Niha rêya Qaçaxçî ku

karibe biçe malên hin tacirên dewlemend, vebûbû. Li vir wî bihîst ku xaçirêkên wan jî hene: Yên taybet, peywendiyên bi karmendên dewletê re, bi leşkeriyê re yan jî bi hin kesên ku xwedî van pêwendiyan bûn. Pêwendiyên ecêb ên tevlihev bi jiderveyê welêt ê nêzîk û ji derveyî welêt ê dûr re hebûn. Deriyê van pêwendiyan gelek caran di merivantiyê de bû. Wer xuya bû ku tevahiya derdora wî ji van xaçirêkan pêk dihat. Ew niha piçekî ketibû nav kesên bi bandor, li gel ku ev pêwendiyên wan ên tevlihev piçekî ji bo wî giran bûn jî. Dema ku bi wî didan îmakirin, bê kîjan cîhaz wek diyarî ji kê re hizirîbûn, an jî bê kîjan ji gelek mercên hukumetê ew ne gengaz dikirin, ku di rêyeke din re mirov wan bidest bixe wan dihişt ku ew jî tev li dinyaya wan a bi rêxistinî bibe. Wan nedixwest ku ew hest bike ku ew tenê barkêşê wan e, ji ciwanekî suxreker pê ve ne tiştekî din e, bêtir di beşê jêr yê pergala wan de ye. Vê jî xwebawerî didayê, ji bo tiştên ku wî dikirin. Qaçaxçî di kursiyeke ku dihejiya ya bi avzêrê neqişandî ya mazûvanekî xwe de rûniştibû û çay vedixwar. Tacir wek baldariyeke biçûk û ji bo ku kêfa wî bîne lempeyek dirêj û reş dayê. Qaçaxçî tavilê ew ceriband. Tîrêjên wê hîn di ronahiya rojê de têra xwe xurt bûn, ji bo kêliya ku mirov berê wê dida ser herdu teyrên tawiz ên ku li hewşê diçûn û dihat, dîn bike. Qaçaxçî, yek ji wan taciran bû, perçeyekî ji peywendiyekê bû û têra xwe karîbû li gor kêfa xwe azad tevbigere û ev jî pirek bû ji bo hereşeya welatê bêxwedî. Lema gotegotan hîn hindiktir ew ditirsandin.

Dîsa jî, di ronahiya heyva çardeşevî de derketina wî ya rê, hişt ku şik pê re çêbibin. Kêliya wî hingê da rê, wî tenê xwestibû ku qenciyekê bi mişteriyekî xwe bike. Ji ber ku wî ji serî de xwe baş his nedikir, wî guhertin tavilê ferq dikirin. Şopên lingan wisa eşkere li ser xaçerêka wî xuya dikirin, mîna ku ji bo çavên wî hatibin danîn. Hingê jî diviyabû ew bi paş de vegeriyaba, lêbelê mereqê ew ber bi pêş de dahfandibû. Wî wek her carê tenê guveguva bayê dibihîst û dengê kuliyan yeko yeko ku

carnan dihatin dibihîst. Ew li ser şopan hûr dibû, ji bo vî tiştî lempeya xwe ya bêrîkan a nû bikar dianî. Xwe baştir hest kir, kêliya ku tesbît kir ku ew şopên potînên leşkeran bûn. Koma kovî yî nenas, niha bûbû komek leşkerên ku di wir re derbas dibû. Ne ku çêtir bû, lêbelê mirov bêtir zanîbû bê rewş çi ye. Tavilê cihê dilxweşiyê, tirsê wergirt. Qaçaxçî ji xwe pirsî bê ji niha pê ve, ew ê di kêliya ku ew ji aliyekî derbasî aliyê din ê xaçereka wî bibin dê ew çawa tev bigerin. Vê pirsgirêkê bê rawest ew mijûl dikir; li ser rêya vegerê, çavên wî her ziq li ser rêya wî bûn, te ê bigota qey ew di her kêliyê de dipê ku tiştekî karîbû ji aliyekî bihata û rêya wî bigirta.

Niha serêşê dest pê kir. Hemû tiştên ku wî li ser kesên nenas bihîstibûn, bi ser wî de dihatin. Hizra ew li wir, li derve tenê bû, bi şev, tûrikê wî tije pere, ku ew ji nişkê ve ji alî hin kesan ve dihat dorpêçkirin, hew ji hişê wî diçû. Destpêkê xwe wisa tenê şipyayî didît, û ev dîmen di serê wî de ma. Lêbelê hêdî hêdî bû dikeke şanoyê ku wî dikarîbû, neçar bû ku ew saz bikira. Wî cûreyên ku dikarîbû çi bigota yek bi yek mîna lîstikekê dilîstin. Lêbelê ew zû dibû tiştekî ku kenê mirov dianî. Piştre tevger hat nav rewşê, di kêliya ku reşên xuya li ser xaçerêkê kom bûbûn, wî xwe da paş, xwe ji derban parast, reviya yan jî xwe bi pêş de kaş kir.

Heta jê dihat hewl dida ku tirsên xwe veşêre, bi taybetî jî ji ber miştериyên xwe. Heta ku dibû wî sefera pêş xwe bi dereng dixist. Ew li maneyan geriya, xwe nexweş xist, neçar ma ku ji bo demeke kurt derkeve rêwitiyekê. Lêbelê li bajarekî biçûk ne gengaz bû ku ew xwe bi demeke dirêj veşêre. Bêyî ku ji bo wê rewşa kambax, bi fanteziyên xwe bikaribe bighêje çareseriyekê diviyabû ew dîsa biketa rê.

Berovajî tiştên ew li bende bû, her tişt baş derbas bû. Mirov digot qey ser guhertinên malkambax hatibû girtin, wî şopên potînan ku hema hema nemabûn, dîtin. Wisa xuya bû ku erda gewr a ku şop li ser hatibû derketin, dîsa hişk bûbû û şopên li ser

hatibûn şayikkirin. Bêguman Qaçaxçî ji bîr nedikir bê ew kortik dihatin çi wateyê. Lêbelê wî dixwest aram bimîne, ev hemû diviyabû rabirdû baya û ji ber ku derdora wî dîsa bêdeng bûbû û tenê ba hebû, wî xwe bi rastî jî di aramî û barsivikiyê de his dikir.

Piştî cara bi dû de yan jî ya piştî wê van hemû tiştan xwe gihand wî. Ew demeke baş dirêj bi rê de bû, ji bo ku aram û bi konsantre be. Şev şîrgerm bû. Bayekî gûr dihat û wer xuya bû ku her ji deh xulekan berê wî dida aliyekî. Ev jî bi wî zehf nexweş bû, ji ber ku nedihişt ew qet li tu tiştê din bibihîze.

Hat bîra wî, bê wî çawa li çemê tarî yê ku wê şevê wek tiştekî zinar î hişk bandor li wî dikir, temaşe dikir; her wî dirêjtir lê temaşe kir, ew bêtir bêtevger bû. Awira wî dixwest bi çermê vî tiştî ve zeliqandî bimîne. Hingê berî ku ew rêya xwe dom bike, wî hîn dengê kûçikan ji gund dibihîstin. Kêliya panava bi taht xuya bû, ew ji mêj ve dîsa xwebixwe mabû, bi dengê gav û nefesa xwe re. Ew tiştê ecêb ê ku di saniyên bi dû de hişt ew di cîh de mîna darikekî hişk bibe, piştî awira duyemîn xuya bû. Tenê dema Qaçaxçî ji ser rê li pêş xwe li jor mêze dikir, bala xwe dabû tahta tarî. Ew taht hema hema astenga herî mezin bû. Ji qorziya çavê wî ve bilindahiya li rex rê bala wî kişand, belkî bi qasî dused metreyî ji wî dûr bû. Piştî wî li wî aliyî mêze kiribû, wî pêşî rûyê xwe ji wir guherand. Piştre zor da xwe ji bo ku careke din li wê deverê binere.

Ew ber bi wê de berjor bû, ew tişt, wek ku ji dûr ve xuya dikir mabû: Şeqekî ku ji erdê ber bi jor ve rabûbû. Ji ber ku ewqas zirav bû, xwezayî xuya nedikir. Mirov digot qey erdê bûkeke lîskê serberjêr dabeliandiye. Pêlava bi dawiya şeqî ve baş xuya bû.

Kêliya ew li ber rawestiya, bayê bermahiya bêhna xerabûnê ya şêrînokî li dor wî belav dikir. Tiştê ku ew şaşwaz kir, şexeke darê ya piçekî tewiyayî bû ku sol di serê wê de hatibû çikandin. Kesekî şax ewqas bi erdê de biribû ku ew çikandî li ser xwe mabû. Qaçaxçî, bala xwe da sola çerm î kevn î bi leke ya ji

rengê erdê, dît ku bizmikên wê ber bi jêr ve daliqiyayî ne. Ev tiştê wî jê nefret kiribû ne ewqas kambax bû, lêbelê tevahiya tiştê ku pê ve bû. Ev şeqê li rex rê wisa xuya dikir, wek ku zarokekî ew li wir çikandibe, ji bo ku mezinan pê bitirsîne. Qaçaxçî, yekser ev heneka xerab anî ser xwe. Wî wisa fam kir ku jê tê xwestin ku tev li lîstikê bibe.

Wê şevê wek ku ji kêfa xwe ketibe rê dom kir. Bi kêmanî wî niha tiştin li ser henekvaniya kesên nenas zanîbû. Lêbelê wî her wiha hest dikir ku ew di bin çavdêriya wan de ye, wan dabû dû wî. Di her gava wî davêt de dipa ku li nîşaneke hebûna wan rast bê, bêlkî jî li parçeyekî din î term. Lêbelê wî tiştekî din nedît, û li vegerê ew sola şîşkirî bêguhertin hîn li wir bû.

Qaçaxçî, pêşî ji kesekî re behs vê yekê nekir. Bi vî awayî hesta ku têkiliya wî tiştî tenê bi wî re hebe xurtir dibû. Niha diviyabû ew di ber solê re derbas bibûya, her cara ku rêya wî bi wir biketa, bi gumaneke mezin heta ku lingê tê de bi tevahî birizya, yan jî ba ew li ber xwe bibira. Tenê wî ev nîşan hest kiribû û dikarîbû li ser wateya wê biramiya.

“Tu nikarî bihesibînî ku tu li wir tenê yî”, got Eno, kêliya ku asoxî Qaçaxçî, neçar mabû ku ji yekî re behs bike. Ew bi rêya qasidekî hatibû bangkirin û di destpêka axaftinê de ev teqand. “Li bakurêrojava gelek gund hatine jinavbirin. Tu bawer dikî ku çend kes, tenê bi kincên li ser xwe reviyane serê çiyê? Kesek nizane bê çend in.” Dema ku Qaçaxçî bêdengiya xwe dom kir û tenê bi baldarî mêze dikir, yê din dom kir: “Baş e, derfetek heye ku mirov li welatê bêxwedî azad tev bigere. Lêbelê qedexe ye ku ez ji te re yan jî ji kesekî din ê sivîl re bibêjim, çawa, lê derfetek heye. Û tiştekî din jî: Tu, tu carî li ser hizirî ku ew ling dikarîbû yê qurbaniyekî mayînan bûya?”

Qaçaxçî serê xwe bi neyênî hejand.

Beno serê xwe bi erênî hejand: “Bêguman hinan ew anîye li wir çikandiye. Lê ew nayê wê wateyê ku wî kesê ew aniye wir bi xwe ew kuştiye jî.”

Qaçaxçî qet nizanîbû bê vê rewşê tu tişt çêtir dikir an na. Wî li maseya paqij mêze dikir û tu tişt nedigot.

“Ez dixwazim tiştekî ji te re bibêjim, tenê ji te re: Zilamekî ku em hemû wî wek kesekî girîng nas dikin, rojek ji rojan bang li karmendekî xwe kir ku bê cem wî. Kêliya ku karmend hat li ber wî rawestiya, wî destê xwe lê ranekir, tu tişt pê nekir, tenê hişt ku wî bigirin û bavêjin kozika segan, ba kûçikê airedale. Tu pê dizanî bê ew çi dikin ku mirov wan baş birçî dike? Ew nakujin, lêbelê mîna keftaran yekser dest pê dikin û dixwin. Li ber çavên her kesî karmend hat perçekirin. „Min tu çêkirî, û wisa jî ez te tune dikim.”, got zilamê girîng. “Tu karî rûyê yê karmend bîne ber çavên xwe, hetanî kêliya ku ew hîn rûyek bû? Ev çîrokeke rast e, ne ji fîlmekî xerab hatiye wergirtin. Ew bi qasî soleke li rex rê rast e, henekeke kambax a ciwanên xerab. Divê tu fam bikî: Ev tiştê tu dibînî ne hemû ye.”

Qaçaxçî, xwe neçar hest dikir ku tiştekî bibêje. Lêbelê tiştek di wê kêliyê de nedihat bîra wî, xwe tenê li ser kursiyê rast kir. Ji xwe re got, asoxî va yekî ji wanên ku ew gotegotên ku ew diçû ku dihatin gotin û belav kirin, ji wan derdikevin, li ber wî rawestiyaya ye.

“Tu mirov ji te napirse, gelo tu tê dihêjî, tiştê li derdora te rû dide. Her tişt ji mêj ve qewimiye, berî ku te dest pê kir, li ser biponijî. Her tişt hîn jî pêk tê, divê tu …”

Qaçaxçî, hest kir bê çawa Beno dilşad dibû gava ku barê wî giran dikir. Wî xwe jê bi dûr xist, mîna rêwîyekî di nav fikaran de wendabûyî pala xwe da dîwarekî ripî tazî ji yên odeyê. Herdu kefên destên xwe li kêleka şeqên xwe bi kevir ve eciqandin.

“Ev mîna şiyarbûnekê ye. Rojekê ji rojan tu bi tiştekî nû re rû bi rû dimînî. Ew mîna nivîseke nenas, labîrintekê, erê, erdekî bi mayîn e. Pergalek tê de heye, lê ne ya te ye; dem jê re divê, ji bo ku pêk bê, lêbelê ne dema te; xwedî sazkariyeke hundirîn e ku dihêle ew bê famkirin, ger mirov wê nas bike. Di

vê kêliya keşifkirinê de tu biaqiltir î, ji xweyî berê. Lêbelê ji dêvla ku tu bimînî, tu her tiştî di dema xwe de, di pergala xwe de bi cîh dikî, tu dixwazî bibî yê têdigihêje, yê çareser dike. Ev ji bisînorbûna di tevgerê de pê ve ne tu tişt e." Wî xwe ji dîwêr berda, bişirîneke bi acizî li ser rûyê wî xuya kir. "Û belkî tu carekê sazkariyeke wisa keşif bikî. Hîngê tu yê bicefilî."

Qaçaxçî dîsa bi şeqê ji hev vekirî xwe sipart pişta kursiya xwe û hişt ku çavên wî li erda kevirî temaşe bikin. Siya Beno xwe li wir dilivand, û ew dilşad bû ku dikarîbû li tiştekî temaşe bike.

"Bê seba çi min tika kir ku tu bê vê derê. Ez vê tenê bibêjim, ji ber ku em ji mêj ve hevdu baş nas dikin." Li dor maseyê zivirî û hat li ber Qaçaxçî rawestiya. "Li kurê xwe yî herî mezin miqate be."

Qaçaxçî li ser xwe rûnişt. "Ew sêzde salî ye!"

"Ne zehf biçûk e, ji bo ku bibe xwedî hevalên xerab. Belkî tu wan wek kesên oldar ku tenê meyla wan li ser nivîsandina li dîwaran e, dibînî. Lêbelê ew kesên ji rêderketî û pêşeng in. Pêwendiyên wan ên siyasî bi derveyî welêt re hene- wisa tê gotin." Beno serê xwe hêdîka bi neyênî hejand û ji jor ve bi şêweyekî nerazî li Qaçaxçî nerî.

"Bi derveyî welêt re?"

"Îran wan fînanse dike. Tu çawa dikarî kurê xwe bi dirêjahiya gelek salan bişînî dibistana Qur'anê û bawer bikî ku tu bandor li wir, lê nabin? Gelo îslamîst giraniya xwe didin ku, ger nadin ser wir?"

"Min digot qey "tevgera îslamî" ya partiyeke yasayî ye."

"Rêxistin. Rêxistineke misaadekirî ye. Ev nayê tu wateyê. Îslamîst dikarin sibe bên qedexekirin û bên şandin bo dojehê. Te zarokên xwe di şer re hatanî vir anîn, niha wan di aşîtiyê re jî bîne."

Qaçaxçî, ji avahiya bi paceyên mezin ên ku qet nedihatin girtin û di tariyê de her şiyar bûn, derket û dîsa xwe di nav xanî

û dikanên nizim ên dunya xwe re, xwe li ba kir. Ew dîsa, ew bi xwe bû, ji derveyî odeyên vikîvala û korîdorên ku dikirin zimîn. Û hemû tişt di hundir wî de tevlihev dibû. Ev babeta rêyên li welatê bêxwedî bû. Qe nebe wî îşareteke wê zanyariyê wergirtibû ku ev demek bû ji Avahiya Sor hêvî dikir. Nexwe hayê kesekî jê hebû. Wî tiştên bihîstibûn di serê xwe de ji nav hev derxistin. Niha ew piştերast bû ku pêlav paşmaya yekî ku li mayînan digeriya bû.

Ger wî hingê zanîbaya, bê Nêrîk di metirsiyeke çawa de dihejiya, dê jê pê ve bi tu tiştên din ve mijûl nebûya. Wî girîngiya şîreta Beno bi qasî ku ecele bû nenirxand. Divê wî li kurik bida, di hundir de derî lê bigirta, ew girê bida. Lêbelê yek jî ji van tiştan nekir, ji ber ku wî êdî hema hema kurik hew didît. Her kesê ku temenê wî têr dikir, ên ku ji kurê wî yê herî mezin biçûktir bûn jî, diviya di dema xwe de, rojekê dest pê bike ku ji heq xwe derkeve. Di eslê xwe de temenê Nêrîk têrê dikir, ji bo ku mal terk bikira, ji mêj ve bû ku ew tenê carina bi mêvanî dihat malê. Rêxistin, Qaçaxçî piştерast bû ku bi destûr hatiye damezirandin. Û ew li kurê wî miqate bû. Wî dizanîbû, bê ew dikare biçe ku, tevahiya rojê fêr dibû, li gel ku mirov nikarîbû bizaniya bê ew fêrî çi dibû û li malê xwarin têra wî jî hebû. Vê rewşê barsivikiyek pêk dianî, devekî birçî kêmtir bibû. Qaçaxçî nikarîbû di vê rewşa ji bo xwe baş de metirsiyekê bibîne. Lêbelê wî danî ber xwe ku kurê wî vê carê bê serdana wî pê re biaxive.

Ew axaftin ji tiştê ku ew li hêviyê bû zehf cûdatir çû serî. Piştî bi gelek salan jî ew piştî nîvroya wê rojê baş dihat bîra wî, ji ber ku ew roj, bêyî ku ew bizanibe ya xatirxwestina ji Nêrîk bû.

Kurik mîna her carê hema hema bêpeyv hatibû male. Ew li ser benka text rûniştibû, û bi ponijîn di pacê re li derve mêze dikir, mîna ku li ser rêya heta bi dergehê hewşê tiştekî zehf girîng rû bide. Bêguman wî nikarîbû ev dirêjtir bikira; birayên

wî tavilê tev li daxwazên xwe li dor wî kom bibûn, bi şalên wî digirtin û kaş dikirin û jê re tiştin digotin. Ji ber ku bi gumaneke mezin wî ji xwe dixwest ku li mala dê û bavê xwe dema xwe derbas bike, ev daxwaza lîskê baş li hesabê wî jî dihat.

Qaçaxçî, hingê kêliyekê li wî nerî û bala wî kişand ku kurê wî, li gel hemû mijûliya bi wan re jî, navberek dixist nav xwe û birayên xwe yên biçûk. Qaçaxçî ji xwe re got, bê guman ev ji bo xortên di vî temenî de tiştekî asayî ye, ew êdî ji zarokên mezin bêtir mezinên ciwan in. Lê dîsa jî, kurê wî yê li ser qiraxa banka li ber pacê rûniştî bû, mîna yekî biyanî bi wî dihat.

Mîna her cara ku ew li wir bû, wan bi hev re xwarin xwar. Nêrîk, hemû tiştê ku werdigirt, qederek derbas nedikir; di tevgerên wî de tiştekî mîna serbilindahiyeke fêrbûyî hebû ku carnan bi ketina nav temenê xwe yê rast ê ciwan ji bo kêliyeke kurt dihat qutkirin.

Ew axaftin, a rastir hewildana ji bo wê, ji aliyê diya wî ve hat destpêkirin. Ew bi rastî jî otorîteyek bû di van tiştên wisa de. Bi hêviya hêza wê ya razîkirinê, Qaçaxçî ew li ber xist, bê Beno çi ji wî gotibûn. Di destpêkê de jina wî cefilîbû û mîna her carên wisa hêrs bûbû. Piştre qermîçekek mîna nîşana ponijînê li ser eniya wê xuya bûbû, eşkere dikir ku ew bi babetê ve mijûl e. Hîn berî ku Nêrîk bê, wê bi neyênî hêdî hêdî serê xwe hejandibû û bi vî şêweyî nerazîbûna xwe ya li dijî nûçeyên bi metirsiyên ji derve eşkere kiribû.

Li ser maseyê wê di ber re dest pê kir: “Tu li dibistanê têra xwe xwarinê werdigirî?”

“Bêtir ji têra xwe”, got kurê wê û awireke bi serbilindî avêt aliyê bavê xwe. “Lêbelê kêm xwarin ji me re pêwîst e.”

“Kêm ji we re pêwîst e”, wê tiştê wî gotibû dubare kir û xuyabû ku dîsa hêrs hatibûyê. “Lê hûn zehf dixwazin, ne wisa?”

“Tu dixwazî çi bibêjî?” Wî xwe rast kir mîna ku xwe ji şerekî re amade bike, bi gumaneke mezin bêyî hemdê xwe, wisa wî baş texmîn dikir, bê niha dê çi bê.

“Bavê te bi zilamekî ji Ewlekariya Hundirîn re axivî. Te tu carî negotibû ku pereyên we ji derveyî welêt tên.” Dengê wê di hevoka dawî de tawanbar bû. Lêbelê ew hîn jî bi xem bû, awira wê yî ne aram rûyê kurik pelikand.

“Ew ne rast e jî”, wî bi kurtî ji wê re got, “vî tiştî tenê hikûmet dibêje.” Piştre ber bi bavê xwe de dom kir: “Lêbelê çi karê we bi Avahiya Sor re heye.”

“Karekî tîcarî ye”, got Qaçaxçî, zehf dûrî nêta ku zelaltir bike.

Kurik, tenê lê mêze kir, lêbelê nawêrîbû tiştê ku di wê kêliyê de dihizirî, bibêje.

Hat bîra Qaçaxçî, bê çawa germahiyekê laşê wî girt, kêliya tê gihîşt, bê ji nişkê ve çi şik li ser wî heye. Wê jî kevçiyê destê xwe danî, zendikên xwe serast kirin û li hêviya peyveke din ji wî ma. Ew bê deng ma. Wî nexwest ku bikeve tevgerê, li gel ku wî zanîbû ku niha bêtir sedemên wê jî hebûn ku karê wî rexne bike.

Û tiştekî din î ku hat bîra wî bala wî kişand: Berê tu carî bi vê lezgîniyê hewl nedabûn ku bi kurik re biaxivin. Ew neçar bû ku di rewşa seyr de xwe di bin zextê de bibîne.

Wê bêdengî qut kir: “Zilamî behsa pêwendiyên we yên bi derveyî welêt re kir.”

Kurik ji nişkê ve keniya û mîna zarokan destê xwe li ber devê xwe girt. Di wê kêliyê de hêrs hat Qaçaxçî.

“Tu di vê derbarê de çi dibêjî?”, bi wî re xeyidî.

Mîna gelek carên di rewşên wisa de kurik, serê xwe ji alî wî zivirand çapraz li rex xwe nerî. Qaçaxçî wek bav xwe ecêb hest kir; tê gihîşt ku yên din ji mêj ve ev rola wî tune hesibandine. Ji ber vê hêrsê û belkî jî rastiya peyvên Beno his kir, mîna otorîteya xwe wek bav bihêztir bike, sêniya xwe dahf da û rabû ser xwe. Ew ber bi derî ve çû, derî vekir û li zemîna ji kevir ya korîdorê ji siyên heyî ronahiya wê lawaz rê dida. Li xwe zivirî. Kurik hîn jî li rex xwe mêze dikir. Kincên wî paqij bûn, heta

pêlava wî jî baş xuya dikir, li gel ku xwar bûbûn jî. Wî mîna ku bersiva awira bavê xwe yê bê rawest bide, bi dengê hêdî got:

“Ji bo me derveyî welêt tune ye.”

“Ji bo we belkî tune ye, lêbelê ji bo Ewlekariya Hundirîn heye.”

“Ew jib o herkesê ku li hesabê wan nayê vê dibêjin. Lêbelê em aştîxwaz in. Ew nikarin tu tiştî bikin.”

“Seba çi we li ser dîwaran nivîsand?”

“Hayê min jê tuneye. Ew yên din bûn.” Li diya xwe nerî û xwest bibişire.

Wê rûyê xwe tirş kir ku tim bêçare xuya dikir. Mirov digot tu tirs jî wê mijûl nakin; ew tenê xemgîn û bêçare bû. Ji dêvla ku bersîva awira wî bide, wê firaxên ji bo xwarinê li ser maseyê bûn serast kirin.

Qaçaxçî li rex kursiya kurikî rawestiya. “Tu tê nagihîjî ku Ewlekariya Hundirîn, dixwest min îqaz bike?”

“Îqaz, ji çi?”

“Belkî hûn ji bo wan metirsiyek in.”

“Her misilmanê birastî ji kesên ne ji dil ên keysperestên olê re metirsiyek e.” Wî nefeseke kûr wergirt, berî ku vê hevokê bibêje. Dengê wî di guhê Qaçaxçî de dîsa gotinên fêrbûyî yê seyr pêk anîbûn.

“Divê tu li bavê xwe guhdarî bikî”, got diya wî, ji ber ku di wê kêliyê de tiştekî din î ku bibêje nehat bîra wê.

Herdu zarokên biçûk, di korîdorê re qelebalix dikirin. Wê bi zendika xwe hêdîka ser pozê xwe paqij kir û rabû ser xwe. Qaçaxçî ji xwe pirsî, gelo kîjan hizrê ew aram kir, yan jî şiyana wê ya ku li tiştan miqate be di wê kêliyê de westiya bû. Ew di ber wî re derbas bû çû korîdorê, û wê dîsa li kurik mêze kir.

“Ez dizanim ku tu tiştên qedexe nakî. Lêbelê zilamê li Avahiya Sor dixwest tiştekî derbarê we de ji min re bibêje.”

“Kî ye ew zilam? Ew çi zane. Bila carekê bê serdana me.” Bi xwe bawer bişirî, rabû ser xwe û amade bû ku biçe.

“Belkî ew dê bike”, got Qaçaxçî û hewl da ku deng neçe jina wî li odeya din. “Lêbelê bi gumaneke mezin dê hingê bûbe dereng.”

Xortî xwe ji ser lingekî da ser yê din.

Tiştê ku dawiya dawîn Qaçaxçî aram kir dîmenê dibistanê bû. Ew hew piştirast bû bê wî wê rojê dabû dû Nêrîk, an jî demeke piştî wê bû. Her hal ew di nav erd û dîwarên reş û kolana tamîrkirina tirimpêlan re hat ber avahiya sê qatî ya bi paceyên avahiya febrîqeyekê û li ber wir rawestiya. Avahî di hewşekê de berjor ve bilind dibû û di ser dergehê wê re desmaleke mezin î rengînî daliqandî bû. Li vê taxê tu nebat çênedibûn, mirov li ku mêze dikir erd û kolan tijî qelş bûn. Qaçaxçî kêliyeke dirêj li paceyan mêze kir. Wî newêrîbû biçûya nava avahiyê, ji ber ku wî nizanîbû, bê ew ê li wir çi bibêje. Wî bawer dikir ku ew dikare li pişt camên gemarî mirovan bibîne, lêbelê ev jî ne misoger bû. Car caran hin zilam di ber re derbas dibûn, lêbelê wer xuya bû ku ne kesek diçû dibistanê, ne jî kesek jê derdiket.

Tiştê ji kurik bala wî kişandibû, biryardariya wî ya bêdeng bû ku her li ser ya xwe dima. Wer xuya bû ku tu tirsa wî ji Avahiya Sor tune bû. Ev çawa gengaz bû, niha Qaçaxçî ji xwe dipirsî, ev xort ne dişibiya bi wî û hema hema bi tu kesî? Bixwebaweriya ku Îslama wî dida Nêrîk, ew dihişiband tenê bi kesekî, ango bi Beno ku ew jî wisa ji ya xwe danediket. Li gor baweriya Qaçaxçî, ev ji wê yekê xuya dibû ku xort jî tu carî behsa nêta xwe ya birastî nedikir, wer xuya bû ku li ser vê zemîna bingehîn pirsyarek ne xwedî tu wateyê bû ji bo wî. Di eslê xwe de Qaçaxçî, baş bawer dikir ku kurê wî û Beno ne tenê dişibiyan bi hev. Ew du berên ji heman hêzê pêkhatî bûn, an jî ew wek du kesên dijber ji bo hev hatibûn destnîşankirin û Beno ev zanîbû. Niha dem dema Avahiya Sor bû, ev ji danberheva avahiyan tenê jî xuya bû. Û vê yekê Qaçaxçî aram dikir; ne gengaz bû ku çend kesên di vê avahiya kevn de,

rêxistineke mîna ya ku di Avahiya Sor de bicîhbûyî, bixin metirsiyê ku di rastiyê de tenê beşê ku tê dîtin ê navendeke hîn meztir bû. Lêbelê dîsa jî, Qaçaxçî li ser rêya vegerê, dema wî motorên bi rûn ên mîna bedenên şewitî di nav qûmê de dîtin, ji xwe re got, rojekê dê ew karibin vê bikin, ew ê karibin heman çekan bi heman ewlekarî û baweriyê bikarbînin, kesekî ji Beno û zilamên wî çêtir ev yek nizanîbû. Her tim tiştên mîna hev li dijî hev şer dikin, Qaçaxçî ji xwe re got, û kesekî mîna min ji bo wî tiştî hatiye destnîşankirin ku di navbera agiran de biçe û bê.

Gava wî ev ji xwe re zelal kir û pê ve, derbasî amadekariyên ji bo sefera xwe ya bê bû. Piştî dîtina pêlavê wî ji bo vegerê hindik tişt wek bar tev dagirtin. Wî nedixwest barê wî giran be. Her tim metirsiya herî mezin li vegerê, li gor wî ew bû ku barê giran ê malê qaçaxê, ew xûz dikir û meşa her gavê, mîna ku di heriyê de be, pê zor dihat. Hetta ew lê hizirîbû, hin perçeyan li dû xwe bihêle ku bêyî wan miştериyê ku mal xwestibû ew alav nikarîbû bikarbianiya. Li gel vê jî dê gengaz ba ku mirov di ber dilê wî de bidana. Lêbelê li gor rewşa heyî tu wateya bi paşdexistinê tune bû. Tu tişt dê pê nehata guhertin. Wî ne dikarîbû û ne jî dixwest xaçerêka xwe ji dest bide, kesekî ji bo wî çend perçeyên bedenê an tiştin din ên ku mirov ditirsandin danîbana wir jî. Wisa wî dîsa dest bi dîaloga bi kesê nenas re kir. Wî ji xwe pirsî, gelo wan bi ling dest pê kiribû, ji bo ku devera xwe destnîşan bikin. Wî karîbû bianiya ber çavên xwe ku dê wî bi xwe tiştekî kirêt daniya cîhekî ku baş bihata dîtin, ger wî devereke ji mirovan vala wek ya xwe bidîta. Çi karîbû ji îşaretên jiyanê û hereşeyê bi hev re bi bandortir bûya, ger mirov bi xwe bitirsiya ku mirov pêrgî kesekî ku mirov ne li hêviyê bû, bibûya. Lewheya biçûk ya ku metirsa mayînan destnîşan dikir û alayoka ji sorê gewrik ku seriyekî miriyan di navendê de jî dawiya dawîn bi kêrî armanceke mîna vê dihat. Ger ew bi nêteke baş jî li wir hatibûn danîn, wan digot: Li vir kesek hebû ku dibêje ji te re çêtir e, ger tu ne li vir bî.

Gava vê carê Qaçaxçî da rê, pûçbaweriya wî jî êdî bi kêrî wî nedihat. Ew di nav kelecaneke bi tirs de bû ku dihişt ew wisa bêhnteng be, lema neçar ma ku ji bo bê ser xwe bang xwe bike. Piştî demekê ev tirs gihîşte astekê ku ew bû sersariyeke cemidî. Wî hest dikir ku hêdîbûna di dema meşê de bi ser wî de dihat, aliyekî wê yî hebekî nebat hebû; ew yeke din, şêweyekî nermtir î pûçbûnê bû.

Hingê, dema ku ew di wê şeva gulanê ya xweş de wek rêwiyekî bi kêfa dilê xwe dimeşiya, çûk li ser hin darên yeko yeko hebûn. Mîna ku nû ji xewê şiyar dibûn bi viçeviç diliviyan. Seba çi ew di ser kevirên ku li wan deran bûn di nav goristanê re dimeşiya û kêliyeke kurt li bin dara mirî ma ku mîna qelşeke ronî ya şaxberdayî di esmanê şevê yê ji stêran şikestî de rawestiyabû? Bi her halî wî ji serê gir li derdorê mêze kir, çavên xwe pêl bi pêl di ser re gerandin heta bi çiyayên ku ser wan mîna kaxiza ambelajê yî qermiçî bûn. Ji havînê pê ve ne tu tişt bû ev hewa nerm. Bi çirayên bazarê yên dohnê gazê yên melûl ên li pişt wî ronîkirî, tariyê, mîna êrîşa dûmaneke dûr î bê çavkanî, xuya dikir.

Ew hîn bi pûçbûna xwe ya nîvşiyar diçû. Bi wî wisa dihat ku ew mercê tiştê dê bi dû re bihata bû. Ji ber ku ew bi derbeke wisa bihêz ku wî got belkî ji her aliyî ve di heman demê de lêket de, bi dawî bû. Şeva havînê girt ser wî, mîna ku çewalek ji nişkê ve bikşe ser serê wî, ew dorpêça.

Ya rast ew şiyar nebûbû, ew ji kûrahiyeke mezin derketibû. Bê oryantasyon ziq li qûmê dinerî, ya ku ji hinarkên rûyê wî dest pê dikir. Dipekiya ser wî, li wî dixist, dixwest serê wî babide. Ew bi devê wî ve çû û tengbûna gewriya wî ya bêhemd bû ku hişt ew, piştî demeke dirêj, wek ku bi wî xuya bû, şiyar bibe. Wî ferq kir ku diranên wî bi qûmê dibûn, ku lêva wî ya jor derketibû derve û dihişt bê rawest qûm bişemite devê wî. Devê wî jî zehf vebibû. Wî hewl da ku devê xwe bigire, lêbelê di nav lêv û diranên wî de zehf qûm hebû, li ser zimanê wî û bi

esmanê devê wî ve qûm hebû, lema devê xwe yekser dîsa vekir. Gava wî ev kir lêva wî ya jor dîsa derket derve, ber bi erdê ve, û niha jê ve zelal bû ku di tevgerê de ye. Wî dîsa bedena xwe hest kir, dît ku zixur di ber wî re dişemitin, çêja qûm eşkere tam kir û yekser tê gihîşt ku tiştekî divê nebûya hatiye serê wî; ew li wir û di wê kêliyê de pêk dihat û diviyabû bilezanda.

Ji nişkê ve xwe avêt erdê. Wî kêliyeke kurt li esmanê şevê û stêrkên mîna fîşekên şewqê mêze kir, lêbelê nikarîbû wisa bimaya, ji ber ku lingên wî li cihekî di se erdê re daliqyayî mabûn. Rûyê wî dîsa çû erdê. Vê carê destên xwe dan ber xwe, ji navê berjor xwe zivirand û pişta zilamê ku bi lingên wî girtibû û ew kaş dikir, dît. Li pêş zilamî quleke ji şevê tarîtir di çiyê de xuya bû, devê şikefteke ji keviran pakkirî bû ku ber wê de diçûn. Ji saniyekê heta bi ya din ew baş şiyar bûbû. Tiştekî nenas, ji wî bi xwe zahf bi hêztir, di wî de hatibû şiyarkirin. Wî xwe baş bi erdê ve eciqand, hişt ku tiliyên wî yên sist bi erdê de biçin û bê rawest bi her tiştê ku karîbûn bigihênê bigirin. Tiştek bi lingên wî ve bû; wer xuya bû livandina wan ji ya serê wî û milên wî dijwartir bû. Mîna ku di heriyê de bin, wî dest pê kir ku wan bilivîne, asoxî qorekî xwe kişand û pîhnek avêt û xwe zivirand lê xwe li ser xwe jî girt. Piştî vê dahfdanê, careke din û careke din lingê xwe avêt, heta ku tam ket ser erdê, asoxî li cihê xwe rawestiya.

Wî dixwest wisa, rûyê wî ber bi ezmên ve, ramedandî bimîne, wisa mîna ku ew li wir bû, tenê bêhna xwe bide bistîne û temaşe bike. Lêbelê mîna destekî mezin êşê dest pêkir ku serê wî dorpêç bike û di wê kêliyê de qula di çiyê de hat bîra wî û pê re dengê lingan bihîstin. Çi be jî ku di nava wî de ket tevgerê, hişt destên wî ji erdê rabin û bedena wî ji navê pê ve rabe ser xwe.

Qaçaxçî, li dûrî xaçirêka xwe rûnişt, lêbelê tirsa wî ya hîngê zêde dom nekir. Niha tevger li dor wî bû. Wî dengê lingan bihîst û di kêliya ew rabû ser xwe de derbeke nû lê ket, lêbelê

ew pûç nekir. Wî dest li ser bedena xwe hest kirin, qorziyên qapûtê wî ji hev bi dûr ketin û cawê wî qetiya. Wî dîsa qula di çiyê de li pêşberî xwe dît û xwe rast kir. Lûleya tivingekê zehf nezîkî wî bû û destê xwe avêtê, ew da aliyekî û destê xwe avêt zilamê ku niha asoxî qilafetekî birastî yî tam bû. Wî nizanîbû, bê dixwaze çi bike, tenê wî dixwest tiştê di destê xwe de zeft bigire û her ku tiving bêtir diliviya, ber bi jêr ve dibû, wî bêtir zeft pê digirt.

Tu nikarî bihesibînî ku tu li wir tenê yî. Ev hevok niha di serê wî re derbas bû mîna awazekê. Ew hîn jî li ser çokan bû û zilamê din î ku dest pê kir li dor wî tevbigere, zeft girtibû. Tiştekî hişk li serê wî rasterast li ber guhê wî ket. Destên Qaçaxçî sist bûn û careke din rûyê wî gihîşt erdê. Ew giran bû, ew yê li erdê bû û wî zanîbû divê ew niha mîna birûskê bi lez be. Rabûna ser xwe ji bo wî ji her tiştê berê dijwartir bû û ew dixist ber şepên derban. Ma çawa ew dê kariba rabiba ser xwe û pê re jî xwe nizmtir bikira. Wî dest û milên xwe rakirin û bi wan serê xwe parast. Kêliya ku tiştekî rû neda, çend saniyan di vê rewşê de ma. Hizir dîsa hatinê, bi cîh bûn. Qaçaxçî, destê xwe li qapûtê xwe peland, tiliyên xwe avêtin betanê peritî. Piraniya pereyê wî çûbû. Tiştekî bi lez xwe zû nêzîkî wî dikir, dengê lingên wî li ser vî erdi êdî baş nas dikir. Wî xencera xwe bi şêweyekî fêrbûyî ji zendika xwe kişand û ew li pêş yê nêzîk dibû girt. Lêbelê reşê dijberê wî dîsa ji wir bi dûr ket, wî di ber wî re bazda û niha berê xwe da qula di tahtê de. Qaçaxçî, da dû yê ku direviya, bê yî ku baş zanibe bê dixwest çi bike. Heta ku yê diz jê ve xuya bû, wî nikarîbû pere mîna ku wenda bûbin bipejiranda.

Di kêliya ku wî dabû dû yê din de ji xwe pirsî bê seba çi yê din tiving beranedayê. Berî ku bireve hundirê şikeftê yê diz li xwe zivirî û rûyê xwe yî xortane nîşanî Qaçaxçî da. Dîtina rûyê wî hişt ku Qaçaxçî bêtir bi biryar bibe ji bo ku pereyê xwe bi paş de bîne. Bêyî ku li ser bihizire ket qulê, ku berî bi pênc xulekan wî bi hemû hêza xwe xwe jê diparast.

Tiştê ku ji dûr ve mîna quleke di tahtekê de xuya kiribû, ji komkirina axê ya ser hev pêk hatibû. Mîna hewşekê derbasî kûrahiyekê dibû ku jê rasterast qulek diçû nava girekî bi gihayê sergirtî. Qaçaxçî xwe çeng kirê û xwe bi zor xist qulê. Di wê kêliyê de bi destê lerizî xençera xwe li pêş xwe girtibû mîna ku divê her çi bikeve ber wê birîn bike.

Wî bawer dikir ku di şikeftekê de ye, heta ku şewqê çavê wî rewrewokî kirin. Zilamê din lempeyek vêxistibû û şewqê rasterast davêt ser çavên wî. Êşa di çavên wî de ewqas xurt bû ku Qaçaxçî neçar ma destê xwe yê çepê ji berjêrî enîşkê bi ser çavê xwe de bieciqîne. Lêbelê wî kêliyeke zehf kurt dîtibû bê li ku bû û bi kê re li vir bû. Di nîvtariyê de rûyekî gewr ê xortekî ku ji Nêrîk ne mezintir bû, li pişt gurzê şewqê di tuneleke ku her diçû tengtir dibû û di bin erdê re diçû, xuya kir. Bi koranî, lê bi bi biryar bi pêş de xwe çeng kir, destê xwe ji ber çavê xwe daxist û bi rastî jî xort zeft girt. Wî zanîbû ku ev keysa wî ya dawî bû, ji bo pereyê xwe bi paşde bistîne. Lêbelê xençera di destê wî de jê re dibû asteng. Wî dixwest xortî zeft bigire, lêbelê devê xencerê tenê karîbû bê çikandin û jê bike. Wisa wî yê din bi giraniya xwe ber bi dîwarê tunelê yê ku xwe sipartibû stûnan û bi kokên bin erdê hatibû daliqandin û pê derxist bê çawa devê xençerê bi axa sist ve çû. Xort li hewa zeftkirî mabû, wî bi pihînan li Qaçaxçî dixist û bi tiliyên xwe çavên wî dieciqandin. Qaçaxçî serê xwe bi paş de kişand, lêbelê êşa xurt ku mîna rasterast li mejiyê wî bixîne xuya dikir, piçekî jî kêmtir nebû. Wî xort avêt erdê. Şewq mîna kesekî sêyemîn ê birîndar ku di navberê re dimeşiya û dilikumî, di ser wî re xwe kaş kir û li ser erdê ramedandî ma. Têrê dikir ku ew xort bibîne ku pêşî bê liv dirêjkirî ma û piştre dest pê kir ku bi çarpiyan here. Qaçaxçî berê xençera xwe da ber bi wî ve.

“Tu kî yî?” bi şêweyekî bêhnçikyayî got û: “Ka bi paş de bide min…”

Dengê wî pê eceb bilind û zehf nêzîk hat. Ew li hêviya bersîvê nema, du gavan bi pêş de çû û bi çavên nepixî dît, bê çawa xortî destê xwe avêt tivinga li erdê. Qaçaxçî serê xençera xwe ber bi bedena li erdê ya li ber xwe ve bir û wî zanîbû ew gihîştiye wê asta ku ew derfeta heyî baş bikar neyne dê bi jiyana xwe bedelê wê bide. Diviya û wî karîbû xençer lêbixista, ew mafdar bû, ew di metirsiyê de bû. Di vê kêliyê de awira wî ya şêlû zelal bû, mîna ku sêvoka çavê wî ya eciqandî dîsa şemitî be cihê xwe yê berê. Perde zelaltir bû, wî xort dît, çakêtekî kitan ê bi tayên derketî lê bû, potînên wî yên leşkerî ku qeytanên wan ne girêdayî bûn ji lingên wî re ewqas mezin bûn mirov digot qey lingên wî di nav pelên kelemke perixî de ne. Bi qasî saniyeyekê Qaçaxçî bi baldarî li qulê nerî, li wê devera ku tîrêjên şewqê yî zirav ji lempeya li ser erdê hatibû danîn ku mirov digot qey ew dixwaze rê li ber tariyê bigre. Ji wir dikarîbûn kesin din bihatana. Ew dîsa li xortî vegeriya, di dema ku pêwist bû de, ji bo ku pêhnekê li piyê wî bixîne û wî dîsa bavêje erdê. Wî hişt xencera wî bikeve ser erdê û asoxî destên wî ji pûçbûna seyr hatibûn rizgarkirin. Lêdan ji bo wî hêsan bû, mîna tiştekî naskirî pê hat. Xortê ku dixwest serê xwe bi destan biparêze, bi her derbê re bi Qaçaxçî bêtir nas dihat. Wî wê kêliyê di kefa destê xwe de por hest kir, beskura çakêtî ya hişk a birûn û girêza devê wî. Dawî wî karîbû careke din bi xort re biaxive: “Tu kî yî?” Çakêtê wî ji hev kir û li pereyan geriya û ew dîtin. Bêhnçikyayî xwe rast kir, û xortî ew keys bi kar anî û bi lez û şarazayî li ser dest û çonkan bi tûnelê ve bi çarpiyan çû. Ji saniyekê kêmtir Qaçaxçî, li nêzîka stûnekê, tiving li erdê dît û têgihîşt bê xortî seba çi neteqandibû. Berî ew tevbigere xort gihiştibû lampeyê û ew tefandibû. Ew di reşaya tarîyê de mabûn. Qaçaxçî erda li dor xwe hest dikir, mîna ku ew nêzîktir wî hatibe. Bêhna rehan jê dihat, bêhna şevê û ya şililiyê.

Wî xwe da bi paş de, ji bo wî tenê rêyek hebû. Kêliya ew gihîşt deriyê şikeftê, wî li ber şewqa şevê ya lawaz a ji rengê şîr,

erda bi giha û kevir dîsa nas kir û bêhnekê şipyayî rawestiyayî ma. Damarên cênîka wî û li devereke bê liv a çena wî ya jêr bi hêz lê didan. Tirsa ji qulê û ya ji tiştê ku dikarîbû jê derbiketa, di hûndirê wî de mîna zilamekî duyemîn serî hildida, zilamekî zehf sivik ku ne neçar bû ji erdê bitirsiya.

Lêbelê Qaçaxçî xwe bera ser çonkan da, kefên destê xwe danîn ber xwe û rûyê xwe nêzîkî ser rûyê erdê kir. Kêliya wî li gelek tulmên erdê mêze dikir, dît ku ew û xort ber bi aliyên berovajîyî hev ve bi çarpêyan diçin. Wî şopên lingê xwe û yên lingê xortî dîtin û destpê kir ku bi leztir bi çarpiyan biçe û bi paş de bide dû wan şopan heta ku xwe ji deriyê şikeftê bi dûr xist. Piştre ew ji şopekê heta ya din yek bi yek li navberên wan geriya. Berî ku ew her desteki xwe yan çonkeke xwe deyne erdê ew radiwestiya û hewl dida ku di bin destê xwe yî ku her carê bi erdê de diçû tiştekî hişk hest bike. Gelo xort zanîbû bê çi kiribû, dema ku ber bi vir de baz dabû, yan jî wî di tirsa şer de ev rîsk dabû ber çavan? Gelo xaçerêyeke wî bi xwe hebû, yan wî ev bi kar dianî, ji ber ku bê mayîn bû? Qaçaxcî, çêja qûmê di devê xwe de hest kir, û bi zimanê xwe ew ji patika devê xwe avêt. Di heman demê de guhê xwe dida dengên ji paş xwe ve. Wa bi hêsanî karîbûn bidana dû wî, ji ber ku ew ne neçar bûn ku bi çarpêyan biçûna. Wî destpê kir ku qûma li pêş xwe bi pifkirinê belav bike. Ew ji mayînên li ser rû di bin erdê de bûn ditirsiya. Tiliyên xwe li erdê pelandin, lê ev berî her tiştî bi kêrî aramiya wî dihat.

Ew ewqas li ser çûna bi çarpiyan hûr bûbû ku wî xaçerika xwe di kêliya dawî de nas kir. Çi nemabû ku di ser re derbas bibe, lêbelê awireke wî yî berbi rexekî ve seferên wî yî bi meşê anîn bîra wî. Xwe zivirand ser piştê û xwe rast kir. Şev dîsa şeveke havînê bû. Ba li dor wî dîsa mîna heywanekî kedî bû. Qaçaxçî deng ji hev derxistin, xuşîna deviyan ji ya gihayê û ya nefesa xwe cuda kir û destpê kir ku birînên xwe hest bike. Xwîna li aliyekî serê wî tev li qûmê bûbû û bûbû mecûnek; ku

destê xwe dida serê xwe tevahiya kafê serê wî diêşiya. Wî beşên bedena xwe yên din yên ku wî birîn texmîn dikirin saxt kirin, hêta xwe peland, sînga xwe, ji bo vê yekê lampeya biçûk a bêrîkan derxist û şewq avête ser destên xwe. Di wan de gelek qelş û xwîn hebû, berî her tiştî dişibiyan bi rewşa şerekî.

Wê şevê wî cara yekemîn û carekê tenê navber da meşa xwe. Ji her tiştî bêtir wî ji leşkerên qereqola sînor re newq vala dikir. Hîngê ji niha bêtir diviyabû wî di kêliya ew di ber wan re derdiket bi şêweyekî absûrd wek ku her tişt asayî be bilîsta. Wisa di demeke kurt a piştî şer de, dê çi bihiziryana ger ew bi qapûtê qetiyayî, destên bi xwîn û birînên teze di ber wan re derbiketa.

Wisa bi meşeke zehf hêdî vegeriya. Li ber çem bêhnvedaneke dirêj da û xwe şuşt. Dema ku ronayî ket erdê, wî ewqas xwe serastkiribû ku dîsa karîbû biçe nav bajêr bêyî zehf balê bikişîne ser xwe.

Li ser erda rast wî dît ku şînê rojê ji paşbingehê tarî yê ezmên xuya dike û ji nişkê ve xwe bi qederê çend metreyan dûrî zilamekî dît ku berî wê bi tu şêweyî hebûna xwe li wir eşkere nekiribû. Qaçaxçî, di cîh de rawestiya û bê hemdê xwe daqûl bû. Lêbelê yê din tenê bi serê xwe silav dayê. Zilamekî bejinzirav bû, kincê lê li ba dibû ku ji bayê mîna ku vala be dixuya, lêbelê ew di rastiya xwe de kevnebetaniyeke cûnikî bi deverên rengmihyayî bû. Tuwaletpaqijkerek, dînek, kesekî wisa ku Qaçaxçî piştî wê şevê li ser vî erdî tenê karibû lê rast bihata. Kêliya ku Qaçaxçî nêzîkî wî rawestiya, zilamî bi şelafî mizicî û bi daxwaz serê xwe doş kir. Ligel ku ronahiya hindik a roja ku dihat dîmenê li dor wan di wê navberê de zelal û aram dianî pê jî, rehetiya wî mezin bû, ji ber ku niha li rûyekî mêze dikir, li gel ku dostaniya wî çêkirî bû mîna tiştekî bi zor fêr bûbe jî. Qaçaxçî, tu tişt ji zilamî re negot, wî tenê serê xwe bi erênî hejand û di ber wî re derbas bû. Yê din betaniya xwe li xwe pêça û bi lez da dû wî, te yê bigota qey sozê tiştekî hatibû dan.

Ew di ser perçêyê erda bi qûm re meşiyan ku di navbera beşên reşahiyê re diçû ser rêya bajêr. Çi nemabû bighîştina armanca xwe, dîsa zilam tevgeriya; ew di cihê xwe de ma û li dor xwe mêze dikir, serê wî doş dibû. Qaçaxçî, li wî zivirî, ew li ser xaçerêka xwe dît, ku li vir ne tenê ya wî bû. Mîna teyrekî mezin ê rengtarî, li ser du lingan rawestiyayî bû. Qaçaxçî nikarîbû, tenê vegeriya nav bajêr, ji ber ku wî wê sibehê nedixwet kesekî li dû xwe li wê herêmê bihêle. Zilamî çavên xwe vekirin û tavilê bişirîneke şelafiyê xwe bera ser rûyê wî da. Lêbelê di wê kêliyê de çavên wî firehtir dibûn, mîna ku dikare li tiştekî navbera xwe û wî de temaşe bike. Lêvên wî ji ser hev çûn û hiştin ku diranên wî yî firk xuya bibin. Wî milekî xwe rakir û ber bi pişt xwe de, tiştin nîşan didan, lêbelê Qaçaxçî serê xwe bi neyênî dihejand û wî jî wisa rûyê xwe yê mîna maskeyekê bi biryar kir. Wî nedixwest wî zilamî li paş xwe bihêle.

Belkî jî, wek wî piştre ji xwe re got, wî tenê nedixwest kesekî di navbera xwe û xortê ku bi erdê de wenda bûbû bihêle. Wî dixwest bi tenê bê malê, herêma vala li dû xwe bihêle ku hingê, dema ku wî li wî aliyê ku yê dîn bi destê xwe nîşan dikir, mêze dikir, minminîk jê bilind dibûn. Herêma vala: Tu tişt divê nebûba, her tiştên li wir pêk hatibûn, ji xwe tenê re dixwest. Ev şêweyê wî yê poşmanbûnê bû ku wî di wê kêliya ku ji pereyê ku ji bo wî şerkiribû da yê dîn de, dest pê kir ku hest bike. Bi tiliyên hişk wî yek ji paçikên girêkirî yî qermiçî derxist, ew çirand û du kaxezên pereyan nîşan dan ji bo ku yê dîn ber bi wî ve bê. Zilêm yekser destê xwe daxist, bişirî û serê xwe bera ber xwe da; tevgera fêrbûyî ya li pêşberî kesê ku tiştek dida. Bi benekî nepen Qaçaxçî, ew bi dû xwe de kişand, ew bir nav kolanên bi kort û tulmik ên bajarê kevn ku di wê seatê de hîn yê qijikan bû. Piştî ku çûn nav dîwarên bajêr ên nêzîkî hev, zilam meşa xwe hêdî kir û bi vir de wê de çû, bi paş de ma, ji bo li ber deriyên nizim raweste, mîna ku li hêviya kesekî nas be.

Cerbohan di ser cihokên ku diçirisîn ên bi herdu aliyan ji keviran bilindkirî re çeng dibûn û qijik difirandin. Kêliya ku Qaçaxçî careke din li aliyê zilamî mêze kir, ew di nav komeke teyrên reş de bû û li deriyekî ku di dîwarê xwe de dîl girtî bû mêze dikir. Di dema ku ew vegeriya, ber bi wî de çû, Qaçaxçî bawer kir ku tiştek di wî de nas kir: ne dînitiyek, lêbelê bêeleqeya ji bo hemû tiştên jîndar, tiştên livbar. Porê wî yî kulavî, bûbû bist bisk, di bin baweşînka baskên qijikan de, ji hev bela bûbû, lêbelê zilam tenê dipa di hêdîbûna xwe de li ser heman bilindahiyê bi tiştên ne livbar ên li dor xwe re.

Qaçaxçî pere mîna ku bide hevalekî xwe bi dizî da wî, zilam bişirî, bê çawa wî destê xwe vekir: hêdî, tu şopa liv û kelecanekê lê nexuya bû. Ji ber buhokan Qaçaxçî nedixwest destê xwe bi wî bike. Wî destê xwe rakir bir ber çavên zilêm û da ser kuça ku berjor ve diçû.

Li ber malên ku pêşber wan bi bexçeyên tijî darên fêkî û mêwên tirî bûn kevok ji nişkê ve derketin pêşberî wî. Wan di fira xwe de siyên çeprast li ser kolkanê pêk dinîn û mîna mistek ronahî di ber wî re dişemitîn, wisa nizm mîna ku ji şewqa sibehê dihatin pekandin. Niha di vê kêliya rêwîtiya xwe de Qaçaxçî, hizrek ji serê xwe derxist ku ji qula erdê heta vir pê re hatibû: Wî xwestibû biçe ba Beno, ji bo li wî guhdarî bike bê çi bûbû. Bi dengekî seyr ê hêrsbûyî, ku piştî ji xulekekê bêtir Beno ji wî re diaxivî, dengê wî her carê diket wê rewşê. Beno êdî ew serpêhatî kiribû ya xwe, kêliya ew ji tunelê bi çarpiyan derketibû. Beno tevahiya bûyerê şîrove dikir, bê bermayî hemû zelal dikir û bi biryar gavên ji bo kirinê davêtin, û ne pêwîst bû ku Qaçaxçî wî li pêşberî xwe bibîne, ji bo vê bijî.

Ew zivirî ser kuça ku diçû mala wî. Dîwarên kevnbûyî û paceyên biçûk dîtin û ev hatina xwe ya malê ji her carê xurtir mîna derbasbûna devereke jiyana xwe ya bi tavahî cuda hest kir, di devereke bi şênî de ku tê de rêgezên din jî derbas dibûn. Ew devereke jinane bû, tiştekî ku her hebû, mijûliyeteke bi

dengê hêdî tê de hebû û tiştekî nerm, li gel ku dîsa jî sînorekî bê tawîz bû ku li ber derve bû, nedihişt kesek tê re derbas biba yan jî di wê demê de diguherand, lêbelê bi qasî ku êdî lê dihat û piştre derbas dikir.

Wî derî vekir û hîn di çêştxanê de ew pêrgî jina xwe hat. Wê bi kurtahî li wî mêze kir. Bişirîneke hûrik î şikbar li ser rûyê wê bû. Piştre di kêliya ku wî kinc û alavên xwe ji xwe dikirin de, ew bi ku de çû wê da dû. Ew li bende ma heta ku Qaçaxçî, kincên xwe ji xwe kirin, destê wî xist nav destên xwe û di vê kêliyê de yekser bi ya daxwazeke ji hundirê xwe yê herî bi hêz kir, bîrînên wî bi tiliyên xwe yên ku bi hemd diliviyan saxtî kirin. Wê lêvên xwe mîna ku dixwaze bifîkîne bi pêş de derxistin û ew neçar hişt ku li ser kursiyekê rûnê. Ew li hêviya pirsyarên wê ma, lê ew nehatin. Wê hişt ew rûniştî bimîne û ava germ anî. Wê birînên di serê wî de paqij kirin, Qaçaxçî bê deng bû. Dengin ji odeya razanê hatine guhê wî. Ji ber ku destûra ew serê xwe bilivîne tune bû, wî di qorziya çavên xwe re li wî aliyî nerî û herdu zarok dîtin ku mîna pisîkan di çarçeveya derî de rawestiyabûn û bi baldarî mêze dikirin. Jina wî kir miremir: "Li te xistine", û Qaçaxçî nikarîbû serê xwe jî bi erênî bihejîne, ji ber ku êşê wê kêliyê davêt heta paşhustê wî. Tîrêjên roya berî nîvro davêtin ser erda kevirî û wer xuya bû ku dengên li derve li hev kom dibûn ku ji bo tevahiya atmosfêra li vir bêyî wan nedibû. Wê sibehê Qaçaxçî xwe ne zehf bêtir ji herdu zarokên biçûk ku li wî mêze dikirin cûdatir hest nedikir. Wî xwe bi aliyê kêlekê ve sipart zikê jina xwe û pa heta ku wê ev rewşa taybet piştî demeke guncav di ber re bidawî anî.

# 7

Niha, piştî wî fanêre dîtibû, tirsa ku hinek bigirin ser wî nema ji serê wî derdiket. Ew karîbû bi paş de vegerya, di eslê xwe de wilo diviyabû jî. Tiştê paradoks ew bû ku mirov dikarîbû li bajêr çêtir fêr bibûya, bê kî li wan deran diçû û dihat. Wisa tevahiya herêmê ye, wî ji xwe re got. Nêzîkahî her tim û li her derê tevlihev û belawela bû, ne ji ber hebûna gelek derfetan, belkû ji ber kêmderfetbûnê bû. Wî pêywendiya di navbera xaçerêka xwe û tiştê ku nedihat zanîn de ya ku niha serê wî diêşand, texmîn dikir. Di eslê xwe de ev xaçirêk ne tenê di nav welatê sînoran re derbas dibû. Ew li her devera ku ew diçûyê bû.

Qaçaxçî, kaş li dû xwe hişt û êdî li her gava ku diavêt miqate bû û ber bi erdê mayînkirî ve diçû. Ber bi çayira bi kevir ve. Ew çayira ku hêdî hêdî bi kaş ve berjor dibû heta bi tahtekê û qotê çiyê yê berî şefîleyê. Kulîlkên zengilok vebûbûn û tayên gihayê ku bi bayê ketibûn erdê û belawelabûyî erd dinixumandin. Hîn komandoya ku li mayînan digeriya nehatibû vir. Tu dever li vir ne qedexekirî bûn û lewheyên îqazkirinê jî li tu derê tune bûn.

Qaçaxçî, li ber çayirê rawestiyayî ma, ji bo karibe devera ku tê re derbas bibe, baş destnîşan bike, çend gavan bi aliyekî ve çû û dîsa vegeriya. Cîh û rewşa keviran wek îşaret bi kêrî wî dihatin. Wî zû deq dît, çayir nehatibû guhertin. Şîşa xwe derxist, hingê wî careke din li dû xwe nerî. Li ser kêş tahta

yekemîn ji devera zerî gewr xuya bû. Mîna mînberekê panava gewr pê ve bû. Du darên melûl ên hema hema rûtîtazî tev li şaxên xwe ve di valahiyê de ber bi jêr ve tewiyayî bûn. Ew li dengên şevê hizirî û hesta ku ji malekê derketibe û bi piştrastî zanibe ku wî tiştek ji bîr kiriye pê re hebû.

Wî tûrê li pişta xwe rast kir û bi çarpiyan ber bi çayirê ve çû. Ji dûr ve mîna ku bi gihayê ser wê hatibe girtin xuya dikir. Tayên gihayê, ser erda hişk î sist nixumandibûn ku tenê cîh bi cîh rehên xwe berdabûn. Di vê de bû xayintiya wê deverê, ji ber ku berovajiyî tiştê xuya bû, wî derfet ji bo mayînên erdê dida ku mîna sê ferşên li ser hev xuya dikirin û yê herî biçûk li jor bû. Li qiraxa wan ferşan ji jor heta xwarê têl hebûn, bi gumaneke mezin ji bo ku baştir di erda sist de bimînin. Bi vî awayî ev tiştên herî pir mîna mezinahiya kulma destekî bûn, hebekî dişibiyan bi lîstokên zarokan.

Her carê piştî erdkolanê ku Qaçaxçî îşretên nivîskî yên tam di wî cihê ku divê valahiya binê ling li ser ferş rast bihata û pêlêbikira nas dikirin, di hişê wî de metirsiya rewşê dîsa zelal dibû. Van îşaretan çi destnişan dikirin jî, ne ji bo neqişandinê bûn. Ew mîna bermayên berdnivîseke kevn a ne ji bo xwendinê û li cihekî xewle bû. Li ser sêlikeke biçûk î kesk î qahweyî bi erdê ser wan nixumandî bû. Ew ji bo wî tiştî bûn ku di teqînê de, di birînê de û di êşê de wenda bibin û bi wî awayî peyama xwe bigihînin cîh. Ew mîna countdowna destpekirî, hejmartina bi paş de ya berî teqînê bûn.

Qaçaxçî, serê xwe baş nêzîkî erdê kir û li ser çonkan ber bi pêş ve şemitî. Tiştê wî di bin tara şefqeyê re li pêşberî xwe didît, xaçerêkeke ku baş dihat dîtin, lêbelê dîsa jî zehf teng bû. Kevirên biçûk ku wî bi xwe ew wek îşaretên bidizî şîrove kiribûn, rêberiya wî dikirin, lêbelê tenê bi qederê santîmetreyan, ji ber ku divîyabû wî rewş tam di hişê xwe de bidîta. Ku ev bi dest dixist, yekser radiwestiya. Wî kaxeza xwe ji bêrîka qapûtê xwe derxist û xêzên şêmayê bi erda pêşber

xwe re da ber hev. Cihê keviran di herduyan de hev digirtin, di planê xêzkirî û yê di rasteqînê de. Wî kaxiz li hev pêça û dîsa xist bêrîka xwe. Piştre şefqa xwe derxist û bi pişta destê xwe ser eniya xwe baqij kir. Ew tiştekî zehf girîng bû, ji bo ku xwêdan neketa çavên wî. Lema bi tiliyên xwe pişgîra xwe ji bêrîka qapûtê xwe ya hundir derxist û pê rûyê xwe zuha kir. Pişre ew danî ser pêşiya serê xwe, bi şefqa qesele zeft kirî, bi rexekî xwe eniya wî dinixumand.

Bi baldarî li her çarçik santîmetreya li dor xwe carek din nerî, xwe daqûl kir enîşkên xwe sipartin erdê. Careke din wî demeke kurt çavên xwe girtin, piştî wî bawer kir ku wî cihê yekemîn dîtiye. Piştre dest pê kir ku şîşê piçekî ber bi erdê ve daxistî baş bigre û tenê bi milîmetreyan bi erdê de bibe û bîne. Diviyabû di astengiyeke herî biçûk de ku ne ji erdê bi xwe bû, ew tavilê rawestiya û ev bû sedemê ku dihişt, li gel pişgîrê jî, xwêdan di ser cênîkên wî re berjêr biherike. Ji bo ku astengiyeke wisa hest bike li tiliyên xwe mêze dikir, mîna ku karibe bi vî şêweyî hesasiya wan zêde bike. Her diçû şîş bêtir bi erdê de diçû, lêbelê ji ber ku ew ber bi erdê ve daxistî ew digirt, wê tim xwe nêzîkî rûzemînê tevdida. Ger ew li mayinê rast bihata jî dê li qiraxa wê biketa, li wê devera wê yî bi perçeyêkî bi hev şidandî. Birastî jî serê şîşê li tiştekî ket. Qaçaxçî dîsa rawestiya û amûra xwe piştî saniyekê ji nav erdê kişand. Wî şîş danî kêleka xwe û destpê kir ew qula di erdê de bi tiliyên xwe kola û ax û kêsek dan aliyekî. Kanala ku hatibû qulkirin bû mîna kovikek ku Qaçaxçî devê wê yî fireh hêdî hêdî mezintir kir. Qiraxa mayînê ya binî xuya bû, rizyayî mîna dîwarê xirbeyekî biçûk. Bi paqijkirina hêdî bi tiliyên xwe re pêlikên qatên mayînê xuya kirin. Qaçaxçî çend santîmetreyan xwe ber bi pêş ve kaş kir û qûma li ser xeleka duyemîn da alî. Niha wî xwest ku mîna hosteyekî karên destan pif bike, lê wî nekir. Diviyabû ji jor ve qet giranî nekeve ser wê deverê. Piştî ku wî hewîrdora tebeqeya jêrîn vala kir, wî xwe ji navê berjor rast kir û milên

xwe dan bi paş de. Wî ji jor ve li wî tiştê ser û dor wî vekirî ku hema hema komîk xuya dikir, nerî, û ji bo biserketina xwe şanaziyek hest dikir. Kêfa ku ji xefikekê rizgar bûbû yan jî jê derbas bûbe, hesteke bêdawî bû. Wî çend caran nefes da û stand û dawiyê bêhna xwe çikand. Vê carê wî enîşkên xwe dananîn ser erdê, lêbelê tenê heta jê hat xwe ber bi pêş ve daqûl kir. Tiliyên herdu destên xwe ji hev vekirin û wisa qiraxa herî bi derve de zeft kir ku wî karîbû mayîn hema hema ji her alî ve bi carekê ve bilind bikira. Gava wî ew bi tevgereke zehf hêdî ji erdê qetandibû, ew hebekî qulipand û axa mayî ji qatê jor ket erdê. Wî ew bi qasî sîh santîmetreyî ji çîma xwe dûr danî cihekî nepen ê rex xaçirêka xwe, lêbelê bi şêweyekî ku tu qevdên gihayê nedigihîştanayê. Wî tûrikê kaxezî yê ku xwê tê de bû derxist û hinek jê rijand kovikê. Bi vî awayî wî karîbû, ger ew dîsa vegeriya, ew bi hêsanî dîsa bidîta. Ger ba xwê li ber xwe bibira jî, dîsa çêtirbû ku îşareke cîhdiyar bihata dîtin. Ew tenê dikarîbû ji aliyê kesekî ku serê xwe nêzîkî erdê bikira û binerya bihata dîtin.

Berî ew çûna xwe ya bi çarpiyan dom bike, wî careke din çavek li kaxeza xwe gerand. Li ser wê li gel cihê wan tîpa mayînan jî nivîsandî bû. Piraniya wan bi pêlkirinê diteqiyan. Lêbelê li sê cihên xaçerêkê ew mayînên ku dişibiyan bi pompeyeke rûnê mekîneyan hebûn: Sîlîndirên ku di erdê de çikandî bûn û ji jora wan tiştekî mîna antênekê bilind dibû ku di kêliya ku tiştek digihîştê mayîn diteqand. Li vir ev tehr wek "hilpekêr" jî dihat bi navkirin, ji ber ku berî ew biteqin tam metreyekê ber bi hewa ve hildipekin. Bi vî awayî misoger dibe ku pîjên pola binzikên mirovan perçe bikin. Ji bo Qaçaxçî sûdeke wan hebû û du xerabiyên mezin: Ger ew li gor planê xwe nêzîkî wê bibaya, bêyî ku erdê bikole dikarîbû ew bidîtina. Lêbelê ew ji mayînên ku bi pêlkirinê diteqiyan zehf girantir bûn û di kêliya ku mirov ew ji bin erdê derxistana an daniyana ser erdê diviyabû mirov li antênê zehf miqate baya.

Wî du mayînên din ên pahn rakirin, berî ku ew bigihêje “hilpekêra” yekemîn. Niha wî hemû tevgerên xwe ewqas hêdî kirin ku bi her kutkuta qapaxa çavê xwe re dicefilî. Wî her carê bi kurtahî li ezmên mêze dikir, ji bo ku westa wan bibe çavên xwe digirtin û vedikirin. Piştînîvroyê destpê kiribû û bayekî sivik li çayirê dixist. Ji bo kêliyekê Qaçaxçî dît ku wî bi çonkan xwe bera ser çoleke bê ber daye. Li gel ku li rex xwe wî karîbû herêm û qiraxên tahtan î tûj û tewra lûtkeya herî bilind bidîta jî, tu dûrahiya vê dîmenê ji bo wî tune bû. Ba bi xwe jî zehf nêzîk li pêşberî wî dilîst û dengên hindik î ku dibihîstin bi şêweyekî girtî mîna ku ji odeyekê bên, dihatin wî.

Wî dîsa serê xwe daxist, nêzîkî erdê kir. Tayên gihayê xwe dilivandin, vê rewşê ew şaşwaz dikir. Wî çend gêrgêrîk dîtin, zuxurekî spî û piştre jî antêna ku diçirisand mîna tayekî konê pîrê, rakişandî, ji bo ku bikaribe komandoyê werbigire. Qaçaxçî nêzîk bû û gîha ber bi aliyekî ve tewand. Wî rahişt bêrika xwe û dest pê kir û ku derdora sîlîndirê xwarbûyî bikole. Li vir ne pêwîst bû ew ewqasî miqate be, tenê diviyabû çavên wî li ser antênê bana.

Piştî wî qedand, xwe rast kir û bêhneke kûr kişand. Wî li rêya ku dê mayîna di destên wî de werbigirta mêze kir û devera ku wî dixwest wê deyne ser, destnîşan kir. Ger ew di ser xaçerêkê re bi paşde vegeriya ew dever diviyabû di pêlên ser erdê de cîhekî parastî bûya û li gel wê jî zû bikarîba bihata dîtin. Wî destên xwe daxistin qulê, danîn ser cismê ku dor wî hatibû valakirin, ew bi tiliyan zeft girt û ji erdê derxist. Di kêliya ku ji erdê dihat derxistin de diviyabû tiştek bi rê de negihîşta antênê. Qaçaxçî, destên xwe bi wî şêweyî livandin, wek ku ji berê de plan kiribû. Wî sîlîndir danî wê devera ku berê jê re destnîşan kiribû û ew hebekî bi erdê ve bir heta cihê xwe baş girt. Wî bêhna xwe stand û herdu destên xwe bi lez ji wî tiştî bi dûr xistin.

Ji ber ku mayîn wisa mezin bû, ew neçar bû ji çaran sisiyan jê dîsa bixe bin erdê, ji ber ku kesekî nasê wê erdê ba dikarîbû ew bi dûrbînê bidîta. Kortek kola xwe li ser xaçirêkê ramedand û mayîn daxist kortê. Sîlindîr ewqas wenda bû ku tenê ji nêz ve bi piştrasî xuya dikir bê çi ye. Dîsa korta din îşaret kir û çûna xwe ya bi çarpiyan dom kir.

Heta ew di ser wî erdî re derbas bû, êdî bûbû êvar. Her kêliya çûna ava ya royê Qaçaxçî, hest kir, ji ber ku wî berî û piştî rakirina her mayînê li jor mêze kiribû. Pênc gavên dawî yên ji erdê bi kevir dûr ku dihişt devera bi hêşîn ji nişkê ve bi dawî bibe, hesta rehetiya qedandina karê xwe didayê. Ew bi çarpiyan li ser erdê step ji wir derket ku yekser hesteke ewlekariyê da wî û li pişt li ser xaçirêka xwe çavên xwe li tiştekî gerandin. Tu mayînên ku hatibûn rakirin û li devereke din hatibûn danîn xuya nedikirin, ya dawî jî nexuya bû, ji ber ku wî ferşê wê daxistibû nav erdê.

Qaçaxçî rabû ser xwe û şal û qapûtê xwe paqij kir. Di van kiryarên xwe de ew her bi dîqet bû. Bi derbasbûna ji ewlekariya sînor wî beşê bêtir ê rêya xwe li dû xwe hiştibû.

Niha mabû ku ew derkeve pêşberî leşkerên qereqola li ser sînor. Li gel ku wan nizanîbû bê dê kengî ew bê jî, wan hesabê hatina wî dikir. Nobeta kê hebaya jî, ew li hêviya "buhayê derbasbûnê" bû. Cihê wî dixwest biçêyê sê kîlometreyan dûr ji rex şifîleyê bû. Ji ser sînor hesteke wisa bi mirov re çêdibû ku wir devereke berdayî ye, tê re rêyê ber bi gelî de çiv didan xwe. Lêbelê di rasteqînê de derdora sînor li aliyê dewleta cîran gelek şênî dijiyan. Li rex wî cihê ku ew her carê pêşî diçûyê, gelek gundên biçûk jî hebûn ku ne dûrî hev bûn. Kengî dema wî hebûya, wî bi kêmanî serdana yekî ji van gundan dikir, ku lê araq erzan bû. Lêbelê vê carê wî dixwest tenê biçe bajarok.

Wî da ber xwe ku heta jê bê zû bikeve ser rêya vegere. Yan na dê ew şeva duyemîn û sibeheke din û piştînîvroyê jî li dewleta din derbas bikira. Ne xema wî bû ku ew derengê piştî

nîvro ji nav erdê bi mayîn derbas biba, ji ber ku xistina erdê ya mayînan her ji rakirina wan zûtir pêk dihat û wî ne bi bêdilî şev li derve derbas dikir, berî ku ew vegeriya nav bajêr. Lêbelê vê yekê ew ber bi wir de dikişand.

Li ser rêya ber bi şifîleyê ve leşkerên nobedar hatin bîra wî ku karîbûn li wir hebana, lêbelê dê wan tenê karîba bi baldariyeke mezin ferq bikirana ku xaçirêkek din di nav erdê bi mayîn re derbas dibe. Bê wekî din çi ew nearam dikir, wî nedixwest bîne bîra xwe.

Ew bi teperep ber bi sînor ve diçû û hewl dida ku li ser tiştê li pêş wî bû hûr bibe, li ser malên ku jê hatibû xwestin yek bi yek hizirî û texmîn kir bê vê carê dê tûrê wî yê piştê çiqasî giran be.

Ber êvarkî gihîşt qereqola ser sînor, barakayek di nav kevirên gewr de bû. Tenê rê ji nav çola bi kevirên gewr ên qehweyî derdiket pêş, şerîdeke ji rengê vekirî bû. Konteyner li gor rêya wî werçep bû. Kêliya ku Qaçaxçî nêzîkî wê bû kesek li wir nedît. Tu rêgirtin tune bûn û ji barakayê pê ve tu îşaretên sînor jî tune bûn. Deriyê aliyekî zirav ê barakayê vebû, lêbelê kesek daneket ser derenceya kurt. Li hundir li benda wî man.

Qaçaxçî bi kêfa xwe nêzîk bû û berî ew bigihîje nerdivanê, bi dengê bilind silav da. Ji xwe re kiribû adet ku bêxem û bi dilşadî dihat ser sînor, ji bo ku peymana wan a bi hev re bi şêweyekî bi lîsk pêşkêş bike. Jê pê ve gengaz bû, ger ne bi gumaneke mezin ba jî, ku carekê yekî ku ji rewşê ne haydar bû li wir ba, dibe jî ku serbazek ba jî.

Ew derbasî barakayê bû û pêrgî awirên çar leşkeran hat. Ew li dor maseyeke kevn rûniştibûn, xwarin dixwarin. Tivingên xwe sipartibûn dîwêr. Yekser serdana wî ya Avahiya Sor ya bi êş hat bîra wî. Piştre tavilê li zilamên li wir vegeriya. Yekî ji wan kursiyek pêşkêşî wî kir. Ew li nik wan rûnişt û cixareyên ku wê kêliyê pê re bû li wan belav kir. Her çaran dev ji xwarinê berdan û mîna ku çixareyên wan bi xwe di bêrîka wan de tune bin, bi daxwaz çixare kişandin.

Niha diviyabû Qaçaxçî, bi wan re sohbetê bike. Rola wî ya mêvanekî ji nişkê ve hatî bû ku her çar jî ji aciziya wan rizgar kiribû. Pirsgirêk ziman bû. Bi hemû leşkeran re rewşê her carê bi heman şêweyî rûdaw pêk dihat: Ew çend hevokên ku dihatin famkirin diaxivîn û wî hemû peyvên ku nas dikirin, didan hev û îşretên mîmîkê lê zêde dikir. Leşkerên li ser sînor gelek caran ji derên dûr dihatin û danûstandina bi wan re dijwartir bû ji ya bi mirovên derdorê re ku berî şer jî li vir dijiyan û bi herdu zimanan zanîbûn. Ji ber vê rewşê leşker mîna dagirkerên li welatê xwe dihatin dîtin. Bi demê re Qaçaxçî têra xwe peyv fêr bûn, ji bo ku bikaribe beşdarî axaftineke hêsan bibe. Hîn di destpêkê de wî tesbît kiribû ku şiyana axaftina bi wan zilaman re xwedî bandoreke rasterast a li ser qederê ku divê wî bidaya bû. Leşkeran vatiniyên xwe li hember yekî biyanî bi tundî pêkdianîn û bi gumaneke mezin ne bi nêta ku buha bilind bikin. Ev tenê ajoyek bû.

Mîna her carê yek ji wan herî pir diaxivî û ew zilamê herî girîng bû. Ew li hember Qaçaxçî rûnişt, bi kişandina çixarê re pala xwe da paş de û piştî kişandina her bêhnê wî bi qiraxa jor a tiliya xwe ya mezin simbêlên xwe paqij dikirin. Wî li nûçeyên nû yên li aliyê xetê yî din pirsî.

Qaçaxçî, kêliyeke kurt ponijî û piştre bi vegotina çîroka 40 pileyî ku bi biryara jor habibû belavkirin, gihişt armanca xwe. Zilaman ji xwe re kêf dikirin, lê ne mîna ku bi henekekê, bêtir mîna ku tiştekî bi wan nas be. Wan ji ken bêtir serê xwe bi erênî dihejandin û şîrove dikirin.

Pê re atmosfer nermtir bûbû, baraka bûbû cihekî ji derveyî pergala tevahî. Yek ji zilaman rabû ser xwe, qeytanên ku şalên wî bi wan vebû, li ser milên xwe rastkirin û sêniyeke teneke ji Qaçaxçî re anî. Wî xwarin xwar û piştre jî çayê vexwar. Axaftin edî hew ewqas girîng bû, ji ber ku heta piştî çayê ew tenê mêvanekî asayî bû.

Bi qasî wî karîbû fam bikira, her çaran li ser germa havînê li paytextê xwe û piştre jî li ser lîska pêgokê sohbet dikirin. Di kêliyekê de bêhnvedanek pêk hat, dor dîsa hatibû wî. Wî behsa çêleka ku di xanîkê kevin de golik anîbû kir, bi kitekit behsa wê bûyerê kir ku wî dîtibû. Lêbelê wan nizanîbû bê divê ew vê çîrokê çawa fam bikin. Hemûyan ziq li wî mêze dikirin, mîna ku di rûyê wî de li tiştekî bigerin.

Qaçaxçî, gulpek vexwar, mîna ku paqij bike, destê xwe di ser devê xwe re bir û ji wan re behsa leşkeran û qemyona ku bi rê de mabû kir. Dîsa kêfa wan hat, çêlek hatibû ji bîrkirin, bi derengî di wê kêliya ku qemyon ji cîh liviya û serbaz çeng bûbû pêş. Dîsa naskirin û bawerî ji nenasiyê mezintir bû.

Qulta çayê ya dawî şêrîntir kir Qaçaxçî û leşkerê zehf ciwan ê li tenişta wî xwest bizanibe bê wî seba çi ew kir. Rûyê wî şayik bû, li ser çena wî çend mû hebûn. Qaçaxçî, di kêliya ku bersîva wî dida de, nikarîbû lê mêze bikira. Wî kursiya xwe bi paş de da û rabû ser xwe. Serbazê wan ji paş maseyê hat pêş û ew bir ber derî. Li wir wî qefla dolarên kaxiz wergirtin. Qaçaxçî destê xwe rakir ber bi zilam de bir û ji bo givaştinê destê xwe dayê. Piştre bi çend peyvên dostane bi mêredewanê ve daket jêr û çû.

# 8

Hingê, piştî şerê bi wî xortî re, jê re neçû serî ku pêrgî Beno nebe. Piştî çend rojekî Beno, hişt ku Qaçaxçî ji malê bê anîn, bi wî zilamê ku Qaçaxçî ji zû de zanîbû ew bi dû wî de ye, yê ku di nav bajêr re dida dû wî û li sûkên tijî şênî nearam dibû. Piştî gotûbêjeke kurt Qaçaxçî, jina xwe razî kiribû ku çêtir e, ew bê pasûmana serê xwe ji malê derkeve. Wî niha şaşikeke xistibû serê xwe û derket derve, hin xeramûşkên lê bal nedikişandin. Gava ku bang wî kirin, xema wî tenê parsûyên wî bûn. Wî bawer dikir ku yek ji wan şikestî ye.

Beno, dîsa di wê odeya rût de li pêşber wî rawestiyayî bû û Qaçaxçî li ser kursiyê rûniştî bû, lê hizirîbû ku êşa xwe nede der.

"Nexwe, ka ji min re behs bike."

Qaçaxçî kêliyekê pa, li dijî refleksa ku bipirsiya "ez behsa çi bikim?" derket. Beno serê xwe rakir û li hundirê odeyê nerî, mîna ku wî di wê kêliyê de biryara aramîparastinê dabe. Wî bi hêz ji pozê xwe nefes dida û distand.

"Tiştê ez ji te dixwazim, tenê zaniyariyek e. Tu li jor pêrgî kesekî bû, ger bersîv erê be, li ku? Divê ez vê ji te bipirsim. Ev tişt ne bi tenê bi te têkildar e. De ka alîkariya min bike."

Wisa dom kir, heta ku Qaçaxçî bi bêdengiya xwe gihîşt sînorê ku hew dibû.

"Hûn çi dixwazin? Tiştekî girîng rû nedaye."

Bi vê "hûn"ê Qaçaxçî, dîtina xwe ya li ser rewşê tev li lîskê kir. Beno niha wek berpirsyarî nedidît ku ew tiştê fikirîbû pêk bîne, axaftineke di nav nasên berê de bi rê ve bibe. Li bayê lezê li dor maseyê zivirî û kefên destên xwe sipartin ser wê.

"Kurê te doh hat girtin, bi sê kesên din re, ji wan du heb bi esil ji Îranê bûn. Niha serêşên wî ji yên te bêtir in." Dengê Beno hatibû guhertin, ew bûbû monoton mîna yê bêjerekî nûçeyan. "Tiştê niha dibe, hema hema qet nikare ji derve de bandor li ser bê kirin. Axaftin bi dawî bûye." Xwe ji ser maseyê be paş de dahf da û di ronahiya rojê ya tarîbûyî de li ber paceyê şipyayî rawestiya.

Kêliya ku hingê Qaçaxçî, di ser cîhê meşqê ya leşkeran a wek her tim vala bû re bi paş de vegeriya, hesteke xwe nebaşhiskirinê pê re tune bû. Ew ji aliyê giraniyekê ve hatibû dorpêçkirin ku wer xuya bû her tiştê li dor wî giran û bêliv dikir. Di hişê wî de ev mîna bêdengiyeke ku dor wî girtibe bû, wek ku di nav mijeke hewîrdor girtî re bimeşe. Piştî ku wî têlên li dor Avahiya Sor li dû xwe hiştibûn û ketibû nav jiyana bajêr î rojane, wî zanîbû ku ew ber bi aliyê şaş de çûye. Her tiştê ku wî dikarîbû bikira, diviya ku bikira, tenê di ser Avahiya Sor re gengaz bû. Wisa ew vegeriya û jê re hatibû gotin ku divê ew adinî rojê dîsa bê.

Îro wî zanîbû vê redkirina xwe şîrove bike. Wateya wê di tiştê bi dû re hat de bû: Wî dest bi jimartina saetan kir û bi her saeteke ku derbas dibû re ji wî ve zelaltir dibû ku dikarîbû ji bo kurê wî ya dawiyê be. Ji bo wî ne gengaz bû ku bi vê zanînê biçe malê û wisa tev bigere mîna ku her tişt serast e, wek ku wî di despêkê de dabû ber xwe. Wî nikarîbû qet tiştek bikira, ji payînê pê ve.

Wê şevê ew li tu cihî zêdeyî sê xulekan nema. Bajar biçûk bû, piştî demekê li bin dareke biçûk a li rex rêya derve ya ber bi başûr ve diçû rûnişt û tayên gihayê dicûtin. Berî berbanga sibehê bi kêliyekê, ew dîsa vir de wê de diçû û dihat, hat ser

hizra ku divê ew baweriyeke baş bihêle, ger ew biçe wir. Ew çû malê, xwe şuşt û kincên xwe guhertin. Pê re hizreke din hatiyê ku heta îro jî dev ji wî bernade: Wî girêdaneke di nav wî xortê ku xwestibû wî bişelîne û Nêrîk de baş zelal didît. Bi şêweyekî ku pejirandina wî zehf dijwar bû, ne tenê herdu bûyer, lêbelê herdu xort jî yek bûn û wî hew karîbû ew ji hev cuda bikirana. Wateya vê li hev rasthatinê ewqas mezin bû ku nikarîbû tenê rasthatiniyek bûya. Wî kurê xwe ji ber çavan wenda kiribû, di kêliya ku ew li yên din rast hatibû -yan jî berovajî. Wateya vê serpêhatiyê ji her alî û goşeyê ve heman tişt bû.

Dema ku dawiya dawîn ew dem hat, ew nebirin odeya Beno. Ew bi dû leşkerekî di korîdorên tarî yî gemarî re derbas bû û dawiyê li pêşberî zilamekî bi qilafet bi îfadeyeke rû yî ku nedihat pênasekirin rawestiya. Zilam bi destikê deriyê odeya xwe yî vekirî girtibû û li hêviya wan bû. Wî bala xwe hew da leşkerê ku tevgerên ji nişkê ve pêk dianîn, destê xwe yê vala bilind kir û Qaçaxçî dahfand hundir odeyê.

Hundir ji ba Beno jî tarîtir û rûttir bû. Keskî nikarîbû bigota bê li vir çi dibû û li ser çi kar dihat kirin. Odeya bi maseyekê, du kursiyan û lambeya dirêj a li erdê mîna modeleke mezin a buroyekê xuya dikir. Li ser maseyê ji pênûseke ji rengê keskê zeytûnî yê leşkeran pê ve tiştek tune bû. Di rewşeke din de dê Qaçaxçî pê bikenya. Zilamê qelew ew bir ber kursiyê û dev jê berneda heta ku ew rûnişt. Pace, ber bi hewşê de bû û Qaçaxçî dikarîbû bidîta bê avahiya gewrî gemarokî çiqasî mezin bû ku devereke bi qûm bi komên mezin ji axê mîna di navendê de wek kelbetanekî zeft kiribû.

"Ka bêje bê çi bûye?"

Qaçaxçî ewqas bi vê pirsyarê şaşwaz ma ku wî qet nikarîbû ew bibersivanda. Zilamê qelew li hember wî rûnişt. Li pêş xwe mêze dikir û rahişt pênûsê xist destê xwe. Bi wê, virde wê de lîst û çend saniyan pa, berî ku bi heman şêweyî careke din bipirsî: "Ka bêje bê çi bûye?"

Qaçaxçî, tê gihîşt ku evê li vir ne wek Beno meyildarê felsefeyê û dirêjkirina axaftinê ye. Vê carê ji hemû carên din bêtir ew bera nav Avahiya Sor dabûn. Li vir aramtir bû ji beşên avahiyê yî pêş. Ji ber ku belkî ev zilamê qelew derfeta dawî bû ji bo kurê wî, hat ser xwe û hemû tiştên ku hatin bîra wî gotin. Wî bi totema pêlava li rex rê dest pê kir û bi Nêrîk bi dawî anî. Pê re her tişt bi hev ve hilandin ku wî careke din bi kurê xwe dest pê kir û kêliya ku zilamî pênûs hêdîka danî ber xwe û serê xwe rakir, wî ji nişkê ve dawî anî. Zilêm ji çavên şêlû, lêbelê şiyar, li Qaçaxçî mêze dikir ku di wan de bixwenebaweriyek jî hebû. Ew bişirî, mîna ku bixwaze kêfa kesê li hemberî xwe bîne, lêbelê dîsa dev jê berda, lêvên xwe kêliyeke kurt kirin mîna ku maçekê bide hewayê û rûyê xwe sist kir.

"Ango tu dixwazî ji min re bibêjî ku tu li kurê xwe digerî."

"Ma tu tişt li ser wî eşkere nebûne?"

Zilam di ber xwe de bi erênî serê xwe hejand. "Ew yekî krîmînel e, dizek û bi gumaneke mezin ew sabotajçiyek e jî. Ewqasî em li ser wî dizanin. Lêbelê tu li ser wî çi dizanî? Herhal ne pir -yan jî tu ji me re nabêjî?"

Dîsa Qaçaxçî xwe qulipand, wek ku bixwaze her tiştê ku wî li ser Nêrîk zanîbû bîne ba hev. Ew ji serîhejandina zilamî ya bêrawest têgihîşt ku tu tiştên wî digotin bala zilêm nedikşandin. Li gel vê jî wî axaftina xwe bir heta dawiyê, dem bi peyvên xwe dagirt, ji bo ku qe nebe tiştekî bike. Piştre ew bêdeng ma. Siyên li ser dîwarê rût destpê kirin ku bireqisin û bijenin, fenomeneke ku wî nikarîbû îzah bikira. Ji korîdorê dengê lingan hat, lê dengek tenê jî nedihat. Zilamê qelew jî zehf hêdî diaxivî. Berî wê wî lempe pêxistibû û ew wisa zivirandibû ku ser maseya vala di navbera wan de ewqas ronahî bûbû û pênûs wisa zelal dixuya mîna nimûneyeke ji pêşangehekê be. Bêhneke nexweş a lastîkê ji şewqa lempeyê ya ku dikir qiçeqiç derdiket.

"Tu dizanî, ez ne neçar im ku ez tiştên tu ji min re dibêjî balkêş bibînim."

Bi şewqê mîna ew li odeyeke duyemîn a teng ku bêhna mirov diçikand de, bi hev re rûniştî ne, xuya dikirin. "Tu vê dizanî. Tu dikarî ji xwe jî bipirsî, bê tu kî yî, ku divê peyvên te bala min bikişînin." Wî yekser li jor nerî û Qaçaxçî, piştî kêliyekê rawestiya, destpê kir ku serê xwe bi erênî bihejîne û bi vê hejandinê re kete rewşeke ku ji zû de ji bîr kiribû, tevgereke ku baş fêr bûbû. Bi hêztir serê xwe bi erênî hejand, mîna ku ji xwe re bihejîne û bi dengekî bi bawerî got ku ew vê dizane û dê tu carî nehata vir, ger ne-

Li hêviya vê bû zilamê qelew, ji bo ku ew bi xwe karibe mîna kesekî mezin serê xwe bi erênî bihejîne û destê xwe bilind bike ku ji bo Qaçaxçî dihat wateya ku divê ew hiş be.

"Tu krîmînelekî ku em pê re îdare dikin î", wî dîsa dengê xwe bilind kir. "Niha here, em ê binêrin." Ew rabû ser xwe, lempe vemirand û hêdî hêdî ber bi derî ve çû.

Qaçaxçî zanîbû, ku ev saniyên wî yên dawî bûn. "Tika ye", got, "kengî ez dikarim dîsa bêm. Tika ye -demekê."

Zilamê qelew dîsa bi erênî serê xwe hejand û hişt ku ew heta ber deriyê vekirî bê, berî bi kurtepist jê re bibêje: "Tu ê sibe bê anîn."

Roja din sibê zû du kesên ku bi kincên xwe bal nedikişandin û bi çek bûn, bi Landrovereke bi rengê keskê tarî hatin. Li ber malê motor şixulandî hiştin û li bende man. Jina wî bi destên xwe yî bi lez kincên Qaçaxçî serast kirin û jê re got ku divê ew li ber pereyan nenere û ku tpêwîst bû kî dibe jî pereyan bide wan. Çavên wê bêxew û xemgîn bûn, kêliya wî ji bo xatirxwestinê û ji bo ku ew bextewar li bûyera wî bihizire, eniya wê maç kir.

Hizra wan a li ser kurik, herdu ewqas mijûl kiribûn ku ew piştî ket tirimpêlê, dest ji xwe pirsînê kir, bê van kesan dixwest çi bi wî bikin. Hema hema ecêbmayî mabû bê di vê hemû çewisandinê de hîn jî cîh hebû an di wê kêliyê de pêk hat ku ew ji bo xwe xeman bixwe. Qe nebe bi serhişkî, wek wî di vê

navberê de zanîbû, zanyarî nedabûn Beno. Encamên vê yekê dikarîbûn çi bana? Herdu zilamên li peşiyê bêdeng bûn, lê xuya bû ji bêhemdî. Yekî bi tiliyên xwe mîna ku li tepilkê bixe li cihekî dixist. Şifêr, gelek caran di mirêkê re, ji bi qasî pêwîst bû bêtir dinerî.

Wan ew ji bajêr derxistin, ber bi başûr ve birin. Qaçaxçî ji xwe pirsî, bê armanca wan dikare çi be. Wî qet nedixwest bipirse; pê wisa dihat ku ne li gor pîvanan e, ger ew di rewşa xwe de wek ê yekemîn gotinekê ji herduyan re bibêje.

Piştî nîv saetê bi tirimpêlê çûn, zivirîn ser rêyeke ku ji bo trimpêlên sivîl girtî bû. Ew asfaltkirî bû û diyar bû ku ew di nav girên vê herêma zuha ya bi toz re derbas dibûn.

"Niha dê tiştek bê serê te", yê li kêlaka şifêr ji nişkê ve di ser milên xwe re avêt wî. Piştî çend saniyan ew dîsa li paş xwe zivirî û bi dostayî bi Qaçaxçî re bişirî, bêyî ku tu guhertin lê xuya bin.

Qaçaxçî nizanîbû, bê divê ew çi jê fam bike û bi zorê ew jî pê re bişirî. Lê dilê wî dest pê kir ku bi hêz lê bide, di wê kêliya ku li bende bû ku têbighêje bê zilêm dixwest jê re çi bibêje. Dibe ku di tevahiya demê de xeyalên wî hebûn bê ev zilam wî dibin ku: Wî goristanek li pêşbêr xwe dît, goreke vekirî, ji bo xwe yan jî ji bo Nêrîk. Wî di cama du felqebûyî re li dîmenekî hema hema rût, li dar û dirîkên ku di rex rêyê re derbas dibûn, mêze dikir û bêdeng dima, bêyî ku karibe.

"Bi esehî te ev hîn nekiriye. Wê li hesabê te bê." Zilam dîsa keniya, wek ku ev lîska şagirtên dibistanê be, Qaçaxçî hew tev geriya.

Li paş rêzeke ji girên rût, erebe bi lez ket ser erdeke rast î zer û qehweyî û ber bi hin avahiyên mezin ve çû. Li her derê kevirên pahn bi rengê vekirî hebûn ku ji bin wan sî mîna ku bi eceqandinê re ji bin wan derkeve xuya dikir. Bergehên bi têlên bi dirî xuya dikirin ku ew ber bi navendeke polisan an jî artêşa leşkeran ve diçûn. Piştre ji nav barakayên ku baniyên wan

teneke bûn ve helîkopter xuya bûn, mekîneyên mezîn ên leşkerî bi rengê leşkeriyê û bi perên rotorê yî zehf mezin mîna ku sist bûbin, berê wan piçekî berjêr ve bû. Berî ku Qaçaxçî bikaribe bûyerê fam bike, erebe rawestiya. Li ber avahiyeke dirêj î nizim peya bûn. Şifêr bi destê xwe îşaretek kir û Qaçaxçî di cîh de rawestiya.

Wî hest kir ku xwêdaneke bi hêz pê ketiye û hewl da ku bala xwe bide derdorê. Wî di xaniyên mezin de geracên belafiran û di yên biçûk de beşên rêvebirinê û malên xebatkaran dîtin. Anten ji nav toza kombûyî derdiketin û ber ezmên ve bilind dibûn. Zilamên bi kincên kar ku her kêliyekê di wir re derdiketin, piçekî bêhna wî anîn ber wî. Nexwe ew devera ku ew lê bû qet ne hepis bû.

Ji avahiyê leşker derketin. Herduyên pê re yên bi kincên sivîl li ber derî xwe dan paş û yê ku li kêleka şifêr rûniştibû bi rastî jî bi Qaçaxçî re dibişirî û kêliya ku leşkeran ew bi xwe re birin ji paş ve hîn jî li wî mêze dikir. Bi gumaneke mezin li ber diket, ji ber ku ew nikarîbû bi wan re ba.

Qaçaxçî birin rex helîkopteran û di yeke qerase de dan rûniştin. Tu carî di jiyana xwe de wî tiştekî wisa nedîtibû. Li hundir biqasî ku nedipa hindik cîh hebû û tenê paceyên mîna taqan hebûn. Her tevgera di vî hundirî de dengekî mîna yên tenekeyan derdixist. Leşker siwar bûn, heta wisa teng bû ku ew neçar ma serê xwe ber bi dîwarê helîkopterê de bizivirîne, ji bo ku bikaribe bêhna xwe bide û bistîne. Piştre dengê girîniya rotorê hat, her çû bêtir bû, hişt ku ji qûma ku ber bi jor ve li hev digeriya pace kor bibin û wê dawiyê hemû ber jor ve kişandin, ji nav wê rewşa xumamî ew birin nav ronahiya şewqa berî nîvro. Qaçaxçî madeyê xwe hest kir, bi hinarkên rûyê xwe li dîwarê helîkoptere yê ku dilerizî ket û giraniya leşkerê li kêleka xwe li ser milên xwe hest kir. Di ber paceyan re girên cîh cîh bi devî û gihayan derbas dibûn û şînahiya ezmên bi şêweyekî seyr çepraz xuya dikir. Giregir di destpêkê de pê mîna ku nayê

debarkirin hat, lêbelê piştî demekê ew bi hejê ve heliya û mîna her tiştê di hundir helîkopterê de tevahiya bedena Qaçaxçî dorpêç dikir.

Bajar bi lez nêzîk dibû û di bin wî re bi dûr diket. Wî hewl dida ku fam bike bê çawa kolan û kuçe ji jor ve xuya bûn, her carê tiştek nasdikir û dîsa ji ber çavan wenda dibûn. Ji nişkê ve awirên wî li ser reşekî dur eliqî ma, tiştekî ku nediguhert û yekser dîsa dihat naskirin: Çem perçeyekî ji şînê bi ser kesk ve bû di vî dîmenê vekirî yî hema hema ji rengê çermê mirov de xuya dikir. Her çû ew nêzîktir bû, lêbelê dîsa jî wek çemê wî ma, fireh û giran. Piştî ew rasterast di ser wî re bûn, li ser rûyê çemî pêlên rabûyû ji hev bi dûr diketin. Çem mîna qiraxa rûpelekê bû ku Qaçaxçî ew gelek caran û bi baldarî xwendibû. Niha ew vekirî bû û wî her tişt ji bilindahiyê jî nas dikir. Wî cara pêşîn tevahiya dîmenê didît ku xaçerêyek tê de bû mîna qelşeke nepenî. Wî rûyê xwe bi cama paceyê ya qalind î gemarî ve eciqand û hêdî hêdî tiştên wî li jêr nas dikirin, ji hev derxistin, lûtkeyên yeko yeko, tevahiya zincîrên çiyayan, heta bi daran jî.

Wî dîsa madê xwe hest kir û jê pê ve bi serê xwe li dîwêr ket, di kêliya ku helîkopter berjêr bû û xwe ber bi rûzemîna ku direviya ve piçekî xwar kir. Wî xwest dîsa xwe bi paceyê ve bieciqîne, hingê wî destê yekî leşker li ser milê xwe hest kir. Cefilî û li paş xwe zivirî û zilamê bi simpêl û birûyên şîn nêzîkî wî bû.

“Tu li wê jêrê di kur e diçî? Nîşan bike!”

Qaçaxçî bi lez û kelecan bi erênî serê xwe hejand û dîsa berê xwe da paceyê. Ew zehf nizm difiriyan. Li gor lûtkeyên nêzîkî sînor, ew baş bi alî başûrê herêma sînor ve firiyabûn. Wî ev ji yê leşker re got û wî jî da yên li pêşiyê.

Manzereya jêr ji nişkê ve ber bi rex ve dikişiya û lûtke ji dûr ve her çû bêtir şibiyan bi wêneyê di serê Qaçaxçî de. Wî li jêr li erdê mêze kir û ji nişkê ve xaçirêka ku ji her kesî ve nexuya bû,

di nav dar, devî û keviran de dît, panav naskir û bêyî ku li ser bihizire destê xwe bilind kir.

Leşker tiştek ber bi pêş ve qîriya û hemû tişt qulipî aliyekî, di kêliya ku helîkopter nîv xelek çêkir û ber bi wê deverê de bi lez çû. Qaçaxçî, hest kir ku ew destê wî yê hîn li hewa bû hat girtin. Yê porşîn ew eciqand.

“Rê bide, bê tu li ku pêrgî wan bû?”

Dem tune bû ku tu tiştî bibêje, zehf bi lez helîkopterê rêya ku bi saetan dajot, li dû xwe hişt. Lêbelê êdî ne pêwîst bû ku ew lê bigere, belkû wî amaje bi wê deverê dikir û ew teswîr dikir. Niha wî nû dît ku zilamek ji wan li ber wî bû û bi baldarî lê guhdarî dikir û tiştên wî teswîr kiribûn li ser nexşekê nivîsandibû. Leşkerê navsere, komandoyek da pêş û helîkopter zivirî.

Qaçaxçî, cara dawî awirek avêt ser xaçirêka xwe ku dê wî tu carî derfeta bi vî şêweyî wê bibîne hew bi dest bixista. Pê biçûk û negirîng hat, lêbelê dîsa jî tu carî bi qasî vê kêliyê ewqas ne piştrast bû ku ew di bêdengiya meşên wî yî bi tenê de û bi hemû tirsên wî re, ya wî tenê bû.

Leşkeran ew beradan, ji giregirê kerrbûyî, bê tu gotinên din. Li ser rêya vegerê, ji herdu leşkerên Avahiya Sor ê belik, di çend xulekên destpêkê de qet bi xwe nikarîbû. Li ser palkursiyê xwe vir de û wê de dida, her carê bi tiliyên xwe mîna li tepilkê bide, li vir û wir dida, di nav diranên xwe re difîkand. Dûre serê xwe doş dikir û Qaçaxçî rûyê dikeniya dît.

“Tu yê li wir êdî hew bimeşî, piştî te dît ku ev aletên wisa hene, ne?” Ew bi devekî vekirîtir keniya û Qaçaxçî dîsa bi erênî serê xwe hejand.

Li gor vî zilamê ciwan, Qaçaxçî gundiyekî nezan ê ku hîna pê nehisiyaye ku niha mirov dikarin bifirin. Bêyî ku li ser biponije wî, ev tişt dikir, wisa bi asayî bi hesteke serdestiyê ku bi hemû kesên li Avahiya Sor û bi gumaneke mezin bi hemû endamên leşkeryê re hebû.

“Mêze bike, bê kî hîn li wir dimeşe, ger mirov karibe bifire. Yên ji van biçûktir jî hene, ew zû tevdigerin, paceyên wan mezin in, heta karin li hewa rawestin jî. Em ne neçar in li wir bimeşin, ji ber ku ev makîne hene.” Wî dîsa berê xwe da pêşiyê, Qaçaxçî hejandina serê xwe ya bi erênî rawestand. “Ew hîn nehatiye ser xwe.”, zilam ji yê şifêr re got.

Wan ew danîn ber deriyê mala wî, wer xuya bû li gor ku talîmat hatibû dan û diviyabû ew biçûya Avahiya Sor. Li wir ew li koridorekê pa û wek ku dilê wî xweş bike carekê Beno, kêliya di ber wî re derbas bû, got divê tu sebir bikî û ji ber ku niha rewş ev e, fêrî payînê bibî. Lêbelê di tevahiya demê de ew qet fêrî payînê nebû. Wî û jina xwe hema wisa ev dikir, ji ber ku jê pê ve tiştek nemabû.

Lêbelê ev payîn hat guhertin. Hêdî hêdî ew tiştê wî di destpêkê de mîna qirdekî çê ku xwedî wateyeke bê hempa, mîna şensekî baş ji bo kurê xwe dîtibû, bû bedbextiyek: Nasiya bi Beno re. Teqrîben piştî sala yekemîn wî zanîbû ku dê ji wî re zehf çêtir baya, ger wî tu kesên bi wendabûnê re têkildar, nasnekirna û lêkolîn tune bûna. Wî destpê kir ku ji xwe bipirse, bê armanca Ewlekariya Hundir çi bû ku her carê gazî wî dikirin da ew biçe ba wan, lêbelê ji bo ku wî neçarî payînê bikin bû. Baş e, ji xwe re got, pêşî wan ez bikaranîm, piştre tu wate tê de nexuyaye. Piştre ev yek hew bi Beno re jî têkildar bû; ew niha kêm caran li wî rast dihat, kesên ku bi wî re diaxivîn, dihatin guhertin.

Di yek ji van rojên serîlêdana mehane de, kêm zêde piştî salekê, mîna her tim li korîdoreke ku ba lê dixist rawestiyabû û li hêviya kesekî bû. Wî kesî, ew nas kir û ber bi wî de hat. Wî xwe ji ber zilamekî esmer ê ku telîsekî gemarî li ser milê wî bû û di korîdorê re lukumî, da alî. Qaçaxçî, dît ku du zilamên bi kincên sivîl bi zikê bi gomlegên mîna berfê spî mil di mil de diçûn. Demeke dirêj bû ew li wir dipa û kêliya wî, dît ew herdu ji ber çavên wî wenda bûn, cesaret kir û da dû wan. Îro ew

piştrast bû ku armanca wî hingê tenê ew bû ku tiştekî din bike, ji tiştên ku hertim dikir cûda, ji bo rê li ber wî şêweyê payînê û xeyalşikestinê bigire.

Herdu zilam ji mêj ve wenda bûbûn, her çû korîdor gemarîtir bûn û li cihên ku pace tune bûn bi lampeyên zer ên mat dihatin ronîkirin. Ew pêrgî kê jî dibû, bi awirên ji qorziya çavan ve li wî mêze dikir û di ber re derbas dibû. Kêliya ew ewqas bi pêş de hatibû, gihîştibû ber beşekî din ji avahiyê ku derketibû pêşberî wî, wî li tûrikan, şûşeyan û bermayên kaxizan, betanî û heta bi pêlavan jî mêze kir ku li her derê li erdê bûn û di quncikan de komî ser hev dibûn. Hîngê wî zanîbû ku Avahiya Sor tenê cihekî jirêzê bû, cihekî ku bi tu şêweyî bi kurê wî re êdî ne têkildar bû. Hevgirêdana bi tenê ya di nav kurê wî û Avahiya Sor de, ew bi xwe bû ku her meh dîsa dihat vir. Ew dihat pêşwazîkirin, tenê ji ber ku bûbû adetek.

Vê zaniyariyê ew bi şêweyekî ji hundir ve ko dikir û bi vê kobûnê ew her carê dîsa dihat. Vê rewşê demeke dirêj dom kir û piştre cihê xwe ji pûçbûnekê re hişt ku wê jî demeke dirêj dom kir, heta ku Beno demeke zehf zehf derengtir, her tişt bi dawî anîbû û çend gotin derbarê xort de gotibûn.

Heta hîngê diviyabû Qaçaxçî û jina xwe fêr nebin, lêbelê rêyekê bibînin ji bo ku bipên. Wê dest pê kir ku bi bêdengiyê ev çareser kir, berî her tiştî jî ya tiştên bi xort ve têkildar bûn. Ji bo wî li ba xwe bigire, wê tiştek dikir ku berê qet ew nekiribû: Wê nimêj dikir. Ji bo Qaçaxçî dîmeneke ne asayî û xemgîn bû ku ew wê, rojê pênc caran li ser erdê di guncikeke odeyê de bibîne, bi şerpayeke nezelal nixumandî, bi xişîna ser erdê û kurtepistî, xwe rast bike bi destên ji hev dûrxistî û dîsa daqûlî ser erdê bibe. Bi vê yekê wê bi wî pîrtir xuya dikir an jî kêmzêde dişibiya bi girsaya jinên yextiyar ên bê rû ku zehf gelekên ji wan dawiyê dibûn bawermend.

Wî bêdengiya wê ji destpêkê ve mîna tiştekî ku nikaribe bê deyaxkirin, hest dikir, lêbelê tu caran jî hewl nedida ku rê li ber

bigire. Li ber çavê wî ew kintir bûbû, ji cergî wê nimêj dikir, rûyê wê yî hebekî bi hestî, bi desmaleke rengvekirî dorpêçayî, tarîtir xuya dikir. Wê niha hewl dida xwe ku seferên wî jî rexne neke û metirsiyan neyne bîra wî, bi gumaneke mezin ji bo ku tu şika ku ew wî tewanbar dike çênebe. Wî roj bi roj xwe piçekî bêtir sûcdar hest dikir, ji qasê ku ji xwe ew, ew bû. Û bişirîna wê xwe diguhert. Di kêliya ku ew bi hev re diaxivîn de, bêyî ku rê bikaribe li ber bê girtin, bişirînê xwe wisa bi şanazî bera ser rûyê wê dida, lema Qaçaxçî neçar dima ku ji odeyê derkeve. Tu têkiliya vê bişirînê êdî ne bi wî re, ne bi Nêrîk re, ne jî bi wê re hebû. Ew ji derve dihat; ew biyanî bû û dixwest, di hedê xwe de be û lê tacîzkar be jî, him şermokî û him jî bi paye be, tiştekî ku derman nedibû derman bike.

Çend hefteyan piştî gera wî ya bi helîkopterê, di berbanga sibê de, erebeya leşkeran di nav bajêr re derbas bû û çû derve bi aliyê erda rast ve. Li pişt komeke pisporên ku li mayînan digeriyan, yekîneyên leşkerî derbasî herêma sînor bûn. Di serdaneke xwe ya ji bo agahdariyan de Qaçaxçî, li Avahiya Sor ji devê Beno ew têgeha, bê li wir li çi digerin bihîstibû: Şervanên Rizgarîxwaz. Ji niha pê ve mîna reşkê şevê ev têgeh li derdorê digeriya û her kesê ew bilêv dikir, xuya bû baş zannîbû bê tê çi wateyê.

Lêbelê Qaçaxçî bi xwe qet nikarîbû tu pêwendî di navbera tiştê ku niha rû dida û wî xortê potikî ku wî ew avêtibû erdê de, daniya. Bêşik, dihat gotin ku Şervanên Rizgarîxwaz di qulên bi navê gorên xiltan de "çalakiyan pêk tînin" ku hîn ji berî şer de mabûn û neyaran ew çêkiribûn. Ew tenê li xortekî bi tivingeke text rast hatibû ku ji alî leşkerên baş nehatibûn bi çekkirin ji bo meşqê dihatin bikaranîn. Û vî wêneyê di serê wî de yê kesên dijber ku li herêma sînor kemîn datanîn, tamam dikir: Artêşeke zarokan, di rewşa herî xerab de, bi çekên lîstokê.

Ew li bende ma heta ku çalakî bi dawî bû, berî ku ew dîsa rêya xwe dom bike û li hêviya vegera Nêrîk bipaya. Piştî

demekê Beno, her ku Qaçaxçî diçû Avahiya Sor, bê peyv tenê serê xwe bi neyênî dihejand.

Ji kesên li bajêr jî wî nikarîbû tu zanyarî bidest bixistana. Ew li çayxaneyekê pêrgî mahkûmekî bû ku di hepseke mezin de li başûr mabû û nû hatibû berdan. Reşê wî zilamê ku bi ser maseyeke biçûk ya textînî û rojnameyekê ve xusbûyî pêşî bi lekeyên çakêtê xwe bala Qaçaxçî kişandibû. Taveke baranê hiştibû zilamên ku piraniya wan zirav û kal bûn di navbera stûn û kursiyan de hevdû dahf didan, bi meşa leglegan di ser piyalên cam ên li ser erdê re dimeşiyan û di ber re, bi hev re diaxivîn. Di wan rojên ku elektrîk hebû de lempeyên vêketî virde wêde dihejiyan. Şewqa wan dida dîwarên mîna ji hevîr çêkirî û ser rûyên bi qermîcok ê li her derê.

Şewqê dihişt rîha zilamî ya kurt î şîn biçirise, devê wî peyvên bê deng têşe dikirin.

Qaçaxçî nizanîbû bê zilam ji ku dihat, lê wî texmîn dikir ku wî aliyê din dîtibû ku her dem û li her derê dikarîbû xwe li pişt peyvên rojane û malên aştiyane nîşan bida. Ew ji bo wî tenê bi Nêrîk ve têkildar bû, lema ew li nik zilamî li ser bankê rûnişt, bi nezaket deng lê kir û ew tev li axaftinê kir ku ji bo wê yekê sedemeke zehf şexsî hebû. Wer xuya bû ku yê din qet ecêbmayî nemabû, wî yekser Qaçaxçî kişand nav hizrên xwe ku diyar e Qaçaxçî nikaribû xwe li dijî wan biparasta. Kêliyek derbas bû heta ku pirsyara li ser rabûrdûya wî dikarîbû bihata kirin. Qaçaxçî, ew dem bi lêguhdarîkirina bi baldarî û şiroveyên alîkar derbas kir. Babet berpirsyariya derveyî welat ji bo keraseta niha bû, lêbelê zilêm bi xwe nedixwest ji tîştên wî digot bawer bikira. Wî her carê xwe serast dikir û Qaçaxçî bawer dikir ku ferq kiribû ku ew ji tirsa çareseriya pirsgirêkekê wisa virde wêde diaxivî. Ew bi temenê xwe li dor navenda salên sîhî bû, xelekên sipîbûyî di nav porê rengtarî de mîna pêlên dûmaneke tenik li ser serê wî xuya dikirin, destên zirav mîna ku bê ruh bin, li ser rojnameyê rawestiyayî bûn.

Dawiyê Qaçaxçî, li gor ku ji hundirê wî hat jê pirsî, bê zanyariyên wî derbarê hepsan de hene. Zilamî çavên xwe yên hûr û ji hev dûr ji bo kêliyeke kurt mîna aktorekî vekirin û bi destan dûmana çixareya xwe da ber bi aliyekî. Wî bi wateya na serê xwe hejand, lê piştre got, mîna ku ji derve xuya dikin, ew ji hundir ve ne ewqas mezin in. Ji Qaçaxçî re got, ger kesekî te li wir hebe, ne hewceyî tu biçî wir, ji xwe kesek nikare bikeve hundir û derkeve derve, tenê yên ku xwedî bextekî çê ne dikarin. Tu pirsyarên din hew hatin bîra Qaçaxçî û wisa hema behsa kurê xwe kir. Çavên zilêm li hundirê wê odeya ku tije deng û tevger bû, bûn. Hişê wî li deverin din xuya dikir, heta wî ziq li nargeleyeke li erdê yî ku nedihat bikaranîn ziq mêze kir. Bi ponijîn tiliya nîşandanê ya destê rastê bir ber devê xwe, aliyên hundir ên lêva jêr û diranên xwe yên rengtarî pelandin. Kêliya wî tilî ji devê xwe derxist, ji Qaçaxçî re got ku ew nêzîkî du salan di hepsê de maye û li wir avahiyeke ji bo girtiyên siyasî hebûye. Ew her tarî bûye û tu carî, bi dirêjahiya du salan, dengê qelebalixekê ji wir nedihat bihîstin. Wî ji paceyekê her hefte gelek erebeyên komisyona welatên rojava a kontrolê di wir re derbas dibûne, lêbelê ew li tiştekî din digeriyan. Wî bi baldarî kurt li Qaçaxçî mêze kir, ji bo kêliyekê xuya kir ku ew wî bi rastî jî dibîne û tiştekî mîna xemgîniyekê di awira wî de hebû. Piştre rabû ser xwe, rojname li hev gerand, bi şêweyekî zehf tund, bi ser hev de eciqand û bêyî peyveke din ji wir çû.

Tiştekî seyr bi Qaçaxçî re rû da: Hişê wî li serî dikarîbû mîna temaşevanekî bibîne bê çawa xeyalek pê re çêdibû. Berî kurê wî wenda bibe, wî ew ji sê hefteyan vir de nedîtibû. Û ev sê hefte bûn ku dev ji wî bernedidan. Niha tu wateya wan nemabû û cara dawî ew di qula çiyê, goreke xiltan de pêrgî Nêrîk bûbû; wî hew karîbû herduyan, yê diz û kurê xwe, ji hev veqetanda. Di bîra wî de çalakiyên artêşê yên li welatê bêxwedî ji bo qewirandina kurê wî bûn. Lêbelê kesekî nikarîbû ew biqewiranda, Qaçaxçî ev zanîbû, piştî ku wî şaşmayî û tirsyayî

di heman kêliyê de, jiyabû ku xort tenê bi kesekî ve negirêdayî bû. Ew tirseke kûr bû, lêbelê hêviyeke mezin jî bû ku ew careke din li wî rast bê.

# 9

Şev bû, dema ew gihîşt taxê. Ji ber ku li tu derê çira vêneketî bûn, wî di destpêkê de nas nekir. Ew bi koranî li ser rêya di bin lingên xwe de çû. Mala pêşîn ku piçekî bi paş ve vekişiyayî bû, hişt ew li xwe hay bibe. Devê paceyên tarî wisa xuya bûn ku mirov digot qey ew ber bi nav kêş ve vedibin ku bê kurahî bi xanî ve dibûn yek.

Qaçaxçî zivirî, ket kuçeyekê, lêbelê di tariya berbangê de nikaribû piştrast ba, bê ew a rast e an na. Çend metreyan dûr, kûçikek xuya bû û deng ji xwe derxist. Ronahiya stêran ya lawaz têrê dikir ku reşê wî wisa tenik mîna tozê, tevgera wî ya virde û wêde û çavên wî yî ku diçirisîn, destnîşan bike. Kuçeya berjor ve diçû, ew rasterast bir ber mala zavayê wî. Ew li ber paceyê tevgeriya, çû ber derî û lê xist.

Merivê wî di eslê xwe de hevalekî wî yî berî şer bû. Wî pêşwaziyeke mezin ji Qaçaxçî re nekir, ew himêz kir û da pêşiya wî çû odeyê. Qaçaxçî sipas kir û li wê odeka biçûk ku di wê demsalê de zehf sar bû, bi cîh bû.

Di navber pakêtên kertonî yên cîhazên ku Zarik peyda kiribûn, tûrên tije alavên malê û hinek pirtûk de xwe li ser doşekê piçikand û hingê hest kir ku gihîştiye cîhê xwe. Bi teqleke lawaz rabû ser xwe û paceya biçûk vekir. Wê tariya ew jê hatibû, nîşanî wî da. Wî çixara xwe dikişand û leşkerê li ser sînor hat bîra wî. Saniyekê jî şik pê re çênebû bê sedemê ji nişkê

ve ketibû rê çi bû. Ji xwe re got: Ji qederê ew bawer dikin zêdetir, mirovên ciwan, bêtir zilam, bi qilafetê xwe gelek caran, dişibine hev. Tiştên wan ên ku dişibin bi hev tevger in û îfadeyên rû ne. Li vir rîha ser çeneyê bû ku ya kurê wî yî mezin jî berî ew wenda bibe, wisa bû. Sêzdeh sal, hizirî Qaçaxçî, mirov nikare di vî temenî de wisa bi asayî wenda bibe. Wî bawer kir ku di bedena xwe de wê kêliyê hest dike ku jiyaneke bi dirêjahiya sêzdeh salan nikare bi dawî bê. Mîna derbeke bi şid, tiştekî avêtî nikarîbû bihata wergirtin, diviyabû wê bi şêweyekî dom bikira. Hizra ku ev domkirin tenê pêk dihat, ji ber ku ew bêrawest her lê dihizirî, kêliyekê hişê wî ji serê wî bir. Tenê westa wî ew ji kelecanê diparast, lêbelê hêdî hêdî wî his kir bê dilê wî çawa lê dide û her diçe bêhn dan û standina wî dijwartir dibe.

Xwe baş nêzîkî paceyê kir û li derve temaşe kir, awira xwe bera nav taritiyê û bayê da. Li ber şewqa odeya ew lê, derve reşî tarî xuya dikir û bi ziqmêzekirinê ronîtir nedibû, tenê nermtir û sistir bû, bêyî ku tiştekî berbide.

Li ser cîhê xwe ramedandî, xaçerêka xwe nêzîk, wilo li pêşberî xwe dît, çend qulên ji rengê asfaltê yên gewr di erda gewr de hebûn. Ew ji rasteqînê bêtir nêzîkî hev xuya dikirin û wan xeteke rast pêk dianîn. Qaçaxçî çeng bû, dengê ji derî ji nişkê ve hatibûyê. Zavayê wî li ber wî rawestiyayî bû. Di destekî wî de çirayeke dohnê gazê, di yê din de destikê derî hebû. Qaçaxçî bi erênî serê xwe jê re hejand û bêhna xwe fireh kir.

“Di vê navberê de, te tu tişt ji kurê xwe bihîst?”

Qaçaxçî, bi çavên firehbûyî li zilamî mêze kir û bi wateya na serê xwe hejand. Yê din serê xwe hêdîka bi erênî hejand û careke din got: “Şev baş.”

Dîsa di tariyê de biraziyê Qaçaxçî, yê ku wî berî bi çendakî pê re xurînî kiribû hat bîra wî. Awira wî ya ku wer xuya dikir li her tiştê bi Qaçaxçî ve têkildar û derdora wî digeriya. Gelo li çi digeriya, ji xwe pirsî. Bi gumaneke mezin biraziyê wî li îşaretên jiyana rabirdûyê, belkî jî li siberoja kesê li pêşberî xwe digeriya

ku Qaçaxçî bi wî şêweyî nedixwest bidayê. Birazê, li qerektera wî dikola û pê piştерast bû ku ew ê bikaribe wê bibîne jî, ger bi baldarî bikira. Seba çi ew di vê derbarê de ewqas piştерast bû? Her tiştê ku wî niha dikarîbû bidîta, kêm zêde ji rasthatiniyan pêk dihatin: Xwişka wî yî mezin îsal nû ketibû wî xaniyê ku Qaçaxçî berî sefera xwe li wir hewiya bû; kincên ku hîngê lê bûn, ji qapût û cizmê pê ve, roja berî bikeve rê kirîbûn. Ew rastiya ku xortê ciwan li pêşberî wî rûniştibû jî, hewdîtineke rasthatinî bû. Ma ne diviyabû ku mêvan, wisa ji xwe re got Qaçaxçî, bi kêmanî malbata wî nas nekira, ji bo ku tiştekî li ser wî fêr biba, jina wî, sê, na, du kurên wî? Seba çi ew di rûyê min de li tiştinan digere û di çend tiştên negirîng ên ku min ji xwe ve pêşkêş dikirin? Ji ber ku ew bawer dike, mîna di wêneyekî de, her tişt di min de kom bûye. Ev merivê ku ji cihekî dûr hatibû, niha bala Qaçaxçî dikişand, tam ew tiştê ku hîngê Beno dixwest zelal bike, dikir: Wî dixwest wî bîne pergala xwe, pirsyarên wî yên keşifkarekî bûn.

Dîsa li derî ket. Qaçaxçî xwe rast kir û Zarik hêvî kir, lêbelê xwişka wî bû. Çira bi wê re tune bû, yekser derbasî hundir bû û di tariyê de li pêşberî wî rawestiya. Ew bi wê re mizicî, lêbelê dizanîbû ku ew hema hema nikare wî bibine. Ew rabû ser xwe, bi hemd bi destên xwe ew peland û kêliyeke kurt ew himêz kir.

“Ka em derkevin derve”, bi kurtepistî wê got.

Ev li hesabê wî hat, ji ber ku dixwest bala wî ber bi dereke din ve bê birin. Kêliya wî qapûtê xwe li xwe dikir, wî nikarîbû çavên xwe ji ser pacê bibirana, mîna ku wir devara ku hizrên wî xwe lê dabûn aliyekî be.

Ew hêdîka di nav malê re derbas bûn çûn nav bexçeyê ber malê. Wî zendên xwe danîn ser deriyê hewşê û li rêyê temaşe kir. Li derve bala wî kişand ku şev dîsa ji hundir odeyê zehf cûdatir bû: Hizir hew ji nav tariyê dihatin ba wî. Wî li dengên xuşexuşê û xişexişê, li dengê bayê sivik di nav daran re guhdarî kir. Li her deverê tevger hebû, wî yê bigota: Bi rê ve çûneke

hêdî û bê pêjin. Qet ne diyar bû, ka deng ji heywanan dihat an tenê ji liva tiştên bê ruh bûn ku diketin ser hev.

Wê mîna her carê pêşî li xwişka xwe û zarokan pirsî.

Wî got, “Hemû baş in”, bêyî ku berê xwe bide wê. “Tewr mêvanekî wê ji dereke dûr hatiye. Lêkolînerek.”

“Ew kî ye?”

Wî jê re behs kir, bê çi li ser mêvan zanîbû. Hingê bala wî kişand ku ne ewqas zehf bûn. Ji bo mêvanekî, li gel ku wî berê hema hema ew bi navê wî nas nedikir, diviyabû eleqeya wî bêtir bûya. Ew dem bû, wî ji xwe re got, demeke ne baş. Jê pê ve ji bo mêvanekî ji derve, ji mêj ve demên baş nemabûn.

Wê hêdîka niquçand wî û wî li çavên wê nerî.

“Li ser sînor tu pirsgirêk bi te re çêbûn?”

Wî serê xwe westiyayî bi neyênî hejand. “Her tişt wek xwe bû.”

Ne wê, ne jî mêrê wê, di derbarê mayînan de tu carî pirsiyar ji wî nedikirin. Li ser vê babetê tabû hebû. Bi hemûyan wisa dihat ku behskirina vê babetê dihat wateya pêkanîna bedbextiyê.

Wê têra xwe amadekarî kiribû. “Çi di derbarê Nêrîk de heye, te tişt li ser wî bihîstin?” Dengê wê piçekî lerizî.

Ew li hêviya vê pirsyarê bû û tenê careke din bi wateya na serê xwe hejand. Pirsyara di derbarê xort de li ba kêm kesên ku wî ew nasdikirin heta astekê bibû kevneşopiyek.

Ew bê deng man û di ber çirrçira çirçirkan re bêhn didan û distandin. Piştere bawişkên wê hatin. Wê bi pişta destê xwe ser devê xwe eciqand û şerpa zelal ji ser milê xwe kişan ser porê xwe. Kêliya wê destê xwe bera da û danî ser sînga xwe, Qaçaxçî rûyê wê yî xweşik î bi teşeyê hêkekê û lêvên wê yî li hevhatî dîtin. Ew bi wê re bişirî. Li nêzîka wê wî xwe baş his dikir. Hemû hewldanên wî yên ku tiştekî nebêje bi îsrarên wê yên nerm bê bandor diman. Xwişka wî ev cara sisiyan dîsa ducanî bû û mirov niha ew baş dîdît.

Wê li jina wî pirsî û wî jê re got ku wî ew terk kiriye.

"Kengî?" berî her tiştî ev pirsî.

"Berî ez bidim rê."

"Na, lêbelê tu vî tiştî nikarî wisa bi hêsanî bikî." Wê newêrîbû bêtir li sedeman bipirse.

"Bêguman ez karim vê bikim, ger ez neçar bim."

Wê bi kurtahî li rex xwe mêze kir û bi şêweyekî ku dihat bihistin wê behn da û stand. Wê nedixwest bêtir bi ser wî de biçe. Bê çawa ew li wir rawestiyabû û wî di dergeh re li derve mêze dikir, wî îşareta xweparastineke negotî ya li dijî hemû pirsyaran dida. Xwişka wî destê xwe avêt bêrîka kirasê xwe û pêçekeke pereyan derxist.

"Ez wan niha bidim te, ji bo ez ji wan xelas bibim."

Wî pere xist qapûtê xwe. Ew pere ji bo xwişka wê bû ku her carê bêyî hayê mêrê xwe, bi şêweyekî ku kesekî nizanîbû çawa dida ser hev û dida wî.

"Ev pereyekî baş pir e", got wî, lêbelê vê carê jî nepirsî bê ev pere ji ku tên. "Zarik hîn jî li te dixe?"

Wê bi lez got na, mîna ku Qaçaxçî zû xwe zehf nêzîkî wê kiribe. "Ji mêj de ye ku hew li min dixe."

"Ev baş e."

"Divê tu wî fam bikî. Ne hêsan e ji bo wî."

"Çi ye, ji bo xwedê, tiştê ku ji bo wî ne hêsan e", wî bi şêweyekî wisa tahl got ku xwişka wî hew ji tirsa hêrsa wî wêrîbû deng bikira. "Çi", li ser ya xwe ma bêyî ku li hêviya bersîvekê bimîne, "dikarîbû ji yekî mîna wî re ne hêsan ba."

Wê seriyê jêr ê şerpa xwe kişand ber çena xwe û bi lez babet guherand.

"Dijwariyên we bi yekî ku alavan tîne re hene."

Qaçaxçî yekser ket nav babetê "Bi kîjanî re?"

"Bi yê ji bajêr re. Wî û gundiyên vir şer kirin. Ji Zarik lê bipirse. Şev baş." Wê bi kurtahî destê xwe danî ser zenda wî, zivirî û çû malê.

Qaçaxçî li dû wê nerî û piştre li derve li şevê temaşe kir. Niha her tişt li ber paceyê dîsa mîna berî bi kêliyekê bû. Tarî mîna dîwarekî derbasbar li pêşber wî bû, bi tevahî bi dîwarê hewşê yî jirêzê jê hatibû veqetandin ku ew li pişt wî rawestiyabû. Çend stêr mîna perçene firidî ku li ser cawekî zehf mezin î tarî yî xwedî girîngahiyeke taybet belav bûbin, xuya dikirin.

Adinî rojê sibehê wî bi lez li ser lingan xwurînî kir û ji bo biçe tiştan bikire zû ji malê derket. Ew di ber tezgahên bazarê re derbas bû û pêşî wî çavên xwe li aletên kar gerandin. Kelbetanên lûleyan û tornawîdên baş ên cûre cûre bêtir diyariyên biçûk û malê qaçax bûn ku mirov bi dest xwe re dianî, lêbelê kesin hebû ku pêdiviya wan zehf bi van alavan hebû. Piştre dora alkolê dihat, Wodka, Whiskey û Araq. Li vir li herêma sînor gelek cûreyên ji li nav welêt bêtir hebûn.

Tiştê bêtir serêşanî çêdikir, meblax bû. Tu tacirî ji du şûşeyan zêdetir nedixwest bifroşe wî, ji ber ku sewqiyat ne bi pergal pêk dihat. Wîsa wî çûna xwe dom kir heta ku hemû şûşe dan ser hev. Cixare li her derê hebûn, bi pakêtên mezin jî. Lêbelê ew markeyên hundirê welêt bûn. Ji bo markeyên amerîkanî diviyabû ew bêtir rê biçûya.

Xanî û holikên li wê devera ku ew bi şev gihîştibûyê, zehf di nav hev de bûn. Lêbelê bajarok bi kaş ve berjêr dadiket, dikişiya ber bi gundên derdorê ve. Ji ser rê ve xanîk mîna ku berdayî bin xuya dikirin. Lêbelê her ew berjêr hat bêtir jîndar xuya bû. Bajarê birastî yê nêzîk û kêmzêde çel kilometreyî dûrî sînor bû û carekê jî wî karîbû bi tirimpêlê, bi zavayê xwe re seriyek lê bidaya. Ew ne rêwîtiyeke ewqas bi kelecan bûye, ji ber ku di rastiya xwe de hemû bajar û deverên li welatê ser sînor mîna hev bûn.

Piştî ku wî cara didoyan tiştên pêwîst kirîn, nêzîkî nîvro şûşe jî anîbûn û danîbûn malê û piştî nîvro hat, cixare bicîh kirin. Bi wan re tûrê wî yê piştê baş giran bû, lêbelê hîn tijî nebûbû. Hîn xwarina ji bo pitikan û kompyûterên biçûk kêm

bûm ku pakêtên wan sê caran ji cîhazan bi xwe meztir bûn. Ew ji pakêtên wan derxistin, danîn ser hev û bi şerîtekê bi hev ve girêdan û ew xistin tûrê piştê. Hûr mûrên bi wan re xistin tûrikekî cuda ku li ser wan tîpa destpêkê ya fîrma wan nivîsand.

Ber êvarkî, Zarik hat malê û Qaçaxçî li yê ku mal ji wan re dianî û xwişka wî behs kiribû pirsî. Vê yekê ji wî re serêşanî çêdikir û bi ser de jî nedihişt ew tavilê bikeve rê. Ji bo wan teva ew zilamê mal peyda dikir, bajarî bû, ji ber ku wî ji cihakî dûr rêya xwe ber bi vê herêmê de şaş kiribû. Lêbelê ji bo vê yekê jî sedemeke berbiçav hebû: Zilam carekê ji aliyê meqamên fermî ve derbarê mafê wî yî dorfireh yê erdên li bakur hatibû agahdarkirin. Bi gumaneke mezin wî bawer kiribû ku ew dê bikaribe kareke mezin jê bi dest bixe û bi wê baweriyê dabû rê. Dema ew gihiştibû wir, wî dîtibû ku erdê wî ji zû de ji alî gundiyên wir ve tê ajotin û çandin.

"Ev ehmeq", Qaçaxçî derket pêş, piştî ku zavayê wî bi çend peyvan jê re behs kir, bê nakokiya bi wî zilamî re, çawa gûr bûbû. "Lêbelê tiştekî ku mirov alîkariya wî bike jî tune bû. Ew her tiştî çêtir dizane. Kîjan karmendê naletî hat ser wê hizrê ku erdê wî disa bide wî, li gel ku wî qet lê nepirsîbû jî. Tu çi dibêjî -em biçin ba wî?"

Zarik bê biryar xwe dilivand. "Lê ew hîn jî li vir e."

"Lema ez dibêjim", Qaçaxçî ket nav peyva wî. "Berî ew here, divê ez wî bibînim. Deynên min li wî hene."

Hizra ku pereyên wî ji vî zilamî re bimînin, ew dixist nav tevgereke germ. Li gel ku evê bajarî, zilamekî ku karê xwe baş dikir, ew bi pergal gelek caran diçû û dihat. Lêbelê Qaçaxçî wek rêgez ew mîna kesekî biyanî didît. Wî baweriya yê bajarî ku dikare bibe xwedî erd, zehf kirêt didît. Li gor baweriya wî mirov dikarîbû derdora erd bigirta, mayîn bikira yan jî biçanda, lê nebûya xwediyê wî. Ji cergî ku ew û pirsgirêka wî naskiribû, Qaçaxçî zehf dixwest ku vê babetê pê re biaxive.

Bi lez ji malê derketin. Qaçaxçî di ser rêya kaş re bi teperep ber bi jêr ve meşiya. Heta ji Zarik dihat hewl dida xwe ku pê re bigihê. Wî dixwest her tiştî vebêje bê wî çi bihîstibû -dawiya dawî bûyereke herî balkêş ji zû de yeke wek wê pêk nehatibû. Lêbelê wî hest dikir ku Qaçaxçî aramî ji dest dabû. Zarik ew di rewşeke wisa de tu carî nedîtibû. Qaçaxçî wisa xuya dikir ku ew ji saniyekê hata bi ya din dikare zehf hêrs bibe. Zarik, bêtir dixwest bê deng bimîne û li bayê meşê hewl dida ku wê hesta xumamî rabigire ku ew di karê xwe yê wek tacir de bi ser neket.

Xaniyekî baş î tebût bû yê ku zilam tê de dima. Wer xuya bû ku wî ji odeyên malê dîmeneke geliyê bi kevir, lêbelê zehf fireh didît. Wî xaniyî têra malbatekê dikir, lêbelê zilamî maliyên xwe li bajêr hiştibûn. Wî dixwest pêşî karên xwe yên li vir bike, lêbelê bi gumaneke mezin ji xwe maliyên wî dê tenê bihata serdanê, ji bo ku milkê xwe bibînin û carekê jî li daristanên paş temaşe bikin. Derenceyeke bi çûk jî li ber deriyê malê hebû. Baş dûrî wir, nêzî baskên deriyê hewşê yên ji sorê şerabê wî, du ciwanên nîvçe wek nobedar bi cîh kiribûn. Wan çavdêriyeke bi rebenî dikirin. Di ser şeqên yekî ji wan ku xwe li ber dîwêr qurnisandibû û li jor xwe jî nedinêrî, Qaçaxçî neçar ma ku xwe di ser re bavêje. Yê din tenê di ber xwe de dimizicî. Kêliya ku wî dît ew herdu tên, çixare ji devê xwe derxist û bi şêweyekî lîskê hêdîka giraniya xwe da ser baskê derî, pê re derî vebû.

Bajarî, ji bo rêwîtiyê amade bû. Kêliya derî vebû, Qaçaxçî tevliheviya li hundir dîtibû. Hemû tiştên livbar ji cihê xwe leqiya bûn, li qorîdorê li ser erdê cincoqên cam û hejîrên pelçiqî hebûn. Şop li qadê jêr heta ber odeya mezin a ku zilam mîna zarokekî tirsiyayî xwe lê bera ser çonkan dabû.

Jihevderxistina tiştên xwe yên ku dawî kirîbû bi wî re nediçû serî. Qaçaxçî derbasî hundir bû û li ber paceya ku mêş bi vingînî li dorê kom bûbûn, şipyayî rawestiya. Dîmena geliyê ku ji şibakeyê xuya dikir, bi rastî jî zehf balkêş bû û dê hîn xweştir ba, ger xumama ji qûmê mîna perdeyekê neketa ber ronahiya

dereng. Wisa binê gelî tê de wenda dibû û pê re dawiya gelî ya dûr jî, ew devera ku axir rê digihayê û di nav çiyan re ew ber bi başûr ve dibir. Di gelemşeya ku zilamî berî çûna xwe pêkanîbû de hema hema hew xuya bû, lêbelê odeyê şopên şerekî nîşan dida. Qaçaxçî bala xwe da deriyê text ê ku jê textekî pihîn lêketî mîna pîjekî ber bi derve de derketibû û mîna hestiyekî telaşî bûbû. Baskên deriyê dolabeke kincan ketibûn hundirê wê. Vazoyek an jî taseke mezin, piyalek û gelek sênî şikestî li ser erdê bûn. Ekrana televizyonê li arîkê odeyê dinerî.

"Tu dixwazî wenda bibî?" bi dengê hêdî pirsî Qaçaxçî.

"Ma jê pê ve ez çi bikim", kir birebir got zilamî û alavên hûr î di destê xwe de avêtin ser erdê ji bo ku çêtir bikaribe bi destan jî tevbigere.

Tevgera wî yî bihemd bal dikişand. Di ser aliyekî cênîka wî re Qaçaxçî wermeke bi ser rengê kesk ve dît. Bi biskên porê wî yên gewr ve xwîna hişkbûyî zeliqî bû. Pozê zilamî yê mezin di bin bêhndan û standina wî ya bi hêrs de tevdigeriya, lêbelê di çavên wî de tenê tirs hebû. Çakêtê qehweyî gemarî bû, mîna ku kesek di ser re meşiyabe.

Qaçaxçî, jê dipirsî û hişt Zarik tiştên ew fam neke wergerîne. Wî zanyariyên bêtir li ser bûyera êvara berî bi du rojan bidest xistin. Du zilaman, yekî ciwan û yekî navsere, ne pir dereng, piştî nîvê şevê deriyê wî şikandibûn û bê deng di qorîdorê re hatibûn. Yekî ji wan selikeke tije hejîr ji ser refika bi dîwêr ve xistibû û pê re tevahiya çalakiyê xistibû metirsiyê. Ne tenê ji ber ku bajarî hîngê şiyar bû, berî ew bigihêjin wê odeya ku ew lê radiza, wan pê li wan hejîrên li ser erdê bela bûbûn kirinbûn û li ser erda kevirî şemitî bûn. Wer xuya bû ew li ber mêrdewanê bi şêweyekî wisa li hev geriyabûn ku dest pê kiribûn ji hev re çêr dikirin. Di wê navberê de bajarî jî hatibû ku mêze bike bê çi dibe. Wî du reşên li ser erdê dîtibûn, maskeyên textînî yî reş li ber rûyên wan bûn û ketibû panîkê. Herdu bi leza birûskê rabûbûn ser xwe û bi merdewanê ve berjor ve hatibûn. Wan

pêhn li deriyê odeya zilamî ya razanê xistibûne û kêrên nêçirvanan ên di destê xwe de li zilêm hejandibûn. Zilam bi qîrîn û li bêcemeyê xwe likumîbû û ber bi pêş ve êrişkiribû, lêbelê wî tenê derb ji herduyan xwaribû. Wan dabû dû wî bi derenceyê ve daketibûn heta bi odeya mezin û li wir dîsa bi devên kêrên xwe li ber rûyê wî girtibûn. Di wê kêliyê de pêhn li dolabê xistibûn û her tiştên li wan deran şikandibûn. Piştre ew hêdî hêdî, zehf hêdî ber bi wî ve hatibûn. Gava ew gihiştibûn ba wî, ew avêtibûn erdê. Bajarî ne tene zanîbû bê kê ew şandibûn, lêbelê zanîbû bê ew bi xwe jî kî ne. Lêbelê ev di xwe dernexistibû.

Zilam bê deng ma û li aliyê paceyê nerî.

“Du qelşên birînê, li paş”, bi lez bi ser vekir.

“Û niha tu dixwazî ji vir biçî?”

“Ji bo jiyana xwe min di ber xwe da”, zilamî bi hêrs got.

Qaçaxçî, nikarîbû ev teşeyê lehengiyê cidî bigire. “Wan dikarîbûn tu bikuştana.”

“Erê, lema ez jî dixwazim biçim. Tu tenê car caran tê vir û diçî, lê ez heroj di nav van gundiyên vir de me.”

“Gundî li vê herêmê hemû mîna hev in, ferq nake çi li wir çi li vir. Erdê zeviyan ê wan kesên ku jê dijî ne. Ev her tim wisa bûye. Ew tu deverê bêyî ku dest bidênê nahêlin, tene ji ber ku dikare milkê yekî ku ne li vir be. Diviyabû te bi wan re li hev bikira, hinek bazar bi wan re bikira.”

“Na, na”, zilamî kir çireçir, “tu mafê wan ne li ser malê min heye, ne jî li ser dema min. Ez ne neçar im ku ez bazarê bikim.”

“Ez yekî nas dikim ku bi şêweyekî şarezatir destpê kir û li gel ku pêdiviya wî pê tune bû jî, her sal çend çewal nîsk ji wan werdigirt. Hêdî hêdî wan ew jî tev li planên xwe kirin û roj hat, bi demê re, gotina wî li ser çandina erdê wî çêbû. Ger ew te nas bikin, ew bi kotekê nakevin xaniyê te. Wer xuya ye te gef li wan xwarine?”

Zilam pêşî xwest bi erênî û bi hêz serê xwe bihejîne, lêbelê ji ber eşê rawestiya.” Min ji wan re got, ger hûn tiştê min î

nivîskî nepejirînin, hîngê ez ê bi yên çekar re bêm. Û ezê vê biķim jî."

Qaçaxçî, mizicî. "Bextê te çê bû, bi rastî jî. -Ger tu niha biçî, dê çi bi pereyên min bê?"

Yê din mîna ku ecêbmayî mabe got: "Ez ê dîsa bêm û cîhazan bi xwe re bînim."

"Ez dizanim", got Qaçaxçî bi şêweyekî dîplomatîk. "Lê vê carê dikare dom bike, ji ber ku tu ê gelek tiştên din jî organîze bikî. Tu dizanî bê ez dibêjim çi. Pêdiviya min bi pereyan heye."

Di vê navberê de wî Bajarî ewqas baş nas dikir, ji bo ku wî fedîkar neke, ne pêwîst bû hîn bêtir vir de wê de biaxive. Kengî û bi çi dîsa ew bihata jî misyona wî ya li vir têk çûbû.

Toza gelîyî gewr bûbû, mêşan hîn jî xwe li camê dixistin û Qaçaxçî razîbû, ji ber ku zilamî pereyê wî dabûyê. Wî ew xistin bêrîka qapûtê xwe û xwe wisa his dikir ku perçayekî biçûk, lê girîng lê zêde bûbe.

Li ser rêya vegerê bala wî kişand, bê rasthatiniyeke çawa bû ku ew piştî girtina ser mala zilamî ew gihiştibû vir. Ji Zarik pirsî, bê seba çi ew bi xwe neçû ba wî, kêliya ku wî bihîst. Zavayê wî jê re got, ji ber ku bi şev bû, û hingê careke din Qaçaxçî ji şiyana zavayê xwe ya hizirî ket şikê.

Di destpêka êvarê de her tişt hatibû çareserkirin. Piştî wî xwe şuşt, li jêr li ba mazûbanên xwe rûnişt. Hîn berî şîvê wî pereyê Zarik dayê. Wî jê re got, ji bo her komputerê ew nêzîkî sed kîlometreyî rê çûbû û vegeriyabû. Bi Qaçaxçî ev mesref piçekî zêde hatibû, lê Zarik di wê baweriyê de bû ku bêyî wî bal bikişanda ser xwe, tenê bi vî şêweyî wî karîbû ew cîhaz bikiriyana. Tevgera wî, wisa fam dikir Qaçaxçî, derbirîna tirsa wî bû, ne tenê ji kirîn û firotina bi qaçaxî, lêbelê ji her cûre kiryarên li derveyî pergala heyî.

Ew li dor maseyê li ba hev rûniştin, hîngê ji derve dengê motoran hat. Ne dengê zirav ê otomobîlan bû. Mîna giregireke kûr destpê kir û her çû dengê teqereqekê hat. Sênî û piyalên li

ser maseyê dilerizîn, beroş li ser ferşê girover ê tifika qahfikî direqisîn. Dengê qelebalixê her çû xurtir bû heta ku gihîşt radeyekê ku hew jê derbas bû.

Qaçaxçî rabû ser xwe û çû ber paceyê. Ji kolanê ronahiya çavên tirimpêlan ên di tevgerê de davêt derdorê, reşên erebeyên mezin di tariyê de xuya dibûn. Wî pace vekir û bêhna nexweş ya ekzozê li rûyê wî xist. Ji hin peyvên ku wî karîbû bibihîstana, têgihîşt ku leşker in, li wir bi cîh dibûn. Niha ew tişt, wî ji xwe re got, pêk tê ku ew her tim jê tirsiyabû: Ew di nav operasyoneke leşkerî ya leşkerên Tirkiyê de mabû ku armanca wê tunekirina Şervanên Rizgarîxwaz ên Kurd li serê çiyê bûn. Ma diviyabû kê ew li ser vê yekê agahdar kiriba; pir pir leşkerên li ser sînor divê ev kiribana. Wan ev nekiribû. Wî pace girt, xwişka wî xwe di ber re rakir û perde girtin.

"Tu dixwazî çi bikî?" Zarikê ku li ber maseyê mabû jê pirsî. Qaçaxçî yekser bersiv neda. "Belkî ev dirêj najo. Ez ê sibe ji derdorê bipirsim. Tu dikarî li vir bimînî -em ê bipên."

Qaçaxçî li pencereya ku perde li ber bû mêze kir, wî dît ku şewq bi perdeyê ve dielpişe. "Hesta ku ew sibe an dusibe ji vir herin, bi min re tune ye. Tevgereke leşkerî yî wisa demekê dom dike. Ma we tu carên din ev yek dîtibû?"

Wan li hev nerî û bi wateya na serê xwe hejandin. "Ji cergî şer û vir de na." got Zarik. "Li aliyê din tu tişt hebû?"

Qaçaxçî careke din li şewqên ne aram mêze kir.

"Qet", got wî "Kesekî di vê derbarê de tiştek nizanîbû. Yan na ez ê derneketibama seferê."

Gotegotên li herêma bêxwedî hatin bîra wî û wî zanîbû ku nikarîbû tu têkiliya wan bi çalakiya leşkerî re hebûya.

Wek tedbîr wan pêşî televizyon vekir piştre jî radyo. Wek ku mirov dikarîbû texmîn bikira, tu agahdarî tune bûn.

Di tariya odeka xwe de Qaçaxçî, demeke dirêj ramediyayî şiyar ma. Motorên li derve bêdeng bûbûn, lêbelê dengên mirovan û şewq man. Hewl da ku bîne bîra xwe, bê ji bo

rewşeke wisa, ji berê de çi hizirî bû. Diviyabû wî derxista, bê leşker dê çiqasî li vir bimana. Bê wan çi dixwest, ne ewqas girîng bû. Bi gumaneke mezin dê niha pirsgirêkên wî bi nobedarên li ser sînor re çêbibûna. Ew careke din rabû û bi şêweyekî nearam pereyên mayî jimartin.

Derengê şevê di xew re çû. Di xewnê de ew dîsa li ser panavê ramedandî bû. Derveyî wî di xewê de bû, lêbelê hestên wî şiyar bûn. Kevirê ku wî li ser pal dabû jî wî baş hest dikir. Ne tarî bû derdora wî, belku gewr mîna mijê bû. Wî hest dikir, bê ba çawa ew mist dida û derbas dibû. Piştre wî dengê pêngavên ku li ser xaçirêka dişemitîn bihistin; kesek rasterast nêzîkî dibû. Wî dixwest bala kesê nenas şiyar bike, lê dengê wî, mîna piştî bêdengiyeke dirêj, xam bû. Wî gelek caran ceriband, heta ku di gewriya wî de dengek pêk hat ku bê teşe di devê bê liv re êrîşî derve kir. Kêliya ku dema ew bikaribe biaxive hatibû, tiştekî hişk li wê devera ku dengê wî lê bicîh bûbû ket. Ew hat eciqandin. Li ber çavê wî seriyek xuya bû. Serê xortekî bû ku wî nexwest bêtir li wî xortî temaşe bike. Xort bi wî re axivî, mîna ku bi zarokekî re biaxive, hêdî û fesîh, lêbelê Qaçaxçî jê fam nedikir. Serjêkirina mîhan hat bîra wî, jendina wan û çavên wan ên jîndar ku zengeloka wan hatibûn vekirin, ew mirina bê deng, lê jiyayî hat bîra wî. Xort tiştek jê dixwest. Her carê dîsa dest bi axaftinê dikir û gelek caran beşek ji peyvên wî mîna pirsyarekê diqediya. Qaçaxçî zanîbû ku kêrek li ser qirika wî ye, li gel vê jî dixwest biaxive, lêbelê yê din nedihişt. Piştî ku jandanek di nav milên wî re derbas bû, navbereke kambax pêk hat. Ji nişkê ve xort milê xwe livand û Qaçaxçî dît ku ew rabû ser xwe û şipyayî li ser xwe di nav gewrahiyekê de rawestiya. Wî niha karîbû milekî xwe bilivanda û destê xwe bir ber qirika wî. Wî hest kir bê çawa jêkirin pêk hat û hewa cemidî tê de, lê ecebmayî ma ku hemû zuha mabû. Xort dibişirî û diaxivî û kêr bir paş xwe, devara ku dirî û deviyên tarî li ber bê direqisîn. Pişre wî kêr xist ber kemera xwe û çû. Qaçaxçî bi qirika xwe

girt, pê re tiliyên xwe di goşt de diçikandin, mîna ku bixwaze serê xwe ji ketina ber bi jêr ve biparêze. Hizra wî ya dawî berî ew şiyar bibe di derbarê birîna wî de bû; ew piştrast bû ku dê di demeke kurt de rehet bibe.

Bêşik wî ji çûna bi pergal bo Avahiya Sor pê ve gelek tiştên din jî ceribandibûn. Atmosfera teng a ji bandora xewna berî wê mayî, tev li bîranînên lêgerînê dibûn. Tirsa destpêkê û miqatebûna ji her kesên ku derdiketin pêşberî wî, niha nemabû, ji ber wî fam kiribû ku Avahiya Sor û kesên li wir bi tu şêweyî niha bi kurê wî re ne têkildar bûn. Vê rastiya asayî dîsa enerjî didayê û niha ew poşman li safîtiya xwe ya di danûstandina bi meqamên fermî re ku wî ew ji qasî ku ew girîng bûn girîngtir didîtin, poşman bûbû. Bi wê yekê wî gelek dem wenda kiribû.

Bi xem bû Qaçaxçî, li ser nivînên xwe runişt û li dolaba himberî xwe ziq mêze kir. Ji xwe re got: Min heta niha di danûstandinên xwe yên bi van meqaman re tu carî ji tevliheviya ji bipaşdemanê, carinan xwebiçûkkirinê û di heman demê de di rastiya xwe de pozbilindiyeke berdewam a li hember wan pê ve tiştek pêk nedianî. Lêbelê ma dê wî, wek Qaçaxçî, karîba çi bikira, bi zanîneke bêtir a li ser kar û xebata vê dezgehê. Dema ku bi wendabûna kurê xwe re rasterast ket nav vî karî û dem bêyî çareseriyekê derbas bû, tiştekî di hundirê wî de xwe şidand; ew ne wêrekî bû, lêbelê bêhêvîtî bû. Wî dest pê kir ku li ser biponije, bê wî kî nas dikir ku bi şêweyekî alîkariya wî bikira. Merivên wî yên ji dûr ve û hin nasên wî hebûn, lêbelê ew hemû jî, ger pêwendiyek wan hebû jî, ji dûr ve bi wê dezgehê re têkildar bûn ku wek navendeke xwedî gelek şaxên zirav ên li her derê belavbûyî li tevahiya welêt desthilatdar bû, û girseya kesên li derveyî xwe dikir qurbaniyên potansiyel. Lêbelê ew her carê dîsa vedigeriya ser Beno. Wî dê xwe zehf baş his bikira, ger wî bikarîba rêyek ji derveyî desthilatdariya li derdora Beno bidîta, ev pêwendiya dawî û lema ya zehf dijwar a di navbera Nêrîk û wî de qe nebe niha bi dawî bianiya. Lêbelê ev ne gengaz xuya bû

Baş dihat bîra wî, bê çawa di dema ku wî bê hêvî hewl dida û bi lez di nav tevgereke nû de bû, ji jina xwe li hin nasên ku bikaribin bibin alîkar pirsî bû. Hingê wî dest pê kir ku ji wê nefretê bike, kêliya wî, ew bi piştа xûsbûyî ya ku ji bo temenê wê ne xwezayî bû li pêşberî xwe li malê dît, awirên wê yî westiyayî wergirtibûn.

“Seba çi”, wî jê pirsî bû, “tu wisa zû dev jê berdidî?”

Wê rûyekî dûrî aqilan rê dabû. “Zû?” gotibû wê û li kincên xwe nerîbû û serast kiribûn, mîna ku li lekeyan bigere, mirov digot qey wê dixwest bi tiştên zehf nêzîk re mijûl bibe, ji bo ku dûrahiya di navbera xwe û kurê xwe de hest neke.

Niha Qaçaxçî zanîbû ku tam ji bo vê yekê wî, hew karîbû ew deyax bikira, ji ber ku wê hiştibû ew dûrahî pêk bê. Wî karîbû di qilafetê wê yî bi ser hev de piçikandî de û di kiryarên wê yî rojane de, ger ne qasidên ji bîrkirinê bin jî yên lihevhatina bi çarenûsê re bibîne. Niha hîna du zarokên wê û xaniyê wê hebû û hemû karên ku dikirin, wisa bi wî dihat, ji berê bi baldarîtir dikirin.

Di wî de ev dûrahî tu carê pêk nehat, berovajî wê. Tevgerên jina wî, biryarbûna wî xurtir dikirin, ji bo ku kurê xwe dîsa bibîne. Ew çû Avahiya Sor û li qorîdorê ewqasî pa heta Beno di ber wî re derket. Qet şaş nema ku wê rojê yekser pê re çû serî ku wî bibîne. Beno hat ber bi wî de, wer xuya bû ku yekser bi rewşa Qaçaxçî ya guhertî derxist. Ew vexwend odeya xwe û lê guhdarî kir, bê Qaçaxçî dixwest çi jê re bibêje. Qaçaxçî vir de wê de gotin dirêj nekir, lêbelê pere teklîfî Beno kir ji bo ku ew bi serê xwe zanyariyan peyda bike.

Beno li ber maseyê rawestiyayî bû û li Qaçaxçiyê ku bêyî li alî wî binere û her diçû serê xwe bi erênî bêtir dihejand û diaxaft, guhdarî kir. Piştre Beno kêliyekê pa, çû ber dîwarê aliyê din û li wir pişta xwe da Qaçaxçî, şipyayî ma.

“Ez dizanim”, got, “ku te pere peyde kiriye. Lêbelê ez ne piştrast im, bê ez karim zanyariyên ku tu dixwazî peyda bikim an na.”

Qaçaxçî kêliyekê li dengê Beno yê tişteyî şaşwaz ma. Wan yekser axaftina xwe kiribûn bazarkirin.

Benoyê ku pişta wî hîn jî lê bû, dom kir: "Yekê ez dikarim niha ji te re bibêjim: Kesekî mîna wî dê ne ji alî polîsan an jî polîsên kirmînal bê girtin. Û tu bi xwe dizanî ku Muxaberat di nav kar de bin, dikare çi bibe, dikare termê miriyekî mehekê li navenda bazarê bimîne, bêyî ku kesek dest wî bide."

Qaçaxçî bêhneke kûr wergirt. "Ez ê bêtir pereyan bidim ser hev."

"Dê bes be, ji ber ku em hevdu nas jî dikin. Lêbelê gelo tu dizanî, bê tu xwe dixî nav karekî çawa? Dikare li her tiştê te bibe mal."

Qaçaxçî, ji ser kursiyê rabû. Beno yekser bi lez li xwe zivirî.

"Bipê, bipê", got û destên xwe bilind kirin. "Tu derfetên min li ber çavên xwe mezin dikî, bi rastî jî. Tiştê ez dikarim bikim, ew e ku ez li derdorê guhdarî bikim -em bêjin: mûxaberata leşkerî. Lêbelê gumaneke mezin tune ye ku ew li cem wan be, li gel ku carnan tiştên wisa jî dibin, bi taybet jî van demên dawiyê ku warên berpirsyariyê tev li hev dibin. Ez ê hewl bidim. Lêbelê ez nikarim xwe bixim metirsiyê ku ez li cîhekî din bikevim nav kar. Yekî din bibîne ku karibe tiştekî wisa bike. Baş guhdarî bike: Tu bi xwe nikarî bipirsî, ji ber ku tu ne xwedî pozîsyon î. Dive tu di rêyeke ne rasterast re, ber bi jor ve bipirsî, ji bo ku ji wir rasterast ber bi jêr ve bê pirsîn. Tu tê digihîjî: Qadek neçar e ku zanyariyan tenê bide yên di ser xwe re. Tenê wisa dikare dibe."

Li vê yekê, ew bi xwe jî hizirî bû û bi tacirê xwediyê papaxan re peyivîbû, ji ber ku ew ji tevahiya mişteriyên wî yê ku ew, bi hêsanî karibû pê re biaxiviya bû. Zilamî li tevahiya serpêhatiyê guhdarî kiribû û qederê xuya bû, li ber çarenûsa xortê wenda ketibû. Berovajiyî tevgerên wî yî din vê carê yekcar bêdeng bûbû û dawiyê, bi şêweyekî mîna Beno, gotibû ku ew ê tiştinan biceribîne.

Niha bi kêmanî Qaçaxçî, ji Beno bihîstibû ku beşê leşkerî tu tişt li ser kurê wî nizanîbû. Tacir, berovajî wî, karîbû jê re behsa zilamekî li paytext bike ku wî midîrê hepisxaneyê nas dikir ku kesên dihatin tawanbarkirin ên rêxistina îstîxbaratê ya serbixwe yî herî mezin dianîn wir. Têkilîdanîn dijwar bû û bi hefteyan dom dikir. Piştre asoxî tacir, wî agahdar kir ku zilam amade ye ku bi wî re bê ba hev.

Qaçaxçî, heta ku karîbû pere dabûn ser hev, ji xwişka xwe jî hinek wergitibû ku wî dikarîbû bi qederekî pereyên baş biketa rê.

Wek bi Beno re jî carekê çûbû, vê carê bi tacir re di ser rêya nav gundan re çûbû. Zilam ji qasî ku Qaçaxçî dipa hindiktir diaxivî. Lêbelê wî jî ew derbarê tiştê ku wî dikir de îqaz kir.

“Belkî em ê wî bibînin”, hêdîka got, “lêbelê ne misoger e ku ew hîn dijî. Di çend hefteyên pêşî de hêvî heye, lêbelê piştre…”

Bi tacir re jî ji cergî destpêka lêgerînê heman guhertin pêk hatibû, mîna bi Beno re; ew niha bê dîqet, vekirî bi wî re diaxivî, bi şeweyekî danûstandina karê bazirganiyê. Gelo wî, Qaçaxçî hîngê ji xwe pirsîbû, xeyal li ser hoyên welatê xwe ji xwe re çêkiribûn? Ew herhal tu carî li ser neponijî bû û niha wî tiştin didîtin ku hîngê bi gumaneke mezin newêrîbû.

“Gelo kî teyrê li ser baniyê te xwedî dike?” got Qaçaxçî, ji bo ku bi kêmanî, demekê babetê biguhere û tacir ecêbmayî lê mêze kir.

Li paytext ew rasterast çûn cem nasê tacir. Qaçaxçî, li ber deriyê hesin ê geracekê ku diviya ew geraja gelek erebayan ba. Berê tu carî nehatibû vê taxa ji mirovan vala, bi gelek dar û xaniyên rengvekirî yî mezin. Gava ew li ber dergehê derve rawestiya û li qatên jor ên avahiyê yên ber bi pêş de derketî mêze kir, wî rêzeke ji paceyên qerase dîtin û li ser her yekê ji wan bi dirêjahî kevirekî neqişandî dît. Şik pê re çêbû. Hingê li vir têgihîşt, bê wî dest bi çi kiribû. Kincên wî yên herî baş lê bûn jî, lêbelê li vê taxê wî bi wan mîna parsekêkî li welatê xwe

xuya dikir. Ew aciz bûbû, kêliya ku tacir bi kêf û bişirîn li zengilê derî xistibû û piştre zikê xwe bi pêş de bel kiribû.

Zilamekî porşîn ê bi bedlekî çeleng, hat ber dergeh û ew vekir. Ew ji qasê ku diviyabû di vê rewşê de henûn be, ne henûntir bû, ne bi tacir re ne jî bi Qaçaxçî re. Ew di hêwaneke bi heşmet û tarî re hetanî bi hewşê birin. Li hewşê ewqas dar gelek bûn ku wir jî tarî bû.

Ew derbasî odeyeke mêvanan a li beşê paş î avahiyê bû. Di aliyê pêş ê ji camê re bexçe xuya bû û bi Qaçaxçî dijwar hat ku li vir çîroka xwe dubare bike. Lêbelê zilamî dixwest tev hemû kitekitan lê guhdarî bike. Wî destên xwe danîbûn nik hev û ew bilind kirin, hêdî bi tiliya nîşandanê li lêva xwe ya jêr xist. Car caran lêva xwe ya jor vedikişand, mîna ku pozê wî bixure. Qaçaxçî, hîngê ji xwe re got, bi gumaneke mezin, ew niha diponije, bê metirsa ji bo wî çiqasî mezin e. Awirên wî bi yên zilamî ketin û zanîbû ku tiştê wî behs kir bi tu şêweyî bandor li zilamî nekiribû. Lema çavên wî li bexçeyê ku ji nav şewqa cîh cîh ya şaxên daran î keskê vekirî, kevok mîna ku ji tune çêdibûn, xuya dikirin û axaftina xwe zû bi dawî anî. Wî dît ku zilam hîn jî bi destên bilindkirî dipê, pakêta pereyan a biçûk derxist û mîna ku di ber re bike, bêyî ku balê bikşîne, danî ser maseya çayê ya li ber xwe. Piştî kêliyeke kurt keçeke xweşik î hîn zehf ciwan derbasî odeyê bû. Wê porê xwe yê reş î di ser milên wê re daketî doş kir û bi bişirîn ber bi bavê xwe de hat. Wî destên wê girtin û çend peyvên ne girîng li ser mêvanan jê re gotin. Keçik li dor maseyê zivirî, ji bo şêweyekî nazenîn ku bal dikişand ser wê, silav li wan kir. Kêliya ku ew ji wir çû, zerfa bi pereyan jî wenda bûbû.

Zilamî got ku wî navê xortî daye midîrê hepisxaneyê, lêbelê wî nikarîbûye di nav kaxezên heyî de tu tiştî derbarê wî de bibîne. Qaçaxçî qilqilî, ji ber ku wî hest dikir, bê çawa hêviya wî wenda dibû. Zilamî milên xwe hildan û destên xwe xistin paş serê xwe. Wî hişt çend saniye derbas bibin û wer xuya bû

ku di encamê de gihîşt wê baweriyê ku ew nehêle di vê rewşê de Qaçaxçî biçe, got dibe nav bi hev hatibin guhertin. Got tenê tiştek maye ku mirov biçe hepisxaneyê û li girtiyan mêze bike. Ew dikare vê di demeke zû de pêk bîne. Di wê kêliya ku zilamî bi kêf cîhê xwe di palkursiyê de xweş kiribû, ma ji erê pê ve, çi di destê Qaçaxçî de mabû.

Wisa jî bû ku adinî rojê, di dergehê bi derabe re ku li pişt wî devereke bi qum dirêj dibû, derbas bûn. Leşkerê li ber dergeh, xwest karê xwe bike û li pêşber hevalê tacir silaveke leşkerî da. Wî tenê li bayê meşê bi erênî serê xwe hejand. Mîna ku xwe ji her tiştî biparêze qapûtekî baranê yî ji rengê qûmê bi ser kincên xwe de li xwe kiribû. Qorziyên qapût li ba dibûn. Wî da pêşiya wan û ber bi avahiya nizm î dirêj î nû ve çûn.

Ev hepis ne bi qasî ya ku mehkûmê hatibû berdan li çayxaneyê jê re behs kiribû mezin bû. Li pişt stûnên ji betonê devê paceyên bi derabe xuya kirin, hemû deriyê ku xuyabûn vekirî bi aliyê hewşê ve bûn. Qaçaxçî li xwe zivirî û ji dûr ve li ber dîwarê derve ku li dor metreyekê bilind bû, nobedarên ku di halê xwe de xuya dikirin, dîtin. Li pişt wî diwarî, xaniyên malan xuya bûn, lêbelê li ser kolana di navbera wan û dîwarê derve yê hepsê de, trafîk tune bû. Ew ê bi tenê tu caran nehata vê taxê jî, ji ber ku li gel ku ji dûr ve nexuya bû jî, deverek qedexekirî bû. Ew malên li wir, li aliyên din, tu şopa ku kesek li wir be, xuya nedikirin, belkû vala û paqij bûn, mîna kûklayên sivîl.

Wan rêya xwe bi baskekî kurt î alîyekî avahiyê xist. Di deriyekî re li hundirê tarî rêzên çewalên kincan î tije xuya dikirin. Di bin dijwariya meşê de tacir, dest pê kir ku bike helkehelk. Xuya bû ku wî xwe baş hest nedikir, serê wî di nav herdu milên bi jor ve kişandî de, mîna ku bêrawest derbên hêsan li wî bikevin, dijenand. Zilamê wan î navberê, baş bi pêş de çûbû, rep î şipyayî bû, bi wateyê ku wî cihê xwe dadigirt. Lêbelê bayê li meydanê porê wî ber bi aliyekî ve kiribû temberiyeke bê teşe.

Li pêşber beşê avahiyê yê navendê û dirêj, di ber eniya avahiyê re derbas bûn û gihîştin ber dergeh, deriyekî hesinî yê bi zirnax û kilîtan ku ew jî vekirîbûn. Li hundir rêberê wan bi kefa destê xwe qapûtê xwe paqij kir û ji zilamê ku mîna li resepsiyona otêlekê be li pişt tezgahekê rûniştî bû re got ku ew dixwaze bi midîr re biaxave. Zilamî li her sê mêvanan mêze kir û rahişt telefonê. Kesê ku heta wir hatibû, diviyabû kesekî girîng be.

Piştî çend xulekan midîr hat. Yekî ecêb ciwan bû. Wî silav li wan kir, lê berî herkesî li zilamê navberê, ji dil û bi germahî. Wî ji wan xwest ku bên odeyeke li rex ku lê kursiyên text mîna di poleke dibistanê de rezkirî bûn.

Bêguman divêyabû Qaçaxçî, çîroka xwe careke din vebigota, hema wisa, ji ber ku ew li wir bû. Tacir jî di wê kêliyê de li hev dianî, mîna peywendiyeke wî yî taybet bi xort re hebûye. Zilamê navberê her tişt girover kir, amaje bi îhtîmala bi hevguhertina navan kir.

Midîr, careke din got ku ev nav li wir li tu derê tune ye. Piştre hema hema bi şêweyekî şermokî li çavê zilamê navberê mêze kir û dest pê kir ku hêdî hêdî bi erênî serê xwe bihejîne. Wî derî vekir û emir da zilamê li odeya din ku ji pêvî girtiyên nexweş û yextiyar hemû girtiyan, bi rastî jî hemûyan li hewşê kom bikin.

Wisa jî bû. Piştî çarîkekê ji hemû qawîşan zilamên bi şal û gomlekên qehweyîyê vekirî kom bi kom derketin û hatin li hewşê kom bûn. Meşeke xemgîn bû. Zilamên ji her temenî di nav wan de hebûn, ên nîvzarok mîna Nêrîk û yên wisa ku li gor rûyên wan kal bûn. Ji qilafetê wan, cûdayetiya wan nexuya bû; gomlekên bi ser wan de daketî û şalên ku bi pirtepirt li ba dibûn, hemû mîna ku di temenekî de bin, rê didan. Di bin çavdêriya çar nobedaran de zilam, rêz bi rêz li nêzîkî cîhekî sipî destnîşankirî, rawestiyan. Midîr ji Qaçaxçî û tacir xwest ku ew ji nêz ve li wan zilaman mêze bikin.

Kêliya Qaçaxçî, çû ber rêzên zilaman û li rûyên wan mêze kir, ji bo wî êdî zelal bûbû ku ew ê Nêrîk li vir nebîne. Ev tişt hemû bi wî mîna lîstikeke ji bo temaşevanan dihat. Girtiyan hiştin ew bi awirên xwe yên ziq di ber wan re derbas bibe û tenê çend heb ji wan kêliyekê ew bi çavên xwe teqîb dikirin. Wî ev rû didîtin ku îfadeya wan î herî bi hêz tirs bû, tirseke ji rewşa fêrbûyî êdî ko bûbû, dihişt ku hemû mîna pûç bûbin xuya bikin. Wî li çavên ku piştî bi xulekan, birûyên wan bi hev ve zeliqî bûn û lêvên jor, mêze kirin. Yekî zehf ciwan nikarîbû vê nerîna li xwe deyax bike û serê xwe hêdîka bera ber xwe da, pê re yekser dengê pîspîska nobedarê nêz hat.

Ew gelek bûn û bi gumaneke mezin dê piştre tenê kêmzêde çar rû bihatana bîra Qaçaxçî. Teklîfa midîr ku bên li beşê nexweşan jî mêze bikin, Qaçaxçî red kir, lêbelê piştre ew lê poşman bû, ji ber ku wî got divayabû ez bi hûr bûn tev bigeriyama.

Mudîr, mizicî û ne ji dil got, ji xwe li wir tenê çend zilamên kal dimînin. Zilamê navberê porê xwe şeh kiribû û bi kêf xuya dikir, ji ber ku ji bo pereyê wergitibû tiştek li dar xistibû.

“Ez dikarim bêtir pereyan bînim”, Qaçaxçî got li ser rêya vegerê ber bi mala wî de, piştî wî bêçaretiya ku ew neçar bû niha pê vegere malê fam kir.

Zilamî awireke şaşwaz avêt wî û pêşî kêliyekê bê deng ma. Lêbelê piştre ew dîsa lê vegeriya û got ku ew dikare hîn jî hewl bide, lêbelê divê vê carê xwe bigihîne kesên ji serayê. Wî bi şik li Qaçaxçî mêze kir û bi ser vekir ku ew xizmet di gelek beşên mezin î ji hev cuda de pêk tê û dê dirêjtir dom bike, sedemek jê jî ew e ku ew nikare zehf bide ser karmendên qada bilind. Qaçaxçî, bêsebriya xwe çewisand û daxwaza xwe dubare kir. Bi vî şêweyî wan li hev kir ku zilam bi karê ku jê hatibû xwestin mijûl bibe û Qaçaxçî jî hewl bide ku bêtir pereyan peyda bike. Tacir kêm peyv bûbû û li ser rîya vegerê baweriya xwe nedigot. Belkî ji wê yekê bi şik bû ku hewldana Qaçaxçî di demeke kurt de wisa mezin bûbû.

Dema ku Qaçaxçî gihîşt malê û jina wî li encama lêkolînên wî jî nepirsî, wî zanîbû ku ew ê wê berde. Lêbelê bi biryardariyeke cemidî ew girtibû; wî serî li hemû mişteriyên xwe yî halxweş da û dudo ji wan amade bûn ku tiştina bikin. Wî serîlêdanên bo Avahiya Sor rawestandin, heta ku rojekê Beno emrê ku ew bê cem wî da.

Wî kiryarên Qaçaxçî bishîstibûn û ew pê aciz bûbû, lêbelê nedixwest di xwe derxe. Bi aramî li Qaçaxçiyê ku hêdî hêdî her tişt jê re got, guhdarî kir. Piştre Beno, bi neyênî serê xwe hejand.

“Dibe ku tiştê tu dikî encamekê bîne, lêbelê teqez dê ne ya tu hevî dikî be…”

“Qe nebe dê encamek be”, Qaçaxçî peyva wî birî. “Seba çi dê destûr tunebe ku ez derbarê kurê xwe de zanyariyan werbigrim?”

Beno kêliyekê rawestiya û piştre bi hêztir serê xwe bi neyênî hejand. “Ji ber ku ji mêj ve ye. Tu rabirdûyê tev didî. Tu fam nakî: Li vir rabirdû tune ye, qe nebe ji bo kesên mîna te. Ne rabirdû, ne jî dahatû- her tiştê din herêma qedexekirî ye. Diviyabû ev biketa serê te.”

Bi vê îqazkirinê Beno, ew berda, lêbelê bi hesteke misoger ku wî dest bi tiştekî kiribû ku diviyabû bandor lê bikira.

Adinî rojê serê sibê atmaosfereke bêhntengiyê hebû li mala Zarik. Baran rawestiyabû, lêbelê esman hîn jî bi ewrên gewr girtî û hewa şilî bû. Li ser xwarinê qulên di erdê mayînkirî de hatin bîra wî û hesteke ku divê ecele bike hatêyê. Wî zû xwar û ji malê derket, ji bo li rewşê mêze bike.

Li ser rêya bi kaş ve berjêr dibû, sê tirimpêlên panzerkirî, bi dû hev de rawestiyabûn û rê hemû girtibûn. Qaçaxçî, ber bi jêr ve daket û di rex rêzê re meşiya. Leşker di nav gemarê de li ser tutikan rûniştî bûn û çayê vedixwarin. Porê wan kurkirî bû, hinekan ji wan ji navê berjor bi tena fanêrê binî û lastîkên ku şalên wan bi wan daliqandî bûn. Awirên wan li ser wî bûn. Piştî wî ew û ûnîformên wan ên tarî dîtibûn, texmîn kiribû ku

ew ji bo nêçîra terorîstan li vir bûn. Qaçaxçî, li wî cihê ew lê bû li derdorê mêze kir, lêbelê wî ji wan her sê tirimpêlan pê ve tu yên din nedîtin. Ew çû ba taciran. Li vir bihîst ku bi şev konvoya ber bi aliyê bakurêrojava ve bi rê de bû. Wek ku wî ji xwe re got, çûneke ber bi sînor ve bû ku evên li vir tenê beşek ji wan bûn ku nobeta derve digirtin. Wek her carê ku tiştekî wisa pêk dihat, bi fermî ew derketibûn, nêçîra teroristan, ev dihat wê wateyê ku li herêma operasyonê di kiryarên xwe de destûrdayî bûn. Ji bo vê armancê yekîneyên taybet di deverên ewle yên li jor re sînor derbas dikirin û qederekî baş bi nav erdê dewleta cîran de diçûn. Qederê dihat bîra wî tu carî heta bi vê jêrê nehatibûm. Wî ji qirdê xwe yê xerab re siqêf kirin û di rêyeke din re vegeriya malê.

Xwîşka wî destê wî girtin û got: "Tu yê çi bikî, ger ew te zeft bikin? Kesek hingê hew kare alîkariya te bike. Ka li vir bimîne, heta ku tu neçar bî. Wê rojekê ji vir herin."

Qaçaxçî li ser hev serê xwe bi erênî dihejand. Wê hizrên wî digotin. Lêbelê dîsa jî bajarok, xanî, ode, esmanê bi ewr û şilî yê melûl ku li pişt darên spîndar ên tenê yên li kaş xuya dikir zehf teng bûn, ji bo ku ew karîba rojeke tenê jî bêtir bimaya. Wî destên xwe ji nav yên wê kişandin û lêvên xwe qermiçandin. "Li derve dê ji min re xweştir ba. Li wir ez dizanim bê divê ez çi bikim. Û dê pêşketin jî pêkbihata."

Xwîşka wî careke din ber bi wî de çû. "Çi nirxê çend rojan heye. Kesek dê lê nepirse. Lêbelê kî bikeve nav destên wan, kesek nizane, bê dê bi ku de wenda bibe. Niha tacir jî nikarin ji vir derkevin."

Dema ku zavayê wî wê rojê vegeriya malê, diyar bû ku xwişka wî maf dar bû. Tevahiya rê û kolanên li erderastê hatibûn girtin. Li deverên kontrolê nedihiştin ku şêniyên derdorê derbas bibin.

"Wê çi bibe, ger ew li malan bigerin? Ger ez li vir bimînim, ez ê we bixim metirsiyê", wî ji herduyan re got.

Wan bê deng li wî dinerîn. Zarik piştre milên xwe hildan. “Ez nizanim. Em tu carî tiştekî wisa nejiyane. Divê em tiştekî amade bikin. Tu merivekî me yê ku mêvan e. Lêbelê çawa tu hatiye vir?”

Qaçaxçî kêliyekê ponijî. “Çêtir e ku mirov derewan neke. Ez li nik qereqola ser sînor bûm. Bi gumaneke mezin wan li wir behs nekiriye. Ev dê berjewendiya wan bi xwe be jî. Lêbelê mirov qet nikare bizane.”

Qe nebe kesekî nizanîbû bê ew li ku bû. Dikarîbû ji mêj de çûba gelî. Nexwe çêtir bû ku ew li vir bima û xwe veşarta, ji bo ku bal nekişanda ser xwe. Lêbelê ger ew bihatana, diviya bû ew mîna her tim dostane baya û her pirsyar xweş û vekirî bibersivanda.

Roj û şevên piştre ew li wir bû, bi tevahî di odeka xwe de li malê ma. Wî dema xwe bi xwendina rojnameyên zehf kevn derbas dikir û alavên xwe ji nû ve ji hev derdixistin, ew ji tûrê piştê derdixistin li ser nivînan datanîn û dîsa tev dadigirtin. Dawiyê hemû wisa baş bi cîh kiribûn ku dîsa cîh çêbûbû. Esman çi bigire qet sayî nedibû, her ewr bû. Kêliya ku ew piştrast bû, zavayê wî jê re got ku leşkeran di vê navberê de çend sed metre li kolana jora wan çadir vekirine, tam li ser rêya ku diviyabû ew tê re biçûya ser sînor. Qelabalix û teqereqa ku bi şev tê, ji wir tê.

Piştî ku wî ev bihîst, Qaçaxçî têgihîşt, bê çawa bêsebiriya di hundirê wî de xurtir dibû. Tiştekî ew ji malê ber bi derve de dahf dida û ber bi derveyî bajarok de dibir. Ji ber ku wî ji seferên xwe û bi taybetî jî ji ya dawî ewqas çêj negirtibû ku niha wî bêriya wê bikira. Her ku ew bêtir li ser diponijî, daxwaza ku ew derkeve derve, ne ji bo esmanê sayî bû, bêtir erd û devî bûn, cêşa qûmê û bêhna rehên bin erdê bû. Lêbelê wî dikarîbû çi li wir bidîta, ji metirsiya ku ew ji hev bê perçekirin pê ve.

Bê çare wî bang xwişka xwe kir ku bê ba wî odekê û ji wê re behsa wî tiştî kir. Wî dixwest ku bandor li ser wî bê kirin,

dixwest ku xwişka wî bi awayê xwe yî hêdî û bê deng nearamiya wî ji ser wî bavêje. Xwişka wî bi qama xwe ya kurt li ber paceyê rawestiya û li wî guhdarî kir, piştî ew tê gihîşt ku gelek tişt hene ku birayê wê jê re bibêje, heska di destekî xwe de danî ber paceyê. Axaftina wî ji wî diqetiya, ji hev vedibû mîna topekî qumaş ku her diçû dibû perçeyekî dirêj î dirêj. Wê bê deng li wî guhdarî dikir, çi nema bû bi awirên xewnan, mîna ku ew çîrokbêjekî li bazarê be. Kêliya ku wî behsa fanêreyê kesk ê wî li herêma sînor dîtibû kir, xwuşka wî hat ser hişê xwe.

"Tu li wî digerî?", wê got.

"Li kê?"

"Li wî, û divê tu dev jê berdî. Ew ê te bixe nav metirsiyan, ger tu vê rêyê dom bikî." Qaçaxçî serê xwe bi neyênî hejand û dixwest îtiraz bike, lêbelê wê gotina wî birî. "Du zarokên min mirin, li gel ku wan êdî bêhn didan û distandin û diqîriyan. Ez dizanim, bê çawa ye, ger mirov li tiştekî bigere û nikaribe bibîne."

"Ew qet ne li vir e."

"Ez jî zanim, bê tiştek çawa dikare li vir be, bêyî ku mirov wî bibîne. Lêbelê demek tê ku ew dest pê dike û xwe diguhere û ger mirov hîn jî lê digere, hingê ew metirsî ye. Kurik çûye. Ew ê hew vegere, yan jî ew ê bê û bimîne, yan jî dîsa biçe. Mîna wan leşkerên li derve. Li wî negere, şopa wî negerîne. Wî li wir bihêle, bê li ku ye, û bipê. Jê bêtir tu nikarî bikî."

Qaçaxçî bawer nedikir ku tiştên wê digotin dikarîbûn alîkariya wî bikirana. Hizra li ser kurê wî niha jê re ne ewqas girîng bû, tiştê li ser fanêreyê wî tenê di ber re gotibû. Tiştekî ew ber bi derve ve dibir, ewqas piştrast bû. Leşker dikarîbûn hîn bi hefteyan li wir bimana. Û seba çi diviyabû ew li malê bipa, heta ew bihatana, ger cudatiyeke mezin di navberê de tune bû, bê wan ew li vir, an jî di nav zeviyan de zeft bikirana. Wî nikarîbû bida mandelê ku ew yekî qaçaxçî ye û bi qaçaxî di ser sînor re derbas bibû.

Wî qapûtê xwe li xwe kir, tûrê xwe bi ser de avêt pişta xwe, li ser dest û çonkan çû û ceriband ku bi çarpiyan bimeşe. Li ser zemîna kevir wî komîkbûna tevgera xwe fam kir. Wî dîsa tûrê piştê danî û li pêş paceyê rawestiya. Kaşên çiyê di bin esmanê giran de xuya dikirin, perçeyê rêyê li ber malê ew ber bi xwe ve dikşand.

## 10

Adinî rojê serê sibehê, ji hemû carên din zûtir da rê. Ew zehf bêdeng bû, xwişka wî û mêrê wê hîn di xew de bûn û li hesabê wî dihat ku xatirxwestineke mezin tune bû. Gava ji zavayê xwe li rêyeke din a ku diçû ser şifîleyê pirsîbû û hiştibû ew wê jê re rave bike, tembî li wî kiribû ku ji xwişka wî re behsa çûnê neke. Piştî axaftina berî bi rojekê ew piştrast bû ku ew bê sedem ji xwe re xeman çêdike.

Wî mal terk kir û ket rêya ku bi kaş ve berjor diçû. Nêzîkî sêsed metreyî di ser malê re wî dikarîbû ew xaçirêka ku piştî çend çivan di nav keviran de wenda dibû, terk bikira û li ser kendalekî kevirî heta bi devara ku çend darên nizim lê biçe. Ew ji leşkeran tenê bi pênsed metreyên esmanî dûr bû. Lêbelê ew ji wan ve nedihat dîtin û rewşeke guncav bû ku ew di ser wan re tevdigeriya. Di paş daran re ew berjor çû qermîçekeke erdê ku ew li baskekî çiyê dizivirand. Hewa serê sibehê ya hêwî ya hîn hênik li hesabê Qaçaxçî dihat. Tenê bêdengiyê ew hîn nearam dikir ku tê de dengên gavên wî mîna yên derban dihatin. Ne gengaz bû ku leşkeran pêjna wî bikirana. Lêbelê di hişê wî de ev meşeke ku wî dabû ber xwe, yeke bê deng bû, şemitandineke li bilindahiya dar û deviyan bû. Wisa wî xwe didît û niha bi teperep ber bi sînor ve diçû ku wî hîn nizanîbû dê çawa tê re derbas bibe.

Riya ber bi jêr ve li pêş devî û diriyên ku wî li vê bilindahiyê

ji aliyê din ve nas dikir, bi dawî bû. Bi ajoya hundirê xwe li wir rawestiya. Li ser tutikan rûnişt û di nav şax û rehên li hev geryayî re li erda zuwa temaşe kir. Qederê ji giha û deviyan xuya dibû, ji mêj ve kesek nehatibû vir. Lê tu vateya vê tune bû. Wî li dû xwe nerî. Ne gengaz bû ku ev devera ewqas nêzîkî bajarok mayînkirî ba. Lêbelê bê xem nikarîbû di nav devî û diriyan re derbas biba. Her tiştên wî li dijî vê yekê bûn, tenê ku mala ew lê mabû û derbaskirina rojên bê wate li wir dihatin bîra wî, ew bi pêş de dihat birin.

Devî li bejna zilaman bûn û jora wan mîna şewqa masîvanan bû. Destên xwe li nav wan pelandin. Tiştê ku pêşî bi wî negirîng hatibû, bi lez jê re bû serêşeke mezin. Şewq li hustuyê wî digeriyan û dadiketin ser milên wî. Tevliheviya ji strî û gihayan û buokan bêhna wî teng dikirin. Li ser beşekî ji rê likumî û bi pêş de çû û jin nav diriyên asê derket ser panaveke ji tahtê ku hêdî hêdî ber bi jor ve diçû. Li wê devera ku rûyê keviran dixwestin xwe bigihînin ezmên, diviyabû li cihekî şifîleyek hebûya.

Niha ew dem bû ku divabû ew li ser gavên xwe yên pêş bihizire. Hêvî dikir ku qirdê wî çê be. Wî dixwest xwe nêzîkî nobedarên li ser sînor bike û pêşî mêze bike bê kî li wir e. Dibû ku yekîneyên taybet niha li devereke din bûn û wî kesek bidîta ku bihişta ew bi dizî derbas bibe. Di rewşa herî nebaş de wî kengî bixwesta hîn jî karîbû bi paş de vegeriya. Ev ceribandinek e, ji xwe re got, jê pê ve ne tiştekî din e.

Ew hilkişiya ser wî cihê xwar û çavên wî li ser xeta di navbera kevir û ezmên de bûn. Çûkên biçûk ên reş, wisa xuya dikir, mîna ji piş wê xetê ber bi hewa ve dihatin avêtin. Ew ber jor dibûn û xwe li kêlekê ber bi ba ve berdidan, ji bo ku ew çiveke fireh pêk bînin û dîsa bi paş de berjêr bikevin. Ev dîmenê mîna heyaletekî hişt ku ew bê pêjin tev bigere.

Dema ku gihîşt serê çiyê, xwe li ser zik dirêj kir û xwe ber bi pêş de kaş kir. Wî karîbû baraka bidîta, biçûk û mîna ku di ber

re avêtibin wir di navbera neqebeke tahtan de bû. Ew ecêbmayî ma û pê re jî rehet bû ku li wan deran pêjna mirovan nedihat. Wî heta hingê newêrîbû li vê derfetê bihizirya. Dikarîbû pê re biçûya serî ku ew bêyî kes pê bihise derbas biba. Wî destê xwe li ser kevirê cemidî danîn ser hev û çena xwe sipart wan.

Kêm zêde wî saetekê li barakayê û hemû goşeyên derdorê temaşe kir. Çûkên biçûk ên reş hîn jî mîna bi tayekî bên kişandin ber bi jor ve bilind dibûn, ji bo ku li devereke nêzîkî esmên dîsa bên berdan. Tiştekî tenê ku carekê bala Qaçaxçî kişand, reyîna segan bû ku mirov nikarîbû bigota bê ew ji ku dihat. Wî bawer kir ku divê ew segên gundekî bin. Payînê ew xilmaş kiribû. Pê dijwar hat ku ew wî cihê xwe terk bike. Wî careke din bi tiliya dawiya pereyên xwe yî mayî peland, di nava xwe de dua kir û ku ger kesek di wir re derketa dê çi bigota, li hev dianî. Piştre bi nalîn rabû ser xwe û li wir cara pêşîn ferq kir bê tûrê wî yê piştê çiqasî giran bû û ew di bin de bû.

Çûna berjêr ve, bê pirsgirek bû. Her ku ew nêzîktirî barakayê bû, piştrastir dibû. Kes li cihê nobedarên li ser sînor tune bû û ji tu aliyan jî tu tişt nedihat bihîstin, ji dengê bayê bê rawest pê ve ku li nav tahtan dixist. Ew tewr li dor barakayê jî zivirî û carekê guhê xwe da ber. Bi dilşadî serê xwe bi erênî hejand û çû ber bi goncala ku ber bi çayirê ve diçû.

Ji bo kêliyeke kurt ew hesta ku li malê bêriya wê kiribû bi wî re çêbû. Li wir wî dê nikarîba xwişka xwe li ber bixista. Çawa wê bikarîba fam bikira ku hemû metirsiyên ew ji wan ditirsiya di mala teng de cûdatir bandor dikin, ji yên li vir ên derve? Li deverên azad û servekirî, ji xwe re got, rastî cihê xwe digire; gelek tişt hereşe ne, lêbelê her tişt vekirî ye jî, kêmasî û valahî hene ku hisek nikare wan heta bi heta jê bibe. Yekîneyên taybet jî tenê dikarîbûn hin mînakan pêk bînin. Dîtina van valahiyan, a rêyên teng ku mirov tenê bi çarpiyan dikare di wan re biçe, karê wî bû û di vê navberê de wer xuya ye ku bûye heyranê vê kiryarê jî.

Dengê xişînekê di kêliya wî barake li dû xwe hişt de ew cefiland û yekser bi paş de vekeşiya û ket sindoqa xwe. Ew tiştê ku di ser tahta bi aliyekî ve xwarbûyî ber bi wî ve dihat, kuçikekî almanan bû ku ji bezê bêtir dişemitî. Bi wê lezê rahpûşkên wî bi ya wî nedikirin û piştî ew gihişt panavê û lingê wî cîh girtin û pê ve dest bi reyandinê kir. Heta ku ew negihîştibû ba wî, Qaçaxçî hîn jî digot qey kuçik tenê li wir e. Lêbelê bibiryarbûn û hêza ku seg bi wan erîşî wî kir, şika xerabiyê bi mirov re çêdikir.

Seg xwe avêt wî û dev li destên wî yên ku ji bo xwe parastinê li ber wî bûn kir, kêliyekê bi wan ve daliqiyayî ma û dîsa ket xwarê. Wî xwe avêt qorziyên qapût ên li ber çavên wî li ba dibûn û ew kaş kirin. Du zilam ji bilindahiya tahta panavê xuya bûn. Reşê wan bi çîmên ji hev bidûrketî li wê jorê rawestiyabûn mîna ku dixwazin xwe wek destik bidin ber ezmên. Piştî çend saniyan ew ketin tevgerê, bi gavên mezin û piştre dîsa bi xweşemitandinê dabûn dû seg.

Di kêliya wî hewl dida ku bi pêhnên ne bi şida kuçik ji xwe dûr bixe, Qaçaxçî dît ku herdu ciwan bûn; wî ûnîformên wan ên ji rengê tarî û ew tiştê çerm ku li ser çakêtên wan li wan bûn, nas kirin. Wan çekên xwe yên bi mekîne û singokirî li pêş xwe girtibûn û bi wî şêweyî metre bi metre ber bi wî ve dihatin. Wî dest bi axaftinê kir, her tiştên ku dihatin bîra wî dianîn ser hev û bi qîjînî davêtin ber bi wan de, ji ber ku wî zanîbû ku tenê peyvên ew dikarin fam bikin, dikarin niha nêzîkbûna devê herdu singoyan û wî telafî bikin.

Çend metreyan li pêş wî yek ji herduyan rawestiya, yê din nêzîkî wî bû. Di kêliya wî lûla tivinga xwe di ser milê Qaçaxçî re bilind kir, bi dengê xwe yê tûj ê ku dikir fîzînî hişt ku seg xwe bide alî. Qaçaxçî, hîn jî tevlihev tiştin digotin û di ber re li rûyê girover î bi çavên tarî yî bê liv mêze dikir. Wî kumê reş ê xwarbûyî û çermê serê wî yê ku dibiriqand bi porê kurkirî dît. Piştre leşker bi lezeke nedîtî kontaxa tivingê kişand û li nîvê

çepê yê rûyê Qaçaxçî xist, hişt bizanibe ku bi kêmanî hîn jî derfeta wî heye ku li vê lihevrasthatinê bihizire.

Ji ser erdê wî xwest xwe rast bike û dîsa xwe li ser çonk û destên xwe dît. Mîna perçeyekî ji wî kumê wî dûrî wî mabû. Rûyê wî pûç bûbû û tiştek ji hundirê wî di ser re diçû û ji devê wî re diherikî derve. Devê seg bi zimanê derketî yî sorêvekirî mîna îşareta îqazkirinê yî matbûyî nêzîkî rûyê wî bû. Herduyan bi binê potînên xwe li paş wî, li çewalên ser pişta wî dan û gelek caran li ser hev ew bi pêş de avêtin ser erdê. Wî tenê zanîbû ku divê ew li erdê dirêjkirî nemîne. Ger wî bêruh xuya bikira, dê ew yek ji bo biryareke li dijî jiyana wî biba alîkar. Lema wî her carê xwe rast dikir, pêşî wî xwe da ser destên xwe û piştre çonkên xwe difisandin, ji bo ku dîsa pêhn lê bikevin. Tûrê li ser pişta wî vebû û şûşe, alavên cam û pakêt bi ser pişt serê wî ve ketin. Wî dengê ken ji jor bihîst û pêhnek li ser milê wî ket, pê re ew ber bi aliyekî ve çû erdê. Wî tê derxist ku dest di bin qapûtê wî de digerin. Wî çavên xwe vekirin û lûleya tivingekê di ser rûyê xwe re dît, li tenişt wê bi metirsiyeke nêzîktir kevanê tûj î devê singoyê dît. Çi dibû bila biba, hizra wî ew bû ku serî ber bi jor ve nelivîne. Kêliya pêhn li herdu rahnên wî diketin û bedena wî ji herdu seriyan ve ber bi hev de hat kişandin, berê xwe da ber bi alî rexê din e.

# 11

"Tu çi dibînî?" Li ser hev çend caran dubare jê pirsî, dengê li paş wî, di eslê xwe de dengekî xweş bû. Bi hevokên asayî yên tirkî diaxivîn. Qaçaxçî hemû baş fam dikirin.

Wî tevahiya hêviya xwe di wê yekê de didît ku berî ew, wî bixin erebeyê, wan çavên wî girêdabûn. Bi qasî wî texmîn dikir, bi tirimpêlê pir neçûbûn. Bêhna odeyên Avahiya Sor ên vala ji wan odeyên avahiya ku ew anîbûnê dihat.

Niha bi destên li paş wî girêdayî û çavên ku dîsa didîtin, li ber klozeteke Ewropî ya gemarî çok dabûn erdê. Qiraxa tara hewdikê wê, madê wî dieciqand. Wî li hundirê kovika bi rengê qehweyî-reş nerî.

"Qulekê", ji devê xwe yî bi tevahî werimî, bi şêweyekî xwarbûyî, derxist.

Wî hewl dida ku heta jê bê, xwe kêm bileqîne, ji bo êşên xwe hest neke. Hizrên wî ev bûn: Tu carî pirsyareke dijber nekirin, ji ber ku her cûreyên pirsiyaran li vir dihat wateya êrîşê; tu carî ne li aliyekî ne jî li jor mêzekirin; pirsyaran heta ku gengaz be kurt bibersivîn, ji ber wan wisa ew bê înisiyatîfa xwe û sax dixwestin. Jê pê ve divê ew lê miqate ba ku hewdikê tuwaletê di bin qefesa sînga wî re bimaya, ango xwe li jor bihişta, ji ber ku pêhnên ji paş de lê diketin ew li qiraxa hewdik dixistin. Ku hîn tiştek di nava wî de hebaya, wisa wî karîbû xwe verişanda, ji ber ku vê kêfa wan dianî.

“Çi? -Tu çi dibînî, mêro? Divê tu ji min re bibêjî, bê tu çi dibînî, rasterast li pêş xwe, li wir.” Qaçaxçî destê li paş serê xwe hest kir û bê çawa serê wî di kovikê de hat eciqand. “Girîng e, ku tu ji min re bibêjî, bê tu çi dibînî. Nexwe tu çi dibînî, li wir, li ber xwe?” Dest ew berda û serê Qaçaxçî ber bi jor de rabû.

“Qulekê.”

“Tenê qulekê? Nexwe, qulekê. Tu çi bawer dikî, bê seba çi ez li vir bi te re van tiştan diaxivim? Ji bo tu ji min re bibêjî ku tu qulekê dibînî? Tu çi dibînî, mêro, çi?” Deng, peyv di bêsebriyeke çêkirî de vedizelandin.

Qaçaxçî hewl dida xwe ku tiştin din bibîne, ji bo ku bikarîba bigota, lêbelê pirsgirêka wî pê re hebû, ji ber ku diviya qet mîna şanaziyekê an jî wêrekiyekê xuya nekira. Wî pêhneke din xwar, bi leza birûskê edaleyên bedena wî ji navê berjor ve xwe kişandin ser hev ve. Lêbelê ev tenê di pêhna yekemîn de bi kêrî wî dihat. Piştre wî pêhneke din xwar, lêbelê bedena wî sistir ma, ji ber ku tirsê hew karîbû ew bi ser hev ve baniya.

Wî hinek dem bi dest xist, lêbelê niha diviya ew biaxive. “Yek… tuwaletê.”

Di kêliyeke bi tevlihevî de bêdengiyek pêk hat. Qaçaxçî hêvî kir ew navberek be ku kesek ne li bendê bû. Lêbelê wî ji dengê yê din fam kir ku divê wî tiştek vexwaribe. Bêhna bi dû re ewqas bi hêz bû ku hindik mabû ew ji ser hişê xwe biçûya.

“Tu çi dibînî. Ji min re bibêje. Ji min re bibêje, bê tu çi li ber xwe, zehf nêzîkî xwe dibînî. Nexwe, tu çi dibînî?”

“Quleke genî.”

“Ez dixwazim bizanibim, bê tu çi dibînî, ne bê tu çi bêhn dikî.”

Qaçaxçî dengê lingên ê din bihîstin. Ne girîng bû dê wî çi bigota. Metirsî di tiştê ku yê li paş wî bigota de bû. Hin peyvên diyar dihiştin ew hineke din bibêje û bi vê yekê hêrsa wî bêtir dibû. Vî zilamî tenê dikarîbû hêrsa pêwîst a li dijî wî bi axaftina xwe bi xwe re pêk bianiya. Diviyabû wî bi axaftinê xwe germ

bikira. Di vê demê de mîna ku ji bo fêrbûna zimanekî meşq bike, her carê tevahiya derfetên xwe bikartanî, ji ber bi hev hatinê heta bi pêwendî ji hev qetînê.

“Ez dixwazim tenê bizanibim, bê tu çi dibînî.” Deng niha di ser wî re bû. “Ma tu bawer dikî ku kêfa min tê ku ez li vir wisa rawestim? Ez niha êdî dixwazim bizanibim bê tu çi dibînî. Qulekê, erê?”

“Erê.”

“Quleke genî, erê?”

“Erê.”

“Tuwaletek, erê?”

“Erê.”

“Û ev hemû ye? Qulek, erê?

“Quleke bi rengê qehweyî û genî... bi qelş e û bi av e…”

Pêhnek lê ket, ji ber ku ew zehf direj axivîbû.

“Qulek, erê?” Zilamî serê Qaçaxçî dîsa berjêr dehf da, berada û ew wisa ma, li gel ku madê wî di wê rewşê de zehf diêşiya jî.”

“Erê”, got û bihîst ku dengê dengvedana dengê wî mîna ku ji devereke kûrahiyeke mezin bê.

“Quleke genî?”

“Erê.”

“Ev tuwaletek e?”

“Erê.”

“Quleke bi rengê qehweyî?”

“Erê.”

“Bi qelş, erê?”

“Erê.”

“Û av, erê?”

“Erê.”

“Û ev her tişt e. Ev e tiştê tu dibînî, erê? Her tiştê tu dibînî?”

Berî ew bigihije, bersivê bide, serê Qaçaxçî ewqas bi hewdikê tuwaletê de eciqand ku ew neçar ma devê xwe bixe ser qula ku

berjêr diherikî. Tirseke mezin ji bo diranên wî ew girt, kêliya ew di ser porselan re xejiqîn. Piştre ava tuwaletê hat vekirin û di ber guhê wî re herikî jêr. Hinarkên rûyê wî û lêvên wî bi êşkeke kurt re şil bûn, di kurahiya qula ku av tê re berjêr diherikî. Zilam ew berda.

"Tu çi dibînî?"

"Qulekê."

"Qulekê, erê?"

"Erê."

Bêhn vê carê ne bi hêz hat û dikarîbû hêsantir bihata deyaxkirin.

"Wekî din tu çi dibînî?" Deng ji nişkê ve ber bi aliyekî din ve bûbû.

"Qehweyî…"

"Çi?"

"Rengê qehweyî û avê."

"Jê pê ve çi?"

Qaçaxçî diviyabû kêliyekê biponije. "Xwîn", got wî û di ber re devê wî li hev geriya.

"Xwînê, erê?"

"Erê."

"Qulekê, erê?"

"Erê."

"Û qahweyî, erê?"

"Erê."

"Û avê, erê?

"Erê."

Dengê lingan bi dûr ket. Qaçaxçî bawer dikir ku ew hew kare dirêjtir deyax bike. Ew ji ser xwe çû û bi paş de şemitî. Bê hemdê xwe serê xwe ji hewdikê tewalêtê rakir. Ji nişkê ve deng dîsa li wir bû û kulmên destan dîsa lê ketin.

"Ez bersîvekê dixwazim. Û ez ne neçar im bibêjim, bê ez çi dixwazim."

"Erê."

Ew dîsa ji wir bi dûr ket. Bi xuşîna di guhê xwe de Qaçaxçî, bihîst ku zilam dîsa diaxive. Kesekî din jî di hundir de hebû ku heta hîngê bi temamî bê deng tevgeriya bû. Wan li ser tiştekî li hev kiribû.

"Tu çi dibînî?"

"Qulekê."

"Tu çi dixwazî?"

Wî nikarîbû bibersivanda û pêhn xwar.

"Ne tu tiştî."

"Tu çi dixwazî?"

"Ne tu tiştî."

"Seba çi tu li vir î?"

Qaçaxçî serê xwe bi neyênî hejand.

"Seba çi tu li vir î? Ji bo tu li tuwalêta gû ziq binerî? Tu li vir î ji bo ku tu serê xwe yî gemarî bixî tuwaletê?"

"Erê." Navbaraka kurt pêk hat.

"Nexwe tu çi dibînî?"

"Qulekê."

"Û?"

"Quleke bi rengê qehweyî."

"Û tu li vir çi dixwazî?"

"Ne tu tiştî."

"Tu dizanî, bê tu li ku yî, beraz?"

"Na."

"Tu nizanî, bê tu li ku yî, lêbelê dîsa jî serê te di tuwaleta gû de ye?"

"Erê."

"Nexwe ez li vir şipyayî me, ez te nas nakim, tu, tu tiştî nizanî, lêbelê bi hemdê xwe tu serê xwe dixî tuwaletê?"

"Erê."

"Tu li vir çi dixwazî, beraz?"

"Ne tu tiştî."

“Tu dizanî, bê tu li vir li ku yî û serê xwe dixî tuwaletê?”

“Na.”

Pêhn ji kêlekê ve li bilindahiya hêta wî ket.

“Li vî cihê ku tu ji tuwaletê vedixwî, tu beraz, em dikarin li vir gelek tiştan bikin.”

“Erê.”

“Tu dizanî bê em dikarin çi bikikin?”

“Na. Erê.”

“Çi?”

“Erê.”

“Ez bawer nakim ku tu dizanî. Tu dixwazî bizanibî?”

“Na.”

“Tu naxwazî bizanibî?”

“Na.”

“Seba çi na?”

“Na.” Wî hewl da ku serê xwe bi neyênî bihejîne, ji bo ku bersîva xwe bi hêztir bike.

“Seba çi nexwe tu li vir î, ger tu naxwazî bizanibî?”

Qaçaxçî tevgera serê xwe dubare kir û li dîwarê hewdike tewalêtê ket.

“Tu çi dibînî?”

“Qulekê.”

“Û?”

“Xwînê.”

“Em dikarin li vir her tiştî bikin.”

“Erê.”

“Tu dizanî bê ev tê wateya çi: Her tiştî?”

“Erê.”

“Ez rê te bidim?”

“Na.”

“Tu naxwazî, ez rê te bidim?”

“Na.”

“Tu ji ku tê?”

“Ji aliyê din.”

“Tu çi dixwazî?”

“Ne tu tiştî.”

“Tu li vir li tu derê bi maletî mayî? Li ba kê?”

“Na.”

“Li ba kê?”

“Ne kesekî.”

“Ji kengî de tu li vir î?”

Qaçaxçî kêliyekê ponijî. Diviya wî rastî bigota, ger wê ne hişta ku bawerî bi îfadeya wî bibe jî, ji ber ku bi gumaneke mezin wan ew nas dikir. Ger wî niha derew bikira, wan ê bi cidî li ser rawestiyana. “Çar rojan.” ji devê xwe pekand.

“Çar rojan û tu li derve razayî?”

“Erê.”

“Çar şevan?”

“Erê.”

“Ji ber ku tu li vir kesekî nas nakî…”

“Erê.” Du pêhn li wî ketin, ji ber ku wî gotina zilamî qut kiribû.

“Ji ber ku tu li vir kesekî nasnakî ku tu li ba wan karibî serê xwe bixî hewdikê gû?”

“Erê.”

“Û te dixwest tu îro vegerî?”

“Erê.”

“Û tiştên xwe yî bêkêr bifroşî.”

“Erê.”

“Û tu rêyê nas dikî?”

“Erê.”

“Ji ku?”

“Ji leşkeriyê.”

“Çar şevan, erê?”

Qaçaxçî bersivand û bawer kir ku wî di dengê yê din de bi şêweyekî ne vekirî ponijandinekê hest dike. Wî karîbû tenê

hêvî bikira ku yê din jê bawer bike. Sipas ji xwedê re, ji xwe re got, niha hîn jî havîn e. Wer xuya bû ku herduyên din dîsa bi hev re diaxivîn. Piştî çend kêliyan Qaçaxçî, hest kir ku destekî bi qirka wî girt. Serê wî ji kovikê hat derxistin. Wî bi kurtahî çavên xwe girtin, lêbelê ditirsiya ku kontorolê wenda bike, serê wî zehf nêzîkî hewdik bû. Wî çavên xwe dîsa vekirin û kêliyeke kurt wî rûyê zilamî, serobino dît, berî ku ew bi şêweyekî rex ve li jor li dîwêr ziq binêre. Dîsa ew e, di serê wî re derbas bû, kêliya ku yê din gewriya wî dieciqand. Rêya wî kurkirî bû, lêbelê çene, çavên zirav ên fêlbaz, divê ev ew be.

"Tu dixwazî çi bikî, ger min ew nîşanî te da? Tu yê li devereke din bi dizî di ser sînor re bi çarpiyan derbas bibî? Belkî heta bi Almanyayê?"

Qaçaxçî li dijî destê yê din bi neyînî serê xwe hejand.

"Çi jê ket serê te? Tu dê sefera xwe bikî. Tu ê pereyan werbigrî. Tu yê binî çend jinên kej ku ew tenê li hêviya tiştekî wisa ne. Û piştre, piştî demekê, tu ê dîsa bê vir, hii?"

Qaçaxçî dîsa got na û zilamî dev jê berda. Wî serê xwe bi paş de xist hewdikî û pa. Di bîra wî de wêneyê boriyeke avê ya bi ser rengê kesk ve ya dîwarekî qelişî yî ifnikî ma.

"Kûçik, bê tu çi yî, tu yê wek xwe bimînî, ya na ez ê rê te bidim."

Deriyekî giran vebû û disa hat girtin, demeke dirêj Qaçaxçî wisa ma û guhdarî kir. Hizra ku yê duyemîn ê ku tevahiya demê hema hema bêdeng li wir bû, dikarîba hîn jî li wir baya, pê re tirseke ji nişkê ve çêkir. Dibû ku, bi gumaneke mezin wisa bû, wî ji kurahiya odeyên çavdêrî li wi kiribû.

Kêliyeke dirêj wisa ma. Lêbelê di bêdengiyê de dest pê kir ku her biçe bedena xwe bêtir hest bike. Di destpêkê de alavên agirê êşê li cihên cuda vêketin, bi demê re ji wan êşeke bi tevahî pêk hat. Dawî bedena wî ya xûsbûyî di ser navê re girantir bû, mîna ku bêdengiyê xwe bera ser wî dabe. Ew dawiyê neçar ma ku serê xwe rake, ji ber ku her çû eniya wî bêtir bi qiraxa tara

tuwaletê ve dieciqî, zehf nêzîkî qula ku ji mêj ve hew didît. Hundirê odeya ew lê ne bi qasî wî texmîn dikir tarî bû. Bê li ku ew heta niha tevgeriya bû jî wî hişt ku ew bi paş de bikeve, bi vî awayî paşiya wî gihîşt paniyên wî. Wek tetbîr wî serê xwe hin jî li ser hewdikê klosetê hişt. Tiştê seyr ew bû ku niha bêhna genî bêtir bû. Behn mîna glokekê li dor wî ma. Di wê kêliyê de wî xwe ji navê berjor ve rastkiribû û ji ber êşê dikir nalîn û serê xwe sipartibû pişt hustê xwe, ji bo ku tavilê wî dîsa ber bi pêş ve berde, ji ber ku ew ditirsiya ku bêhiş bikeve. Gelo bê kesek li paş wî rûniştî bû an na-ev guhertina rûniştna wî bi wî hêjayî her cûre cezayê bû.

Ew bi dirêjahiya xulekan wisa wek xwe ma û dawiyê bi lez berê xwe da aliyekî. Hundirê odeyê vikî vala bû û gewrekî çîmento bû ji erdê heta bi arîkî, heta devera ku rojînekê xwe bera jêr dida, ser wê mîna taqekê girtî bû û jê şewqa bê reng, xwe bera jêr dida ronî dikir. Luleyeke floresansê ya gemarî li rex wê bû. Ji boriya ku ava şuştina klozetê tê re dihat pê, ve tu tiştên bi reng li wê odeyê tune bûn. Deriyê hesinî jî ji gewrekî tarî bû. Wî li ku çonkên xwe didan erdê, ne tenê dîwar bi leke bûn, lêbelê erd bi xwe jî. Wî li nêzîkî dîwêr quleke duyemîn dît ku erd ji ber pê de berjêr dibû. Nexwe wir tiştekî mîna hucreyeke di kîlerekê de bû.

Wî di heman kêliyê de destpê kir ku xwîna xwe tam bike û çi nemabû bihizire. Ger yê ku lê dixist dîsa bihata dê her tiştî bi encam biba. Qaçaxçî, ji bo wan ne girîng bû, lêbelê di wê de jî metirsiyek hebû. Tiştê herî bêtir ew ditirsand, rûyê yê lê dixist bû. Wî ew rû ji mêj ve û baş nas dikir. Ne rasthatinî bû ku dîsa ew bû, yê ku ew kişandibû qula di erdê de, vê carê quleke çar niçik. Wî çonkên xwe dan erdê û li lûla avê nerî. Ger dengek ji derî bihata ew ê vegeriya cihê xwe. Wî wek tedbîr carekê provaya wê kir. Ger ew dîsa bihatana, wî dê her tişt mîna berê bikira. Lêbelê ku wan ew bibirana devereke din... li tiştekî wisa nikaribû bihizirya. Diviyabû wî hesabê qalikê êşê yê her tişt

taridikir dikir bikira û bizanîba ku her tişt, bi rastî jî her tişt buhureke derbasbûnê ye.

Her ku ew bêtir dipa, bêtir bi êş û jan dibû ew payîna wî. Dawiyê wî ji bo xwe dixwest ku êdî bên. Wî nedixwest lê bihizire, bê wî dê çi bikira, ger zilamê bê deng li hundir ba. Ew yeka ku wan ew tenê hiştibû, dikarîbû nişaneke başiyê ba. Teqez ew ji bo wan ne ewqas balkêş bû û kesin din jî hebûn ku ew bixwazin êşê bidin wan, bêguman gelekên din di nav destên wan de hebûn. Bi gumaneke mezin ev bilindahiya kîllerê qerase bû û tijî mirov bû ku diviyabû îşkence li wan bê kirin. Ew tenê yek ji gelek kesan bû, yekî ku wan piçekî ji xwe re pê kêf dikirin.

Qaçaxçî nerî ku her çû ronahiya taqê kêmtir bû. Ode her çû reştir bû û kûrtir xuya kir. Wî bawer dikir ku wî bi çonkên xwe rewşa zemînê hest dikir. Ji her tiştî bêtir wî dixwest şeqên xwe dirêj bike, lêbelê newêrîbû. Belkî jî hew qet dibû, ji ber ku di binya çonkê re her tişt êdî pûç bûbû. Kêliya ku şewq bi tevahî wenda bûbû, bi wî wisa dihat ku hestkirina demê nema gengaz bû. Niha wî bê tevger di taritiyê de çonkên xwe dabûn erdê, hêdî hêdî bêhna genî jî ji bîr kir û zimanê xwe yî werimî yî ku hema hema nikarîbû biliviya, deverên ne mîna hev yên devê xwe ji hundir de dipeland.

Tev li qerebalixeke mezin hatin hundir. Derî bi dahfdanê hat vekirin. Di wê kêliyê de Qaçaxçî serê xwe dîsa xistibû kurahiya hewdikê kilosetê û bedena xwe, heta ku hîn gengaz bû, şidandibû. Şewqa floransê hundirê ew lê bû ronahî kir û hişt ku mirov kitekitên qaşilê gemarê yê kovikê bên dîtin. Li paş wî hucre bi kêmanî bi pênc zilaman tije bû ku kenê wan, fişefişa wan û borebora wan dihişt mirov texmîn bike ku ew xortin ciwan in. Dengê ku êdî wî ew nas dikir, bi şêweyekî bilind bi ser wî de berjêr hat.

“Hoppela, ew çi ye ji tuwaleta me derketiye. Minrov çawa li xwe dizivire, tiştek xwe jê kaş dike.” Zilaman bi ken û tinazî

henekê xwe pê dikirin. Yê diaxivî nêzîktir bû. “Hûn dibêjin çi, mîna ku bê serî be, xuya dike.” Dengê kenê wan dîsa li odeyê veda. “Na, xwe pê mijûl nekin, me ew li vir ji bîr kiribû.”

Qaçaxçî bihîst, bê çawa ew li dor wî kom bûn, potînên wan li çîmên wî ketin ew dan alî. Dilê wî dikir gupegup, mîna ku ew bi her derbê re di gewriya wî re diçû, serê wî û ji wir di devê wî re dişemitî derve. Wî dibihîst ku bi kincên xwe mijûl in û bi kêmanî dengê du kesên ku bi şêweyekî ecêb dikeniyan bihîst. Piştre wî şilahî hest kir, ji her aliyî ve bi ser wî de dirijiya. Kovika ku serê wî ew xetimandibû bi mîzê tije bûbû, ku hêdî hêdî di ber rûyê Qaçaxçî re herikî jêr. Wî ew tam kir û ew bi nefesa xwe re kişand û ew li cihê xwe mîna xwe ma.

“Ew dibêje, ew naxwaze li vir bimîne.” got zilamê ciwan bi dengekî mîna ku li ber dikeve.

“Uhuu”, kirin hinekan ji wan. Tîrêjên mîzê lawaztir û kurtir bûn, li mil û piyên Qaçaxçî rasdihatin.

“Min tiştekî din jî ji te re bi xwe re aniye”, got zilamê ciwan.

Qaçaxçî bihîst ku yên lê dixin bi kurtepist bi hev re diaxivin. Piştre tiştekî bi dengê şilpîniyê re ket hewdik ber rûyê wî. Tiştekî ku nerm û şil bû, wî çavên xwe girtin. Kêliya ku serê wî ber bi jor ve hat rakirin, dilê wî bi lez dikir gurpegurp.

“Niha ka lê mêze bike”, zilamî bi gef jê re got.

Qaçaxçî neçar ma ku çavan veke. Di hewdikê li ber wî de gurzek porê dirêj mîna yê jinan hebû. Ewqas pir bû ku bi qevda destekî bi zor dihat zeft girtin û li aliyekî jê bi xwîn xuya dikir.

“Tu çi dibînî?”

“Por.”

“Kêfa te jê re hat?”

Qaçaxçî tenê xweziya xwe daqurtand.

“Baş e, ez ê ji te re tiştekî din bînim.”

“Na.” Wî bi hêz serê xwe bi neyênî hejand. “por baş e.”

“Tu dikarî wî bi xwe re bibî. Û ger tu careke din bê vir, hîngê tu yê wî nîşanî me bidî, ji bo ku em yekser bizanibin ku em te

ji berê de nas dikin." Qaçaxçî bi şêweyekî mekanîk destê xwe avêt gurzê por. "Tu dizanî, kesên ku berê carekê hatine vir, em ji wan zehf hez dikin. Bê dudulî bigire û bixe bêrîka xwe!"

Qaçaxçî, porê şil ê ku dilop jê dihatin, girt deste xwe, destê xwe ber bi xwe de kişand, xist bêrîka şalê xwe û gurzê por berada.

"Ger ew naxwaze li vir bimîne, bila biçe, yan?"

Ji her aliyî ve dengê pejirandinê hatin.

Qaçaxçî bi aliyekî ve hat dahfdan û dikarîbû di kêliya dawî de serê xwe rabike. Li ser erdê rûniṣt û wî çîmên bi şalên rengtarî li dor xwe didîtin. Kêliya yekî bi milên wî zeft girt, wî di ser xwe re mêze nekir. Dest ew bi ber bi pêş ve dahfand, lema ew neçar ma ku li ser çonk û destan bimîne. Hema hema wî nikarîbû şeqên xwe bilivandana. Serê wî di nav du çîmên bi şal de mabû. Ew bê liv dipa. Yekî çewalekî reş kişand serê wî.

"Rab ser xwe û bimeşe!" Dengê yê ku lê dixist bi kêf xuya dikir. "De, niha rabe ser xwe, mêro."

Wî da xwe ku rabe û tê gihîşt bê zilam çi jê dixwaze. Bi hewla sisiyan karîbû raba ser xwe; ew di odeyê de rawestiyabû û yê ku lê dixist, li ser milên xwe hilgirtibû. Şewqa tûj, di çewal re jî derbas dibû. Bi xumamî dît ku her pêncên din li pêş wî ne û rêya derî vedikin. Û ew bi pêngavên dijwar ên ne ewle ket nav tevgerê.

"Ger tu naxwazî li ba me bimînî, divê tu biçî -ûde, bê çi bêhna genî jê tê!"

Li piṣt çewalê teng derî ber bi wî de dihat. Ew fêr bûbû ku rahêje tiştên giran, lema zilamê li ser xuzika piṣta wî, jê re ne xem bû. Lêbelê çîmên wî ew ditirsandin ku nema bikaribin bilivin. Berî her tiştî: Ew ê çawa di derî re derbas biba, ji bo vî tiştî diviyabû ew tev li giraniya ser xwe bi çonkan biçe erdê. Kêliya ku ew gihîşt ber devê derî, yek ji zilaman hat ba wî, derî vekir û ew zeft girt. Di keliya ku hewl dida ku xwe daqûl bike de, Qaçaxçî çû ser çonkan û wek tedbîr yekser xwe bi pêş de

xist, ji bo yê din bi paş de li ser erdê nekeve. Ew li ser lingên xwe şipyayî ma, hişt di ser sikifa derî re bi çarpiyan derbas bibe korîdora li paş derî û dîsa lê siwar bû. Qaçaxçî yekcar hew didît, ew bi hemd dimeşiya, li gel ku zilamî bê rawest didayê ku ew zûtir bimeşe. Wî ew li ser milên xwe mîna barekî asayî bi cih kiribû û nedihişt ku xwe şaş bike. Li gor rewşê ye, ji xwe re got, divê ew her tiştî wek ku jê tê xwestin bike; çewtiyeke ku ew bike, dikare yê li ser xwe bîne ser hizrên nû. Dema ew dimeşiya, her ku çû êşên ji navê bêtir berjor bûn. Wisa pê dihat ku qefesa sînga wî tengtir bûbû, hewa ku wî di navberên kurt de dikişan xuya bû ku tiştekî di hundirê wî de pê dixîne. Diviyabû min bikarîba xwe ramedanda, di demeke nêz de ez ê bikaribim xwe ramedînim.

"Were xwarê", ji nişka ve zilamî kir birebir.

Qaçaxçî şipyayî rawestiya, hêdî çonkên xwe dan erdê û ber bi pêş de xwe bera ser destan da. Zilam ew berda û ji wir bi dûr ket. Qaçaxçî xwe ji navê berjor dîsa rast kir û wek ewlekarî di wê rewşê de ma, mîna ku di hucreyê de rawestiya bû. Bi çewalê li ser serê wî mîna şabûkekê xuya dikir li welatê ser sînor. Bêguman niha zehf hêsantir bû ku ew li wî bixe, lema wî edaleyên ku hîn bi ya wî dikirin, şidandin.

Demeke dirêj tu tişt çênebû. Piştre ji nişkê ve zilam hatin dor wî, ketin bin milên wî û ew bi jor ve kaşkirin. Ew di nav wan de hêdî hêdî meşiya, bayê sar î şevê li dor xwe û zixur di bin lingên xwe de hest kirin.

Ew li otomobîlekê siwar kirin û biqasî nîv saetê di ser pîstên erda bi tulm re çûn heta ku gihiştin ser rêyeke ku wer xuyabû asfaltkirî bû. Piştî deh xulekên din rawestiyan. Yek ji wan peya bû, deriyê dawiyê vekir, û Qaçaxçî ji erebeyê kaş kir. Heta niha kesekî ji wan zilaman peyvek jî negotibû. Piştî wî çewal ji serê wî derxist û pê ve Qaçaxçî beskura mîna berfê û rûyê mezin î sor ê zilamekî navsere bi kincên sivîl li pêş xwe dît.

"Wenda bibe", got û berê xwe jê guherî.

Li erebeyeke ku xerabî jê nedihat, merkeyeke biyanî, siwar bû û ajotin ji wir çûn. Qaçaxçî dît ku şewqên sor li ser rêya gundan ji ber çavên wî wenda bûn. Di wê kêliyê de ji ser xwe çû û ket erdê. Destên xwe yên mîna ku qerimî bin şidyayî xistin bêrîka şalê xwe, gurzê por jê derxist û avêt dûrî xwe. Pêşî rûnişt, piştre li rex rê palda. Lêbelê wî nikarîbû wek bê çawa tevahiya demê ji xwe re xwestibû, xwe dirêj bikira, piyên xwe jî nikarî bû di ser serê xwe re bilind bikirana. Di wê kêliya ku ew bi tenê ma de, her tiştê li binya sînga wî bi ser hev de hat givaştin û her tevgera wî dixwest bike, zehf dijwartir bû.

Wî li ser aliyekî xwe palda, mîna ku bixwaze verêşe, bi ser hev ve guvaştî ma. Serê sibehê, tirimpêlen ku di ber wî re derbas dibûn, ew şiyar kirin. Hêdî hêdî xwe rast kir, serê xwe biqasî ku bikaribe rêyê bibîne, rakir. Wî xwe wisa lawaz hest dikir, werimî û bê tevger ku di destpêkê de bawer nedikir ku bikaribe tenê gavekê jî biçe. Piştî ku ew rabûbû ser xwe, ji dil hêvî dikir ku rêya li pêşber wî ya ku diçe çiyê ber bi mala xwişka wî ve be.

Cihê ew lê bû, herêmeke bi erdê bi pêl bû, li dûrî xwe zincîra bêdawî ya dîrekên elektrîkê didît. Ew pêşî li rex rê, vir de wê de doş bû, ji bo ku îşaretekê bibîne. Rewşa wî yî reben dihişt ku kesên bi tirimpêlan di ber wî re derbas dibûn, di şibakeyan re ziq lê mêze bikin. Piştî demekê qemyonek deh metreyan dûrî wî rawestiya. Qaçaxçî lê swar bû, xwe avêt ser koltixa reng jêçûyî, mîna ku wî meşeke tevahiya rojê li dû xwe hiştibe.

# 12

Şifêr yekser têgihîşt ku rêwiye p ê re, ne di rewşa ku bikaribe pê re sohbetê bike de ye, belkû êşên wî hene ku qet nahêlin ew bêhnê bide û bistîne. Bêhna mîzê çûyê û kincên gemarî bala wî kişandin. Belkî jî wî texmîn dikir bê çi bûye. Çend carên ku Qaçaxçî li rûyê şifêr mêze kiribû, tirs di çavên wî de dîtibû. Zebeşên di paş qemyonê de, vir de wê de diçûn û dihatin, li hev diketin û zilamê mîna tayekî zeîf î zirav ê li ber badokê rûniştî, mîna hacûcekî xuya dikir. Dawiyê wî ji Qaçaxçî pirsî, bê dixwaze biçe ku. Bi peyvên ku bi dijwarî ji devê wî derdiketin, Qaçaxçî got, bê ew bajarê ku Zavayê wî lê kar dikir, li ku texmîn dike. Tacirê zebeşan bi erênî serê xwe hejand û awireke kurt î bitirs, avêt zilamê li rex xwe yê bi ser hev de piçikî. Bi gumaneke mezin ji mêj ve li vê kiryara xwe ya dostane û mereqa ku mîna hemû kesên vir bi wî re jî hebû, poşman bû ye. Bi van hizran Qaçaxçî, di xew re çû, ji ber ku pê hêsan bû ku ew hemû xeman ji xwe dûr bixe, di vê rewşa ku bi ser hev de hatibû eciqandin, di qalikê bedena xwe ya birîndar de.

Mîna wî texmîn dikir, ji bajêr ne zehf dûr bû. Kêliya ew ketin kolana bi dîwarên nîvketî yî nizm ê zebeşfiroş, Qaçaxçî şiyar kir. Bi dijwarî, bi hizrên bi deng, Qaçaxçî rewşa atolyaya ku zavayê wî tê de dixebitî anî bîra xwe. Zilamê ku dilê wî pê dişewitî, lê guhdarî dikir û bi rastî jî rê derxist.

Li pêşber avahiya atolyeyê li cihekî biqûm ê bi rûnê mekîneyan lewitî rawestiya, daket, li dora erebeyê zivirî û ji Qaçaxçî re derî vekir. Mîna ku yekî nexweş be, alîkariya Qaçaxçî kir. Ew li ser lingan danî û kincên wî serast kirin, mîna ku bixwaze wek her tiştên ku dibirin cîhekî bê qusûr radest bike. Du mekinîstên ku perçeyên bi kêr ji pîkabeke rûxyayî ku pelixîbû derdixistin, karê xwe rawestandin û li herdu kesên ku hatin û li şînahiya wan bi xwe re dianî, temaşe kirin. Ji kozikên ji hev dûr gelek karkerên din hatin û yekî ji wan xwe ji meşa hêdî rizgar kir û rasterast çû nik Qaçaxçî.

Qaçaxçî, nizanîbû bê çi ji zavayê xwe re bibêje, yekser piştî ku zavayê wî, ew bi hin banqenotan ji zebeşfroşê bi xem û tirs, ji girê hêşîn ji zebeşan û ji tevahiya bedbextiya wî rizgar kiribû? Qaçaxçî, lê diponijî, kêliya ku zavayê wî ew bi trimpêlê dibir mala xwe. Leşker ji wir çûbûn, wek ku wî ji ser rêya ber jor ve hildikişiya, karîbû bidîta û tu tiştî hew hebûna wan dianî bîra wî.

Kêliya ew dîsa şiyar bû û xwe ji berê xerabtir hest dikir, xwişka wî mîna berê li ber nivînên wî rûniştî bû. Wê pişta xwe dabû pişta kursiya ku dihat girtîn û vekirin û dipa.

“Ew bû”, got Qaçaxçî û hesteke ku asoxî xwe jê rizgar, kir pê re çêbû. Wî ev karîbû tenê ji wê re bigota, tenê wê ev fam dikir, wî ev tavilê di awirên wê yî baldar de didît.

“Raweste.” Hema hema bi kurtepistî got û destê xwe bir nêzîkî milên wî, lêbelê newêrîbû dest wî bidaya. “Wextî bijîşkek bê. Divê tu bê saxtîkirin. Tu dibînî, divê niha dîsa ez li te miqate bim, mîna demên berê.” Xwişka wî bi kurtî bişirî.

Bi wî nexweş bû ku wî ev wek xweşiyê hest kir. “Na, tu ne neçar î”, bi dengekî ku kir xîzînî jê re got û yekser zanîbû ku bi vê peyva wî re, bi rastî jî mîna demên berê bû.

Piştî prosedureke ku ji bo wî kambax bû û tenê ji hildana gomlek, berjêrkirina şalî û saxtîkirina hêdî ya bi destan pêkdihat. Bijîşk li gelek cîhên werimî û xwîna di bin çerm de

destnîşan kirin, texmîn kir ku parsû şikestibin û ji bo gurçikan jî xem dixwarin. Bi Qaçaxçî wisa dihat ku wî zilamê bejindirêj, yekser zanîbû bê birîn ji ku hatibûn. Wî bi peyvan lê nepirsî. Şidandineke xembar di rûyê wî yî bi qorzî de bi cîh bû û hew jê çû, heta ku wî li devê Qaçaxçî nenerî û hestiyên rûyê wî nepelandin. Piştre ew dîsa jîndar bû û jê pirsî bê wî tu rengguhertina mîza xwe ferq kiriye an na. Bala Qaçaxçî kişand ku ew hîn qet nehatibû bîra wî ku biçe tuwaletê. Bijîşk jê xwest ku niha wê bike. Bi her tiştê xwe wî ev qet nedixwest, bi wî wisa dihat ku her tiştê ji bedena wî derdiket niha tê de gol bûbû, mîna ku çermekî hişk be, mîna qalikekî ku li dor wî çêbûbe û nedihişt tiştek jê derve, ne peyv jî, ger di wê kêliyê de xwişka wî li rex wî ne runiştî baya.

Bijîşk alîkariya wî kir heta bi tuwaletê û li devê derî rawestiya. Ji bo Qaçaxçî dijwar bû ku ew li ser qula tuwaletê li ser tutikan rûnê û bîranîn ji bo bên bîra wî amade bûn, jê dûr, xwe di nav bêhnê û kûrahiya qula ku berjêr dadiket de veşartibûn, ji ber ku ev tuwalet ne yeke Ewropî bû û bijîşk bi serbir li pêşber wî rawestiyayî bû û dipa. Çend caran jê pirsî bê dibe, yan divê ew here, jê re şûşeyekê bîne. Lêbelê diviyabû bibaya. Qaçaxçî nedixwest ew benê şidandî yê bi jiyana asayî ve girêdayî bê qetandin. Wî ji bo statuyeke ji derveyî dinavnivînandemanê, di ber xwe dida û wisa hest dikir ku dikare bi vî awayî bîranînan ji xwe dûr bihêle. Kêliyekê dom kir heta wî di navberên qolincên êşê de valahiyek dît ku wî tiştê di wî de hatibû ser hev dilop bi dilop mîna di quleke teng re berada. Wî piştî çend hewldanan ew kir tîrêjeke zirav û heta radeyekê ji rewşê razî bû. Berî ew rabe ser xwe, gunên xwe pelandin.

Ecêbmayî nema dema bijîşk piştî kêliyeke kurt, lêbelê baş lê mêze kir, berê xwe jê guhert û got xuya ye ku qirdê te çê bû, her çi ev e, pirsgirêk tune ye. Dîsa jî diviyabû ew bi dorfrehî bê muayenekirin. Qaçaxçî, dîsa li ser cihê xwe bû, bijîşk çi digot

serê xwe bi erênî dihejand an jî digot erê, ji bo ku êdî bijîşk biçe. Wî biryara xwe dabû û piştrast bû ku ew bi xwe dikare bizenibe bê ji kengî pê ve ew dikare bê astengî li ser xwe bigere.

Wî gelek roj bi heman şêweyî derbas kirin; şiyar dibû, êş û werma canê xwe hest dikirin, berî ku zavayê wî bihata, bi çarpiyan diçû tuwaletê û li vegerê di paceyê re awirik diavêt derve. Serê sibehan herdu dihatin ba nivînên wî û her roj Zarik, hewl dida ku hebekî bêtir tiştina bibihîze. Qaçaxçî xwe dûrî pirsyarên wî digirt. Piştî zavayê wî diçû, bi hemd xwe bera nav nivînên xwe dida.

"Ev tişt aramiyê ji wî re nahêle." Ji wê re bi laliktî got. Xuya bû, wermên di devê wî de hîn jî bihêztir dibûn û agirê wî rabûbû ku dihişt ew bi dijwarî li ba hizrekê bimîne. Her ji çend saniyan dîsa vedigeriya nav bîranînan û nav zincîra hizrên seyr ên bi wan ve têkildar.

"Ew ditirse", di ber re got, kêliya ku wê kursî datanî û çingînî ji bazinên wê dihat. "Ew dibêje, dibe ku tu ji me re serêşanê çêbikî. Û wisa ye jî, divê tu wî fam bikî."

"Kengî derfet çêbibe, ez ê yekser biçim."

Wê rûyê xwe qermiçand û berê xwe da ber bi paceyê ve. Qaçaxçî, ev bandora peyvên xwe texmîn kiribû. Hîn di zaroktiyê de wî ew neçar kiribû ku ji bo wî, tenê ji bo wî tiştên ne li rê, tiştên bi metirsî, ne tenê bipejirîne, lêbelê ew bi xwe jî bikeve nav. Ev kiryarên wisa bi demê re ji bo wî bûn kevneşopiyek. Niha vê kêliya ku wî dît, ew wisa zeîf, bi porê tarî yî pir û di heman kêliyê de bi awirên xemgîn û dilşadiyê li wir rûniştiye, wî ji nişkê ve wî zanîbû ku ev taybetmendiya wî bû ku hezkirina wê ji xwe re misoger dikir. Wî tu carî tenê eleqeya wê nedixwest, lêbelê qurbaniyeke biçûk, tiştekî ku di eslê xwe de wê nikarîbû wek jin di rola xwe ya ku ji destêpêkê de ji bo wê hatibû dan de, bi cîh bianiya. Ew têgihişt bê çiqasî zehf pêdiviya wî bi wê hebû ku ew hîn wek keçekê û jineke ciwan, biaqil bûye, ji bo her tiştên ku mafê wê bû û dê di vê

jiyanê de bibaya mafê wê. Gelo di vir de jî wekheviyeke wan heye ku heta niha wî ferq nekiribû?

“Tu ne neçar bû te ew bigota”, wê bi dengekî westiyayî got, mîna ku piştî çend saniyeyan derketibe pêş, ji bo ku lîska berê ya nas pê re bilîze. “Ew heqaretwarî ye, ji bo min jî.”

Ji êşa goştê xwe bi ser hev de eciqandî, di nav guloka germê de pêdiviya wî hebû ku vê carê wê ji berê bêtir bikşîne rex kûrahiya çarenûsa xwe. Wî dixwest, wê lê sor bike ku ew di xaçirêka wî re neçe jî, qe nebe wê bibîne. Wî bawer dikir ku tiştê diviyabû wê ji bona vê yekê bikira, wî ji zû de pêk anîbû.

“Çem hîn tê bîra te?”

Wê destê xwe rakirin û yek kêliyeke kurt danî ser eniya xwe û bi şêweyekî bêtir sembolîk berê xwe jê guhert. Blûzê wê yî rengtarî niha hema hema şîn xuya dikir û ji ber ku rûniştî bû, qumaş eşkere li ser zikê wê qewsik xuya dikir. Qaçaxçî, li qirika wê yî zirav û bejna wê yî mîna ya keçekê ku nehatibû guhertin, mêze kir. Di kêliya ku dîsa ket nav germa laşê xwe de li zikê wê nerî; wî bawer kir ku niha tam wî cihî dibîne, cihê ku niha serê vî zarokê nû lê ye û nikarîbû nehata bîra wî, bê çawa carekê ew nêzîkî vê deverê bûbû:

“Dev ji vê zaroktiyê berde. Di dawîyê de wê ew jî bê bîra te, bê we xortan ji şûmî çi bi keran dikir. Ev hemû bi kêrî çiyî jiyanekê tên, ka li halê xwe binêre…”

“Ne pêwîst e ku qet bi kêr bê”, bi hewldana ku piçekî xwe rast bike re, naliya. “Ew hema wisa bû û tu dixwazî ji bîr bikî.”

Di vê kêliyê de bi zelaliyeke nenas, hema hema bi şêweyekî nexwezayî yî zelal, ew piştî nîvro hat bîra wî û mîna ku êşên di organên laşê wî de hêza bîranînê bêtir bikin, xuya dikir. Ew li xanîk bûn. Gelo seba çi ew li wir bûn, wî ji xwe pirsî, ji bajêr baş dûr, di nava tevahiya çayir, kaş, rêyan û xanîk bi xwe de mîna ku dixwestin di nav şênahiyê de bîmîn, xuya dikirin? Û gelo çima ew herdu tenê li wir bûn? Wî dixwest vê pirsyarê ji wê bike, lêbelê wî dev jê berda, ji ber ku pêdiviya bîranînê bi

van sedeman tune bû. Despêkê ew li ber paceya biçûk ya xanîkî rawestiyabû. Pace di dîwarê text î tarî de, ronî mîna şewqekê bû. Di vê ronahiyê de xetên giran bi hev ve dimihiyan. Wî xwe ji wir derxist, bizmika derî dahf da, vekir û çû dervê. Li ser baniyê xanîk, mîna tevahiya derdorê, giha pir bû. Wî li ezmên nerî, mîna paceyeke hîn mezintir î ronahî bû û bêyî ku li gavên xwe miqate be di nav gihayê bilind re meşiya. Bi bîranîna bi germahiya bedena xwe re hema hema piştrast bû ku niha dîsa wan gihayan di bin lingên xwe yî tazî de dikare hest bike; çermê wî jêdikirin, qevdên gihê dihiştin ew bilikume. Lêbelê wî meşa xwe dom kir; bi ser girekî zarokan î biçûk ve hilkişiya. Mestbûyî ji jor ve wî li jêr, li çem mêze kir. Erdê xwe di vê qelşa bêbinî de vekiribû. Pêşî tarî xuya dikir, lêbelê piştre bi her pêngava ku xwe nêzîk dikir re keskekî kûr î diçirisand nîşan dida. Ew bi gavên bi biryar ên mezin bi gir ve berjêr daket û her tiştê ku ew lê miqate bû, ew tiştê kesk î mezin î aram bû ku hîn ew ferq nekiribû. Ev gav, niha ew hizirî, wek mîna nişaneke kelekeke kevn î berî dema şer, berî her tiştî jî berî dema berî Beno bû. Ew kêliyekê bê deng li rex çem rawestiya û dawiyê meşiya nav, heta ku av gihîşt çewqa wî. Di destên wî de ew hew kesk bû.

Wê di rêya ser gir re da dû wî. Wî bang wê kir ku bê cem wî, bêyî ku li aliyê wê mêze bike û di wê kêliyê de ew li nik wî di nav avê de rawestiyabû jî. Kêliyeke kurt, ji ber ku tenê çonkên şil têra wê nedikirin. Ew bi çîmên rastkirî ber bi devara kûr ve gav avêtin heta ku ava çem bi şepeşep li pêsîrên wê dixist. Ji nişkê ve vegeriya û bazda çû rex avê. "Tiştek bi laşê min bû", wê got. Wî dixwest bi çavên xwe di rûyê ava kesk re derbas bibe û wî jî hew karîbû dom bikira; cemediya avê hest kir. Gava ew zivirî û çû rex avê, wê mîna heywaneke tirsyayî li nava zeviyan xwe qurnisandibû ser hev. Wê sar bû û wî bipiştrastî hest dikir ku ne tenê ji avê bû. Ew bêhnçikyayî li rex wê rûnişt û destê xwe avêt ser milê wê. Lêbelê wî ev ewqas bê şarezayî kir ku wî bi giraniya xwe ew xist xwarê. Ew li rex hev di nav tayên gihê û

ezmên de ramedandî man û wî dît ku destê wî yê çepê li ser zikê wê bû. Wî germahî hest kir, mîna ku dixwest ji şilaya kincan a sar derbas bibe. Tiştê di bin destê wî de bû şêweyekî nazik, lêbelê dihat hestkirin ku ber jêrî nav şeqên wê dibe. Her tiştê ku niha wî cara yekemîn li pêş xwe didît, mîna ku ji tûlm û xetan pêk tê xuya dikir. Wî bi destên xwe ew taqîb kirin, di ser pêsîran re û dîsa berjêr heta bi şeqan, destê wî ket bin çermê şaş î cemidî yê fîstan û di ser çermê wê yê birastî re berjor ve çû. Ew li nik wî dirêjbûyî bû mîna ku di cîh de hişk bûbe. Nefesa wê jî êdî hew dihat hestkirin, lêbelê dilê wê li her deverê li bedena wê ya step î bê pêjin dida, mîna ku tê de dîl hetibe girtin. Wî berzika wê hest kir, du tilî xistin nav û şilaya din a giran î germ a berjêrtir keşif kir. Wî awirek avêt ser rûyê wê, çavên wê yî reş li esmên dinerîn, wê eşkere tu tişt li dijî mereqa wî nedikir ku wî dom kir. Xwest bibîne, bê gihîştiye ku û kirasê wê di ser şeqan re kişand jor. Niha dilê wî heta bi gewriya wî lê dida û wî nizanîbû, seba çi. Tiştê wî dît, tarî bû, neçar ma ku xwe nêzîkê bike û bi her tevgera wî re wê xwe vedikir, lêbelê ewqas hindik ku wî hema hema hest nedikir. Wî rûyê xwe danî ser rahnê wê û pişta xwe bi hêz ber bi erde de eciqand, lêbelê erdê jî nikarîbû repbûna wî dîsa jê bibe. Wî bêhna wê ya ku tev li ya ava çem dibû, bi nefesa xwe re dikişand û tilî dan bi paş de, ji bo karibe qermîçeka tarî bibîne. Diviyabû wî niha çi pê bikira? Destûra ku ew dudilî bibe tune bû, hingê wê dê xwe disa bigirta û wisa wî hewl da ku maçî wî bike.Wî dît ku berovajiyî dev, maçîkirina wî ne hêsan e, ji ber ku her tiştên wî ber bi hundir ve diçûn. Ji ber ku bi wî tiliyên wî girs bûn û ji bo wir ne guncav xuya dikirin, wî zimanê xwe derxist pêş, ew tenê tişt bû, wek ku wî bawer dikir, yê ku ji wir re dibû. Û bi rastî jî rêya diçû hundir, şil û nerm bû û wê bi lerzîn dixwest rêyê vebike, lêbelê serê wî rê li ber şeqê wê digirt. Ew li ber diket ku zimanê wî nedirêjtir bû û hest dikir bê çawa şeqên wê milên wî dehf didan. Hîngê wî serê xwe rakir, şeqên wê ji hev vekirin û

xwe dahf da nav wan. Her tişt baş li hev dihat, ew dîsa nêzîkî wê bû û vê carê bêyî astengî zimanê xwe radayê. Di ser zikê wê re wî, di nav pêsîrên wê yî nixumandî re, qirika wê yî sorbûyî, çena sipîçolkî û rûyê ku mîna digiriya destê xwe danîbû ser, dîtin. Îskeîska wê bû jî û vê ew xist şikê; wî zimanê xwe bi paş de kişand û kêliyekê pa. Aliyên şeqê wê yî binî dilerizîn. Wî bawer kir ku wê sar e û xwe li ser wê dirêj kir. Gava ku dawiyê destê xwe ji ber rûyê xwe rakirin û bi kurahî ji pozê xwe nefes da û satand, berê çavên wê ber bi wî ve bûn û tiştekî tarîtir ku wî nas nedikir ku dihişt ew hest bike mîna ciwanekî ehmeq î biçûk ku tiştek kiribe, bêyî ku zanibe çi, di wan de hebû.

“Ne baş bû, ew tiştê me kir, mîna ku ne baş e bê tu heta îro çi dikî. Bavo ji bona vê ewqas li te xist.” Xwişka wî hêrs bûbû û xweziya xwe daqurtand. “Çima tu nikarî dev jê berdî, her tiştî vir de wê de bikişînî heta ku bi ser te de bikeve. Ka carekê tenê li halê xwe binêre…”

Wî bi baldarî li wê mêze dikir. Wê zendikên xwe kişandin ser destê xwe, qumaşê tenik bi ser poz û devê xwe de eciqand û dest bi girî kir, bêyî ku di wê kêliyê de rûyê xwe biqermiçîne. Wê li tiştê wî dixwest wê keliyê bibêje, guhdarî nedikir, ango ku kesekî heta hingê bi lêxistinê ew neçarî tu tiştî nekiribû, lêbelê pê re agirê bedena wî bilind bû, ji gewdê wî ber dest û lingên wî ve belav bû, lema wî nikarîbû gotina xwe bibra dawiyê.

“Ew mîna te bû. Erê, Nêrîk bi tevahî mîna te bû, tenê biçûktir bû. Ez jî hingê mîna te bûm, ez dişibiyam bi te, ji niha zehf bêtir. Lêbelê -li min guhdarî bike- divê tu wî jî eynî mîna min bihêlî. Ji ber ku -li min guhdarî bike- bê niha ew li ku be jî û ew çi be: di cara bê de, wê te bikuje. Ez nizanim, bê çi bi te hatiye, lêbelê bi wî re têkildar e. Û tu yê bi vê yekê bimirî.”

Nexwe wê peyvên wî yên destpêkê ji bîr nekiribûn. Qaçaxçî di derbarên tiştên wê digotin de bê deng ma. Wî nedixwest ew wan tiştan bibihîze. Tirsa wê ya ji bo wî û axaftina wê ya bi girî

di nav qumaşê bûlûzê wê re, bi wî mîna şanoyekê dihat. Wê çi jê fam dikir, wî tu tiştê ji yê ku bi salan dikir, cuda nedikir û vê carê qirdê wî çê derneketibû. Ew hêrs dibû ku wê mîna zarokekî bi wî re dida û distand û niha ew ji dema ku ew ê hîn li vir ramedandî derbas bikira tirsiya.

Di wan hefteyan de, bijîşk du carên din jî ber êvarkî hat û şêweyê pelandinê dubare kir. Wî dermanên êşê, melhem û alavên ji bo girêdana birînan jê re li wir hiştin. Tiştê ji bo Qaçaxçî girîng bû, şiyana ku bikaribe xwe tevbide bû ku wî hest dikir ku zehf hêdî dîsa tê,wek ku xwe bera hin organên bedena wî dida. Tenê êşa wî ya di ser navê re nedihat guhertin û yekcar kêm jî nedibû.

“Qirdê te çê bû”, her carê bijîşk berî biçe jê re digot, mîna ku rewşê dîsa bîne bîra wî.

Carekê Qaçaxçî nehişt ew biçe. Wî bi dizî bi destan îşaretek dayê. Bijîşk li rex cihê wî rawestiya û ji şêweyekî ji payînê bêtir, bi ponijîn ji jor ve li wî mêze kir. Gava wî dît ku Qaçaxçî, hema wisa naxwaze biaxive, kursiyek anî nêzîkî wî û li ser runişt.

“Tirimpêla min li cîhê ji bo parkê qedexekirî ye”, got bijîşk, bêyî ku rûyê xwe biqermiçîne.

Qaçaxçî hewl da ku bi vê hevoka ji televizyonê bikene û piçekî xwe rast kir. Wî amaje bi dermanên li erdê li ber cihê wî bûn kir. “Ji vana bê guman mirov dikare hîn bêtir werbigre”, wî got.

“Bêtir?” Li ser rûyê bijîşk î gewr ku her tim westiyayî xuya dikir îşareta zanînekê xuya bû. “Tu yekî qaçaxçî yî” û xwe li ser kursiyê dihejand. “Ez dizanim bê tu çi dixwazî.” Wî serê xwe bi neyênî hejand û rabû ser xwe. “Nabe. Malbateke min heye. Kontrol zehf tund in.”

Qaçaxçî di heman kêliyê de ji xwe pirsî, gelo dermanên ku hayê wî ji hebûna wan hebû, ji ku dihatin.

Bijîşk bersîva wî da, bêyî ku pirsyar bihîstibe. “Ez ji te re yekê bibêjim: Li ser dermanan destin ji yên min zehf mezintir hene,

li vir jî tam mîna aliyê din î xetê ye. Ew tên wateya desthilatdariyê. Tu bi xwe jiya-yan jî te bihîst, ew zilamê ji bajêr: Ez neçar bûm ku ez paş wî bi gelek kêlan bidrûm, ji ber ew jî mîna te naxwaze biçe nexweşxaneyê. Tu bawer dikî ku wî fam kir ku divê ew li qaîdeyên lîskê miqate be? Ne piçekî jî. Lêbelê çi be jî, ji bo wî dê heta bajarê wî rêwîtiyeke ne ewqas xweş be."

Gava ku bijîşk xatir xwestibû, bi Qaçaxçî wisa hat ku ew mîna zarokekî hatibû cezakirin.

Tiştê ku li gel hestên wî yên li dijî di nav nivînan de manê û yên li dijî wê malê, dihişt ku ew bixwaze ji wir biçe, tevgerên zavayê wî bûn. Ew piştî rojên destpêkê carekê tenê jî nehat odeya wî û bi vî awayî nerazîbûna xwe dida hestkirin. Tenê di kêliya axaftina bi bijîşk re carekê bi şêweyekî kontrolkirinê ketibû derî, bi gumaneke mezin bi tirsa ji serêşaniyên din.

Carina ku Qaçaxçî xwe di nav dengên hundirê xwe de wenda dikir, ditirsiya ku tiştin bêtir li pişt vê yekê hebin. Wî dest pê kir ku her tevgera destên Zarik, bîne bîra xwe. Gelo çawa jê ve xuyabû, kêliya ew gihişt wir, hîngê ne tengijî û ji demên berê kêmtir dem dabû wî? Wî roja ku leşker hatin, ew dîtibû ku tengezar li ber maseyê rûniştî bû, desten wî yên pahn î kurt di nav hev de eciqandî, her diliviyan. Di rûyê wî yî pahn î ji tîna royê qemerbûyî de Qaçaxçî, ji tirsa mirovên biçûk pê ve tiştekî din nedidît. Ev wê êvarê bû, baş e. Lêbelê ma ji mêj ve nîşanên ku ew didexisî tune bûn?

Ew hîn jî tewyayî û bi rûyê xwarbûyî li ber deriyê dolaba vekirî rawestiyabû û dixwest xwe nêzîkî wêneyê xweyî di mirêkê de bike, bê ew berê çi bû. Mîna kalekî, ji xwe re got, û li ber ket ku qapût û tûrê wî yê piştê çûbûn. Wer xuya bû ku ew neçar bû kincan jî ji vî mekinîstî deyn bike. Ji bo xwarina wê jê re dianî, wî xwe bipaş de dida û êvaran ku Zarik li malê ba, heta ku gengaz bû wî hindik deng ji xwe derdixist.

Meşqkirina meş û çûna bi çarpiyan bi roj dikirin. Ku xwişka wî li çêştxaneyê şipyayî dima, ew bi çarpiyan li ser dest û

çonkên xwe di odeyê re diçû û di pişt wê re heta bi deriyê şaneşînê. Piştre radibû ser xwe û bi paş de vedigeriya û dîsa ji serî de dest pê dikir. Dest û lingên wî her diçû di tevgerên wî de bêtir bi ya wî dikirin û wî bi hesteke dilşadiya ji bo dema bê, dema ku wî hîn pêdivî pê hebû texmîn dikir.

Van piştenîvroyên bi wê re, ew dibirin dema zarokiyê. Piştî bi hefteyan wî ferq kir ku ev li hesabê wî tên. Ku ew bi dehên caran di pişt wê re bi çarpiyan diçû û wê bi awirê bitirs î ji rex ve ev didît, heman sebra wê ya ji bo kiryarên wî yî seyr mîna hîngê hebû. Niha wê xwe piçekî daqulkiribû, bi wî fîstanê ku nedihat pênasekirin î tarî mîna keseke şîngirêdayî, lêbelê xwişka wî dibişirî ku wê ew didît.

Tiştekî ku wî ne gengaz dîtibû, wisa ji xwe re got, kêliya wî ji ser erdê ber bi jor ve li wê mêze kir, pêk hatibû; ew bûbû jineke mîna hemûyên din. Hingê ew hîn nebûbû jin, belku- ew bi vê mafdar bû- beşeke ji wî bû. Ew yeke ji bo tevahiya dunya mayî nepen bû, tenê ji bo wî jineke lîstikê yî biruhkirî bû, sozekî jîndar, ji bo bihevşabûnê zehf nêzîk, lêbelê têra xwe dûr bû, ji bo ku daxwazeke ku nedihat rayê, yeke lezgîn î geşbûyî, destûr ji bonê bê dan. Ev daxwaz giran bû mîna çemê kesk î hingê û dê ji bo wî her bi awirên tarî re têkildar bimaya, awira ku ji wî re digot, wê bi xwe nekir, lêbelê hişt ku bibe-lêbelê tenê ji bo wî.

Pêşî rûyê wî yî qeşmişî xuriya, piştre ew ji bîr kir û niha hest dikir ku kêliya wî diguhert an diqermiçand, ew ji hev diket. Ew li ser cihê xwe ramediya bû bi êşê re meşqkirina livandina rûyê xwe pêk dianî. Du diranên wî yên kursiyan bi şêweyekî metirsî dileqiyan û wî ji xwe dipirsî bê dê tu carî dîsa bikaribe devê xwe vebike. Paceya odeka wî mîna her carê dîsa vekirî bû û bêhneke payizê tev li ba derbasî hundir dibû.

Meşqkirinên wî yî çûna bi çarpiyan di wê navberê de wateya xwe wenda kiribûn, ji ber wî karîbû ew bi saetan dom bikira. Wê ji bo wî amaje pê kiribû.

“Tu jî ne neçar î ku li devernan bi çarpiyan biçî”, wê got, piştî wê demekê lê mêze kiribû.

Qaçaxçî li ber lingên wê cemidî ma û li bişirîna wê ya nazenîn di ser xwe re mêze kir. Ji ber vê yekê ew li ber xweşbûna xwe ket, ji ber ku niha kêm tiştên ew bike hebûn.

Di sibeheke ji yên dawiyê de, bi zîqîniyeke li ber guhê xwe şiyar bû. Xwe rast kir û rûyê xwe peland. Qaşilên deverên qeşmûşgirtî radibûn. Wî gepên xwe tije ba dikirin, çena xwe virde wê de didahfand û bayê sibê yê sar li ser çermê xwe yî hasas hest dikir. Dîsa jî newêrîbû ew qeşmûş rakirana, wî tenê dixwest wan sist bike. Xwişka wî kêliyekê bêhnçikiyayî ma, gava wê ew di deriyê odeyê re dît. Qaçaxçî bi lez destê xwe bir ber rûyê xwe, heta ew tê gihişt ku wî ser aliyê şaş girtibû. Ji ber ku wî bi vê tasa nîv teqiyayî nedixwest bigere, wî destê xwe gelek caran mîna mûçingê avêtê heta ku xwe berada. Wî dolab vekir û li mirêkê nerî. Li ser eniya wî çerm hin jî qeşmişî bû, lêbelê hinarkên rûyê wî berjêr heta bi çena wî pembeyekî ronî bû.

“Rûyê min şîn hatiye”, bi miremir got û berê xwe da wê. “Niha ez dîsa karim bidim rê.”

Wê hêdî hêdî serê xwe bi erênî hejand. “Li başûr di ser sînor re derbas bibe mîna her kesî, ez vê ji te tika dikim.”

Qaçaxçî, li ser nivînên xwe rûnişt û mîna li ser zirnazîqê be, bilind dibû û dîsa dadiket. Di vê kêliyê de jî pace ji ber çavên xwe wenda nedikir.

“Ew dê bi rojan dom bike û gelek pereyan bixwe.” Wî zanîbû ku hemû argumanên berbiçav li aliyê wî bûn, tenê diviya ku wî ew bilêv bikirana.

Wê bi çavan tevgera wî ya mîna li ser zirnazîqê teqîb dikir.”Tu niha bi rastî jî baştir bûyî”, wê got û ji odeyê derket.

Qaçaxçî bi baldarî li çêbûna rûyê xwe ya ji nû ve mêze kir. Ne tenê tiliyên wî ew hest dikirin, rû jî tilî hest dikirin. Pembayê ku diçirisand mat bûbû û ji bo kêliyeke kurt ev rûyê nû mîna maskeyeke ji ard xuya dikir, ew hîn xav bû.

Piştre, ji êşa di sînga wî de û diranên dileqiyan pê ve, ew dîsa bûbû yê berê. Wî xaçerêk li pêş xwe didît û plan dikir. Xwişka xwe, çemê giran î kesk û her tiştê ku hingê bûbû, demeke dirêj î berî şer ku pê re jiyana wî ya birastî dest pê kiribû, ji bîr kirin. Jiyana wî ya wek zilam di nav zilaman de, jiyana wî ya bi jineke birastî ya biyanî re, yeke ne leyistoka wî bû û lema wê zarokên ku dijiyan jî dianîn. Di vê kêliya ku li van tiştan dihizirî de dîsa nearamiyê pê girt. Xwişka wî mafdar bû, bi Nêrîk ve têkildar bû.

Wî dengê wê li pêşber malê bihîst, wê legenek vala dikir. Kêliya ku avê li ser erdê kevirî kir şirpînî, wî xwe da ser paceyê û xwe ber bi derve de dirêj kir. Belkî dixwest hizrên xwe biqewirîne.

"Tiştê te li ser keran got, ne rast in. Min tiştekî wisa qet nekiriye." Wî navbereke kurt dayê. "Tu kera min bû."

Wê bêdeng di ser xwe re li wî mêze kir, ew legana dibiriqand di destê wê de bû û wî ji ber awirên wê xwe da alî, ket hundirê odeyê. Bê ew çi bû jî, ji xwe re got wî, niha wî ew bi dawî anîbû.

Rojekê piştî wê ew dîsa pêrgî zavayê xwe bû. Qaçaxçî li ber wî rawestiya, çavên zavayê wî yî nearam xwe ji ber dîmena rûyê wî yî gewr î paqij didan alî. Ji her carê kintir û firehtir xuya dikir, destên wî di bêrîka şalê wî de bel xuya dikirin. Her tiştên wî daxwaza ku divê Qaçaxçî ji mala wî biçe, diyar dikirin, lêbelê ew bê deng bû û wisa dikir mîna ku ji bo wî ferq neke.

Qaçaxçî, dixwest bi pirsyarên asayî wî bikişîne nav axaftinê, tiştekî wî diviyabû biba sedema çûna wî. Wî gav bi gav da dû zilamî di odeyê re heta bi çêştxaneyê, dawiyê wî ew herdu li wir li pêşberî xwe dîtibûn, wê bi tirs xwe ji ber wî da alî, dûrahiya navbera wan kêmtir bû, heta ku wî rûyê xwe yê li pişt wan di cama deriyê terassê re dît: Dor wan hatibû pêçan.

Adinî rojê serê sibê zû wî mal terk kir. Wî karîbû ev bikira, ji ber ku wê jê re çakêt û gomlekek amade kiribû, bêyî ku ew careke din bi wê re axivîbû. Pere jî li wir amadekirî bûn, wî ew mîna deynkirî hesibandin û xistin bêrîka xwe.

Wî dîsa ber bi jor ve da rê û di xaçerêka kevirî re çû heta bi darên tewiyayî yên ber tahtê. Dîsa dengê lingên xwe wisa bilind dibihîstin ku wî dixwest hêdî lingên xwe biavêje. Dar û dirîkan, çi nema bû rêya ew tê re diçû girtibûn. Qaçaxçî, li ber wir rawestiya û li şaxên wan î di nav hev de mêze kir. Wek ku wî berî erdê mayînkirî dikir, ew çend gavan bi paş de çû, ji bo ku şopa xwe baş bibîne. Dirîk li hev digeriyan, dibûn yek û devera ku ew berê tê re derbas bûbû eşkere diyar bû. Birînên wî hatin bîra wî û li başbûna wan î hêdî hizirî ku wê jî tebût dikir. Diriyan jî heman tişt dikirin, wan valahiyek dadigirtin. Kêlîya ew dîsa ket nav wan, ew tê gihîşt ku ev girtina navberê di hundir de ji derve zehf bêtir bû. Niha diviyabû ew, dîsa bi xepirandina destan bi pêş de biçûya û ew bi helkehelk gihîşt panava ku mîna ew û esmanê gewr î di wir re derbas dibû li hev bikevin xuya dikir, bêyî ku çûna wî rawestîne. Çûkên reş î biçûk wenda bûbûn. Qaçaxçî, ev mîna îşareteke çê pejirand û dest bi çûna ber bi jor ve kir. Gava gihîşt jor, wî xwe li ser erdê dirêj kir. Wî dîsa bêhna xwe da û stand, direjahiya ku ew li wir paldayî mabû, ew sist kiribû.

Pêşî dîsa qereqola li ser sînor vala xuya bû. Lêbelê çend cîzmeyên li ser derencê hebûna leşkeran li wir rê didan. Ev cizme wisa eşkere li wir bûn, mîna ku bi zanebûn li wir hatibin bi cîhkirin. Belkî ew îşaretek in, ji xwe re got, belkî jî ji ber ku bêhna genî ji wan dihat.

Çend xulekan bi şûnde derî bi dahfdan hat vekirin, lêbelê kesek nexuya bû. Qaçaxçî li dor xwe mêze kir, payîna bi aramî hew jê dihat. Piştre leşkerekî bi gomlek û lingên xwas di devê derî re xuya bû û lingên xwe mîna li gogekê bixîne, li cîzmeyên li ser mêrdewanê xist. Her yekê ji wan li hewa pêlek pêk anî û li ser erda ji axa sere ket. Ji hundirê barakayê dengên qîrîneke bi lîsk dihat, leşkerekî din, zilam dehfand bi aliyekî ve, bi lingên xwas di ser mêrdîwanê re berjêr likumî û cizme kom kirin. Leşkerê ku lingê xwe li cizma xistibû, li jor rawestiya û tiştin ber

bi hundirê beraqê ve qîriya, du zilamên din î bi kincên binî derketin derve û hemûyan bi hev re rê li ber ê ku rahiştibû cîzmeyan girtin. Ew bê biryar li wir rawestiyabû û destpê kir ku bike gotûbêj. Ji nişkê ve xwe da pêş û xwest bi dahfdan derbas bibe. Ew ket destê şeş destan, cizme ji destên wî hatin kişandin û dîsa di pêlên bilind di ser derencê re bi hewa ketin. Bi hêrseke êdî ne ne wek bi lîskê zilamî, ew cara duduyan anînin, lêbelê yên din xwe ji cihê xwe nedan alî. Hingê wî cizme danîn jêr û bê çek çû jor. Hemû ketin beraqê, xwe wenda kirin, heta derî jî dîsa hat girtin. Hemû wisa ne, ji xwe re got Qaçaxçî, leşker ku mirov ji wan tiştekî dixwaze û zarok ku xwe bi xwe dimînin. Ji aliyê din, vê yekê wêrekî dayê; atmosfereke baş hebû li ba wan, bi gumaneke mezin dê nehata guhertin, ger ew bihata.

Qaçaxçî rabû ser xwe, bi çipiskan kincên xwe paqij kirin û berjêr daket. Kêliya ew gihîşt jêr, derî hîn jî venebûbû, tenê dengê xirtexirtê û teperepê ji hundirê barakayê dihat. Ew çû heta ber derencê û li wir sekinî. Pêşî wî xwestibû li bendê bimaya, heta wan kincên xwe li xwe bikirana û derketana. Aramiya sibê ya derdora wî, ew anîbû ser hişê wî ku wî heta hingê qet ferq nekiribû. Wî kortala çend metreyan dûr dît. Ger ew bi pişt wê biketa û wenda bibaya, teqez wan dê ew hew bidîtana. Girîng bû ku di wê kêliya ew ber bi wê de diçû de, derneketana derve. Wî dengê wan hîn jî dibihîst û payîna xwe dom kir. Ji saniyeyekê heta bi ya din wî ew hew deyax kir. Bi paş de gav bi gav çû, pêşî hêdî hêdî, ger tiştekî xwe bilivanda, ji bo ew bikaribiya raweste. Herdu gavên dawî, wî bi lez û likumandin avêtin ser xaçerêka berjêr ve, xwe zivirand û bi lez ber bi çayirê ve çû.

Bayê ku bêrawest li tahtê dixist, di guhê wî de dikir guveguv û tiştekî ku wî got qey beybûnên bejî ne, li ser rêya wî mîna şopeke zer û diçirisandin li ser xaçerêka wî belavkirî bûn. Xaçerêka wî ya ku ji vir dîsa destpê dikir, dê li bajêr bi dawî bibûya.

Ew ji bangeke ji nişka ve ditirsiya û bêtir lez da xwe. Piştî gihîşt ber çayirê careke din li dû xwe zivirî û li jor mêze kir. Kesek nexuya bû. Li ber çayirê Qaçaxçî çû û hat, ji bo ku devera lê digeriya bibîne. Şopa wî jê çûbû, lêbelê piştî deqekê pê ve, belkî pênc metreyan bi nav çayirê de, wî yek ji kortên ku wî mayîn ji wan derxistibûn dît. Kort daketibû, bêtir qelşek bû, diyar ne rasthatinek bû, lêbelê bi erdê de hatibû kolan. Ew bû, deqa ew lê digeriya. Wî xwe bera ser çokan da û bêhna xwe kûr da û stand.

Ba, ji hingê zehf bi hêztir bû, li gihayê dixist û dihişt ku xuşexuş jê bê. Li paş çayirê, herêmê di nav xumameke seyr de xuya dikir ku wî pêşî got qey qûma li ber bê ketiye. Lêbelê ba ewqas jî ne xurt bû. Piştî kêliyekê wî zanîbû ku dûman bû, tiştê wî didît û niha wî bawer dikir ku bêhna wê jî dihat. Agirekî dar û qirşan heta hingê li vê jorê qet rû nedabû. Yekser dîsa ew mirovên ku bihîstibûn, hatin bîra wî. Divê kesekî ev agir pêxistibe. Ew li rex çayirê li ser çokan rûnişt û destê xwe yê rastê da ber çavên xwe. Darên hindik ên xwar ku hebûn ji dûr ve mîna pûşê di nav dûmanê de daliqyayî mayî xuya dikirin. Lawaz û spîçolkî bû xavik di nav bê de, lêbelê wî çiqasî hewl da xwe jî nikarîbû cihê ku dûman jê dihat bidîta. Her ku bêtir mêze dikir, bawer dikir ku tenê tiştekî zelaltir dibîne hebû: Dûman ber bi wî de tev digeriya. Wî bi lez li erdê mêze kir. Bi kurtî, wî karesatek li ber xwe didît: bajar dişewitî, her tişt, tiştên wî nasdikirin, zarokên wî miribûn, dîsa şer hebû bi bombeyên nû û mezintir.

Bala wî çû ser buokên li ser çayirê. Li her derê wî morî, bi kêmanî sê cûreyên kêzikan û tewr kurm jî dîtin. Qûm bi ser wan de reşiyabû û zeliqî bû, mîna ku niha ji bin erdê derketibin ser rûyê erdê. Ji her tim bêtir in, ji xwe re got û bê hemdê xwe ji rex çayirê bi dûr ket. Madê wî bi şêweyekî ku nas nedikir li hev ket, lêbelê wî da xwe ku aram bimîne. Jixwe ew dê di tu mercan de bi paş de venegeriya, niha qirdê wî bi leşkeran jê re

çê derketibû. Diyar e ev tişt asayî ye, ji xwe re got, dibe ku sedem ew be, ez heta niha tu caran wisa zû nehatibûm vir, lema.

Careke din bêhneke kûr da û stand, destên xwe ber bi pêş de dirêj kirin, ew girtin û vekirin. Wî wek her carê piyên xwe hejandin, ji bo ku giraniya qayişên tûrê piştê belav bike û hat bîra wî ku ew li ser pişta wî tuneye. Wateya sembolîk a vê rastiyê ew ji bo kêliyeke kurt tirsand. Piştre dest bi meşa bi çarpiyan kir.

Riya vegerê her tim bê pirsgirêk bû. Pêdiviya wî niha bi kaxezê jî tune bû. Li gel ku axa wî avêtibû ser mayînan êdî hişk bûbû jî, ew hîn jî ji erda li dor xwe bilindtir bû.Wî çavê xwe li wan deveran digerand, li her yekê ji wan, li kortikê wî mayîn ji wan derxistibûn, digeriya, ew baş kûr dikir û piştre dor mayînê dîsa vala dikir. Ji bo wê rabike xwe bi pêş de kaş dikir û bi hemd xwe diqulupand. Wê sibehê destên wî aram bûn, ji cihekî danîna bo cihekî din bê dijwarî pêk dihat. Mayîn bi mayîn wî, xaçirêka xwe li pişt xwe digirt. Ew kir ku kesek nikarebe tê re derbas bibe û ew nexuyayî dikir. Ev beşê rêya vegerê her carê rehetiyeke seyr pê re çêdikir, ji ber li vir xuya dibû ku xaçirêk milkê wî bû. Ew di serê wî de hebû û ne li tu deverên din.

Bayekî xurt dihat û hênik bû. Qaçaxçî, xwêdan nedida û bi lez bi pêş de diçû. Her ji kêliyekê serê xwe radikir û li herêma bi dûman mêze dikir. Kaşên çiyê yên dûr hema hema hew xuya bûn. Dûman bi toftir bûbû, lêbelê wer xuya dikir ku ew bilind nedibû. Mîna şiliyekê ser beriyê girtibû û belav dibû. Ew bi çarpiyan hîn jî diçû û kincên wî yên ku hînî wan bûbû û niha ne lê bûn hatin bîra wî ku niha bêriya wan dikir. Gelo kê qapûtê wî li xwe kiribû, yan wan ew avêtibû? Wî qapûtê xwe niha li ber çavên xwe didît, li cihekî bi toz bû. Wî bêriya saeta xwe jî dikir.

Buokan ew ji hal dixistin, wî ew didan aliyekî, qûm davêt ser wan, an jî bi pifê ew bi dûr dixistin. Lêbelê wan xwe nû

dikirin, ji bin erdê derdiketin, bêyî ku wî bikarîba bidîta. Vê yekê ew dixist nav lezê. Diviyabû wî xwe neçarî aramiyê bikira, ji ber ku mayînên “hilpêker” destûra lez û bezê nedidan. Antênên wan ên mîna tayan zirav î lerzok mîna dîlimên zirav di şewqa şîreyî de diçirisandin û Qaçaxçî ev mîna îşareta ku divê miqate be fam dikir.

Kêliya wî bi herdu destên xwe bi silinirê yekemîn girt, ew li avahiya tije destên bi reng û gemarê hizirî. Berî bi demeke dirêj ew çûbû serdana wir, li gel ku di rastiya xwe de wî rêya xwe bi cihên wisa nedixist jî. Demekê rengê dîwarên vê avahiyê ji şînekî teyisandî bû, lêbelê gelek tiliyên reş dest pêkiribûn ku vî şînî terîş terîşî bikin. Piştî demekê di van dîwaran de cîh nemabû ku tevahiya destekî bi rengê şîn karîba li ser bihata wênekirin û destên ziyaretvanan dest pêkirin ku li ser hev bikevin, tiliyan hevdû çeprast dikirin, gelek tiliyên mezin li ser hev zehf qalind dibûn mîna deqên rengtarî. Piştre şopên destên berê bûbû piştbingeh, ji yên teze rengvekirîtir xuya dikirin. Piştî demekê, ji xwe re got, tiştê seyr pêk hatibû: Paşmayên bela wela yên rengê şîn bi tîrêjên xwe di destên tarî re derdiketin mîna ku ji kûrahiyekê bên; şîn bi dûr ketibû, li gel ku her kesê bawermend bi şopa destê xwe li nêzîkahiyê li derfeta xwe gihandinê geriyabû. Kêliya ew hingê derbasî hundirê avahiyê bûbû, hesteke ku zehf mezin e li ser wî hiştibû û ku wî xwestiba şopa xwe li wir bihêle, dê ji wî re tu tişt nemaya, ji lêxistina destê xwe li ser ên din pê ve, ketina nav qelebalixê. Di ser wî re qîjîna teyrên baz hat, pê bi pêl nizmtir dibûn.

Deqa kesk li dawiya çayirê xuya bû. Ew ji nişkê ve li wir bû û di navenda dîwarê ji dûmanê yê ku nêzîk dibû de bû. Kêliya Qaçaxçî berê xwe da aliyê ku bi çarpiyan ber bi wî ve diçû, wî ew di qorziya çavê xwe re dît. Lêbelê wî baş lê nenerî. Wî dixwest karê xwe heta bi dawiyê bibe, wek ku wî di serê xwe de dabû ber xwe. Her yek ji tevgerên destên wî li gor vê hizra wî bû û ew ne amade bû, ku niha bihêle, tu tişt vê yekê têk bibe.

Ew ber bi pêş ve tev digeriya û wî zanîbû divê ew piştî demekê li jora xwe mêze bike, li ser demê wî karîbû piştî deh metreyên din biryar bidaya. Di van çend metreyê dawiyê de hizra ku wî bawer dikir ew ê cara dawî be, cîh lê teng dikir. Wî xwişka xwe li pêşberî xwe dît, legana birqokî di destê wê de bû û ne ecêbmayî, lêbelê tenê bi baldarî, ber bi jor ve li wî mêze dikir. Di awirên wê de aramiya berê ya “bihêle bila pêk bê” hebû ku wî ew ji wê nas dikir û piştî wê birînên wî dîtibûn dev jê berdabû. Seba çi ew neçar mabû ku wî benê nepen biqetîne? Di kêliya wî herdu mayînên pêlkirinê yên dawiyê dixistin bin erdê têgihişt bê seba çi; ew têgihîştibû, bê ew çi qasî zehf ji vê “bihêle bila pêk bê” li ba wê jî nefretê dike, ji ber ku vê yekê ew jî dikir bûyerek, mîna yên din ku dihatin û diçûn. Lêbelê dîsa jî diviyabû ew her tim ji bo wê ew bûyer baya, ji bo ku wê dîsa ji wî hez bikira, xema wî bixwara û li wî miqate ba. Ez hew dixwazim ez ev bim, ji xwe re got, divê ev bi dawî bibe. Wê dê zarokê xwe bianiya û ger vê carê sax ba, dê bi wî re biba perçeyek ji jiyana “îro” yî kambax ku Beno behsa wê kiribû û Îro, li gor dîtina wî, ne tenê ew tişt bû ku ji wan hemûyan re dima, lêbelê pê re jî ew tiştê ku ji tevahiya rabirdûyê xurtir bû. Ev Îro ji bo wî hew karîbû ji jibîrkirinê bihata cûdakirin. Ger xwişka wî mafdar bû jî- û ew her tim di hemû babetên bi wî ve têkildar de mafdar bû-wisa ev jî beşek jê bû û diviya ew jî wisa bi dawî biba.

Ew gihiştibû dawîya rêwîtiya xwe û hîn jî ziq li destê xwe yên pahnkirî li ser erdê, mêze dikir. Bi baldarî didît bê çawa şeytanok di ser pişta destê wî re kaş dibûn, mîna dilopên xwêdanê yî rengîn di çaviyên erdê re derdiketin û hişk dibûn. Piştî bi gelek salan ev cara pêşî bû ku Qaçaxçî, heywanên berdayî li herêma bi gir didîtin, ew pez koviyên biçûk bûn yê ku wî ew ji zaroktiya xwe de nas dikirin. Aştiyane û hêdî hêdî dimeşiyan, mirov digot qey ew hemû jî xwedî seferekê pişterast in. Gelo van heyawanan xwe ji tirsa agir li vir didan ser hev?

Dawiya dawîn wî karîbû destên xwe ji erdê berde û ecêbmayî nema ku ziq li pêlava xortê li pêşber wî rawestiyaya bû û ji jor ve lê dinerî, mêze kir. Ew heman pêlav ku hingê di lingên wî de bûn, wî ew jê re bi xwe re anîbûn. Bêyî dilê xwe, wî serê xwe rakir û neçar ma ku bibişire. Xort destên xwe xistibûn bêrîkên derve yên qazaxê hirî yê kesk. Ev jî Qaçaxçî jê re kirîbû. Xortî bi awirên nerm ên ne zarokane, ji jor ve li wî mêze dikir. Rîha li ser çena wî hîn jî firk û rengvekirî bû, mîna hingê. Qaçaxçî, bi şêweyekî bêhntengbûyî û baldarî li rûyê wî mêze kir, çavên wî yî zirav, guhên wî yî hebekî refikî û porê wî yî gûr ê mîna kulavekî ku mîna sîxan li ser serê wî rawestiya bû. "Nêrîk", bi dengekî bêhnçikyayî got Qaçaxçî, "tu li ku bû?" Piştî şaşwazîbûnê di kêliya wî li xortê bê liv rawestiyayî dinerî de hêrsek hate wî, ne ji wî, lêbelê ji salên tirsê û yê payînê. Ji madê Qaçaxçî ev hêrs berjor bilind bû, ewqas bi hêz bû ku ew neçar ma rabe ser xwe, xwe ber jor ve vezelîne, ji bo ku cîh ji wê re çêbike û dest û milên xwe vala bihêle ku pêdiviya wî bi wan hebû, ji bo ku li kurê xwe bida, wî bigirta û wî bîne dîsa bixe pergalê, hemû cihê ku divê bûbûya. Lêbelê xort xwe da paş. Bêyî ku lê miqatebe aw bi çend gavan paşo paşo çû. Qaçaxçî da dû wî, lêbelê xort ji xaçerêkê derket. Qaçaxçî dixwest wî îqaz bike, wî destên xwe bilind kirin û îşareta ku divê ew raweste dayê. Xort pişta xwe da wî, careke din lê zivirî û bişirî, piştre bi gavên mezin çû, rengê kesk tarî bû.

Qaçaxçî bi lez li ser xaçerêka xwe vir de wê çû û hat mîna heywanekî ku bi hevsarê xwe ve girêdayî be, lêbelê vê carê wî nikarîbû xaleke ku tê re derbas bibe bidîta. Kêliyeke kurt da xwe ku bide dû xortî, lêbelê erda ku diviya kesek derbasî ser nebe nedixwest gavên wî hilgire, wê ew li ser xwe nepejirand, lema neçar ma ku di cîh de raweste.

Destê wî li bêrîka şalê wî ket û tiştek tê de hest kir. Wî nedixwest tavilê destê xwe bixêyê; hişê wî hîn li ba xort bû. Xişexişa kaxezan di bêrîka wî de ewqas eşkere û nêzîkî wî bû,

mîna ku ji dunyayeke din be. Wê bi tevahiya taybetmendiyên xwe yên wî nas dikirin, ewqas xwe da ser wî û bala wî ji ser xort da alî, mîna êşa ku bikeve nava xewnekê. Bi lez ji bo ku bi dawî bîne, qefla pereyên ku xwişka wî veşartibû derxist. Wî li serî û hejmarên li ser hev nerî û nedixwest ji xwe bipirse, bê wê çawa karîbû dîsa qederekî ewqas pereyan bide wî, ji ber ku di wê kêliya ku wî ev dikir de wî, rengê kesk ji ber çavan wenda kir, keskê ku nikarîbû bihata dest dan di navenda welatê ku nikaribû bihata dest dan de.

Hevokên Beno hatin bîra wî, hevokên ku wî ew baş fam nekiribûn, belkû ew tenê hilanî bûn, heta bi niha: “Xort, erê -ez bawer dikim, te ew wenda kir, û bi min bawer be, bi Xwedê, ez nizanim, çawa. Te jî nikarîbû xwe hertim di her derê re rabikira. Wisa lê mêze bike: diviyabû te ji bo xaçerêka xwe bedelek bida.”

Sherko Fatah (Şêrko Fetah) nivîskarekî Kurd û Alman e ku di sala 1964ê de li Berlîna Rojhilatê hate dinyayê. Di sala 2015ê de xelatên "Hunera Mezin ya Almanyayê" û ya Adelbert von Chamisso wergertine. Li edebiyata Almanî zimaneke nû û cografyayeke nû zêdekir û bi wê dihête methkirin.

Sherko Fatah ji sala 1975ê ve re li Berlîna Rojava dijît û romana xwe ya pêşîn "Li Welatê Sînoran" di sala 2001ê de weşand. Vê romanê di eynî salê de xelata Acpectê a Edebiyatê ya li Almanyayê ji bo romana herî baş dihête dan, stand. Dîsa di sala 2002ê de jî xelata Rûmetê ya "Yekemîn Romana Herî Baş ya Rexnegirên Alman" wergirt.

Di romanên xwe de gelemperî behsa herêma ku babê wî jê hatî, yanî Başûrê Kurdistanê û Îraqê dike. Cografyaya herêmê û insanên wê digel derd û kul û hêviyên wan biqasê zihniyeta welatê lê dijît baş dizane. Di romanên xwe yên Almanî de van herdu çandên cuda bi hostayane vedibêje.

Sherko Fatah di romana xwe ya yekem ku ji aliyê rexnegiran ve pesnê wê tê kirin de çîroka kesekî ku li ser sînoran tê û diçe vedibêje. Lehengê bê nav li devera mayînkirî qaçaxçitiyê dike û peymaneke wî digel mayînan heye: hindî ku ew wan aşkare neke ew jî îxanetê li wî nakin. Lê gava kurê wî berze bûy, her tişt diguhere. Ji bo peydakirina kurê xwe yê winda mecbur dimîne ku bi ajan re bikeve têkiliyê û demûdest rastê îxanetê dibe. Li gel vê peymana wî ya nepenî a digel mayînan betal dibe. Di karê xwe yê xeternak de ev derfeta ku vê peymanê pêk diîna yek car ji destê wî diçe...

Wek karakterên romanên Sherko Fatahî welatê ku ew karakter lê digerin jî "bê nav" in. Nivîskar lehengê vê romana xwe "Qaçaxçî" li ser sînorên di navbera Îraq û Tirkiyê digerîne, yanî li wê Kurdistana welatê sînoran... Wekî qaçaxçiyê romanê, xwendevan jî rastê rastiyên sînoran dibin û nikarin ji wê dinyayê bi rehetî veqetin..

"Kitêbeke pêwîst û cîhanşumûl" Peter Handke

"Sherko Fatah, keşfeke rastî ye." Televizyona Almanî NDR

"Nivîskar, xwendevanên xwe dikêşe erdên mayînkirî." Christina Zink